# Dîroka hunerê şêwekarî li Kurdistanê

[redacted]

Xwediyê Imtiyazê
**Hafiz Qazî**

Sernivîskar
**Mueyed Teyib**

**Mafê çapkirinê parasti ye**

**Adrês**
**Êraq – Kurdistan**
**Duhok**
**Avahiye yekîtiya sendikayên karkerên kurdistanê**
**Qatê sêyem**

**Tel. 7225376 - 7222125**

**www.spirez.org**
**www.spirezpage.net**

- **Jimara weşanê**: (**166**)
- **Navê pirtûkê:** Dîroka hunerê şêwekarî li Kurdistanê
- **Danan:** Fehmî Balayî
- **Derhênana hunerî:**Nazdar Cizîrî
- **Berg**: Necîb Balayî
- **Wênê serbergê yekê:** Malva
- **Serperştya Çapê:** Şêrwan Ehmed Teyib
- **Çapa:** êkem
- **Tîraj:** (500) Dane
- **Jimara Sipardin:** (      ) li sala (2006)
- **Çapxaneya :** Haj Hashim - Hewlêr
- **Weşanxaneya Spîrêz**

دار سپيرێز للطباعة والنشر

**SPIREZ PRESS & PUBLISHER**

# Dîroka hunerê şêwekarî

## li Kurdistanê

Danan

**Fehmî Balayî**

2006

# Diyarî

**Ji bo hunermendê Şehîd"Selman Zaxoyî", xwediyê hestên nazik û evîndarê cwaniyê, ew hunermendê li gorepana leşkerî li "Feyîdiyê" bi destên Çekdarên rjêma Beis hate gulebarankirin. Wî bi xwîna xwe tabloya "azadî"yê afrand..Lewma jî ew bûye beşek ji tabloya bi navê"Gulebarankirina şoregeran"yê hunermendê navdar ê cîhanî "Frencisco Goya".**

**Fehmî Balayî**
**Berlin 21.adera.2006 ê**



**Tabloya hunermendê Ispanî"Francisco Goya"**

# Naverok


| | |
|---|---|
| **Pêşgotin ………..………..………..……..…………** | **9** |
| **Hunera gelêrî  çiye? ………..…………..……………........** | **11** |
| **Huner li ser dema dewleta Dustekî …………..…………..** | **27** |
| **Bingehê Hunera Şêwekar  …………..………..……….** | **39** |
| **Şerefxanê Betlîsî û nîgarmendî ………….……………...** | **45** |
| **Despêka Sedsala Bîstan ………..………..…………..…** | **77** |
| **Qonaxa despêka salên di navbera herdu şerên cîhanê de** | **81** |
| **Bizava hemdem ya şêwekariyêli başurê Kurdistanê ……** | **89** |
| **Hunera Şêwekarî li Bakûrê Kurdistanê ………….....……** | **125** |
| **Hunera Şêwekarî li Başurê Rojavayê Kurdistanê ………** | **141** |
| **Malva (OmerHemdî) ………..………..………...……** | **145** |
| **Hunera Şêwekarî Li Rojhilatê Kurdistanê …………..…** | **161** |
| **Çend Mînak Ji Hunermendên Derveyê Kurdistanê ……** | **167** |
| **Karîkator hunerekî birînderkirina bê xone …………..…** | **169** |
| **Sombolizma Reng ………..………..………..……….** | **177** |
| **Huner-Xweza û Dîrok ………..………..……..…...…** | **183** |
| **Çavkaniyên Hunerî ………..………..………..………** | **185** |
| **Bandora Huner Di Dîrokê de ………..………..….……** | **187** |
| **Hîkariya Huner Li Ser Mirov ………..………..………** | **189** |
| **Huner û Netew ………..………..…………..……..…** | **191** |
| **Huner û Cwanî(Estetîk)……………………...…....…** | **205** |
| **Jêderên Kurdî û biyanî ………..………..……….…..…** | **211** |

# pêşgotin

Huner di destpêka jiyanê de xwedî roleke giring bûye. cwanî, hestên nazik û şaristaniyet di nava xwede hembêz kiriye. Lewma di hemû dem û qonaxan de grêdayî mirov û civakê bûye. Kurdistan weke xaka kevntirîn şaristaniyên Mezopotamiya tê naskirin. Livê xakê jiyana mirovatiyê destpêkir, her livê xakê jî mirov xwecih bû, gond û civak avakirin fêrî rengên şaristaniyê bû. Qonax bi qonax rengên jiyanê têde eşkere bûn, taku tîrojkên xo bi alîkariya deryavan, bazrgan û dagîrkirinê li cîhanê belavkirin, kevneşopiyên vê herêmê veguhastin Esîna û ronahiya xwe daye Roma. Gelê kurd xwediyê dîrokek kevnar û dewlemende, li ser vê xakê gelek afrandinên hunerî pêkhatine û jiyaneke biromet pêşkeşî mirovatiya cîhanê kiriye. Lewma di qonaxên djwar de perçebûn, jinavbirin û talankirin pêkhatin û carek din jinûve jiyanê serhilda. Kultur, çîrok, nexş,dastan û melodiyên kevneşopiyên dîrokî di nava xwede hembêz kirin, ev jî peywendiyên huner û jiyanê nîşa me dide, her ji destpêka hunera li ser kevir û teqn û amanên axê û huneran gelerî taku qonaxên nû bixweve digre, weke berhemên çandin û rstin û nexş û xemla nava malê û ..htd. Vê yekê jî kevneşopiyên vê herêmê parastîne, di van parastna de gelek beşên hunerî xwe têde dibînin yek jiwan jî nîgarmendiye. Melodiyên kurdî xwe di nava cvak, xwezaya rengîn a Kurdistanê de di bîne biwan taybetmendiyên dîrokî xwe gehandiye roja îro. Ji egera nebûna deşelatek netewî û parastî di çarçuveya perçekirn û talankirnê de hevrikiya nexoşiyên sext û dijwar kirye. Diser wê yekêre gelê kurd şiyaye mohra xwe li hind qonaxên dîrokî bixe û kultura xwe biparêze, weke stran, çîrok, serhatî, dastan,nexş û xemlandin..htd ev jî tê wê wateyê ku rêjeyek ji bermayê talan û jinavbirn û perçebûnê gehandiye destê me, beşek jî ji netewên Kurdistan dagîrkirî re bûye mal û molk û beşê herî giring jî îro li herêmê maye bê lêkolîn û winda bûye. Lewma pêwîste li ser nivêskarên kurd xwedî livan nirxên giran derbikevin û lêkolînên zanstî li ser bêne encamdan. Hind bandurên nerênî li ser civaka kurdî bûne rêgirên pêşdaçûn û diyardên hûnerî bitaybetî piştî hatina îslamê bo herêmê bitaybetî beşa nîgarmendiyê evjî bû egera destberdana gelek kesanên xwedî behreya hunerî mîna helbestvan û nîgarkêşê kurd (Bekir Begê Erizî û Osman Beg) û gelekên din. Mirov dikare xala yekem ji hunera nîgarkêşiya kurdistanê ji tlên zêriynên dîroknivês û nîgarkêşê kurd (Şerefxanê Bitlîsî) destpê bike, ewjî bi xebat û lêkolînên ronakbîrekî weke

(Abdulreqîb Yusiv) î hatiye eşkere kirin û ew şiyaye hind qolaçên tarî ruhn bike û tabloyên vî hunermendî ji tuza ber simên hespên dagîrkeran paqij bike û bêxe berdestên me. Ev jî dibe xala yekem ji bo destpêka şêwekariya kurdî. Lewma min bifer zanî vê pirtûkê bêxme berdestê xwendevanên kurd û bitaybetî hunermendên kurd ku bibin xwedî pêzanînên hunera şêwekari ya kurdî. Dinava rûpelên vê pirtûkê de hind qonaxên xebata nîgarkêşiyê hatîne diyarkirin. Herweha taybetmendiyên nîgarkêşiyê li parçeyên Kurdistanê bi alîkariya xebat û berhemên hunerî tabloyê Kurdistana mezin nexşandiye û çend mînakên her parçeyekê pêşçav kirîne, herweha hunera karîkaturî, dîrok û xweza, huner û jiyan, Estetîk, huner û netew û hunera gelerî dinava vê pirtûkê de hatine şirovekirin.

Paldana min ji bo nivêsîna pirtûkek weha çend egerên giring bûn: yek jiwan valatiya pertûkxaneya kurdî di vê mijarê de û nebûna çavkaniyên hûnerê şêwekariya kurdî. Duym: piştî serhildan û xebatên netewî li kurdistanê bigiştî û li kurdistana başûr bitaybetî piştî serhildena pîroza 1991 an kurd bûne xwedî hind sazî û destpêka avakirna kurdistanê, helbet vê yekêjî gelek peymangeh û Akademiyên hunerî avakirin valatiya nivêsên li ser vî beşê hunerî buşatiyek peydakir min bifer dît ku beşekî biçûk ji vê valatiyê dagrim. Sêyem: eşqa min diwarê nivêsînên hunerî de ew bû ku ez bikarim hunermendên kurd li parçeyên kurdistanê bi hevdu bidem nasandin û tabloyekî yekgirtî binexşînim ku hemû reng xwe têde bibînin. Hîviya min ewe ku ez şiyabim xzmetek biçûk pêşkeşî gelê kurd û pertûkxana kurdî bikem. Pêşniyara min ya dawî ewe ji sazî û dezgehên hunerî û ji hunermendên Kurdistanê ku salane Festîvalek hunerî binavê (Festîvala Şerefxanê Bitlîsî) bê kirin û hemû hunermendên herçwar parçeyên kurdistanê bi tabloyên xwe beşdar bibin, daku pêtir reng yek bigrin, dîrok bê nexşandin, hestên cwaniyê bi ramanên nazik jiyanek nû biafrînin û pêşkêşî hemû mirovatî û cîhanê biken. Û dîroka me ya nîgarkêşiyê dinava vê festîvalêde bê parastin.

**Fehmî Balayî**
**Berlin 2006**

# Hunera Gelêrî çiye?

Dema em nêrînekê li ser hunera gelêrî ya destpêkê bikîn dê ji bo me eşkere bît ku hestên cwaniyê xerîzî bûn li ba piraniya mirovan, diser rewşa wana bîrkirinê, di hizra berhemanînê û giring ya mirovî ji bo pêwîstiyên jiyana rojane de, lê di heman demê de xweşikiyek jî pêre hebû, mirovê destpêkê aletên xw di nexşandin û di xemlandin bi hind nexşên endazeyî (hendesî) û kolan û hind xetên yeksan û lihevalyayî û sêguşe, yan bi wênên giyaneweran. Li destpêka şaristaniya kiştukalî û xwecihbûnê, hind şêwên din yên hunera gelêrî peydabûn ku pêtir pêwîstiya mirovî pê he bû, digel pêşdaçûna şaristanyê bi rêya bazirganî û zêdebûna aletên kiştukalî. Ev meydane pire ji hunera rojane weke navmalî, stivan, morîk, amanên, xwarnê û vexwarnê, tiştên xweşik kirin û xemlandinê.Çend hunermendê gelêrî ev derbirîne rojane pêşde bir, cwaniyeke li gurî demê di berhemên xwede pêk di anî. Bi vêjî em dibînîn hunera gelêrî têkele di gel huneran mifader yên ku pêwîstiyên jiyana me ya rojane têde diyar dibe, komkirina bihayê cwaniyên afrandina karekî hunerîaşkeraye.Ev hunere mil bi mil bi drêjiya dîrokê digel hunera resimî bihevre bûn. Keleporê kurdî xwedî dewlemendiyeke hunera gelêriye di edebyat, stran, muzîk, nexş û nîgaran de, ev yeke jî zîrekiya hunermendê gelêrî eşkere dike yê ku bi şêweyekî sade pêkanî. Ev hunerekî tendurusti ye hunermendê gelêrî aliyekî giringe ku gel di parast ji gelek aliyên jiyanê.Wjden û hestên cwaniyê peyde dikirin, dema dewlet bêhêz dibû şiyan û afrandinên hunera deselatderî dihate çarçûve kirin.Bivî şêweyî aliyên hunera çavlêker yên serane kêm dibûn û hêza hûnerê gelêrî xort dibu. Di hemû demekê de hunera gelêrî serbilind bûye, herwekî qehremanê serhatiyên gelêrî mînakê herê xort bu li ba her gencekî. Ev hunere weke keleporê gel bi hezaran sala hatiye parastin û geheştiye roja îro, evjî serhatî, ruden, kelepor, dastan û bîreweriyên netewekî nîşa dide, ku ji nifşekî bo yê din hatiye veguhastin û xwediyê wê nayê naskirin lewma li ser navê gelekî tê

naskirin. Gelek şêwên cude ji vî hunerî weke sombol ji bo dastanên netewî hatine bikaranîn, mîna Mem û Zîn a xanî, Romio jolya Şekesbîrî, Şirîn û ferhad,Rustemê zal,Enter..hw

## Taybetmendiyên hunera gelêrî:

- yek ji diyardên hunera gelêrî bikaranîna meterialê navxoyî ye ji yekgirtina jîngehê. Di lêkolînên hunera gelêrî de bo me eşkere dibe ku rihên hunereke resene ku gelek aliyên wê hatîne windekirin piştî beşderî jiyana me bûn ji aliyê afrandinên ku cudehiya dinavbera dema berê û îro de diyar dike.

- Ev hunereke xemlandinê ye li ser navê çi kesan nayê hijmartin, jiber ku hunerek gelêrî berfirehe, hunermendê gelêrî bitenê babetên keleporî yên tên naskirin pêktîne, herweha bersivdena pêwîstiyên jiyana rojaneye, resim li ba van hunermenden nwênerê riyalîteya eqliye pêtir ji riyalîteya dîtinê, herweha derbirîne bi rêya resmî li cihê axaftinê, di wênekîde gelek rudana nîşa dide herwekî serhatiyek tê gutin,û wênên dîtin û nedîtinê wêne dike. Û bawerî bi bingehê endezeya dîtinê nîne.

- Hunermendê gelêrî giringî dide berhemên xwe yên nexşandî li ser du regezan.

  **Yekem:** yekgirtina şêwên endezeyî yên sade,di berhemên pîşesazî de bikar tîne û madê xo li ser zal dike mirov dikare bêje li ser rêya pîşesazî tên encam den.

  **Duem:** nexşên endamên sade giringî dide xetên nerim û beşên biçûk, yan gulên li ser bingehekî sade û pêlên avê.(1)

- xemlandinên xwezayî ji bo aliyê mirovî, evjî xwesteka hemû netewaye li cihên cude ku bala mirovî dikşîne.Çi bi alîkariya renga yan wêne yan deng, her endemek rula xwe dibîne di

(1) Hyam El Seyd el seqafe wel fen.malperê Islamonline.net

hunera gelêrî de, peywendiyek bi hevre heye bitaybetî di çêkirina morî û stvanan de li ser bingeha endezekî ji hêl û sêguşeyan pêk tê.

- Wênên li ser dîwara giringtirîn rêbaza derbirîna hunera gelêriye, ku têde wêneyên zincîr, aman, foxar, kelûpelên nexşandî li ser bingehê endezeyî û nexşên kinc û stivan, morî..hw.


Livir mirov dikare bêje ligur dem û pêwîstî û jîngehê hunera gelêrî tê afrandin, di civakeke kiştûkalî de dê tiştên ji axa sor weke aman û aletên pêwîstiya kiştûkalî pêkînit, civakeke koçerat û xwedî pez dê ji hiriyê tiştên rêsay û karên destî, mafor, xemlandina nava malê ji hirya pezî pêk înît, civakeke li deştê û liderdura avê dê ji xorma û qamîşî selik û kursî û pêwîstiyên wê herêmê û peydabûna metiryalê pêwîst pêk îne. Jiber rastgoyî û resenatiya hunera gelêrî rihên wê derketîne ji erdê û çavlêkera kelepor û pêwîstiyên mirovê normal ji bo jiyan û parastin û viyanê hatiye afrandin.

## Hunera Gelerî Ya Kurdî

Helbet dema mirov behsa hûner dike, hind tiştên nû dikevin berçavên mirov û dibin cihê pirs û bersivdenê.Weke kîjan hûner, aya hûnera mîlî dikeve di qada hûneriyê de yan dibe behre û pîşe? aya hûnereke çavlêkere yan afrênere?aya mirov dikare mercên hûner ji hev cude bike?ev û çendîn pirsên din dikevin berçavan taku mirov bikare navê hûner û rastiya hûner pêşçav bike.

binêrîna min cwanî yan Estetîk di karekî jî afrandinên mirov be û bikare bandora xwe li ser hestên mirov bike, çi dibe bila bibe dibe beşek ji karê hûnerê. herçende di beşên hûnerê şêwekarî de jî şêweyên cude hene, lê dîsan mirov dikare vê cudehiyê dihind xal û mercan de bide xoyakirin. Jiber ku taniha çendîn pênasên cude li ser hûner hatîne kirin û gotin her yek bi awayekî û ligur nêrînekê, lê dinava van pênasan de yek armanc heye ewjî karê afrandin û

bedewiya hûnere. ku bihest û bîrên kesekî hatbe encamden û kesê beramber bikare bikeve bin bandûra vî karî û xoşiyê jê werbigre bi alîkariya hestên xo. Ger em hûner û xweza bideîn berhev, aya tabloyekî siruştî dibe çavlêkirina siruştî yan hind guhartina bixweve digre ji hundurê hûnermendî derdikevin û hind nûyatiya bixweve tîne, herweha nexşeyên mafor, derî, alet û .. tdw reng bişêweyekî lihevhatî yan hemberî hev bi rêk û pêk di herdu beşan de pêk tên, di nexşeyên kurdî de piranî rengên gerim têne bikaranîn weke sor, zer, porteqali û rengên sar û siruştî weke şîn û kesk vê yekêjî peywendî bi herêm û cihê jiyana her netewekî ve hey, ji berku herên kurdan xwedî dîmenên cwan û xwezayeke bedewin û welatê rojê ye vê yekê bandûra xwe li ser hestên hunermend û karên hûnerî, nexş û nîgarên kurdî kirîne. Herweha peywendiya jiyana kurdan bi kiştûkal û siruştî ve mirovê kurd paldeye wê yekê ku ev renge di hestên wî de bimînin xwedî bandur. Lewma ev yeke bi berdewamî di gelek qonaxên jiyanê de digel netewa hemdem bû.



**berkên Xwerêsan**



*Berkên Sinna*



*Berkên  Başûrê Kurdistanê*

## Nîgarên Maforên Kurdî

Dema em rewşa kurdan di jiyana rojane de pêş çav bikin, di dirêjiya dîrokê de li Kurdistanê û axa kurd lê dijîn û berdewamiya koçberiya kurdan li ser vê xakê jiyaneke rojane bû. Ev jî ji herêmekê bo ya din, ev yek ji sedemên jiyana civakî û aburî û ji sedemên dagirkirin û ferzkirina şeran li ser kurdan û wan herêmên kurd têde dijîn. Ji ber vê yekê jî ji hemû aliyên jiyanê şêweyên huner, rewşên civakî û jiyanê xalên hevbeş bi xwe ve girtine. Jiber ku jiyana kurdan bi giştî jiyaneke koçerat û kiştukalî  bû. Ev jiyan

jî piranî girêdayî siruştî bû û bi xwedîkirina pez û ajalan. Ev jî sedemên wê yekê ne ku ew bi xwe bikaribin hin tiştan biafirînin. Gelê kurd nexşandina maforan û kel û pelên nava malê û alet ûwd.. bi kar dianîn. Em dikarin cudebûnekê di maforên kurdî de bigirin berçav. Bi taybetîm di nava kurdan de li herêma Enadol û herêmên mîrnişînên kurdan dewlemendtirîn bingehê vî hunerî bû.





**Maforên herêma Anadolê**

Ev huner jî li ser destê koçeran pêşde çû. Jiber ku ji bo germkirin û xemlandina reşmal û dîwaran û helawîstinê û li bin xwe raxistinê ev yek girêdeyiyê jiyana wan bû. Herweha ji bo zînkirina hespan û dewaran, kortan, serhevsar, cihal û tiştên navmalê, di van nexşan de ciwankariyeke bihêz pêk aniye. Ji nexşên ciwaniya siruştî û jiyana rojane li pêş çavan raxistiye. Dema em li destpêka jiyanê di qonaxên xweçêbûna mirov binêrîn, piştî qonaxa rav û nêçîran komelgehên şivan û bi xwedîkirina ajalan dest pê dike û tê qonaxa çandina kiştûkalî. Pêwîstiya vê qonqxê jî bi maldariyê hebû. Bi vê yekê jî mirov pal da dirustkirina mafor ristin û tiştên nav malê.

Hunera maforan ji koçeran ber bi gundan û bajaran ve çû, paşî ji çarçoveya bajaran derket û kete destê xwedî welat û biyaniyan. Dema koçer zivistanê û havînê koç dikin, zivistanê diçin dul û deştan û havînê diçin çiya û cihên zozanên bilind. Pêwîstiya vê

yekê bi dirustkirina maforan hebû. Di havînê de reng ji siruştî werdigirtin ji pelên hişk yên dar û gulan û ji mu û hiriya pez dirust dikirin. Ev kar jî di navbera jin û mêran da parvedibû. Mêran tişt berhev dikirin û jinan nexşê hunerî bikaranîna maforê pêk dianîn. Tevn û ristin berê zayina Isa hebû. Ji ber vê yekê em vî hunerî li ba kurdan wek kevntirîn hunera rengkirinê dihijmêrin.



**mînakek ji maforên Loristan**

## Maforên Kurdî

Maforên kurdî taybetmendiyên xwe hene li ser şêweyê endazeyî weke çargoşe, lakêşe, sêgoşe, xal û hêlên dirêj mîna çîmenekê sercemê çarçoveya maforê digre. Nexşê kurdî bi zexrefê ji nexşê farsî, tirkî û erebî cude ye. (nexş û reng) şêweyê dubarebûnê û bingehên yek li dûv yek bi kêş û qalib kom dike, jimarên têde xweya dibin. Berkên kurdî ji hemûyan bi qerebalixtir û lipêştir û ciwantir in. Li ser şêweyê pirî giyandar û balinde û ajelên kedî û kuvî, herweha bizavên mirovan bi hatin û çûn û weke şêweyên govendan ku ji piyan ve xweya dikin nexşên ser bi herêma Hewlêrê ve Paleyî, Gerdî û herêma Behirkê. Mêr bi şewqe û bizava govende û jin jî têde bikar aniye.

Di hin herêmên Sine de ku bi ciwantirîn karên hunerî li rojhelat

tên nasîn nexşên wan yên ji ajal û perên ciwan yên balindan mîna kotir û tawisan pir in. Di berkên kurdî de nexşên cûda cûda bi kar anîne. Ev şêwe jî sade ne û bi asanî tên dîtin. Piraniya wan hêlên têde bikaranîna asoyî ne û ev jî pênaseke ji bo sadeyiya berkên kurdî. Berkên kurdî piranî şêweyên dirêj bi xwe ve girtine. Heke haşiye bi rengên gerim bin derdor û naverast bi rengên tarî bi kar hatine. Weke reş û mor aliyên wê bi rengên tarî û hewza naverastê bi nexşeyên pirî gul û gulzar bi rengê sor xemlandî ne. Berkên kurdî bi hîç şêweyekî mîhrab têde nîne ne mîna yên tirkî ne. Hin caran di berkên kurdî de hewzek bi sê goşeyî ku hîmayê zeviyekê didin dema balinde û ajal li derûdorê kom dibin, yan jî remzê malekê didin. Erd di bereyê Sine de sipî ye, rengên wê li nexş, balinde û ajalên tarî û bi rewinewq in. Gulestêr maforên kurdî dapoşîne, ev jî sembola xweragirtinê dide xuyan. Gul û stêr diyar e û encam dayîna hunera ristinê ti peyrewên akademîk têde nînin, bi tenê guncan û xweza rengîn in. Tawis di herêma Sine û Loristan de gelek bi kar tên. bi rawestaneke qît bi şêweyê endezeya sade nexşîne. Li bin pêyan kar û berx û kotir û koçik hene. Di hin herêmên din yên Kurdistanê de sêbera padşahiyê heye. Gelek berûtayan têde dixuyên. Dibe ku bi asanî mirov nikaribe ji mirovan cude bike, bi awayê tirsa heram û helal bi temamî şêweyên wê tecrîd kirine, di têkşikandine ku şêweyê kopîzim û fotorîzm lê diyar e. Ger hunera nû weke mînak Picasso di salên sîhan de sercemê şêweyan ser û nû têkşikandîbin û ji destpêkê bi vî şêweyî kurdan guzarişt û darişţin kiriye. şêweyên berkên kurdî şêweyên tabloyên kopîzim dibê sêberin. Karên maforanmîna hest, soz û helçûnan e, kartêkirinên civakî, olî û sozên nav civakê têde reng didin. hin caran mîna hunera şêwekarî dîroka rojevê tomar dike û nîşan dide. Reng di maforên kurdî de geş û ruhn in, rengê sor ji hemûyan bêhtir bi kar hatiye, tenê di hin herêmên Sine de nebe ku rengê spî li ser zal e. Ew jî vedigere ji bo gulên sorên biharê. Bi pêçewaneya vê yekê berkên erebî û tirkî di vîgor û rengên germ de mîna berkên kurdî dewlemend nînin. Neteweyên Samî di gel neteweyên Arî bi hest, nêrîn û naverokên derûnî tên nasîn. Regezên Samî, Matî û Xamoşî di rengên wan de, di maforan de dîyar dibin. Bi pêçewaneya berk û maforên rengê geş û contrasteka sor û pir gulên spî û şîn, ji gulên sor û nêrgiz ku sinorê hêlan bi şêweyekî ruhn û eşkere çêdikin. Li vir careke din vedigere ser wateya nexşan ku di

herêmekê de û ji kesekî û li demekî ji bo yê din cudehî heye, pêkhatî û nexşên berê ola xiristiyan bûn. Di pirtûka *Glim Alstrhal* û *Joze lojik* dibêje heft hezar sal berê mafor li Kurdistanê dirust dikirin. Di navbera maforên netewan de kartêkirin û nêzîkbûn heye, çınkî li destpêka mirovatiyê ku ber bi pêş diçe ji hevûdin nêzîk in. Ji ber wê yekê jî gelek ji şaristaniyan di warê folklorî de nêzîkê hev in. Mînak; şêweyê çargoşe û xaçî di berkên kurdî de û netewên mîna kêşwerê Efrîkiyan nêzîk in. Ji ber wê yekê mafor li gelek deverên din yên cîhanê hatine dirustkirin. Lê di yek babetî û zexrefe, nexş û qerebalixên rojane de hejar in. Ev pîşeya destê hunereke netewî ye û li ser karên hunara nû de Çi ji aliyê teknîk û çi jî ji aliyê form û reng bikaranînê ve bandora wî heye. Ev bandor jî di tabloyên *Vermer* de eşkere ne ta şerê cîhaniyê yekem ji sedema bizavên leşkerî li Efganistan, Qefqasiya, Tirkiya, Mexrîb û Cezaîrê, ku parçeyên berkên wan ji bo malên xwe dişandin Ewropa û dikine diyarî. Ev bizava ji bo sedema nasandina berk û mafurên rojhelate. Vê yekê bandora xwe li ser Vermer hîştiye, paşê bo *Matis* û *klmt* û *Picasso*. Lê hunermendên mîna *Vangugh* û *Gaugan* berkên rojhelat mîna *Matis* nenasî ne, ji ber ku ew ketibûn bin bandora ristina Japon û Çînê. Vê bandorê jî bi eşkereyî mirov di baugrandê modelên wan de dibîne. Mîna; *Tulos Lotrik* ku gelek bi nexşên li ser hêsîlka Japonî sersam bûye û bandora xwe li ser hîştiye. Niha berkên rojhelatî di piraniya bazarên mezin ên malên dewlemendên Ewropî de tên dîtin û bazarî pê dikin. Herweha çendîn dezgeh û kanalên ezmanî programên taybet li ser maforên rojhelatî çêdikin.

## Herêm û maforên kurdî

Li gelek herêmên Kurdistanê ev şêweyê hunera çandinê û xemlandina malan bi nexşên kurdî belav in û gelê kurd bi vê yekê gelek dewlemend e, ji ber ku ev jî vedigere pêwîstiya jiyanê û peywendiyên kurdan yên bi siruştî û jiyana gundan û koçeratê. Mirov dikare herêmên navdar bi vî şêweyî binav bike:Herêmên kurdan li rojhelatê Kurdistanê: (Îran) berkên bêçarî kurd-sênî Kurdistan-Qoba-Şêrwane-wramên-Kirman-Hersîn-Xorasan-Evşmaforên,Xorasanî evin:Şahson miqan-Şahson qezwîn-Şahson

sawe-Şahson pênc.Berkên kurdî li bakurê Kurdistanê: (Enedol-Turkiya)Fethiye turusî-Afiyun (xişxaş)-Edene-Reyhan-Qonya-Aroglu-kiça,muhsin-abrul-nîfede-Qeyseriye-denc-Heleb-Turus.Herêmên,başurê Kurdistanê: (Irak)

Herkî-dizeyî-Yezîdî-Soriçî-Koçer-Herêma badînan-

Berkên soriçî û herkiyan gelek nêzikê hevin. Herweha berkên biradost-Paleyî-Behirkê ûwd... [2]

## Dîroka Wêne Û Nexşên Sindoqa Boraqê (Sindoqa Bûkê) Li Herêma Kerkukê

Dema em behsa huner dikin di nava her netewekî de şaristanî bi hemû beşên xwe ji bo xurtkirina kultur û hunera van neteweyan dibe dewlemendiyek. Kurdistan bi dirêjiya dîrokê xwedî şaristanyeteke gelek dewlemend e ku bingehê jiyanê û pêşdeçunê tim li vê herêmê serhildeye. Lewma gelê kurd di hemû beşên jiyanê de hin şêweyên hunerî bi jiyana xwe ve girtine. Heger ji bo jiyana rojane jî bin, dîsa ciwaniyek û rêxistinek têde bi kar hatiye. Heke em hemû beşên vê jiyanê şrove bikin, pêwîste ku pirtûkek taybet li ser bê nivîsandin, ji ber wê jî hin mînakên ku nêzîkî hunera şêwekarî û wênekirinê ne. Em ê di rupelê pêşîn de pêşçav bikîn. Me hin mînakên maforên kurdî li hin herêmên Kurdistanê berçav kirin. Niha jî em ê behsa nexşkirina sindoqa bûkê bikin ku li herêma kerkukê bi navê sindoqa Buraqê tê naskirin.

Weke me diyarkirî ku netewa kurd mîna hemû netewan di berdewamiya jiyanê de hewl daye ku jiyana xwe ya civakî pêşve bibe. Di hemû deman de bizavkirî ye ku ji bo guharîna civaka têde dijîn de rulea xwe bibîne, ev yeke ji rêkxistina malê destpêdike û nexşandin û rêkûpêki ya kelûpelên nav malê û dirustkirina huner û sazkirina nexş û nîgaran ber bi pêş ve birîne.

Weke em dizanîn ji bo van peywendiyên civakî mal aliyekî giring e. Jiber vê yekê çi ji aliyê bikaranîna rengan û xemlandina malê ve hewl hatiye dayîn ku nava malê bi nexşan û ciwaniyê bi rêk û pêk bibe. Bi vî awayî jî ji bo dirustkirina gelek amrazên

---

(2) Rustem Axale -Kovarî şêwekarî jimare 3 hewlêr rûp.6 .

dirustkirina hin tiştan, ji bo parastina kelûpelên malê hewil dane. Ev kereste jî bi gelek cure û şêweyan û madên hemcure yên mîna ber, dar, hesin, qêr, şuşe û gelek tiştên din bi kar anîne. Ev jî vedigere ser pêwîstiya wê demê û zêdebûna van kerestan li her herêmekê ji wan kerestên giring û ji hemûyan bêhtir bikar tê. Jiber ku darên di demên kevin de ji bo gelek mebestan bi kar dianîn li gelek herêmên Kurdistanê pir in. Herêma Kerkukê jî her tim kesk bûye, dar lê şîn dibûn, ji ber vê jî gelek erzan bûn. Ji aliyê aburî ve ji bo dirustkirina keresta bihayekî baş hebû. Dema em li herêma Kerkukê binêrîn; xwedî gelek şaristaniyan bû, weke; *Nuzî, Kuruxanî, erapxa* û *Al-îlanî* ji berî wê jî her tim giringî daye pêşdeçûna şaristaniyê û vê yekê jî li vê herêmê cihekî taybet di herêma Kerkukê de girtiye. Weke me got sedema vê yekê jî dar û çandina daran bû. Ev jî vedigere pîroziya ola Zeredeşt û giringî dayina çandinê. Wisa diyar e ola Zeredeşt bandora xwe ji kevin de li ser vê herêmê hîştiye. Dartraşên vê herêmê gelek şêweyên hunerî ji dar dirustkirine û di van xalên jêrîn de mirov dikare hin navên wan karan pêşçav bike:

1- Sindoqa eşterxane; ev sindoq li vê herêmê ji dara guzê ji bo zêr û pere bi kar dianin. Ev ji cureyên sade hebûn û hin jî bi nexşê darî wênekirî bûn.
2- Ferhengsazî; ev pencere ji darê guzê dirust dikirin, bi şuşên rengîn nexş dikirin yan jî di van pencereyan de şîşên hesinî jêre hildikişiyan. Hin derî jî ji dar dirust dikirin, bi bizmarên hesinî dinexşandin, hin sade bûn, hin jî bi daran dinexşandin.
3- Nexşandina pêşiya malê û bin ban nexşên darên rengîn û sade ye, lê ev şêwe li herêma Kerkukê kêm dixuyê.
4- Dirust kirina derî û pencereyên nexşdar û sade, ev jî ji darên sade dirust dikirin.
5- Dirust kirina kursî û mêz û kelûpelên nav malê bi şêweyên hunerî dinexşandin.
6- Textên raketina havînê ku li hewşan datianîn û bi dar dinexşandin.
7- Dirust kirina cenceran ji bo gêrekirina genim û ceh, li bêderan û cudakirina genim ji kayê, paşê bi milhêbê li ba dikirin.
8- Derguş, bilûr û lîstokên zarokan.
9- Nexşandina merbêr û milhêban
10- Dirust kirina sindoqa buraqê pêşiya wê bi rengên cuda û bi

wêneyên duldula hespê hezretî Elî, yan jî hespê buraqa pêxemberî dinexşandin û ev ji bo tiştên bukê û yên taybet dihate bikaranîn.

11- Qabqabên nexşdar û sade keç û jin li malan dikirin pêyên xwe ku herêma Kerkukê bi vê yekê navdar bû
û ta niha jî berdewam e. Herweha li gelek herêmên din yên Kurdistanê bi kar tînin.

12- Parzîn, çante, dezbilonk, serhefsar, goreyên hiriyê û nexşên dîwaran.

## Sindoqa Buraqê (Sindoqa Bukê)

Ev sindoq ji sindoqeke lakêşe pêktê. Dirêjiya wê di navbera 1,06-1,12 m. yan de ye. berê wê di navbera 52-58cm yan de ye. Rûyê wê bi sê beşan dabeşkiriye ku her yek ji sê parçeyên lakêşe pêktê. Lakêşeya naverastê ji yên din mezintir e. Lakêşeyên herdu aliyan 38cm dirêj e û 29cm pan e, darê dirêjiyê 1,06 cm dirêj e û 42cm pan e, aliyê pan 52cm dirêje û 43cm pane. Çar pêyên vê sindoqê hene û her lingekî 19 cm dirêje û 6cm biber e. Di vê sindoqê de tiştê herî balkêş, bikaranîna rengan e. Bi şêweyekî gelek berfireh û bi gelek cureyên şuşeyan xemlandî ye. Ger em li dîroka vî şêweyê hunerî binêrîn; li demekî ji bo yê din guhertin têde çêbûne û gelek taybetmendiyên xwe wenda kiriye. Ev jî vedigere ji bo kartêkirinên wê dema ku têde dijiyan. Weke bikaranîna şuşe û paşê jî bikarnehatiye û gelek keresteyên din bikaranîna kilîlê di naverasta sindoqê de heye ku berê bi kar nedianîn. Li cihê nexsên naverastê qudîk bi kar hatiye û nexşên rengîn kêm kirine. Piraniya van sindoqan di destpêka sedsala bîstan de bikaranîne. Bitaybetî li malên dewlemendan bikarhatine.

## Bikaranîna Keresteyên Sindoqa Bukê

Di çêkirina vê sindoqê de keresteyê sereke dar e. Bi şêweyekî teng û sivik bikarhatiye. Keresteyê duyem şuşe ye, ji parçeyên

lakêşe di çarçoveya sindoqê de bikarhatiye. Piraniya van şuşeyan rengîn in û wêne li ser resimkirî ne. Bikaranîna bizmaran bi cureyên biçûk û zirav pêkhatiye daku digel darên biçûk û tenik biguncin. Herweha kerestê giring di bikaranîna vê sindoqê de reng e, gelek cureyên rengan têde bikarhatiye. Rengên sor, şîn, kesk, reş, sipî, altunî, zîvî, pembeyî, erxewanî, zer û sorê henarî, herweha cure rengê fisfor jî bikarhatiye. Ji ber wê yekê bi roj û şevê dibiriqe. Digel biriqîna şuşeyê ciwaniyekê dide sindoqê. Herweha hesin û mis jî kêm bikarhatiye.

## Babetên Sindoqa Boraqê

Babetên ku li ser vê sindoqê resim dikirin gelek cur in. Ji aliyê naverokê de her yek ji van xwediyê nexşekî taybet e. Ew jî girêdeyiyê rewşa civak, olî û aburiyê ye. Jiber wê yekê di nava malê de ye, babetên siyasî bi xwe ve negirtîne. Li bin bandora jiyana civakî ya vê herêmê de bi kar anîne. Jiber vê yekê jî pêwîst bû girêdayiyê jiyan û rewşa wê civakê bana, daku herkes ji vê yekê hez bike û bi asanî fêm bike û herweha girêdeyî rewşên olî be.(3) ger em li babetên vê sindoqê binêrîn ti babetên dûrê hizrên olî li vê herêmê nehatine resimkirin. Rewşeke olî û civakî têde hatiye resim kirin û nexşandin. Van resman jî ruyekê karîkaturî bi xwe ve girtiye daku dîrêk neyêne resimkirin. Herweha bi şêweyê remz resimkirine daku nebe cihê rexneyên civakê û kartêkirinê û li ser rewşa aboriya xwediyên vê sindoqê tesîr neke.

## Babetê Wêneyê Boraqê:

Piraniya wêneyên vê sindoqê ji giyandaran pêkhatiye. Mînak; *tawis, boraq û hacîleqleq.* Ger em li van wêneyan binêrin dê bibînîn ku ruyekî eşkere ji hêla babetî ve heye. Ti guhertin têde nekirine û mîna şêweyê siruştî resim kirine. Jiberku bandora olî li

(3) Suleyman Nemir- Kovarî Hezarmêrd jimare 18. 2001 rûp.105

ser vê yekê nebû û wêneyên giyandaran qedexe nebûn. Lê bandora olê li ser wênekirina mirovan hebû. Jiberku bi nêrîneke heram lê dinêrîn. Ev yek jî bû sedema wênekirin û nexşandina vê sindoqê, bi wêneyên giyandar û giyayan û di şêweyên xwe yên siruştî de li gor hezên civakê resim dikirin.

## Babetên Wêneyê Giyayî

Vê yekê di nexşandina vê sindoqê de ruberekî fireh, di hemû parçeyan de dihate resimkirin. Ji wêneyên belgên dar Pêkdihatin; mêwe, belgên hinar û gula hinarê, gulebax û gulberoj û gula qerenfilê ûwd...

Tiştê balkêş di van wêneyan de bi şêweyê siruştî resim nekirine. Ew jî bi têkelkirina belgeyên mêwe digel belgên hinara, yan belgeyên hinaran digel tirî, yan gulebax digel guleka din. Ev jî di nexşandina sindoqê de ciwankariyeke.

## Babetên Olî:

Ev ji nexşên ayetên Qurana pîroz û zexrefa îslamî pêktên, wêneyên minare û mizgeftan bi rengê kesk, sipî û gelek rengên din têkeldikirin û têkelkirina ayetan digel wêneyên giya, mizgeft û minaran. Herweha wênekirina wêneyê hesp û şorê hezretî Alî, bitaybet ev yek li herêma *Daqoq* bi kar dihat, jiberku piranî mezhebê şiî bûn.(4)

## Teknîka nîgarkirinê

Ger em hûr li wêne û nexşên ser van sindoqan binêrîn, emê bibînîn ku di vê demê de di nava civaka kurd de hunerekî mezin bi kar hatiye. Bikaranîna nexşan li ser şuşe, di ruyê ji nav de, di

(4) Suleyman Nemir- Kovarî Hezarmêrd jimare 18. 2001 rûp.106

sedema înandin û birinê de nayê sirîn û weke xwe bimîne. Şiyanên din reng e û bi şêweyekî hunerî dabeşkirî ye. Li ser ruyê sindoqê û bi yeksanî mîna bikaranîna rengan di tabloyekî hunerî de wek; rengê sor, şîn, kesk, zer, pembûyî, erxewanî, henarî, reş, sipî û xweliyê. Ev jî dibe sedema wê yekê ku ruyekî ciwan bide sindoqê. Herweha bikaranîna şûşeyên rengîn li ser piraniya parçeyên sindoqê ji bo biriqîn û balkişandinê. Di herêma Kerkukê de taybetmendiya vê sindoqê heye ku ji herêmên din yên Kurdistanê cudeye. Ji ber ku di vê herêmê de keresteyên bikaranînê pir in û bandora babetên olî di vê herêmê de heye. Herweha xwediyê şaristaniya kevn e. Rengên vekirî û rewneqder bi kar anîne û sindoq li ser şêweyê lakêşe hatiye dirust kirin. Ew wêneyên li ser hatine resimkirin xwediyê taybetmendiyeke wê herêmê ne ku girêdeyê şaristaniya wê herêmê ne. Mîna şaristaniya *Hurî, Mîtanî* û herêma *Nuzî, Kuruxanî, Erabxan* û *Al-îlanî*Van hemûyan paşmayiyekî dîrokî li vê herêmê hîştiye û bandora xwe li ser jiyana civakî ya vê herêmê kiriye. Lewma di vî beşê hunerî de dibe xwediyê dewlemendî û taybetmendiyê.(5)

---

(5) Suleyman Nemir- Kovarî Hezarmêrd jimare 18. 2001 rûp.105.

# Huner Li ser Dema Dewleta Dustekî (Merwanî),

Ji bo gelê kurd, çaxê dehê zayînê bi çaxê serhildenê tê naskirin. Vî miletî ji bo serxwebuna xwe xebateke mezin kiriye. Şiyan ku di vê demê de gelek hikumetên kurdî yên mîna (hikumeta Hizbanî, Şededî, Berzîkanî û Dustekî yan Merwanî) ava bikin. Di dawiyê de mîrê kurdan Ebu Şecai Bad Dustekî, sala 982 z. dewleta Dustekî damezirand û ta sala 1086 z. berdewam kir. Hemû aliyê hikumetê têde hebûn, ji hemuyan girîngtir jî rêxistina rêvebirî û siyasî bû, şaristanya wê û peywendiyên wê yên jiderve bihêz bûn. Sînorên wê ji rubarê Ferat destpêdike ta başurê Neînewa û bakurê Tikrît û bakurê rojhelatê wanê ta Ur nêzîkî sinorê Tirkiye û Suriyê. Herweha Muş û Zaxo jî dikevin nava sînorê wê. Sinorên wê ta Nêrwe li rojhelatê Amêdiyê digrin.[6]

## Pêşdebirina nivîsîna Kofî ya Zexrefekirî Di Dewleta Dustekî de

Ger em qala dîroka huner li ser dema dewleta Merwanî bikîn, wê demê gelek rastiyên hunerî û pêşdaçun di vê qadê de dixuyên, herçendê bandora îslamê û huner û nivîsên erebî û îslamî pêve diyarbin jî, lê dîsa hin sînor derbaskirine û taybetmendiyek bixweve girtiye.Gelek ji zanayên şunewaran di wê bawerêdane ku bajarê Dyarbekir weke xizînekê tê naskirin. Ku pêşdeçuneke mezin di nivîsên kufî de diyarin. Li ser şunewarên îmare, bitaybetî jî li ser şurh û mizgefta wê ya mezin (Ulucamî) gelek girîngî daye vê nivîsê. Ji bo zanîn û şîrovekirina taybetmendiyên wê yên hunerî ligor qonax û dîrokên cuda, digel hevberkirina nivîsîna kufî li hin

(6) Abdulreqîb Yusif.rûp- Hezaret al dewle al dustekiye fî Kurdistan al wista..5.cild 2.1975.Baxde

herêmên din di cîhana îslamî de, sedemê van zanyariya dikeve sedsala yanzdehan ji têgîhîştina nivêsên zexrefî bû. Nivîsên Amedê vedigerin dema Merwanî. Dustekî ji pêşkeftîtirîn nivîsên kufî ne li cîhanê.(7)

Yekem kesê ku lêkolîn li ser nivîsên Amedê kiriye (Birthem) bû. Di destpêka vî sedeî seredena bajarê Amedê kir pertukek binavê (Amîda) nivîsî. Li ser şunewarên şurha wê û nivîsînên wê yên zexrefkirî di dema Dustekî yan de ji dema berê bêhtir girîngî da nivîsên dema dewleta Dustekî û Seljoqî, jiberku di rastiyê de çavlêkirna nivîsên Dustekî Merwanîne.

Sala 1920an xwendekarekî Swîsrî-Filorî-bi lêkolîneke, nivîsên kufî li Amedê pêkanî. Li Mizgefta Ezher, mizgefta hakim, li Qahîre û Qeyrewan li Tunis, şêweyê herî balkêş di hunera îslamî de Li Amedê zincîreke nivîsên zexrefekirî dît. Florî dibêje; hunera îslamî yê Erebî li Qahîre yê Fatimî negîhîştiye nivîsên zexrefkirî yên li Amedê.(8)

## Zexrefa giyaneweran

Taybetmendiyeke din di nivîsên Dustekî de heye, ew jî zexrefa giyandaraye ku di navbera zexrefa nivîsî de hin wêneyên giyandara dirustkirîne. Di navbera zexrefa riwek de wêneyên giyandarên mîna pilingan hene. Herweha resmê balindê Hudhud çêkiriye, pêyên wî mîna jimare çara erebî nivîsên pirtuka 460.h.ya li birca çargoşe, li ser şurha Amedê eşkere ne. Zexrefa giyandarî yek ji taybetmendiyên resen li dewleta Dustekî ya yekem e. Ji ber ku berî dewleta Dustekî nivîsîna giyandarî bikar nehatiye. Ev şêweyê nivîsînê bo Selcoqiyên ku li ser hind şunewarên Amedê heye di dema melik şah de hatiye veguhestin. Herweha dewleta Dustekî zexrefa nivîsîna giyandarî li ser parên xwe jî resimkirî ne.
Li bakurê Efrîqa-Endelos, Îspanya, (Marsiye) lêkolînerekî nivîsên

---

(7) Abdulreqib Yusif- Hezaret al dewle al dustekiye fî kurdistan el wista.rûp.6.1975.Baxde

(8) Abdulreqib YusivHezaret al dewlw al dustekiye fî kurdistan el wista.rûp.411.1975.Baxde

kufiye û gelek lêkolîn kirine. Di hunera zexrefî de gelek giringiyê dide nivîsên Amedê û dibêje: pileya gîhîştinê ya hunera nivîsîna kufî weke bingehekî zexrefî di cîhana îslamê de hunera Amed e.[9] herweha Dr.Zekî Mohemed Hesen yek ji şarezayên hunera nivîsîna Amed e, dibêje; bikaranîna zexrefa nivîsên li Amedê ji hemû cîhana îslamî ya rojhelat û rojava bi hêztire.[10]

Herweha Dîman dibêje; pêşdeçuna nivîsîna kufî di hunera zexrefî de li dewleta Dustekî li dema Ebasiyan nebû û dibêje ew nivîsên kufî yên Ebasiyan li ser şurha Amedê hatine kirin, ji zexrefê vala bûn. Lê ew pêşdaçun li ser dema dewleta Dustekî li ser destê baştirîn hunermendên kurd hatine dirustkirin.[11]

## Huneran Mîmarî

Gelek şunewarên dewleta Dustekî yên wek avahî, şurh, kelat, pir mizgeft, minare, xan, qobe û mezheriyên madenî û der belavin. Beşek jî hêşta lêkolîn li ser nehatiyekirin û li herêmên bin desthilatderiya Dustekiyan, bitaybetî wêneyên paytexta Dustekiya bajarê (Farqîn) ê belavin. Hin wêneyên rêvebiriya şunewarên Tirkiya û wêneyên şunewarên bajarê Amed jî bi vî awayiye. Mirov dikare li Kurdistanê li ser hunera mîmarî û zexrefa dewleta Dustekî raweste. Herçende bitenê ji aliyê wan kesan ve hin şirove pêkhatine jî, yên şiyaîn xwe bigîhînin rêvebiriya şunewarên Tirkiye û Kurdistana bakur û taybetmendî û girîngiya hunera vê demê biden pêşçavên me.

(Birthem) pertuka xwe li ser Amedê nivîsiye, yek ji wan kesên lêkolîn û pêzanîn nivêsandî ye. Herweha Mehmud Yasin hin tiştên mîna; gelek avahiyên dema dewleta merwanî ji nexş û zexrefê li ser dergehên bajaran ji wî wergirtine. Ji bo avahiyan kevan bikaranîne û ji van kevanan re digotin kevanên şkestî. Di birca bajarê Farqînê

---

(9) Abdulreqib Yusif-Hezaret al dewle al dustekiye fî kurdistan el wista.rûp.414.1975.Baxde

(10) Abdulreqib Yusif-Hezaret al dewle al dustekiye fî kurdistan el wista.rûp.414.1975.Baxde

(11) Abdulreqib Yusif-Hezaret al dewle al dustekiye fî kurdistan el wista.rûp.415.1975.Baxde

de kevanên şkestî yek li duv yadin di deriyê pêşîn li bajarî bilinde, yek jî li ser kevaneke dine. Dewleta Dustekî nexş û resim di avahiyên xwede bikar anîne û piranî ji çar qata pêkdihatin û Di nexş, zexrefe û wêneyên giyandara Nesruldewle baştirîn ciwanî û karê hunerî li ser qesrê bikaraniye. Ji diwar û ban de zêr bikaraniye û ev şêweyek yekane ye. Ji nexşên endazeyî, giyandar, mirov û riwekan pêk tên. Ji dîmenên van şunewaran (dîmen û jin) li ser avahî dirustkiriye. Fariqî li ser vî avahiyê dibêje; li ser

dergehê bajarê Farqînê û li ser du bircên biçuk ev yek aşkereye.Wêne dîmen û jin digel du bircan ji aliyê Mîr Nizameddîn ve di binçavdêriya qazî (Ebîelhesen Ahmed bin elbexel) de hatiye çêkirin. Ta nîvê sedsala sêzdehan z. şunewarên wê mabûn.(Yaqot Elhemewî) dema seredana Farqînê ya sala 1225 z dibêje: bircek hebû ku jê re digotin (Birca jinê) di dema rojhelarinê de wêneyek mezin yê jinekê ku ronahiya wê li hindavî çiyan şewq dide hebû, hin ji hesinê ta niha jî heye, ji ber ku ji bo dirustkirina dîmen û jin hesin jî bikaranîbûn. Armanca avakirina vî avaheyê ya li ser şurhê ew bû ku ji bo razan û runiştina mîrê Dustekiyan bi

tevî hind kesên din bû.



**mînakên nexşên li ser Kela Amedê**

Mizgefta Farqînê sala 1025 z. ji aliyê Nesrul Dewle ve hatiye nûkirin. Ji ciwaniyeke hunerî pêktê, ji stun û nexşên ciwan demjimêrek bi navê (Binkam) tê de heye. (Nasir Xesro) ji taybetmendiyên vê mizgeftê dibêje: niha ji vê mizgeftê re dibêjin mizgefta Selaheddîn Eleyubî. Mizgefta Eceman ji hin şunewarên hunera avahiyan pêktê, Selaheddîn nedîtiye, lê ev nav lêkiriye. Bitenê hin beşên wê di sedsala sêzdahan de ji aliyê Eyubiyan ve hatiye nûkirin. Zanayê Amedî (Basri Konyar) dibêje; berî dema Eyubiyan vî zanayê ev mizgeft biçavên xwe dîtiye û dibêje: ji dema Eyubiyan kevintire. Di vê mizgeftê de demjimêreke rojê ya kevin hebû. Ev jî ji bo mizgefta Nesrul Dewle gruveke. Ew demjimêra ku ji aliyê Nesrul Dewle ve hatiye dirustkirin û navê wê li ser nivêsiye, Fariqî bi navê (Benkam) binav dike (Basri Konya) li ser vê demjimêrê dibêje; li serê mizgeftê avahiyek hebû demjimêra rojê bû, ev avahî binav û deng bû, ji 12 pencereyan pêk dihat, ji bo dema demjimêra diyarkirî destnîşan kiribîn. Di her demjimêrekî de tîrojkên rojê di pencereyekê re li demjimêrê dide. Du deriyên vekirî, berbi mizgeftê ve ji aliyê bakur avahiyê demjimêra rojê hebû. Bi pencereyan xemlandîbû û mîna qenteran her donzdeh pencere jî berbi aliyê mizgeftê ve vekirî bûn.(12) Lê sala 1907an de ji aliyê Ermenan ji holê hate rakirin. Şunewarên wê ta sedsala bîstan jî mabûn. Li vir bê şik dewleta Dustekî paşmayiyekî dîrokî, hunerî li paş xwe hîştiye. Ji şunewarên hunerî yên medenî û derî yên mîna dergehan û mezheriyan (Fariqî) destnîşan dike. Gelek caran dergehek ji madeyê nihasî ji aliyê Nesrul Dewle ve hatiye dirustkirin, rengê wî zer bû, jê re digotin (dergehê Zer). Bi taybetî ji bo dergehê qesran li bajar dirust kirî bû. Ev jî li aliyê rojavayê bajarê Batmanê tê dîtin û navê wî li ser nivêsaye. Giringiya dirustkirina vî dergehî (Fariqî) li dergehê mizgefta Farqînê dîtiye. Piştî dema dewleta Dustekî veguhastiye. Ev jî nîşana wê yekê ye ku Kurdistan ji aliyê pîşesaziyê ve ji dirustkirina derên maidenî mîna dergehê dêra Farqînê yê hesinê kun kun, xwediyê hunerekî xurt bû. Gerokê faris (Nasir Xesro) pê ecêb mabû û dibêje; min tiştekî mîna vî dergehî ciwan û xwedî huner nediye. Deriyeke din yê hesinî li aliyê rojavayê bajarê Farqînê de têxuyan.

---

(12) Abdulreqib Yusif- Hezaret el dewle al dustekiye fî kurdistan el wista.rûp.422.1975 Baxde

## Sedlî

Dewleta Dustekî di avakirinê de terzê Sedlî bi kar aniye. Wateya wê, avahî ji sê qoban yek di hundirê yekê de di yek avahiyê de pêk tê. Ev terzê mîmarî li cem sasaniyan hebû, ji ber ku pêwîstiya qesrên wan bi vî şêweyî hebû. Li (Hire) qesrên mîna Qesra Sedîr-yek ji qesrên navdare. Fariqî li ser qesrên dustekî dibêje; Nesrul Dewle yekem car li Sedli veşartiye û li qesrên paşayan ji bo qubê hatiye veguhastin.

## Hunera Ezic

Yeke ji hunerên mîmarî derbirînê ji avahî dike, banê wî kevaneyî ye. Di dema dewleta Dustekî de şêweyê van avahiyan li kurdistanê navdare.Fariqî dibêje; Wezîz Ebalfezil El-enbarî wezîrê Mîr Nizameddin li Ezic di rojavayê mizgeftê de li çiyayê Farqînê veşartiye. Li rojhelata navîn Elame, Hunera Ezic li kurdistanê berî dema dewleta Dustekî hebû û yek ji taybetmendiyên îmarê kevin bû. Dr.Mustefa Cewad dibêje; yek ji dahênanên Sumer e.(13)

## Hunera Qubab

Dewleta Dustekî Hunerekî din ji bo avahiyan bi kar aniye. Hunera Qubabe ji bo berzkirina îmarê mîna qesra Dustekiyan quba Emîr Ebî Ali, ya li derduora bajarê Erzin.

Quba Benî Merwan ya Nizameddîn tê de veşartî, quba Amed, quba deriyê çiya (li Cizîrê ya Emîr Behram tê de veşartiye), li nîva Amedê quba kanî zeur. Lê şêweyên qubeyan ta niha bi başî negîhîştine me. Yan bi awayê hêkê bûn yan jî kevanî bûn. Herweha nedîyare ka bingeha wan çarguşe bûn yan bazneyî bûn. Mînakên

---


(13) Abdulreqib Yusif- Hezaret al dewle al dustekiye fî kurdistan el wista rûp.425.1975 Bexde

qubeyên piştî dewleta Dustekî ne eşkerene. Weke kîjan qubeyên wê demê ne. Li Xelat û Erziromê û herêma Wanê ku digehin hunera Selcoqiyan, bi ciwantirîn qubeyên cîhana îslamî tên hijmartin. Hin ji wan yên mîna qubeya (Argîn Xatun-qoba Husta Şakir-qoba Helîme Xatun li bajarê Westan li derdora derya Wanê bi ciwanî hatine zexrefkirin. Ev şêweyê qubeyên dewleta Dustekî li Kurdistanê vedgere dîroka berî Îslamê, ji ber ku ev şêwe li Kurdistanê pir hene. Lêkolînerên mîna Cirtrud-Misbil-û Rabrakos-Tamara rais dibêjin; şêweyê qubeyan mexrute û ji Selcoqiyan û ji çadirên kurdan yên koçeratî wergirtîne. Li asya navîn û hin ji wan jî li Ermeniya û li beşekî kurdistanê hatine dîtin. Ev jî şarezayî ya gelê Kurdistana naverast-kurdistana bakur di hunera mîmarîyê de nîşan dide ku ji dirustkirina kel-pir-îmare-avahî-şurhe û mizgeft mîna kela Bitlîsê-Hewrexê-şurha Amed-mizgefta mezin-minara helawîstî bi kevir, li ser çar stunên kevir, li Dyarbekir, pira Batmanê ku hîç şêweyekî endazeyî yên mîna wê li rojhelata navîn nehatiye dirust kirin. Qubeya Xelat û xwendingeha Yaqutî û Xatunî li Erziromê, xwendingeha Zinjîrî li Mêrdînê ye. Van xwendingehan bi zexrefê nexşandi ne û gelek ji van avahiyan vedigerin çaxê naverast. Gelek mîmarên kurd yên navdar, avahiyên hunerî pêk anîne. Li derveyê Kurdistanê jî lêkolînerên şunewaran dibêjin; baştirîn karên mîmarî di nîva dawî ya sedsala yanzdehan de li Kurdistanê çêbûne. Di dema dewleta Dustekî de wezîrê dewleta Fatimî, sê hostayên mîmarî ji bajarê Ruhayê daxwaz kiriye. Her yekî ji wan li herêma Amedê ji bo nûkirina sê dêran, ji şurha bajarê Qahire li Misrê dêrek avakir, ji bo avakirina dêra Fatimî ku bi navê dêra Suryanî tê naskirin li newala Netrun li misrê hin ji xelkên Nisêbînê jî beşdar bibûn. bi zexrefekî ciwan nexşandiye, ji zexrefa çaxê Tulonî piştî sedsala nehan z.. Hacî Mincibiltê Xelatî bi çêkirina mînbera mizgefta Elaieddîn li bajarê Qonyayê rabûye, sala 1145 z. ta niha jî tê bikaranîn, navê avahiyê Kurdistanê li sere. sala 1228z. xiramşah kurê Mecîd Xelatî di gel Ahmed bin Îbrahîm

Tiflîsî dergehê bakur ji mizgefta mezin li Dîurîxê dirust kiriye. Herweha nexweşxaneya mejunexweşan di heman bajarî de bi zexrefê nexşandiye. Ji nûkirina avahiyê kevir li herêma botan, di avahiyên Mêrdîn û Tur Ebdîn ê Turê bi navûdeng in. fille gelek di vî warî de şarezabûn. Wek mînak; hoste Hena-birca Belek li kela cizîrê avakiriye ku navê wê di gelek stranên kurdî de tê gotin. Gelê Xelatê ta niha jî vî hunerî diparêzin, ji ber ku li Kurdistana bakur hunera mîmarî gelek pêşde bû. Wisa tê gotin ku paşayê Sasanî Qubadê yekem dema bajarê Amed dagîr kir, di destpêka sedsala şeşan de, hemamek dibîne û ev hemam gelek bala wî kişand û biryar girt ku di her bajarekî farisî de hememeke mîna wê bê avakirin. Hunera mîmarî li kurdistana bakur ji hemû parçeyên din yên kurdistanê pêşdetir bû.

## Zexrefa Dewleta Dustekî

Dewleta Dustekî di ciwankirina avahiyan de gelek şêweyên zexrefê bi kar dianîn. Piraniya van zexrefan li ser dîwar, şurhan, mizgeft û qesran bikardianîn. Wek mînak şurha Dyarbekir û mizgefta farqînê gelek ji van zexreva di gel nivêsînê û resmên giyandaran û giya bikardianîn. Ji hunera kurdistanê navdartir, huneran zexrefa Dustekiyan bû. Li ser gelek kel, birc û şurhan nexşên weke şerîta zexrefê û nivêsîna kofî hebûn. Gelek ji zanayên şunewaran yên mîna (Florî) û ( Fan Brthim) ê mamostayê wî ev yek di nivîsên xwe de bikaranî ne. 51 şêweyên zexrefeya nebatî yên.



**mînakên zexrefa Dostekiya ku ji xwezayê girtîne**

yên Dewleta Dustekî hebûn. "Dimand" dibêje; ev zexrefe ji hunera peykerên pêşkeftiye. Lêkolînerên şunewarên Amed eşkere kiriye ku ta çi rade pêşdaçun di hunera peykerê îslamî û hunera zexrefî bi giştî di çaxê Selcuqiyan de hebû, lê hunermendê dema Ebasiyan nivîsînên kofî li ser zemîneke vala û bê zexrefe di nivîsandin, lê nexşên şurha Amedê ku di dema Merwaniyan de pîtên kofî bi belgên giyayî nexşandîne û dîroka wan vedigere salên (426.h,437.h,457.h,460.h,476.h. Herweha Diman dibêje: Selcuqiyan zexrefa giyandarî di nivîsên kofî de li Amedê derxistine. Lê nizanibûn ku ji aliyê dewleta Dustekî ve gihîştiye

encamê. Grupên vê jî wêneyên piling, Hudhud û balinde ne. yên em di nivîsên Dustekiyan de dibînîn herweha giringî dayîna Dustekiyan ya bi zexrefe û peyker e. Ev jî di dema dewleta Dustekî de nîşanên pêşdêçuna hunera zexrefê bûne. (14)

## Peyker

Hunermendê Dustekî ne tenê giringî daye zexrefê, peykerê mirov û giyandar ên li ser kevir. Digel belavbûna avahiyên Dustekî hind resim jî di beşên şunewarên wan de diyarbûne. Hunermendên Dustekî gelek bi hurbînî û hunerî karê xwe pêk anine. Ji ber ku resim di Ola îslamê de herambû û qedexebû, lê dîsa jî hunermendê Dustekî ev yek di hunera xwe de pêk aniye. Ji ber ku îslamê giringî dida zexrefa riwekî û dîmenên siruştî. Peykerekî bi nav û deng wêneyê şêrekî li ser pira Amed ku li dema mîr Nizameddîn li ser rubarê Dîcle sala 1064z. wêneyê şêrekî berbi aliyê rastê duvê wî li ser pişta wî ye û zimanê wî li derveye. Ev şêweyê wênekirina şêr ji bo jiyanê sembola pêwîstiya avê ye. Li aliyê rastê yê şêr remzekî sê goşe herdu bingehan bi hevre girêdide. Ev remze armanca hunermend diyar dike. Şêr weke remzê hêzê û netirsiyê tê naskirin, dibe ku ev remzê hêzê be. Ev wêneyê sê goşe ji bo mîmarî bi hêztirîn şêweyê endazeye, ji ber wê jî Fîrewunan ji bo avakirina pîramîdên Misirê wêneyên sê goşe bikar ani ne. Armanca hunermend ewe ku hêza mîr Nizameddîn û hêza dewleta Dustekî bide xuyan.

"Birthem" li ser vî resmî dibêje; ev yek diruşmeyên dewleta Dusteki ye. Herweha "Konyar" di wê bawerêdeye ku wêneyê şêr mîna hebûna hin wêneyên bi vî cureyî li ser beşekî şurha Amedê nêzîkî dergehê Xerputê ye. Birthem li ser wêneyên heywana di dema Dustekiya li Farqînê dibêje; li ser şurhê wêneyên mîna stêrên deryayî hebûn û ji pênc beşan pêk tên, li ser her beşekî wêneyê balindeyek merwaniyan li paş xwe hîştiye, li ser kevirên şurhê kolayî bûn. Ev wêne weke wêneyên şêran taybetmendiya

(14) Abdulreqib yusiv.rûp- Al dewle al dustekiye cild 2 .rûp 431sal .1975.Bexde

hunermendê Merwanî diyar dike. Herweha wêneyê balindan Hudhud di navbera nivîsên Dustekiyan de li ser birca çargoşe ya Amedê di şerîteke nivîsînê de hatine dîtin, sala 460.h li ser dema Nizameddîn, Hudhud berbi aliyê çepê diçe li dawiya nivîsînê û wêneyê zexrefa giyandarî di nivîsînê de diyare. Herwekî di babetê zexrefê de destnîşan kirî, ji hurkarî û afrandinên hunermendî bû.

Ji bo belavkirina wêneyê Hudhud hin taybetmendiyên hunerî hebûn. Ji aliyê civakê ve, ji nêrînên duratiya duyem yan buşahiya ezmanî, yan ji aliyê wî û li hindavî wî, ji aliyê nêrînê ve bi şêweyekî guncayî di gel siruştê berbi Ebstrakê neçuye. Di beşên laşê Hudhud de mîna şêweyekî realîteyî wênekirî ye. Hunermend wêneyê vî balindeyî di nivîsên xwe de li hember navê Nezamedîn çêkiriye,ev jî siyaseta wî û hikimdariya wî ji bo çareserkirina arêşeyên civakî, herwekî bi goştê Hudhud gelek nexwşiyên derunî çareser dibin. Haletê bêdengiyê li ser balindên di wênekirinê de di şêweyekî endeza ezmanî de heye. Birufil dibêje; remzê bêdengiyê û binecîhî ye, li kurdistana naverast li ser şurha Amedê di dema mîrîtiyê de wêneyekî din yê balindeyekê bi peyker di nivêsên Dustekiyan de nîşan dide .

## Wêneyên Abstrak

Ji wêneyên peykerên Dustekiyan wêneyê Piling li ser şêweyê Abstrak di navbera zexrefa ruyekî de hebûye ya ku niha li ser şurha Amedê li dema mîr Nesrûl dewle, bi qebarekî biçuk ku lêkolîner nikarin li ser zexrefê bihêjmêrin. Bi dawî hatina piling û lingê wî yê rastê bi tayekî giyayî û duvê wî têkelkirina laşê wî û giya, hunermend bi şêweyekî ciwan wêne kiriye. Ev jî ji zexrefa giyandarî di nivêsînê de regezekî ye. Hunermend, piling weke remzê hêzê û hêza dewleta Dustekî bikaraniye. Wêne li rêza destpêkê dirust kiriye, ji nivîsînê wêneyê Abstrakiy yê giyandarekî serê wî mîna Sinuriye, du şaper pêvene yek ji wan mîna tîpa (M) ji peyva rêza yekem ji nivîsînê 426.h. ji wêneyên abstrak wêneyê du mirovan jin û mêrek li ser kevirekî mezin û dirêj li ser şurha Amedê bi şêweyê stunî, li ser da şeş rêzên daran hene, mîna wê nivêsîna balinde di navberê da wêne kirî bi nivîsînê dirust kirîne. Li

ser vî kevirî wêneyê dêrekî ciwan çêkiriye, ev wêne jî li herdu aliyên derî wênekirî ne li ser serê wan her yekî ji van tiştek di dest daye. Ev jî di berpisyariya kêmasiyên civakî de remzê beşdarbûna jin û mêrane. Ev şêwe girêdayiyê hunera Romanî û Bêzenti ye, ne girêdayiyê hunera Islamiye, jiber ku di wê demê de li ser şurha Amedê hebû, yan jî li kurdistanê di cihekî din de. Hunera peykerî li Kurdistana naverast di bin bandora hunera hilnistî û Bîzentî yê mesîhî bû. Ji ber peywendiyên cografî û dîrokî di navbera van herêman de ev bandor nêzîkî piştî dewleta dustekî du sedeyan ma. Ligor pêzanînên zanayên şunewar û dîrokzanên hunera îslamî mîna Dr.Hesen Paşa bandora hunera Hilnstî û Bîzentî li vê herêmê hebû. ji wan Mehran bin Mensor Merwan û ibnî Rezaz El Cizîrî û Tebîb el Mardînî û Lawlan ji sedê 6-12.z. Hesen paşa dibêje: taybetmendiyên hunera Hilnstî li ser hunermendên kurd li herêma Amedê bi alîkariya hunera Bîzentî yê mesîhî çêbû. Ev jî di wan du wêneyên mirovan de diyare. Ji ber cihê cografî wêneyê peyker li Kurdistana naverast di dema dustekiyan de ta sedsala sêzdeyê zayînê taybetmendiyên hunera islamî û hilnistî û Bîzentî bi hevre bi şêweyekî serbixwe jê derdikeve. Ji aliyê hunerî ve di sedsalên navîn de. Ji aliyê hunerî ve di sedsalên navîn de mirov dikare hunera vê herêmê bi navê xwendingeha Amedê binav bike. Mîna xandingehên din mîna xandingeha Bexdeyê. mirov dikare şirova wêneyên hunermendên Amedê mîna wêneyên Şemsedîn kurê Ziyaeddîn Ruşkî yê Bitlîsî.

# Bingehê Hunera Şêwekarî

Hunera şêwekarî, peywendiyeke bi hêz bi hebûna mirov hebûye. Ji destpêka jiyanê bûye şahidê bûyerên dîrokî û serkaniya çavik û zanîna rûpelên dîrokê. Mirov dirustkerê wêneyê ye. Ji wêneyên li ser dîwarên şkeftan di dema berdîn de ev hemû ji bo me jêderekî giring e ku heta roja îro berdewam bûye. Di ser wê yekê re pêkhatinên hunerî ji demekî bo demeke din cuda bûn. Lê ev hemû şahidên wê yekê ne ku mirov pêwîstiyên xwe ji bo veguhestin û ezmûna xwe û beşek ji wî hunerî di berhingarî û hevrikiyek berdewam de bû ya bêy dawî, ji bo parastina mirov û vejandina qehremanî û palewaniyê di civak û xwedawendên wan de. Komkirina di navbera remzên wêneyî û avakirina mîmarî yên ku mirovan dirust kirin, ji bo roja îro weke xizîneyekê ye. Ronîkirin û eşkerekirina veşartî û nihêniyên jiyanê, gelek ji van rastiyên hunerî şahidê wê demê ne. Herweha ji bo zanîn û xweşiyê, ji bo zanîn û dîroka wê demê jêderek e. Li vir mirov dikare bêje huner ne tenê di çarçoveya wezîfederiya xwedîka jiyanê de bitenê ye. Her çiqas ji demên kevin bin jî,  lê roja îro em têde dijîn ew ji bo ciwanî û hestên ciwaniyê û hezkirina rêyeke hunerî tê hezkirin. Ger em bipirsîn dîyarda hunerî di jiyanê de çawa ye? Û mirov çawa gihîşte wê baweriyê ku hest bi xweşiya hunerê ya peywendîder bike, bi jiyana bizehmet a siruştî? Û çawa her li roja mirov tenê wek giyanewerekî biyolojîk hebûna xwe pêktîne? Ku beşeke ji siruştî, jiyan û têkiliya di gel siruştî û têgîhîştin, zalbûn li ser siruştî û jê cudabûn û pêkhatina komeleyan.

Çendîn nêrînên mirov yên dîrokî û fikrî ji bo jiyanê û têgîhiştina nihêniyên jiyanê û siruştî ji guhartinên civakî bi ser mirov de tên û berfireh dibûn. Piştî pêkhatina wêneyekê hunerî yê giştî ev hemû palderên guhartin û pêşdebirinê bûn û bi destanîna karê zanistî, ji bo guhertina berdewam ji peywendiyên hevrik û danûstandinên di navbera hişiyarî û realîteyê de.[15] Dema em bi taybetî qala huner bi

(15) suleyman şaker- Kovara raman jimare 29.rûp.101.

awayekî giştî û hunera şêwekarî bi awayekî taybetî dikin, ev jî li her qonaxek û di nava her civakekê de di rewşeke taybet de dijî. Dema em berawirdiyekê di navbera civakên rojhelat û rojava de bikin, herçendê ev şêweyên huner û şaristanî li van herêman kevintirînbin jî lê ji hin sedeman me nikariye vê pêşdaçunê di hunerî de pêk bînîn û di nava civaka xwe de bidine pejrandin. Ger em bi şêweyekî giştî û zanistî li dîroka Kurdistanê û bişêweyekî taybetî li dîroka çand û hunera kurdî binêrin; ê ji bo me eşkere bibe, ku Kurdistan xwedî çand û hunereke dewlemend e. Lê mixabin di vê hêlê de lêkolînên zanistî pêk nehatine.Ger çend mînak li ser vê yekê ketibin ber destên me, ew jî piranî ji aliyê biyaniyan ve hatine nivîsandin û gelek rastî ji dîroka hunera kurdî wendea bûne. Piranî jî di nava gelên herêmê û welatên dagirkerên Kurdistanê de hatine wendakirin. Dîroka çand û hunera kurdî, her ji şaristaniya Mezopotamiya ya kevn heta iro.

Herwiha li Kurdistanê bi hatina musilmantiyê, dinavbera salên (639-644z)ê, leşkerê ereb berev rojhelatê kurdistanê çûn li sala 730z Kurdistan biyekcarî dagîrkir.[16] Êdî ji wê rojê û vir de çendîn sedeyan berî zayînê taku roja îro gelê kurd di bin destê degirkeran de jiyaye û biyaniyan ev kultur kirine milkên xwe. Gelê kurd ji bo azadî û serxwebûnê her tim berxwedaye, lê rastê gelek şkestinan hatiye. Em dikarin li ser çend sedemên ku nehîştiye gelê Kurd bigihîje armancên xwe rawestin. Weke; nebûna keyanekî siyasî yê serbixwe, paşvemayîna civakî, ketina barê aborî, feodelîzim û meselên olî ûwd..

Dîsa gelek sedem hebûne ku li ser pêşveçuna vî şêweyê hunerî kar tê kirin, bi taybet li ser ola musilmantiyê, civaka musilmanan bi şêweyekî giştî nîgarkêşî ji hunera dûr xist. Bi belavkirina çend ayet û gotinên musilmanan.[17] Herçende Şêx Mohamed Abde dibêje(binêrîna min şerîieta mosulmanan dure ji qedexekirina rêyekê ji baştirîn rêyên zanistê, ku hîç metirsî têde nîne li ser ola musolmanan ne ji aliyê bîrûbaweran nejî ji aliyê karî û dibêje ola musolmanan wêmeyî qedexe nake ger ji bo armanca xemlandin û bedewî bê bikaranîn, ji ber wêjî dîroka musolmanan gelek wêne li

---

(16) Amed Tigrîsî û Aso Germiyani.Korte mêjoy kurd û Kurdistan,Rû 34 swêd
(17) soret el maide-ayeta 90

paş xwe hêştîne.)[18] her çende hunera musilmanan bi şêweyekî zexrefî û avakirin ji serdema pêxemberî (Muhemed) dema avakirina mizgeftan ji bo nivêjan; heta derketina dewleta Ebasî û Emewî pêşketîtirîn avahî hatin avakirin. Hêdî hêdî hunera musilmanan pêşket û hin şêweyên nû bi xwe ve girtin û bû yek ji bingehên giring yên Ereb. Miletê herî ketibû bin vê bandorê gelê kurd bû. Heke em li dîroka musilmanan binêrîn, piştî hatina qonaxên nû li serdema Dewleta Ebasî û giringî dayina nîgarê kesayetiya mirovî taybetmendiyeke hunera musilmanan bi xwe ve girt. Ev derketin û pêşveçûn vedigere sedsalên (12-13 z.) ku ew jî hin resmên avî û hêlkarîbûn di pirtûkan, stiranan de ku niha li Misrê tê parastin.[19]

Ev nîgar û berhem ser bi xwendingeha Bexdedîne û bi destê du nîgarmendên xwedî şiyan hatine dirust kirin weke (Abdula el Fezil û Yehya el Wasitî) ev herdu nîgarmendena li ser demê xwe bi navdertirîn nîgarmend li qelem didin. Şiyan şêwazekî taybet û resen di taybetmendiya hunera nîgarê musilmanan de binexşînin. Beşekî van nîgaran li ser bergên pirtûkan nexşandîne bitaybet pirtûkên dîrokî li ser şêwê *Mînator* weke pirtûka „Exwan elsefa û meqamat el herîrî ûwd..„ Wasitî şiya li jêr bandora xiristiyanên rojhelatî û îranî de şêwazekî nû yê hunera musilmanan bafrîne. [20]

Helbet di vê demê de kurd jî weke netewekî girêdeyê musilmantiyê bûn û di civakeke musilman de jiyane. Dibe ku gelek nîgarmendên kurd jî hebûn, lê berhemên wan li ser musilmanan û gelên din hatine hijmartin û dibe ku beriya Wasitî jî be, ger em li demên berî Wastî binêrîn û serhildena wî ya hunerî di nav kurdan de bitaybet li Kurdistana bakûr hunera nîgarkêşî hebû. Dîroknivîsên hunera musilmanan dibêjin; li bakûrê Musilê, bi mana Kurdistanê di sedsalên navîn de, fêrgeheke hunerî hebû, wêneyên *mîhran û ebin elrezezî* hunermendên wê devera Kurdistanê, ruxsar û bingehê hunerekê taybet têde hatibû dîtin. Di wê demê de karên hunera *helnistî û bîzentî* pê ve eşkerebûn. *Dr. Hesen Elpaşa* bi şêwazê *Amed* navkiriye. [21]

---

(18) heyam el seyd-islamonline.net2005
(19) Belqis Mohsin- Tarix elfen elislami- 1986 Bexde rûp.42.
(20) Dr.Efif Behnsi- Elfen welmuctemi ebreeltarix- Dimeşq rûp.151.
(21) Ebdulreqîb Yusif- Tabloyên Şerefxanê Bitlîsî., Çapa duyem Hewlêr rûp.13

Ji bilî van hunermendan çend nîgarmendên din jî tên ber çavên me, mîna *Mehmodê kurê Yusifê kurê Osmanê Hesenkêfî.* û *Muzeferê kurê Husênê hesenkêfî* .[22] di babetên pêşiya me de emê bi dirêjî li ser 20 tabloyên şerefnameyê rawestin, ên ku xemxûrê gelê kurd hêja *Ebdulreqîb Yusifî* bi şêweyekî lêkolînê eşkere kiriye.

Li vir armanca me ew e ku em bikaribin hinek ji vê dîroka hunerî ligor şiyan û pêzanînên xwe bidin berçav. Dibe çend lêkolîn jî hebin, lê jiber parçebûna Kurdistan û zaraveyên kurdî em nikarîbûn bigihijinê. Ger em diyardên cîhanê ji dîroka huner bidin berçavên xwe, di cîhana hunera her gelekî de dîrokek û bingehek jê re hatiye danîn. Herweha çendîn sumbolên netewe û folklor, nexş, nîgar, nivîs û jiyana civakî jê re bûne sumbolên hunerî û hunerekî resen li ser bingeha netewî hatiye danîn.

Ger li ser dîroka Kurdistan û folklor, reng û peywendiya gelê me bi jiyana civakî, karên rojane rewşa civakê, dîmenên ciwan ên siruştê Kurdistanê, weke çiya, dar û ber, av, rengên teyran û dîmenên ciwan ên karker û cotkarên Kurdistanê di hunera xwe de bikarbînîn. Ev hemû û Kurdistan, di nava dilê şaristaniya mezopotamiya de ye, ku bingehê herî kevn ê şaristaniya cîhanê ye û jiyanê li vir destpêkirîye û şaristaniya Sumer, Eked, Babil, Aşur mîdî ûwd.. li vir bûye. Niha jî gelek şunewarên kevin hene bi şêweyekî hunerî li ser gelek kevir, şkeft, sûr û kelayên Kurdistanê mane. Mîna şkefta Qizqapan, Hezarmêrd, şaneder, çinoyan, navçeya Cizîrê, Wanê, Amed, Kermanşan, şkefta Helameta, şkefta çarstuna û Malta jêrîn li bajarê Duhok .ûhd.[23]

Di dîroka her miletekî de bergirî û berevanî ji huner û çand û şaristaniya wan hatiye kirin û dîroka xwe parastiye, mîna hunera Misrê û şaristaniyeta Misrê çendîn caran kete ber gelek hêrîşên dagirkeran. Lê gelê Misrê berevanî ji vê yekê kir û şaristaniyeta xwe parast taku bandora xwe li ser hunera Girîkî, Farisî, Roma û Bîzente heta li Ewropa jî belav bû, bitaybet li Girek û Îtalya. Mirov dikare bibêje divê herêmê de peywendiyeke bazirganî hebû ev jî palderek bu ji bo têkelkirina hind aliyên hawbeş di huner û zanînê de.Kurdistan jî beşekî giringê vê dîrokê bixweve digre ger bi hind navên dinjî be, lê rastiya wê hêşta liber lêkolînên zanstîye, evjî girêday qonaxên jiyana bi hevre girêdaye.

(22) Ebdulreqîb Yusif -Tabloyên Şerfxanê Bitlîsî..
(23) Enwer Mayî -Elekrad fi Badînan çapa duyem Duhok 1999 rûp.126

Digel borîna jiyana wê demê û girêdana civaka wê demê bi hin pêwîstiyên jiyanê nexş û nîgarên kurdî jî li gelek deveran belav bibûn. Lê her wek hate eşkere kirin hin cudahî di nav bera wan de hebûn ji hêla bikaranîna şêweyê hunerî yê wê demê ji deverekê bo ya din; mînakê vê yekê jî, şêwê hunerî li çiyayê Bêstun li Kermanşan li ser dema Sasaniyan ne mîna şêwê hunerî ye, li ser Kela Hewlêrê li ser dema Eta begêyan şêwê li ser gurepana Qendîlî û Gelale Cuda ye ji şêwê hunerîyê li ser sûra Amedê.(24)

Ji bilî vê cudahiyê hin guhartin li ser van wêneyan hatine kirin ji ber nebinecihbûna kurdan û koçberiya berdewam ji deverekê bo devereka din, li vir eşkere dibe ku gelê kurd jî dixwast mîna neteweyên din di sedeyê navîn de giringiyê bide resim, nexş û nîgaran . Bitaybet ew nexş û nîgarên girêdayî jiyana kurdan ya wê demê, weke nexşên li ser dergeh û pencereyan, dîwar û aletên şer, weke şêweyê Mînatur bi kar dianîn.

Ev şêwe bêhtir li ser bergê pirtûkan û destnivîsan bi kar dianîn. Sala 1596an yekemîn komeleya Mînatura kurdî derket ku jiyana siyasî û civakî ya gelê kurd, li Kurdistanê nîşan dide. Ev yek jî gelek di pirtûka *„şerefnama" Şerefxanê Bitlîsî* ku di arşîvê *Budlyan li Beritanya hatine parastin*.Herweha sala 1600- 1700an ê *Ebdelxan* resamekî mezin bo, hêja *Ebdulreqîb yusif* dibêje „eger em karên hunerî yên *Ebdelxan* û *Şerefxanî* bi dest bixin ev dibe xizîneyekî mezin ji bo dîroka kurdan." (25) Herweha Şerefxanê Bitlîsî weke di şerefnamê de diyar e resamekî pir mezin e di beşên dahatî de bi dirêjî em ê li ser kar û xebatên wî yên hunerî hin şîroveyan bikin. Herweha di sedsala nozdan de 1800 ciwankirna gelek bergên pirtûkan û çîrokên evîndarî û efsaneyî yên kurdî û rudanên dîrokî û destnivîs di edebê kilasîk de eşkere ne. Li Arşîvên Almanya, Berîtanya, Rusya û beşekî kêm jî li cem zanayê kurd Mohemed Mokrî û li Parîs hatiye parastin.

Bi vî awayî dewlemendî û bingehên dîrokî di welatê me de ji hêla arkelojî de dibe bingehê şaristaniyeke kevin û pêwist e gelê kurd li vî samanê pir giring xwedî derkeve. Ev yeke jî sedemeke ji bo dagirkeran ku her tim bi armanca dagirkirina Kurdistanê û berdewamiya şeran li Kurdistanê bibe sedema nebinecihbûna gelê kurd û koçberiya gelê kurd daku nikarin xwedî li vî samanê pir giranbûha derkevin. Ev ji hêlekê ve û ji hêla din ve bandora xwe li

---

(24) Kovara Yekgirtin Hejmar 1-3.1987

(25) A.Reqib Yusif-Tabloyên Şerefxan çapa duyem Hewlêr

ser jiyana civakî, siyasî û aborî hîştiye. Ev hemû sedemên nebûna keyanekî siyasî yê gelê kurd e. Kurdistan bû pireke ciwan ku hemû welatên rojava û rojhilat lê kom bibin ji bo talankirin û dagirkirina Kurdistanê û bi vê yekê gelek berhemên hunerî û dîrokî têkbirine.

Grek jî xwedî şaristaniyek kevin bû lê (*Durgehê krêt*) jê re bû pirek ji bo veguhastina şaristaniya di navbera rojhilat û rojava de. Gelê kurd jî mîna hemû gelên cîhanê di van qonaxên dîrokî de jiya ye lê nekariye armancên xwe yên siyasî û hunerî pêk bîne. Piştî parçekirina Kurdistanê ji bo cara duyem û danana sînorên destkird di rêya pêşveçûna hunerî û kulturî de bêhtir astengî derketin. Ev jî di navbera

parçeyên Kurdistanê de dibe sedema nebûna peywendiyan.

Ev jî girêdeyiyê çendîn sedemên dîrokî ne. Bitaybetî hunera şêwekarî li Kurdistanê bi giştî girêdayiyê rewşa welatên dagirkerên Kurdistanê bûye. Lê hin sedem di rêya vê yekê de bûne asteng. Mirov dikare çendîn xalan pêş çav bike weke:

1. Nebûna pîleyeke berz ji hişiyariya rewşenbîriya civakê.
2. Kartêkirinên olî, bitaybetî ola îslamê li ser civaka Kurdistanê.
3. Giringî nedayîna rewşenbîrî û hişiyariya civakê ji aliyê dewletên ku Kurdistan dagîrkirin û wendakirina nasnameya kurdî.
4. Giringî nedayîna xwendingehên seretayî ji bo waneya resmî, ji bo waneya resmî weke bingehek bibe jêderê şiyan û paldana xwendevaniyê.
5. nebûna meteryalan li ber destên hunermendên kurd.
6. koçberî û nebinecihbûna gelê kurd li ser axa xwe.
7. Xala herî giring ku van xalan hemûyan bi xwe ve digire: *Li ser xaka Kurdistanê tunebûna keyanekî siyasî yê kurdî.*

Ev hemû bûne sedemên wê yekê ku huner bi awayekî giştî û şêwekarî bi awayekî taybetî di nava civaka Kurdistanê de li gor xwestekên îro cîh negire. Herweha ji ber parçebûn û dûriya di navbera hunermendên kurd de, sedemên ne nasîn û têkeliyên di navbera hunermendan de peyda kiriye. Li vir mirov dikare hin tîrojkan bixe ser hin aliyên veşartî ku heta niha haya me jê nebûye. Li gor wan çavkanî yên ketine ber destên me, me li gor herêmên kurd têde dijîn şêwekariya kurdî pêş çavkiriye. Em hêvîdar in gelê me ji vê yekê sud werbigire.

# Şerefxanê Betlîsî û nîgarmendî

Hêja Ebdulreqîb Yusif di lêkolîneka xwe ya taybet de li ser layenekê nû ya li ser Şerefxan dike ku sala 1998an di konferansa li ser Şerefxanê Bedlîsî, li Berlînê hate çêkirin ji aliyê instituta kurdî ya Berlinê ve. Me pêwîstî dit ku em beşekî giring ji vê lêkolînê di vê pirtûkê de bicîh bikin.. Ebdulreqîb dibêje: *"Berî wê yekê ku ez bişêm eşkere bikim ku tabloyên di nava şerefnameyê de, dê karên destên Şerefxanê hunermend bin. Di qonaxa yekem de Kesê ev yeke nizanibû. Lêkolînên li ser tabloyan sala 1991an ku li Swedê ji layê kovara jiyana nû ve bi tîpên latînî hatibûn çapkirin."*[26]

Çınkî di wê demê de ji bo min eşkere nebibû ku ev rastî bi çendîn belgeyan zelal bibe. Ji ber wê yekê di şerefnamê de behsa tabloyan û xwediyê wan nehatiye kirin. diyarkirina vê rastiyê karekî bi zehmet bû. Di heman demê de karekî mezin û giring bû. Ya giringtir jî ew bû ku babetê di nava lêkolînê de, perde ji ser Şerefxanekî hunermend hate hilden.

Di vê qonaxê de min nêrînek li ser çapa Swedê kir û hin çewtî rast kirin. Ez gîhîştime encamê dewiyê ku wêneyên Şerefxan ji aliyê huner, dîrok, civak û siyasî ve dane ber lêkolînan. Min gelek caran jî bi aliyê şaristanî û keleporî ve girê dide ku lêkolîna tabloyan amûrên Muzîkê bûn. Wek; dihol, Zurne, şimşal, tembur def û Buq. Herweha amûrên şer wek; xencer, şimşêr, rim, zîn, tîr û kevan, kulavên tasî, tifeng, top û kumekê barutê û kîsê guleyên tifengê. Herweha lêkolîna şêweyê avakirinê (îmar) wek; kel, mizgeft, minare, xwendingeh, dikan, bazar, cureyên dergeh, elqerêz, kevan, gumez, pencere, kîswan sekû ûwd.. Wêneyên nexşê avahî, nexşê giya, endeziyariya **Fisifsai** û tistên din... Di gel hevcudakirina cil û bergên kurdî, farisî, selçukî, bîzentî, turkmanî û osmanî min wêneyê her tiştî danî ber vekolînan. Wêneyên Şerefxan di van aliyan de pir giranbiha ne. Bêguman lêkolîn li ser wêneyên kevin yên bi vî cureyî pêwîstî bi şarezayeke hunerî heye. Bitaybetî

(26) Konferansa Şerefxanê bitlîsî Berlîn 1997.abdulreqîb yusif

hemû cureyên xwendingehên hunerî û hunera misilmanan û taybetmendiyên wê. Lewma hêja Ebdulreqîb Yusif lêkolîn li ser sê beşên giring di qonaxên dîroka Kurdistanê de bitaybetî giringî daye şunewar û keleporî şiyaye bêhtir ji 12.000 wêneyên li ser meydana şunewar û kelepurî komkirine. Bitaybet kelepurê mîmarî, telarsazî, nexş û nîgarên bakur, başur û rojhelatê Kurdistanê. Di komeleyeka şunewarên Kurdistanê de bo cara yekê hatiye dîtin. Çend perestgehên Zerudeştî hatin dîtin, ku giringiya wê perestgeha Zerudeşti ya Duhokê û perestgeha derbendî baziyan. Herweha li ser hunera misilmanan gelek giringî hatiye dayîn. Ji ber ku xwestine hunera kurdî, ji hunera misilmanan cuda bikin şerefnameya bi destxetê Şerefxan ku li namexaneya **Budliyan** li zanîngeha Oksfort ku jimara wê 312 ye, 20 tabloyên rengîn têde ne, ku ji aliyê hunerî ve gelek berz in. Babetên wan jî ev tabloyên jêrîn in:

Tabloyê 1. Dîmenekê rav û nêçîrê ye li **Hekariyê** û wêneyê Zekerya Begê Mîrê Hekariyê ye.
Tabloyê 2. Dagirkirina **qela dizê** li Hekariyê û wêneyê Esedeldînê Mîrê Hekariyê .
Tabloyê 3. Bajarê Amêdiyê û wêneyê Seyîtxanê Mîrê Behdînan e.
Tabloyê 4. Xwendingeheke nûjdariyê li Amêdiyê ye.
Tabloyê 5. Cizîra Botan û Mem û Zîn.
Tabloyê 6. Dîwanxaneya Mîr şerefê Mîrê Botan.
Tabloyê 7. Kela Hesenkêf.
Tabloyê 8 . Hesenkêf û Sultan Husênê Mîrê Hesenkêfê.
Tabloyê 9. Kela Agîl li nafçeya Amed.
Tabloyê 10. Kela Agîl .
Tabloyê 11. Bajarê Hîzan û dikan û bazarên wî.
Tabloyê 12. Hîzan û baxên wê û Mîr Hesenê Mîrê Hîzan.
Tabloyê13. Wêneyê Urtufê Selcûqî û şêx Hesenê Zerkî nexweşiya demara Urtuqî.
Tabloyê14. Dorpêçkirina Kela Bedlîsê ji aliyê leşkerên Ak koyunluyan .
Tabloyê 15.Civata Mîr şerefê bapîrê Şerefxanî û wêneyê wî û wêneyê dapîr û babê Şerefxanî.
Tabloyê 16. Şah Tehmasb li bajarê Xelata ber Gola Wanê.
Tabloyê 17.Beşa yekem: Civata Sultan Osmanî damezrênerê Dewletaq Osmanî. Beşa duyem: Hatina şandin Iran û Bîzentî û

Ereb û turkman û Selçukî bo aliyê Sultanê Osmanî.
Tabloyê 18. Şerê Edirne di nav bera Osmanî û Bîzentiyan de.
Tabloyê 19.Sultan Mihemed Fatih û bajarê Stembolê .
Tabloyê 20. Şerê çaldêranê di navbera dewleta Osmanî û dewleta Sefewî de.



**Tabloyê 1an,dîmenekî Nêçîrê li Hekariya**(27)

## Şerefxan û Nîgarmendî

Weke di pêşiyê de hate qalkirin, dibe ku Şerefxan di xwendingeha *şah Tehmas* de dersên nîgarî û nexş xwendi bin, ku car car şah ser li xwendingehê daye û gotiye haya we ji nîgarmendiyê hebe. Jiber ku nîgarmendî bîrkirina mirovî ye, mirov pê rast û dirust dibe.

Ku di vê demê de germe germa giringî dayîna hunera Sefewî bû.

---

(27) Şerefxanê Bitlîsî ,Şerefname,Tarixa kurdistanê ya kevnwergêra kormancî Zîya Avci, Apec çapa yekema kormancî 1998 swêd

*Sultan Muhemed* hunermendê mezinê birêveberê Akademiya Hunerî bû. *Aqa Mîrkê* şagirdê herî serkeftî bû di xwendingeha hunera nîgarmendiya *Teymorî* û xwendingeha *Sefewî* de hunermendê navdarê dîroka musilmanan bû. *Behzad* nîgarmendê *Şah Teymas* bû. Hunermendên bi nav û deng mîna *Mohemed, Mizefer Elî, Sadiqî* û *Zeynelabidîn* mezintirîn hunermendên hevçaxên *Şerefxanî* bûn. Dibe ku Şerefxan dersên wêneyê li cem van hunermendan yan jî li cem hinekên din xwendibe û sûd jê wergirtibe. Bitaybetî Sultan ku nîgarmendiya çiyayê Berdîn bi şêweyekî tablo wêne kiriye, ji ber ku Sultan Muhemedê hunermend gorankarî afirandiye û pêştir nebû. Dirustkirina tabloyên *Şerefxanî* ser bi xwendingeha hunera Sefewî bûn û diyar e ku Şerefxan hez ji zanist û hunerê dikir. Paşê wî sê salan li ser fêrbûna nîgarmendiyê berdewamî kir taku bûye hunermendekî mezin. Herweha berhemên çendîn hunermendên wê demê kom kirine û bi xwe re birine Bedlîsê. Piraniya pirtûkên pirtûkxaneya mezin ya Bedlîsê li ser dema Ebdalxanî de bitaybet yên wênekirî ku hinek ji wan qelemkêşên *Behzadî* mezintirîn nîgarmendê Sefewî bûn. Ku Şerefxan bi xwe kom kirine û pirtûkxaneya wî bû, ku kurên wî *şemsidîn Ziyaeddîn* û *Ebdalxanê* kurê wî.

Di vê dawiyê de diyardeka giring ji aliyê hêja Ebdulreqîb Yusif ve hat dîtin ku di şerefnameyê de wê baweriyê dirust dike ku Şerefxan hunermend bû û ev tablo karên destên wî ne ku li dawiya şerefnameyê wisa nivêsandiye: **“Li gorî wê jivana di pêşekiya pirtûkê de niha hefsarê qelemê devtîjê lenc û larê *Wasitî* û hefsarê belaxeta gotinê derbarê şirove û ronkirina rudanên rojane yên sultanên osmanî û paşayên îranî û turan badidim.”** Paşî dest bi nivîsîna bergê duyem yê şerefnameyê dike .

Eşkereye ku *Wasitî* di sedsala 13an de edîb nebû û di edebiyata erebî de nenivîsiye û navê wî di nav edîban de neaniye. Belku bi resim hatiye nasîn û nav û dengên wî belav bûye. Mebesta Şerefxan qelemê dev tîj û binaz, li vir qelemê hunera nîgarmendi yê bû. Nik qelema edebiyatê û belaxetê digot heger: qelema dev tîj a Herîrî. Çimkî *Ebu el-Qqasim El Heriri* di wê demê de mezintirîn nivîskar bû. Edebiyata Erebî gelek qala Herîrî kiriye. Bitaybetî Herîrî mezintirîn nivîskarê hunera Meqamat bû. Li vir mebesta Şerefxan ewe ku qelemê xwe bi qelemê Wasitî ve girêdeye û xwe bi Wasitî daniye ku di dema xwe de hunermend bû. Ji ber ku taybetmendiyên

hevbeş di navbera wan de hebûn û hunera nîgarmendîyê û bala destiya di nîgarmendiyê de. Heke hûr li gotina Şerefxan binêrîn dê bibînîn ku ji 2 beşan pêkhatiye:

1- Badana hefsarê Wasitî
2- Badana hefsarê belaxetê û herdu gotin jî, ji bo şirovekirin û ronîkirina dîroka dewleta Osmanî, Iran û Turan bûn.

Şerefxan vê yekê bi qelemê Wasitî qelemê hunerî bo wênekirinê rohnî dike. Diyar e ku wêne di rêbazên giring ên xwe de rohnî kirina tiştane. Şerefxan jî çar wêneyan bi qelemê xwe dirust kirin ku Tabloyên 17-18-19-20.ên ku barê çar rudenên mezin di dîroka dewleta Osmanî de weke: 1- Damezrandina dewletê. 2- Şerê Edirneyê. 3- Dagîrkirina Stenbolê. (Kustentiniye) 4- Şerê çaldêranê. Dibe ku gelek tabloyên din yên şerefnameyê bi vî cureyê hatibin dirustkirin. Yan hatine dizîn bitaybetî ji aliyê rojhelatnasan ve weke pirtûkan.

**Îbnî El-rezazê Cizîrî** nusxa namexaneya **Ayasofya** ku hin ji wêneyên wê hatine dizîn ji aliyê rojhelatnasan ve. Ev nusxa şerefnameya **Budliyan** rengê tiştên bi vî cureyê têde bin. Li ser vê yekê hat eşkere kirin ku ew tablo karê destê Şerefxan bixwe ne. Ji ber van belgeyan:

1- Şerefxan di şerefnamê de xwe bi *Wasitiyê* hunermend li qelem dide .
2- Şarezaiya nîgarmendiyê li edetên civaka kurdan û hûr karkirina reyalîta di hin ji tabloyan de eşkere ne weke di tabloyê *şerê çaldêran* de, ku çawa şer li ser wî dirust bûye, ji leşkerên Osmanî û Sefewî û giraniya topên osmaniyan û vekirina zincîrên topan û kuştina *Mihemed Xan Estacloyî şa îsmaîlê Sefewî.* Wesa diyar e nîganmendî zanyariyeke baş li ser vî şerî hebû. Ev yek weke dîrokeke bi resim hatiye dirustkirin, ku di gelek çafkaniyên dîrokî de yek digirin, xwediyê van wêneyên dîroka dîroknivêsekî weke Şerefxanî ye. Li ser dema xwe ev zanyariye gelek ji devê xelkê Îran û Kurdistanê wergirtiye.[28]
3- Şarezayiya di cilûbergên şah Tehmasb de. Wêneyê (16an) ku civata Tehmasb e, li bajarê Xelatê li ber Gola Wanê. Belgeyê

(28) Abdulreqib Yusiv,konferansa Şerefxanî ,Berlin 1996

wê hene ku wênekêşê cil û bergên şahtehmasbî, ew cilên fireh û nîva kulavê sako li ser cilên wî veşartî ye û ser û kulavê xwe ku gilover in û ber bi jor ve teng û zirav in. Li bin darekî rut bi qumaşî di nîva kulavî de bilind bûye. Mêzera tê pêçaye *Aqamûrkî* wênevanê serdema vî paşayî di pirtûka *Menzomat xemse* ev cil û berge û serê kulavî di tabloyekê xwe de bo *Kîsra Enuşîrwan* wêne kiriye.

4- Sûdwergirtin ji yekem tabloyê destnivîsê *Menafî El-heywan* ya *Ebdula binBextîşuyi* belgeyek e. Lê wênevanê şerefnameyê Şerefxan bixwe ye çinkî ev daneye destnivîs e, ku niha li *Pirtûkxaneya Morxan* (Newyork) de ye, ya *Pirtûkxaneya Mîrên Bedlîsê* bû, ku mohra *şemsedîn Ziyaiedînê Roşkî* û navê wî li ser e û wênevanî ev dane dîtî ye û wêneyê textê Sultan Osman di tabloyê 17an de, li ser şêweyê textê Sultan Mehmud Xazanî dirust kiriye.

5- Di tabloyê 13an de du çarek dêr ji dest xetê nivîskarî bi giştî şerefname li goşê ser destê çepê yê tabloyê nivîsîye û ev yek jî rêbazek bû di nava hunermendên misilman de. Hin ji nivîsa xwe dixiste nîva tabloyê. Lewma dibe belgeyek ku ev tablo ne karê vî nivîskarî ye.

**6-** Di tabloyê 2 an de nîgarmendî li nîva wêneyê dergehê kela **Dizê** li Hekarî nivîsiye **Esed hez ekber firokir** ku ev nivîs beşek ji wêneyê tê hijmartin û nivîsa nîgarmendî bixwe ye nivîs nêzîkî destxetê şerefnameyê ye û wateya wê jî ev e**: (Esed beşê mezin bi dest xist).**

7- Di tabloyê 8an de li nîva wêneyê di mizgefta bajarê Hesenkêfê de hunermend li ser **minarê** bi xetekî biçûk **4x2** ml. nivîsiye: **Elah Cele Celal.** Ku ev jî beşeke ji wêneyê. Wêne û nivîsa destxetî, nêzîkî destxetê şerefnama ku Şerefxan nivîsiye .

8- Di tabloyê 18an de ku derbarê **şerê Edirne** ye. Li ser bilindiya goşê destê rastê peyveke gelek biçûk **1-1/2x2ml** bi gurey çapa swêdê ku peyva **Xan** e renge mebest Şerefxan be.

9- Beşê destê rastê her di wî tabloyê de tabloyê (18an) îmzeya destî yan muhreke biçûk heye bi rengê sor li ser zerî bi şêweyekê tuxra (tfra) yê têkel nivîsiye. Pîvana wê **2-1/2x2ml.** e Nivîsa wê têkel e ji şêweyê nivîsa **Dîwanî celî** û **Kufî**. Ev cureyê nivîsan û mohrên biçûk Şerefxanekî resam dide xwiyakirin. Herweha Şerefxanekî neqaş ku şiyanên wî di nexşkirina tabloyan de

eşkere ne û dikeve ba hunermendên kevn ên Kurdistanê. Weke: **Mehran Fariqî û zanayê fîzyayê û endaziyarê mekanîkê Îbnî El-rezazî Cizîrî, Muhemedê Hesenkêfî û Mizeferê Hesenkêfî**.

Bê şike ku Şerefxan ne tenê ev 20 tablo dirust kirine. Belku gelek tabloyên din jî dirust kirine. Lê piranî ji holê çune. Bitaybet ji sedema talankirina Pirtûkxaneya Mezin ya Mîrê Bedlîsê, bi destê gunehbar **Melik Ehmed Paşayê Turk,** ku şaristaniyeke kurdî serhilda bû li Bedlîsê. **Ebdalxanê neviyê Şerefxanî** jî Ewliya çelebî dîtiye û wesif kiriye ku hunermendekî mezin bû. Di dirustkirina wêne û nexşan de li ber destê wî fêrî van du curên hunerî bûye. dibe ku gelek kesên din jî li ber destê Şerefxanî fêr bibin.Di gel talankirina wê pirtûkxaneya giring û mezin ku çendîn destnivîsên wênekirî û gelek tabloyên din yên hunermendên din di nav de hebûn. Li dema talankirinê **Ewliya çelebî** li wir amade bû, dîtiye û qal kiriye ku çawa kesên cahil û nezan û li dijê şaristaniyê, ew wêne parçe parçe kirine.dibêje; 200 dane wêne û nîgarên balkêş ji wênên nîgarkêşên navdar hatin têkdan ku gelek jiwan yên hunermendên biyanî jî dinavda bûn, weke "Şaqolî, Welî can, Şems xan, Malik, Erjeng, Axa reza, muheked reza û Behzad"î dinava wanda wênê hesper û Fîlek cwan wênekirî bû ku bala mirovî dikşand, ev wêne liser qomaşî bû, herweha dibêje bi hezaran karên hunermendên cîhanî li vir kombibûn. Lê dema gotî wêne herame bi çeqoyên tirkemana dihatin drandin.(29) Di gel vê yekê jî, dur nine ku hin karên din yên hunera Şerefxan bêne eşkerekirin di paşerojê de li nav hin destnivîs û kesên din. Ku bişên destnîşan bikin bi sedema van tabloyên Şerefxan û bibine sedema nasîna karên destê Şerefxan. Di pirtûkxaneyên gelek dewlemend û hin destnivîsan de wêne û tabloyên cuda cuda hene, ku heta niha nayê zanin ka karê kê ne.

(29) Ewlya Çelebî kurd le mêjoy drawsêkan da, Siyahetnama,wergêr Seid Nakam,rûp284-285. çapxana kurî zanyarî kurd Bexda 1979

## Rêbaza Hunera Nîgarmendiyê Li Cem Şerefxan

Şêweyê bikaranîna tabloyan piranî li ser rûpelan hatiye eşkere kirin. Yek ji wan nivêsên hatî kirin, di nava çarçuveyê de ye. Tablo giştî di nava çarçuveyê de ye. Lê hin caran yan di hin tabloyan de, resim ji çarçuveyê derketiye û xwe bi çarçuveyê ve girê nedaye. Ev yek jî, yek ji taybetmendiyên xwendingeha Tîmur bû. Her tabloyek li gorî cih û babetê wî hati bû danîn, bi wateya digel babetê şerefnamê de yek girtiye. Hin tablo têde hene ku naveroka wan babetek e. Hinan jî bêhtir ji babetekî û wateyeke zêdetir têde ye.

Hin wate hene nîvê wî babetek e û nîvê din babetekî din e. Hunermend tablo didine nasîn. Ev jî rêbaza piranî ya hunermendên serdema misilmanan e. Êdî pênasa wêneyan û lêkdana wan dikeve ser milên wî kesî ku lêkolînê li ser dike. Ev jî pêwîstî bi kûratî û zaniyariyeke kûr li ser lêkolîn û şarezayiya hunera misilmanan heye. Pêwîst e dîroka wî hunerî û taybetmendiyên hunerî û xwendingehên hunera serdema Selçukî **xwendingeha Bexded û Mexulî û Tîmur û Sefewî** û bi dîroka wî serdemî ve bête girêdan. Kesên di nava tabloyan de her tim bi ruxsar û ser û çav, cil û berg, rêk û pêkî, bi rewşa hunerî û şêweyê livîna wê demê de têne nasandin. Mînak: mirovên mezinên mîna mîr û paşa bi vî şêweyê didin nasandin ku cihê wan di nava tabloyan de eşkere ne û bi hurmet û qedir tac di serê wande ye û fincan li ber sîngê wan e û baweşîn li hinavî serê wan tête kirin û mîna bêderê li hinavî serê wan dizivirin, Wêneyê Heyvê yan li pişt yan jî li hinavê serê wan resim kiriye. Zêrevan li derve ne û hin tiştên din. Weke (Sultan Selîm, di tabloyê şerê çaldêranê de) bi wê yekê tê naskirin ku hespê wî mezin e û guling di mil de ye, çınkî çi hespên din yên cebhê osmanî di wî tabloyê de weke wî mezin nebûn. Herweha du kes jî li pêşiyê diyarin û her yekî *Tebrezîn* di dest de ye Tebrezîn di cihekî wisa de nîşana serbilindiyê ye. Hin tabloyên şerefnameyê pirî wêne ne, çınkî babetî wisa dixwest, weke tabloyê şerê çaldêranê û şerê Ewrinê û şerê Bedlîsê. Hunermend yek duratî ji bo wêna daniye. Di rastin wate de durî û nêzîkî weke yek wêne çêkiriye û **duratiya siyê** û menzor têde nîne û bi du duratiyên dirêj û pan wêne hatiye kişandin. Neku bi şêweyê duratiya sêyem ku wêneyê nêzîk- mezin dirust bike û yê dur û biçûk. Ev jî rêbaza piraniya hunermendên

dema misilmanan bû. Tenê **ibni El-rezezê Cizîrî** û **Yehya Elwasit** û xwendingeha demê Moxolan **Êlîxan,** di destpêka sedsala çardehan de peyde bibûn, ku duratiya sêyem bikar dianîn. Lê xwendingeha **hunera Tîmur**, hin ji sedsaliya çardehan heta sedsaliya panzdehan, duratiya sêyem têde bikar neaniye. Nîgarmendê tabloyên şerefnameyê gelek giringî dide siruştî. Ji dîmenên siruştî weke çiya, deşt û Rubar ta giyanewer, giya, guh, xanî û kelûpelên nav malê. Ji ber ku van tiştanan hemû di tabloyan de cîh digirin, serê tabloyê dirêj bûye û dawiya wê teng bûye. Tenê hinek ezman di tabloyê de eşkere ye û hin caran xwiya nake. Ji ber wê jî duratiya sêyem bi kar neaniye. Hunermend ezman bi rengê şîn dirust kiriye. Lê di hin tabloyan de rengê zêr bikar aniye weke tabloyên jimare **1, 5, 11 û tabloya 12an,** ezman bi rengê zêr bi zer re bi kar aniye. Li hinavê çiya yê şîn û şewqdar, beramber erd û deşt û keskatî û nexşên biçuk, di ezman de bi kar aniye**. Ev şêweyê bikaranîna rengê zêr beriya ronesansê li Ewropa resaman bi kar dianîn.** Ev nexş di xwendingeha Moxol de hebû. pêlên ewran jî bi şêweyekê giştî komeleke nîv bazneyî weke kevan û biçûk û rengê sipî gelek li der û dorên pêlên ewran daniye ku rengdana pêlên ewran li der û dora wî aezmanî de ye. Hunermend, ezman di tabloyê (3.) de gelek teng kiriye ku wekî serê çarçuvekî lêhatiye şêweyê nexşî bidê. Di tabloyê (9.) de wêneyê ezman ji vî alî û wî aliyê beşê serê tabloy de kişiya ye, lê di xala herî berz de ew nekiriye ku ew bibe nîşana berzayî ya vê kela Kurdistanê. Em çiqas bêjin jî hin berz geheştiye ta felekê. Dibe ku gelek xal û wate di hizra kûr û zewqa hunerî ya şairane de winde bibin.


Hunermendê şerefnamê pantaya der û giya gelek bi tangî û vekirî reng kirine û gelek têde pir nînin. Herweha wêne bi şêweyekî realîte ne dirust kirine. Pencereya di nîva tabloyê (5.) de ku rewşa bajarê Cizîrê ye, remzî ye û nîsana maleke mezin e. Herweha darên di nîvê tabloyê de guldar bin, yan bê gul di reyalîteyê de ne rast in. Belku ji siruştî ladane. Ev curê darên nazik û ladan ji sirustî di wêneyên xwendingeha Moxolî û Sefewiyan de hebûn û hunera osmanî jê wergirtîne. Hunermendan wêneyên van daran ji hevûdû wergirtine. Lê darên di nava tabloyên **Wasitî,** de ku sala 636an (1237z.**)** ê ku ji destnivîsê **Meqamat el Herîrî** de kirine, ji vî cureyê daran nînin. Hin ji wan beşê herî mezin weke dara xurma.

Ewên din hemû ji siruştî la daye. Di tabloyê (10.) de darek bi şêweyê gulê resim kiriye ku şêweyê taca sê goşe dide darek xerîb û ji siruştî la daye. Giyayên ku di tabloyên şerefnamê de hatiye bikaranîn piraniya wan giyayê sosin e, realîte ne û di tabloyê (11.) de bi gulan baş tê naskirin. Giyayên din piraniya wan ne realîte ne û di rastiya tabloyê de denîne. Weke xwendingeha dema misilmanan ji siruştî lê dene. çiyayên bi kevir gelek ciwan dirust kirine, di gel wan darên nazik ku di berên hişk de kesk bûne şêweyê nexşê **(**Zexrefê**)** dide. Ber jî bi çend rengan reng kirine, nazik rêkxistî ne, piranî mîna berên çiyayên Kurdistanê ne. Mînak: li tabloyê jimara (9.) binêre; şêweyê wêneya kevirên çiya hin caran bi xarî kişiyayî ne. S*ultan Muhemedê* hunermendê mezin ev şêwaze derhênaye, ku di dema **şah Tehmas** de rêveberê xwendingeha Akademiya Hunerî bû. Dibe ku Şerefxan şagirdekî wî be. Ev xal jî saxletekê hunera Sefewî ye. **Çiyayê Hîzan** di tabloya (12.) de bi rengê şîn yê pirsingdar wênekiri ye, ku dîmenên ciwan û zîvî, zer û keskê Hîzan nîşan dide. Hunermend, ser û çavên mirovekî kurd di tabloyê **çaldêran** û çend wêneyên di şerefnameyê de ciwan derxistine. Bitaybetî yên mîrên kurdan û zilamên li dor 40 salî û yên ber bi jor. Lê ser û çav ku ber bi jêr e, ji xwendingeha Moxol hatiye nav xwendingeha Sefewî. Çınkî hin ji wan ser û çavên xir yên Moxoliyan e. Wêneyên çend jinan jî li bin bandora xwendingeha berê ku xir û bi goşt in, lê yên kurdan kêm goşt, xar û dirêj in. Di piraniya van xwendingehan de ser û çavên jinan xir û qelew in, çav û dev teng û xar in. Van ser û çavanan ji regeza turanî ne, bi sedema hunera li Iran, Iraq, Misir û welatên şamê belav bûne, ku di gelek wêneyên **Wasitî** de jî eşkere ne. Her çi wênekêşê şerefnamêye çavên badayî û teng, ser û çavên xir bo jinan bi kar anîne. Belku ser û çavên kurdan bi vî şêweyê resim kirine. Ji ber wê yekê ser û çavên jinan bi şêweyê moxolî, yan regezên tirkî wergirtîne. Di gelek cîhan de xal li ser ruyê jinê daniye û milên wê mezin dirust kirine. Heke ev sîfet di hin cihan de nebûya, jin ji zelam nedihat cudekirin. çınkî gelek caran ser û kulavê jinê ji yê zilam cude nabe û wek hev e. Nîgarmendê wêneyê jinê **bê xişil** kişandiye, tenê guharên biçûk nebin ew ên di guhên hin mêran de eşkere ne. Ev jî rêbaza piraniya hunermendên sedsalên navîn bû, weke dema Moxol, Sefewî û Osmanî heta serdema Şerefxan

wêneyê jinê **bi xişlî** gelek kêm e. Nîgarmend, tiliyên destê mirovan dirêj û zirav resim kirine. Piraniya wêneyên xortan bê rih û simbêl resim kirine û yên bi emir bi simbêl resim kirine. Hin bi rih û bê rih jî resim kirine. Di erzinka mêran de rih hene. Hin ji wan bi rih in û hin jî bi rihên teng in weke rihên mezinên mîna *Esededînê Hekarî.* Hinan jî kêm rih hêlayine di erzinkê de weke siwarê hespê di tabloyê (12.) de diyar e, ku li ser mîrnişîna Hekeriyê ye. Cureyek din yê rihan heye weke berî niha me li ser erzinkê behs kir, lê bi xetekî zirav hêlayîne ta aliyê guh çûne. *Ewliya Celebî* sala 1065(k), 1654an (z) di rûpelê 209 bergê çarê **Seyahatnameyê** de wiha gotiye: *"Kurdên devera Hekarî Simbêl mezin in û rihên xwe kuhr dikin, bi tenê ew nebin ku hin kes rihên xwe li ser erzinkê dihêlin û guliyeka teng bi nav çavên xwe e berdidin jêr."* Di rupelê 317de dibêje: *"Kurdên Mehmudî li devera Wanê rihên xwe kuhr nakin û bi rengê sor, şîn, zer û reng dikin."* Hunermend bihayekî mezin daye rengkirina cil û bergên di tabloyan de û nexşê van cilan jî piranî bi wêneyên gulan nexşandine. wisa nîşan dide ku qumaşê guldare di gelek cîhan de bi vî şêweyî cil nexşandine. Di dema hunermendê mamostayê hunerî Sefewî de (Behzad), ku li ser dema *şah Ismaîlî* nexşkirina cil û bergan di wêneyan de belav bûye, lê di dema *şah Tehmas* de belav nebibû. Li vir diyar dibe ku hunermend ketiye bin bandora hunera Sefewî. Lê hin kartêkirinên xwendingehên pêştir di wêneyan de eşkere ne. Ev yek jî tiştekî seyr nîne. Ji ber ku hunera miletan kartêkirin li ser hevûdû kiriye. Herweha hunera *Xwendingeha Bexdad* jî, gelek tişt ji hunera selcukî, iranî û hunera mesîhî yê rojhelatî wergirtiye. Karê hunera Sasanî û Manî û Helnistî di wêneyên wî de eşkere ne. Weke *Dr. Zekî*

*Mihemed Hesen* û hinên din gotine: Wasitî bi mezintirîn nîgarmendê Xwendingeha Bexdadî tê hijmartin. Ew kartêkirin di wêneyên wî de diyar e. Di piraniya tabloyên şerefnameyê de cûş û xirûş, di dîmen û şêweyên sitran, muzîk û yariya tepê û dîmenên nêçîrê di herêmên çiyayî de giyane zewq û şadî yê. Di dîwanên mîrên kurdan û civatên şah Tehmaspî şahê iranê û Sultan Osmanê osmanî û di tabloyên şer û şor de giyanê ser û sextgîriyê û ser birîn têde diyar in. Tabloya şerê çaldêran tabloyekî yekcar berz e. Her

tabloyek ciwaniyek bi wate têde ye. Weke yasa, zanist û olderî. Di tabloyê (19) de, ku derbarê *Sultan Mihemed el fatih* e, weke paşayekî bi siyaset û dadperwerî û handerê zanistî nasî ye. Hunermend mesela kiştûkal, bazar, kirîn û firotinê jî, ji bîr nekiriye. Di herdu tabloyan de **(**11, 12**)** ev yek amade kiriye. Ev e sercemê bikaranîna rengên ciwan û di gel yek di gunca.



**Tabloyê 10an,Kela Egilê** [30]

---

(30) Şerefxanê Bitlîsî ,Şerefname,Tarixa kurdistanê ya kevnwergêra kormancî Zîya Avci, Apec çapa yekema kormancî 1998 swêd

ger wêneyên şerefnameyê biçine ser xwendingeha hunera Sefewiyê yekem jî, nîgarmendî sûd ji tabloya yekem a destnivîsa *Menafi El-heywan* wergirtiye, ku wêneyên wî ser bi xwendingeha hunera *Êlxanî* Moxolî ye. Ji ber ku textê *Sultan Osmanî*, di tabloya (17.) de bi şêweyê textê *Sultan Mehmûd Xazanî* (1295- 1304 z kurê Exon kurê Abaqay kurê Hulakuy) ye û şêweyê runiştina herdu Sultanan jî wek hev resim kirine. Textê Siltan Osmanê; sê alî bi derî girtîne û li pêşiyê hinek vekiriye û yekser li ser ciyekî bilind daniye. Tenê herdu textên li pêşiyê **100%** wek hev in. Cudehiya di navbera wan de; textê Sultan Osmanî bê tişt e û textekî xar û biçûk e, li ber singê wî daniye. Dibe piştî runiştina Siltan li wir danîbe. Runiştina wî jî mîna Mehmud Xazan e, lê destê çepê bo sîngê xwe bilind kiriye. Mehmud Xazanî jî destê rastê û çepê li ser ranî danîne.

Dibe ku Şerefxan tabloya Sultan Mehmud dîtibe yan ji destnivîsa *Menafi El-heywan,*

yan jî, ji ya *Ebdula ibni Bextşui* ku nujdarê dewleta **Dustkî** ya kurdan bû. Denina wê ya li *Pirtûkxaneya Morgan* e. (New York) Ev dane jî di Pirtûkxaneya Şerefxan de bû. Çınkî di nîvê yekem a sedsala panzdehan de, yan jî pêştir kete nava *Pirtûkxaneya şemsedînê kurê Ziyai Elroşkî* yê ji bapîrên Şerefxan ku ji mîrên herî mezinên Bedlîsê bûn. Ev yek di nava nexşekî ciwan li ser pişta destnivîsê heye û mohra *şemsedîn* li ser e, ku îmzayeka badayî û navê *(şemsedîn)* bi şêweyê *tifrayi* di îmzeyê de nivîsiye. Herweha di nava wê îmzayê de li ser destnivîsa pirtûka *Ibn El-rezezî* de heye, ku danek li *Pirtûkxaneya Topqapî* ye û nîşana wê ew e ku ev jî, ji destnivîsên wênekirî yên *Pirtûkxaneya Mîrên Bedlîsê* bû. Dibe ku ev du destnivîs di nava talanên *Pirtûkxaneya Ebdelxanê* neviyê Şerefxan de bin.



**Tabloyê 11an,BajarêHîzanê,arêşeka avasazîy ê**(31)

## Tabloyê (11.): Bajarê Hîzan


Ev tablo li ser mîrnişîna Hîzan e. Ev tablo û tabloya (12.) ji dîmenên bajarkî Hîzanê pêk hatiye. (Ku niha gundekî 20 malî ye li navçeya Qeresu yê wîlayeta Bedlîsê ye. Deştek li ber singî wî ye û her çar aliyên wî bi çiyan dorpêçkirî ne cîhekî gelek xweşe.) Ev herdu tabloyana wateyeke aborî didin, ji ber ku di tabloyê (11.) de dikan û bazarê vî bajarî diyar e. Di tabloya (12.) de jî dîmenê zevî,

(31) Şerefxanê Bitlîsî ,Şerefname,Tarixa kurdistanê ya kevnwergêra kormancî Zîya Avci, Apec çapa yekema kormancî 1998 swêd

zar, çûk, av, bax û kêlan ji aliyê baxwaniyê ve wêne kiriye. Weke Şerefxan nivîsandiye Hizan cihekî pir bi bax û bostan e û hemû cureyên fêkiyan tê de hebûn, ku hin ji wan li deverên din nînin. Weke *bindeq* û *kişmîş*. Li gorî gotinên mêjûnivîsan; gilyas, şah û berû jî hebûn. Dikan û bazarên Hîzan di vî tabloyê de eşkere ne û bajarê Wanê bi girekî ve diya re. Dikanên wê sor in û pişta wan bi şêweyekî kevan û bi rêk û pêk ava kirine. Dewr û berên hin dikanan nexş kirîne. Di dikanan de fêkî difroşin komeke şûtiyên (Zebeş) dirêj û bê xet di dikana destê çepê de, ku şêweyekê bi kevanî eşkere ne. Zebeşek jî kerkirî ye û ber bi çav e, daku bala mûşterî bikşîne. Xortek zebeş dikire. Çend refik hene, dibe ku fêkî li ser danîbe. Zembîlek jî di serê refatka serî de ye. Dikana nîvê; zebeşên giroverên xal xalî di mîzanê de ye û tê wezinandin. Piraniya zebeşên bakurê Kurdistanê bi vî şêweyê giroverin. Ev yek jî belgeyeke ku li Kurdistanê ev cureyê zebeşan hebûn. Di dema kevin de û berî 400 salan di vî tabloyê de diyar in. Heke li hemû cîhan nebin jî li Hîzan hebûn. Zebeşên girover ên xaldar di vê dikanê de li ser pêlika ne. Ev pêlikanan jî diçin ser wê dikanê, ku mirovek li pencerê ye û dikandar xort e û li ser enîşkê runiştiye. Zilamekî din jî runiştiye û zebeşek li ser destê wî ye û jê kiriye ku paşve vedigerîne. Mîzana dikandar di bin kûşxankên dikanê de girêdayî ye û şur bûye. Ev cureyên mîzanan niha jî di bajarên me de li dikanên qesab, pembû û hiriyê de hene û bi kar tînin ku li devera Silêmaniyê dibêjinê *şayen*. Dikandarê sêyem fêkiyekî girover di dest de ye nîşanê mişteriyî dide. Dibe ku bindeq yan Hejîr bin. Di destê din de ji bo tîştekî din rakêşaye û mişterî jî destê xwe ji bo wî aliyê dirêj kiriye ku Zembîl e. Xortekî li ser banê dikana destê çepê rawestiya ye û yekî din jî li ser banê dukana destê rastê rawestiya ye, wêneyê wî hin ne diyar e. Dibe ku jin be. Kêseyekî bînasazî (Mîmar) di herdu tabloyan de heye. Şerefxan weha nivîsandiye: *"Xaniyên nîva kela Hîzan li ser terzê bînasaziya rwangeha Stêrnasînê* ***Mersid Felekî*** *avakirî ye."* Herweha gotiye: "*Kelaya Hîzan ne mîna kelên din yên Kurdistanê ye bêhtir nêzîkî şêweyê kelên Ecemistanê ye û bi Ber û Kilsê dirust kirî ye dîsan*

*Hîzan bajarekî musilmanan ne. Hatin û çûna welatê Ecem di gel de bû."* Her di berdewamiya gotinên xwe de gotiye: *"Di nava xelkê Hîzanê de belav e ku ev bajare xwediyê bajarê* ***Meraxe*** *û* ***Tewrêzî*** *ava kiriye. Hulakuy bajarê* ***Meraxê*** *nû kiribû û kiribû paytexta desthelatderiya xwe. Nesredîn Tusî zanayê mezinê stêrnasî rawêjkarê wî bû. Dibe ku Nesredîn digel wezîrekî mezinê musilmanan bajarê* ***Hîzan*** *ava kiribe û her wî hatin û çûna Hîzan bi Ecemistanê ra çêkirbe. Dibe ku Nesredîn ji damezrênerên vî bajarî be."*

Di herdu tabloyên yekem û duyem de ku li ser **Hekarî** ne. elqeyên bazneyî ye û bazneyekî biçûk di nîvê de ye û diyar dibe ku berztir e. Di Sedsala nehan de berî zayînê di navçeya **Biradust** de li devera **Rewanduzê,** di cîraniya Hekariyan de wêneyê serê serî bi metalî ve daniye û hikumateka kevin ya Kurdistanê li wir hebû. *Şah Erzana* paşayê wê bû. Leşkerên Silêman Bêjen di tabloyê de aliyê jêr ê kela Bedlîsê damezra ne û pir bi çek; û şûr, rim, tîr, gurz, top û Tiveng şer dikin. Hin jî di nava kevirên jêrî kelê de girêl dibin û dibe ku hin di birîndar bin. Dûkel û Agir di devê topan de derdikeve û agir bi dîwaran dikeve. Deriyê kelê jî, ji dûkelê reş bûye. Lê ji hesiniye Şerefxanî navê topê naniye lê bas kiriye, ku *Aq Quênlô* (Menceнîq) di gel de bû, her di wê demê de top jî hebûn lê kêm. Leşkerê Aq Quênlô *kulav* (Xude) li serî ne. Di navê de hin Bîzentî yan bêjîn mesîhî ku esil Ewropî ne di navê de hene, ku kulavên wan yên Ewropî ne li pêşî yan li paş du beş e û her ew şewqe di tabloyên (17.-18.) de jî hene. Ev ne xelkên rojhelatê Enadolê ne. Ji derdura Derya ye . "



**Tabloya 14an,dorpêçkirina Kela Bedlîsê**
**ji alîyê Akkoyunluyan** (32)

Dema mirov li ser nêrîneke hunerî li tabloya 14 an binêre,ber bi hunera Abstrak a nû ve diçe ev jî hunermendiya Şerfxanî nîşanî me dide. Ev hunere li destpêka sedela bîstan li ewropa diyar bû li ser destê hunermendekî Rus bi navê "Wasili Kandensky

## Tabloyê (14.) Ji Aliyê Akkoyinniyan ve Dorpêçkirina Kela Bedlîsê,.

Ev Tablo li ser Mîrnişîna Bedlîsê hatiye resimkirin. Ji dorpêçkirina kela Bedlîsê, ji aliyê Dewleta Akkoyunlu ve bi serokatiya Silêman Bêjinî pêktê. Şerefxan behsa wê kiriye ku Hesen El-tewîl damezrênerê dewleta Turkmenî ya Akkoyunlu bû, di sala 871-882î koçî (1466-1478 z.) li ser dema *Mîr Îbrahîmê kurê Mîr Hacî Mihemedê Bedlîsî* de. Hesen El-tewîl, artêşekê di


(32) Şerefxanê Bitlîsî ,Şerefname,Tarixa kurdistanê ya kevnwergêra kormancî Zîya Avci, Apec çapa yekema kormancî 1998 swêd

serokatiya Silêman Bêjenî de bo dagîrkirina kela Bedlîsê şand. Silêman zivistanan diçu deştên Bşêrî û Mardînê. Dema ku zivistan bi dawî dihat vedigeriya Bedlîsê ji bo dorpêçkirinê. Çınkî Bedlîs zivistanan pir sar dibû. Bi vî şêweyê dorpêçkirina wê, sê salan berdewam kir, taku xelkê di nava kelê de ji birsiya û nexweşiya *taunê* û ji ber tundiya dorpêçiya şer bê hêz bibûn. Slêman Bêjenî, Mîr Ibrahîm şand aliyê Hesen El-tewîlî, li Tebrêz wî jî hurmeta wî girt karek dayê li bajarê Qum û li wir mir. (Beituyê) Kurê wî jiber serkêşiya eşîra *Roşkî* li Bedlîsê Mîr Ibrahîm kuşt. Di gotinên Şerefxan de derdikeve ku dorpêçkirina Bedlîsê sala 1466an z. bû. Mîr Îbrahîm mirovekî bi hêz û rû bilind bû. Yek ji wan mîrên Bedlîsê bû, ku resmê wî li ser parabo niha jî li Muzexaneya Stembolê ye û hatiye parastin. Weke di nameyeka muzexaneya Birîtanî de nivîsîye ew a bo hêja Ebdulreqîb Yusiv hatiye şandin.


Silêman Bêjen di vê tabloyê de li aliyê çepê li ser kursiyekê runiştiye û rimeke kurt bi cureyê rima *Mewcar* di dest de ye û tîr di nîva tîrdanî de ye û şûr jî di kavlan de ye û bazbenda şûr ya ji dest xwe kirî û metal jî heye. Ev cureyê çekî di destên çend şerkerên din de jî hene. Di tabloyên din de dikêmin wisa diyar e ku bi biha ne. Çınkî piraniya metalên din durmandur dixirin di naverastê de, kûr û tûj in, di şaneşîna kelayê de diyar in. Zilamek ku ser û kulavê wî ji Qumaşe, ji derveyê kelê digel Bîzentiyekî diaxife. Di navbera wî û Silêman Bêjenî de çi kesên din nînin, tenê ev zelam heye. Cil û bergên wî ji cilên leşkerên Silêman Bêjenî cudane. Dibe ku ji zilamên Mîr Îbrahîm be û ji bo aştiyê şandibe cem Slêman Bêjenî. Heke wisa be ew kesên digel Îbrahîm sax mane û heşt kes in. Heke wisa nebe ji bilî Mîr Îbrahîmî heft dimînin û li ser kelayê rawestiyane. Di wî demê de tablo ji bo nîşadana qonaxa dawiyê ya berxwedana vî mîrê kurdan hatiye resimkirin. Di tabloyê de li ser bilindiya kelayê du ala hene; yek rengê porteqalî ye û yek jî keskê tarî ye. Li ruyê dîwarê kelayê di deriyekî hesinî yê kun de (moşebek) lûlûyeka Topê hatiye der. Em nizanîn ev rast e ku di wê demê de topên Mîrê Bedlîsê hebûn yan na? Weke çawa topên Ebdalxanî hebûn yan na? Derbarê vî şerî di şerefnamê de qala topê nekiriye. Lê qala mencenîqê kiriye ew jî ya Akkuyunluyan bû. Di lêkolînekê *Stinosimi* de ya bi navê *Peydabûn û dirustkirina çekên agirdan li Kurdistanê,* bi vî cureyê jêrîn şirove kiriye.



**Tabloyê 16an,Şah Tehmasb Li Bajarê Xelatê**



loya 17an, Beşa Yekem; Sultan Osman  Beşê Duyem: Dîw




**Tabloyê 18an,Şerê Edîrneyê**

## Endeziyariya (Hendese) Kelayê

Bi qelemê Ewliya çelebî yê dostê kurdan, ku şiya 610 kurdên êxsîrên şerê Ebdalxan ku piranî Êzîdî bûn ji şûrê Melik Ehmedê Paşayê gunehkar rizgar bike, ger celadên wî weke 190 kesên din serê wan jêkirin. Ji bo me derdikeve ku ev tablo her ew endaze û pîvanên rasteqîneyên kelê ne. Tenê ew nebe ku niha ew aliyê kelê xira bûye ku seraya Ebdalxanî lê bû, keti bû piştê aliyê rojava. Balkonek di tabloyê de li ser çar kevanên bazneyî di qata sêyem de eşkere ye û du jin serê xwe di pencereyê de derxistine. Ewliya Celebî jî di rûpelê 106an de qala hebûna balkonên di kela Bedlîsê de kiriye û di wergera kurdî de weha gotiye: *"Hemû pencereyên balkonê li ser burcê û dîwarî bûn. Wêne. vê diyar dike ku hejmarekî balkon di bilindiya qata siyan a kelayê de hebûn û dîmenekî ciwan daye vê kelayê ku 300 Ode lê hebûn û 300 malbat di navê de bûn, ji bilî embara çek, dewar û Ceblxaneyê."* Herweha di rûpelê 266an de gotiye: *"Kela qat,qat li ser êk e û her Xanek hatiye ser kelayê û karekî avedanî têde kiriye. Lê Ebdalxan, zana û endaziyar û stêrnas (Felek)î û dixtorê binavûdeng bû. Wî serayekê ji şêweyê seraya Fîraqa di kelayê de dirust kiribû û deurûberên kelayê 4000 şeqau bûye. 360 li jêr destê Akkoyunluyan bûn.* Di tabloyê de mîr Îbrahîm ew kes e ku serê wî ji Pencereyeke kelayê xweya dike. Mêzereka sipî di serî de ye û rengê sor (rengê şer û xwînê) di pencereyê de diyar e. Mîr Îbrahîm bi rih û simbêl bûye. Çunke hêşta xurt bû. Weke çawan Şerefxanî di tabloyê sêyem de wêneyê Seyîdxanê Mîrê Behdînan bê simbêl û rih resim kiriye, ku bizanin hêşta xort e. Mîr Îbrahîm di wê demê de jin neanîbû, cunke di şerefnamê de hatiye ku teslîm bû û dûr xistibûn bo bajarê Qum û li wir jin anî bû. Di tabloyê de diyar e bi tenê sê kes ji şerkerên Mîr Îbrahîmî li ser kelayê mane û şer dikin ew jî bi beran. Çınkî ne gule û barûta tifengan û ne jî tîrên wan nemane, ji ber wê yekê naçar in berevaniyê bikin bi beran. Dibe ku berên wan jî kêm mabin, cûnke bi tenê duyan ji sêyan ber di dest de ne û bilind kirine ku bavêjin

dijminî li jêr kelayê. Ev jî nîşana hêz û berxwedan û xweragiriya wan a azadiyê ye.



**tabloyê 15an,civata Şerefxanê Bedlisî**


## Tabloya(15) panzdehemîn: Civata Şerefxanê Bedlîsî.

Ev tablo rûpelê 145 li ser fermandariya **Şerefxanê kurê mîr Şemsedîn** e. Bapîrê Şerefxanê mêjûnivîs, ne tenê mirovekî xwêndevan bû, belku ji mîrên herî bi deşelatên Bedlîsê bû. Weke Şerefxanî nivîsiye: di zanyariya

stêrzanînê de xwedî şiyan bû **sala 940 kuçî , 1533z-1534z** di gel leşkerê osmaniyan şerkiriye û digel 700 kesên ji hêza wî, li **Tatîkê,** Ku dikeve ser rêya dinavbera Bedlîs û Hîzanê hate kuştin. (33)

Ev tablo tanahiyê resim dike, bitaybet li ser kurê Şerefxanî. Ew li ser Kursiyekê xwar û biçuk runiştiye û zilamên wî li derûdoran rawestiyane. Şerefxan di wêneyê de baş û bilind xwya ye Dûr nîne ku Şerefxanê dîroknivîs, ev wesvê bapîrê wî ji babê xwe bihîstibe. Şerefxanî Cilên Mîrîtî di ber de ne. Kirasê wî sor û gul gul e. Kurtek pîvazî bêyî hiçik li ser dapoşiye. Kembera piştê zer e, şalwar jî ji qumaşekî gul guliyê zer e. Ser û kulavên sipî û bi xetên mezin li serê xwe kiriye û parçe qumaşekî sor di naverastê de girêdeye. Qopeyek berz û mezin li ser cawan xweya dike. dibe ku ew qumaşê sipî û xet xetî, îranî be. Cunku her ew qumaş di mêzerên Îraniyekî de heye, di tabloya 16an de û di wêneyên osmaniyan de nîne. şêweyê qobeyê wesa mezin bû, ku çi mîrên din ne dirustkiriye û nîşana mîrîtiyê ye. Dibe ku qobe ji parçe Qumaşê sor zirav yan dezuyê sor dirust kiriye. Serûçavên Şerefxanî tevlihev xweya dikin.

(33) Abdulreqib Yusv,Seminara konferansê Şerefxanî ,Berlin 1996



Tabloya 19an, Sultan Mehmed Fatih û Stenbol



**Tabloyê 20an,şerê Çaldêranê**

## Tabloyê(20.):ŞerêÇaldêran.

Ev tablo li ser şerê dîrokî yê di navbera dewleta Osmanî û Sefewî de ku li Kurdistanê li çaldêran Qewimî bû ye. Şer roja 8ê Recebê sala 920ê k. (24ê Abê 1514ê z). dest pê kiriye. Nêzîkî 200.000 çekdar yan bêhtir ji neteweyên rojhelata navîn Ewropiyên jêr destê dewleta Osmanî, di herdu aliyan de beşdar bibûn û xwîna hevûdin rijandibûn. *Nezmî Zade* di pirtûka *Gilşin elfa,* rûpelê 185an de dibêje: *"Bitenê ji ereban nêzîkî 10.000 kes hatin kuştin."* Ev şer ji şerên mezin yên dîrokî tê hijmartin. Mîrên kurdan li bakurê Kurdistan piştevaniya dewleta Osmanî dikirin û serketina

Osmaniyan de rolekî mezin ya kurdan hebû. Sedemê çêbûna vî şerî jî siyasî û mezhebî bû. Osmanî Sûnî û Sefewî şiiyên tundrew bûn. Mezhebê şiiyî roj bi roj di Enadolê de pêngavên ber bi pêş davêtin. Osmanî gelek ji vê yekê ditirsiyan. Sultan Selîm di pêşiyê de kuştineka giran li şîiyên Enadolê kir. Dibêjin tenê 40.000 hezar kes jê hatin kuştin. Ew ên din jî dûr xistin bo Ewropa. Paşî Sultan Selîm ji bo dûrxistina metirsiya şîiyan û metirsiya dewleta şiî ya Îranî dest bi vî şerî kir, **ku şah Îsmaîlê kurê şêx Heîderê kurê şêx Cineydê Erdebîlî,** di encama ji holêrakirina dewleta Akkoyunlu bû damezrênerê wê. Hin Dîroknivîs şerê çaldêranê dikin destpêka dîroka siyasî ya nû ya kurdan. Çınkî pêşî Kurdistan seranser di bin destê dewleta Sefewî de bû. Bi sedema vî şerî bakurê Kurdistan li gor xwestek û hêviyên mîrên kurdan û bi alîkariya **Mela Tedrîsê kurê Hisamedînê Bedlîsî** ket destê dewleta Osmanî. Kurdên bakur û başurê Kurdistan ji bilî wê yekê ku şiî bûna dewleta Sefewî dê ne razî bûbûya. *Siyaseta şah Îsmaîlê Sefewî* jî, ji bo wan xirab bû. Ji ber ku desthelatiya mîrên kurdan wê ji dest derketa û rast e, xwe xistine bin destê dewleta Sefewî û sefewiyan fermandarên Îranê li cîhê mîrnişînên mîrên kurdan datîanin. Lê Sultan Selîm biryar da siyaseteka nerm li hember kurdan bi kar bîne. Ew jî, dest ji mîrnişînên mezin ber nede. Rê da ku mîrnişînên kurdan weke berê di mîrnisînên xwe de karê xwe bikin. Ev jî li ser dexwaza mîrên kurdan bû, bi alîkariya **Îdrîsê Bedlîsî.** Dema Sultan ji Tewrêzê vedgeriya, ev daxwaza ji bo hemû mîrnişînan bû, taku hîç fermanderekî tirk di van mîrnisînan de nemîne û Sultan bi vê yekê razî bû. Ev sîstemek nû wekir, ku li ser sîstemê derebegîtî eskerî (derebegên kurd) bûn, ku di dewletên berî musilmaniyê de, weke **Dewleta Sasanî** hebû. Demê misilmaniyê, **dewleta Buweîhî** di sedsala dehan de zîndî kirî. Naveroka vê sîstemê jî ew e ku derebeg di kar û barê herêma xwe de xwediyê desthelatdereke serbixwe ye. Tenê divê baca salane bidin dewletê û di dema şer de dewlet daxwaz bike wê şerkeran bişînin. Ew mîrnişîn jî 17-19 bûn. Ewên din jî weke sîstema îdarî bi fermandarên hikumatê ve girê dan.

şerê çaldêranê şûnewarekê karîger li paş xwe hîştiye. Tenê hunermendên îranî, tirk û kurd jî sêsed sal piştî şer wêneyê wê dastanê di tabloyên xwe de nexşandine. Mînak *Rîç* roja 26.10.1820an tabloyekî vî şerî li bajarê *Sine* li ser dîwarekî koşka *Emanola Xanê Yekem Mîrê Erdelan* hatiye dîtin. dîroknivîsê tirk

*Ehmed Rasimî* di pirtûka *Osmanli Tarîxî* bergê yekê, rûpelê 259an de tabloyekê şerê çaldêranê belav kiriye. Lê ev tablo ne mîna yên şerefnamê ciwan, hûr, eşkere û hemû alî lê nîne. Tiştê di van tabloyan de tê dîtin: şer û êrişkirina ser êk, kuştin, ser birîn û zori kirina li ser hevûdû bûn, şerker û birînder bûn, ketina hespan û bikaranîna hemû cureyên çekan bûn. Mîna; şûr, rim, gurz, top û tivingan, şerekî zor germ, qurs, tund û tûj bû, ku guleyên tivengan û serên tîran li çaldêran têkelî hevûdin bibûn.

Nîgarmendî wêneyê tabloyê ji tabloyên din bêhtir têr û tijî resim kiriye. Li gorî tabloyê leşkerên osmanî li hêla rastê de ye û yên îraniyan hêla çepê, bi maneya li rojhelat û rojava li gor helkefta cografiya herdu dewletan. Di tabloyê de *şah Îsmaîl* li ber çadirekê kesk de, di navbera jina xwe û sinêlekî de rawestiya ye. Jina wî tase kulavê serî li serê wê û li hêla çepê ye û kurekî sinêle li hêla rastê ye. Cilên şah zer in û mêzera wî sipî ye, ew parçe qumaşê ku mêzer pê girêdayî sipî ye. Îşareta sor a şîiya sefewîyan li ser mêzerê bilind bûye. şah hêşta xort e û jiyê wî 37sal e şah û Sultan Selîm ji dûr bi kerb û kîn temaşey yek du dikin. Çadira kesk û zerê tarî ya osmaniyan bi bilindî li ser axa çaldêran hember çadira reng xenayî û çadira kesk ya îraniyan e. Jinek li ber derê çadira porteqalî de ye û yek jî li pişt bereyê kurdan tase kulavê şer di serî de ye û li wî şerî mêze dike. Dibe ku Sultan Selîm be. Herdu aliyên çadirê yên baregayên serokatiya wan li ser bilindiya kevirên çaldêran vedaye. Leşkerê (înkîşarê tirk) di nava hêzên osmaniyan de bi fês û Ewropayî bi şefqe û hêza ne nîzamî ya tirk bi mêzer in. Hêza kurd jî bi mêzerên xwe ve li nava hêza aliyê çepê bi (mîsre) tên nasîn. Herweha di qada şer de kurd têne dîtin, ku ji wan tîravêjek kurd guldsanekî dirêj li ser û kulavê wî ye, rimekê dadweşîne û tîrvanê îranî ji ber wî direve û şkestin ketiye nava îraniyan. Wêne, di derbarê cihê kurdan de bi giştî di gel wan agahiyên Nezmî Zadeyî dîroknivîs de rêk in ku li *Gilşin xelfa* rupelê, 185 de gotiye: “leşkerê Rumelî” bi maneya beşa Ewropa li Tirkiya û “leşkerê Amed” bi maneya leşkerê kurdan. Herdu hêz di vî şerî de di nava hêza çepê ya leşkerê Osmanî de bûn. Di tabloyê de wêneyê Sultan Selîm di cergê leşkerê osmanî de tê dîtin ku ebayekî reng porteqalî li ser kirasekî kesk de pûşiye, şelwarekî zer li pê ye û mêzereka sipî li ser daniye. Kulavê wî li ser destura osmaniyan di nîvê de hinek diyar e û du dar di kulav de bilind bûne. Sultan siwarê hespekî şînê

mezin e. Du kes karkirî li pêşiyê diçin. Sultanî rimek di dest da ye. Hêzên piyade bi tivengan çekdar in û nêzîk in. Top jî li pêşiyê ne. Ev jî di agahiyên Ehmed Rasim de di bergê yekem rûpelê 260an a heman çavik de êk digirin ku! Sultan di hêzeka înkîşarî di naverastê de bû. stuneke hiştira bi ereba ne. Li vir singê wan bû, yanî hiştirê top radikêşan. Lê wêneyê hiştirê resim nekiriye. Di tabloyê de şah Îsmaîl, ku serkêşiya aliyê rastê dikir, dikarî bû leşkerên osmanî li aliyê çepê ji hev belav bike. Lê osmaniyan topên xwe li aliyê rastê xir vekir bûn û zerbên mezin li leşkerê aliyê cepê xistin û şkandin. Waliyê herêma Amed *Mihemed Xan* kuştin. şah bixwe hat ku serkêşiya aliyê çepê bike û êrişeke bi hêz anî ser aliyê rastê yê leşkerê Osmaniyan. Lê topên osmaniyan derfeta serkevtinê neda şah. Top ji aliyê rastê yê tabloyê diyar in, bi erebe ne û zincîr pêve girêdayî ne. Serbaz ber bi leşkerên îranê pal didin. Herweha çend top jî di nîvê de amade dikin. Lê hêzên siwarên leşkerê îranî di hêrişeka giran de topên osmaniyan ji êk cude dikin û zincîrên wan qetandîne. şerkerên îraniyan di vê hêrişê de nêzîkî Sultan bûne. Siwarek fermandar di naverastê de diyar e. Weke di wê gulingê de eşkere ye; ya di nîvê kulav de bilind û bi şîr zincîrên topan qetandine û hewl dide bi hespê xwe ji sinorê topan derbas bibe û ber bi aliyê Sultan Selîm ve biçe. Ev derbirîn gelek bi hêz e di gel agahiyên di nava pirtûka *Mihemed Rewf Tewekilî* ya bi navê *Cografiya û tarîx bane –Kurdistan* rupelên 103-105an de hev digirin. Li gor van agahiyan *Sarubêreyê Baneyî* ku di nava hêzên leşkerê Şah Ismaîl de bû, bi birîndarî bi topên osmaniyan ku leşkerê wan têk çûbû. Em dikarin bêjin ew siwar fermandarê tabloyê *Sarubêre* ye

Sarubêre xortekî kurdê qahreman bû. Pêşiyê şah îsmaîl nav û dengên zîrekiya wî bihîstibû, kû mirovekî nêçîrvan bû. Piraniya jiyana xwe di gel çend hevalên xwe yên zîrek bi nêçîrê li çiyan derbas kiribû. Lewma şah dixwast wî bibîne. Dema dît jê daxwaz kir ku bikeve nav rêzên leşkerê wî û bibe fermanderekî bi navûdeng. Lê Sarubêre jê re dibêje pêwîstiya min bi te tine ye. Şah jê re dibêje pêwîstiya min bi te heye. Bi vê yekê razî bûn, ku ew û hevalên xwe bêne nav rêzên leşkerê şah. Di şer de sê fermandarên din digel Sarubêreyî serkêşiya leşkerî dikirin. Hêza taybet ya Sarubêreyî deh hezar leşker bûn. Piraniya wan kurdên lorî yên ji eşîrên Kakewend, Segewend, û Espawend bûn û çekê wanê serekî

di şer de darên mezin bûn, ku ji darberû û darên guz û ji darên din yên qaîm dirust kiribûn. Her darek bi giraniya gurza Sarubêreyî bû, ku ji şûrî tirsnaktir bû û gelek bi şarezayî di şer de bi kar dianî. Her kesê ku ev dar lê ketiba yekser dihat kuştin. Şerkerên Sarubêreyî di vî şerî de şûr, gurz û nêze bi kar dianîn. Hêza Sarubêre azatirîn û çalaktirîn hêza leşkerê şah bû. Sarubêre bi du hezar kesan xwe avêt nava qada şer û şiya rêzên leşkerê hêza *Îç Oglan* ji hêza înkîşara ya leşkerê Sultan Selîm têk bide. Sarubêrey bi destê rastê gurz girtibû bi destê çepê mertal. Demê şer germ dibû, mertalê xwe davêt. Serê gurza wî gelek mezin û giran bû. Çimkî (1/5)min bû û ji risas dirust kiribû. Bi yek gurz şerkerên osmaniyan dikuşt. Di wê demê de hêzên leşkerê Îç oglan kirin du parçe û ji nişkê ve tîrek li navçavên wî ket, wî bi dest derhêna aciz bû û zêdetir germ dibû û bi ser dûjmin de diçû û hêriş dikir.

Di wê demê de şah Îsmaîl çû cem wî û gotê: *"Sarubêre carê yekê min tu li bane dîtî, min zanîiibû ku fermanderekê mezin û aza dê ji te peydabe. Xwedê te biparêze dema min dît ku tîrek li nav çavên te ket, lê tu ji vê azatir bûyî, ku bi tîrekê giyanê xwe ji dest bidî. Ew tîr weke mêşekê bû li nav çavên te."* Hema ew Sarubêre hêrişeke tund bire ser topên Osmanî di ser vê yekê re tîrbarana hêzên osmanî karekî zor kire ser hêzên wî. Di wê dema ku gurzê xwe di destê xwe de bilin kiribû guletopeke mezin li destê wî ket û destê wî jêkir. Lê bi destê çepê gurzê xwe ji ser erdê hilgirt û dijwartir berhingarî topên wan bû. Topçiyên wan reviyan û topên xwe bi cîh hîştin. Êdî Sarubêrê dêw çerxê topên wan têkdan. Sarubêre nêzîkî Sultan Selîmî bibû. Ji ber ku wî di şerî de didît çawan bi azayane şer dikir. ji ber wê yekê gelek ket dilê Sultanî. Lê ew topçiyên revîn ji dûr ve Sarubêreyî dan ber tîran taku ket û xwneka zor ji laşê wî hat. Sultan Selîmî dizanî ku leşkerê wî dê serê wî jêkin û jê ra biben. Ji ber wê yekê weke rêzgirtin ji bo qaremaniya wî, fermandarek şand cem fermandarê topçiyan taku ji topçiyan ra bêje serê wî jê nekin.

Şerefxan jî di rupelê 257an de navê *Sarubêrê Qrçîbaşî* di nava fermandarên kuştî de nivîsiye. Guman têde nîne ku kuştina vî qaremanê kurd şkesteka mezin bi leşkerê şah Îsmaîlî de û bo egera şkestina wan. Du fermandarên din jî yên vê hêzê bi navê *Eslan* û *Emîr Ebdulbaqî* hatibûn kuştin. Bi tenê yek fermandar bi navê *Hesenbêg îlaî* mabû wî jî hizir dikir ku çareyekê bo vekşana

leşkerên xwe bibîne, bo yên sax mayîn. Ew bû ji meydana şerî vekşan û bi vî şêwey hêzên leşkerê îranê şikestin. Ev jî di tabloyekî de nîşan daye, ku topên osmaniyan çawan zirar bi hêza balê çepê yê leşkerê îraniyan dane. ev di gel wan agahderiyên *Ehmed Rasimî* de ew mebesta ku gotiye: *"Hêzên Mihemedxanê Îstaclo ji aliyê çepê leşkerê îranî hêriş bire ser balê rastê yê laskerê Osmaniyan. Lê Sînan Paşa şiya bi topan wê hêrişê ji nav bibe, bi başî li ser wan zal bibe."* Livir Mihemed xan û kurên wî hatin kuştin. Wesa diyar e ku ew zilamê birîndar bi herdu dastan milên hespê xwe girtin taku nekeve. Ew Mihemed xan e ku li tenişta wî jî kurekî sinêle ku tîr lê ketiye bi kûrî birîndar bûye û nêzîk e ku bikeve ser erdî ji ser pişta hespî şîn û ku guletopek li ranê hespî ketiye û ketiye ser erdî. Ew gulinga di milên hespî de, ji bo ciwaniyê Şerefxanî kiriye nîşana pila komelayetiya siwarî. Ev yek tê de diyar e ku kurên Mihemed xanî ku di gel wî hatibûn kuştin, yan di wê demê de dirust kiriye dema nêzîke bimire neku piştî mirna wî. Ku gelek caran resam wêneyê wan kesên navdar yên di haletê birîndariyê de resim kirine. Birastî kuştina Mihemed xanî, ku ji fermandarên herî mezin ên şah û waliyê Bakurê Kurdistanê bû bê hêzî û sistiyeke mezin bi balê çepê yê leşkerê îraniyan keft. Ew zirar jî osmaniyan bi topan li vê balê îraniyan de. Di tabloyê de bi hûrî resim kiriye. Piştî kuştina Mihemed xanî, şah bi xwe serkêşiya leşkerê balê çepê dike û di vê demê de şah birîndar dibe û ji hespê da kete xwarê. Piştî wê yekê ku leskerên *Înkişarî* ku di nîva leşkerê osmaniyan de bûn, hêrişî ser leşkerê îranî li balê çepê kirin û balê çepê yê leşkerê îranî jî û balê çepê yê leşkerê osmanî jî şiya rêzên balê rastê leşkerê şah ber bi paş bibin. Leşkerê îranî şkest û jina şahî bi êxsîrî hate girtin. Hêzên şahî ta wê demê jî her li kela Amed, Mêrdîn , Cizîr û kelên din yên Kurdistanê mabûn xwe nedan destên wan. Paşî nêzîkî du salan piştî şerî osmanî û kurdan bi zor û zehmet ev herêm pakij kirin.

Nîgarmendî, resmên piraniya topçiyên osmanî li vir resim kirine. Lê çekê agirdar weke top û tiveng di bereyê leşkerê îranî de çênekirine. Bi tenê wêneyê şûr, rim, gurz û tîran resim kiriye. Diyar e mebesta wî pê ew bû ku leşkerê îranî nîşan bide, ku çekên agirdar nebûn, çekê agirdar ên osmanî gelek bi hêz û gelek bûn. bitaybetî top ku du sed heb hebûn û ev egera şkestina îraniyan û serketina osmaniyan bû. Herweha pirçekiya osmaniyan bi çekên agirdan, egera serkî bû ji bo serketinê li ser misriyan. Ger çi şerkerên

îraniyan bi egera baweriya olî bi şahî azayane şer dikir weke fîdakaran. Ehmed Rasim gotiye: *"Hêzên siware şah îsmaîl zor bi hêz bûn xubextkirineka zor nîşan dan, Lê hêza agirdar ya bêhêz bû. Top jî nebûn hêzên piyade ne rêkûpêk bûn. Hêzên siwarên osmaniyan heştê hezar kes bûn, hêza peyade jî çil hezar bûn. herdu ji aliyê rêkxistinê ve bi rêkûpêk bûn."* Racer Sîwrî derbarê vê yekê gotiye: zirara îraniyan gelek bû, bitaybetî gelek ji fermandar û mirovên navdar hatin kuştin. Ji hêzên leşkerên osmaniyan jî jimara wan zor bûn. Piraniya siwarên osmaniyan ji siwarên înkîşarî, mekedonî, sirbî û yên din ji nav çûn. Taku Sultan Selîm ew hemû kuştar bînî bîr li vekşan û helhatinê kir. Lê Sînan paşa ferman da topa berztir bavêjin û ew jî bêhtir bo egera tirsandina hespên leşkerê îranî û revîna wan. çunke pêştir dengê topagulê nebû, êdî swar neşiyan hespên xwe rabigrin û zep nedibûn. şaşiya mezin ya şah îsmaîlî ew bû; ku rê da leşkerê Sultan Selîmî ji Edirne bigîhîjine nêzîkê Tewrêz a paytexta wî. Dikari bû li wîlayeta Amed yan navçeya Erzingan û Dêrsimê pêşiya wî leşkerî bigre. Pêşniyarên *Mihemed xan îstaclo* û *Nur Elî Xelîfeyî* herdu fermandarên herî mezinên xwe red kir ku daxwaz kirin rê nede leşkerên osmanî ber bi îranê bên. Û gotina *Durmîşxanê şamlo* li ber çavgirt ku pêşniyarên wan du fermandaran ret bike. Di wê demê de ku li Enadolê gelek alîgirên wan hebûn. Êdî şah pîs şkest û Tewrêza paytext dagir kir, ger çî sultanî jî Tewrêz bi cih hîşt û li Enedolê vegeriya û xwast bitenê Kurdistanê di destên xwe de bihêle. şah di encama vê şkestinê de moralê wî têk çû. şiyanên bi rêvebirina kar û barê dewletê neman karê birêvebirnê da destê zilamên xwe taku li sala 1524 z, di jiyê 37 salî de mir. Hin dîroknivîs berî binemala Sefewîyan wek kurd dinivîsin.

Şerefxan derbarê vî şerî di şerefnamê de bi dirêjî behs nekiriye. Belku bi tenê di tabloyan de resim kiriye. Weku ew dîroknivîs di zanyariyên xwe de behs dikin û weke di pêşiyê de me got, nîgarmendê vî tabloyê her dibe dîroknivîs be û zanyariyekê baş, rast û reyalîtî li ser vî şerî hebûye. Ci li ser şêweyê hêz û dabeşkirinê di qada şer da û çi li ser kar, ger û bê hêziya çekê herdu aliyan. Ev jî belgeyeke ku nîgarmendê vî tabloyê Şerefxan bixwe ye .herweha Ewliya Çelebî dibêje; Ebdalxan ji bilî ku di piraniya pîşeyên xweda xwedî şiyan bû, di wênekêşî û xetxoşiyê jî de wedî

şiyanên hunerî bû.[34]

Divê lêkolînê de ger em çend tabloyên Şerefxanî pêçav bikîn, wê ji bo me hind rastiyên din derkevin. Weke tabloya 14-18-20 an. Divan tabloyan de şêwekî Abstrak têda tê xweyakirin, di heman demê de bi alîkariya hêl û fîgoran buşatiya tabloyî pir dike, divan tabloyan de rengê spî zale li ser ruberê giştî yê tabloyan, di hind kojan da rengê sorê gerim û mirov û hind hesp birengê şînê asmanî yê sar reng kirîne ev jî tê wê wateyê ku Şerefxanî taybetmendiyek di rengan da hebûye, herweha hind rengên zêrî ser bi zerîve weke rengên bîzetniyan di tabloyên xweda bikaranîne mîna tabloya 16. "Şah Tehmasb li bajarê Xelatê û tabloyê 15 an "Meclisa Şerefxanê Bidlîsî".Ev jî azadiyeke li ba hunermendî ku xwe ji rengên busilmantiyê rzgar kirî, ku rengên bîzentiyan û kristiyana bikaranîne, ger em bigiştî li tabloyên Şerefnamê binêrîn çawa endazyarî têda bikarhatiye, weke lakêşe ji bo dîwar û derî û penceran, çwarguşe ji bo heman perçeyan, kvan û sêguşe ji bo hawsengiya tabloyî. Ev yeke bîrame tîne hunera Kandinsky û Monderyan î. Bizava tîr û boq û balnda û mirovan digel pilingê li jêriya tabloyê jimare -1-"Nêçîra li Hekariyê, çawan wî azadî daye van bizavan di tabloyî daû tablo pirkiriye ji peywendiya hêlan bihevre. Ji aliyê din yeksaniyek bi alîkariya hêl û rengan di fîguran de bikaranîye. Mirov xweza û giyanewer bihevre girêdane, rengên xerîb weke pîvazî yê ser bispîve digel rengê zêrî ser bi zerî ve ruberê giştî yê tabloyî dapoşiye. Bikaranîna daran di tabloya 13 an de"Nexweşiya Demargiriyê". Di vê tabloyê da bawgrandekî spiî bikarhatiye dar û pelên dara baş têne xweyakirin, di navendê da lakêşeyek heye gulek li paşiya bawgrandî heye derdura lakêşeyê bi hêleka sor wênekiriye, ev jî yeksaniya tabloyî di şêwên endazeyî û rengada pêk tîne. Ji aliyekî dinve mirovek nîva wî derketiya bi rengê sore razana nexweşî li ser şemlka lakêşe berwar û ji çarçuveya tabloy derketiye, evjî stîla hunerî ya Şerefxanî bû. Tabloya 12 an " Hîzan", di bawgrandekî keskda dar û pelên dara digel ruberê kesk hevdû tamam diken çuna swaran digel hespan û bizav û xebata cutkarî liber darê ji bo yek aliye, nêrîna wê jina di pencerêda xweya dike  ji bo heman alî diçe. Di tabloya 16 an de ,

(34) Ewlya Çelebî.siyahetname rûp 123.wergêra kurdî .Seîd Nakam.çapa Bexda 1979

her tişt berev asmanî ye li ser şêweyekî estunî mirov û komkên di serî de berz bûne mase û qomaan de, lakêşe û kojên digel stuna hemû berev asmanî berz bûne.ev jî ji bawerî û hestên hunermendî tê.bi vî awayî mirov dikare bêje Şerefxan xwedî ên hunerekî serkeftî bûye û weke hunermendê yekem di dîroka gelê kurd da tê naskirin.

# Destpêka Sedsala Bîstan

Li vir ez dixwazim li gorî wan jêder û pêzanînên ketin ber destê me, hin tîrojkan bêxin ser hunera şêwekarî yê kurd. Dibe ku li ser hemû parçeyên Kurdistanê zanyariyên me nebin. Ji ber çend egeran me nikarî kur xwe dahêlin hemû qulaçan. Lê di gel wê yekê me karî perdê li ser çend tiştên veşartî hildin û rastiya vê yekê bidin ber çav. Li ser vê yekê weke dîroka hunera şêwekarî me li ser parçeyên Kurdistanê dabeşkirine.

## Başurê Kurdistanê

Her weke tê zanîn ku beşekî Kurdistan, di dawiya şerê çaldêran li sala 1514an z. de, kete jêr fermandariya impratoriya osmanî û beşekê din, kete jêr destê împiratoriya sefewî îranî. Roj bi roj di navbera wan de nexweşî çêbûn û kurd jî di nava wan nexweşiyan de bûn û li wê demê kurd di navbera du dîrokan de dijiyan. Kurdên başur, beşek bûn ser bi wîlayeta Musil, ku yek ji sê wîlayetên Îrakê yên dewleta osmanî bû. Di vê demê de beşek ji şaîr, nivîskar û rewşinbîran ji bo xwandinê ber bi *Estaneyê* ve (Stenbol) çûn, ku bi drêjiya hukmê osmaniyan Stenbol bibû warê edeb, huner, rewşenbîrî, hêz û desthelatdariyê. Ev bajar girêdayê ferhenga çand û karîgiriya Ewropa û di astekî pêşketinê de bû, li gor herêmên din. Hin kes jî ji bo xwendina serbaziyê diçûn li *Zanîngeha Erkana şerî* dixwendin. Di gel xwendina leşkerî, waneyên hunera nîgarsaziyê jî fêr dibûn. Dema vê zanîngehê bi dawî diînin bi pileya efserî der diçûn. Li vir ew kesên ku ji Îrakê çûbûn fêrî hunera nîgarmendiyê bûn. Ji wan gelek hunermendên pêşeng û serkêşên hunera şêwekarî li Îrakê bûn efser di nav artêşa osmanî de. Wan xwendina xwe li vê zanîngehê temam kir bûn. Bi giştî xwendina xwe ya hunerî digel ya leşkerî dixwendin. Piştî têkçûna Dewleta Osmanî di şerê cîhanê yê yekem de û parce parce bûn û dabeşbûna împeratoriya wan ji aliyê

Ingilîz û Firensa ve, piraniya wan kesên li wir jiyan vegeryan Îraqê û li Bexdayê binecîh bûn. Ji wan: *Ebdulqadir resam, Asim Hafiz, Hac Mihemed Selîm, Eta Sebrî, Mihemed Salih Zekî ûwd...* (35) Van kesan bingehekî hunerî li Îrakî danîn û pêşdeçûna hunera şêwakarî bi destê van hunermendan pêş de çû. Hunermendên kurd jî, her ji destpêka Sedsala Bîstan nîgarmend hebûn.

Li gorî hin çavikan tê zanîn ku pêşengê hunera şêwekarî li Îraqê hunermendekî kurd bû û ji xelkê Silêmaniyê, navê wî *Osman Beg* bû. *Dr.Selsel Elani* dibêje: *"Di destpêka sedsala bîstan de, li bajarê Silêmaniyê,* ***Osman Beg*** *bi navê nîgarkêşiyê binavûdeng bibû. Diçû nava Guristana bajarî û resim çêdikirin. Resmên wan jinan dirust dikir, ew ên di nava guristanê de li nav giyayî rudiniştin. Ev rewş li cem civaka kurd bi tiştekî kêm û ne baş dihate zanîn. Jinan li her cîhê behs dikir. Lê heta niha hîç tabloyekî wî neketiye ber destê me."* (36) Dîsan di derbarê vî hunermend û nîgarmendî de nivîskarê Felistînî *Cebra Îbrahîm Cebra* dibêje: *"Di goristaneke Silêmaniyê de li destpêka vê sedsalê efserek hebû navê wî* ***Osman Beg*** *bû. Resmê wan jinên li ser guristanê resim kiriye, ew jinên gul û keskayî li derdora wan de. Lê hîç tablo ji wan nemane. Lê bîreweriyên wî hunermendî her mane."* Heta niha hîç lêkolîn û nivîs derbarê vî hunermendî di rojname û kovarên kurdî nehatine nivîsandin. Bi tenê ev du kurte agahdarî li ser hatine dayîn. Dibe ku tabloyên vî hunermendî mabin lê taniha kes lê xwedî derneketiye.(37) Dibe ku ev hunermend xwedî ezmûneke mezin ya hunerî be li ser bingehekî akademîk ..! Herweha ev yek, di wê demê de zîrekî û wêrekiya vî hunermendî nîşan dide, ku li wê demê şiyayî di nava civakekî bi vî cureyî de resmên jiyana rojane resim bike. Dîsa di nava civakekî dîndar de bişê rojên Înî biçe nava goristanê û resim çêbike..! Wesa tê zanîn ku resmên wî bi rejoyê û rengan resim dikir. Dibe ku ev hunermend efser be di leşkerê osmanî de ku di dema xwede di zanîngeha erkanî li Stenbol xwendibe. Dîsa dibe ku ev hunermend dûr ketibe ji bajarê Silêmaniyê û ber bi Bexde, Îran, yan jî Turkiyayê ve çûbe û navê Osman Beg jî li ser xwe rakiribe û guheribe. Ji ber xelkê wê demê

---

(35) Şakir Hasenal seîd- Fisul mîn tarîx al hereke al teşkîliye al îraqîye..Bexde1983

(36) Ferhad pîr bal- Kovara raman jimare 29 rûp.142. nûsîneweî mêjoî resmî kurdistan.

(37) Burhan Hejar.kovara kurdistî Îmro.rû.59.jimare13.2001

revîbe û dijatiya wî hatibe kirin û nekarîbe berdewamiyê bi hunera xwe bide.

Di dîroka gelê kurd de gelek karesatên bi vî rengî bi serê hunermend û kesanên din hatiye. Dibe ev hunermend li ser neteweka din li qelem dabe û haya me jê nebe. Cûnkî mînakên bi vî şêweyê pir in ji wan; *Asim Ebdulhafiz, Eta Sebrî, Mihemed Salih Zeki, Ekrem şukrî ûwd.*. ev hunermendine bi serkêşiya hunermandên Îraqê li qelem diden. Ev jî girêdayê çend egeran e, ku kurd ne xwedî keyanekî siyasî ne bişên li bingehên kulturî xwedî derkevin û muzexaneya vekin daku berhemên hunermendên xwe têde biparêzin û weke mulkê gelê kurd destnîşan bikin.

# Qonaxa destpêka salên di navbera herdu şerên cîhanê de

Weke li pêşiyê me got; heta niha çi jêderên zanistî li ser dîroka berhemên hunerî neketne berdestên me dbe di nava van şeran de hatibin winda kirin yan ji nav birin. li van salên dawî hin nivîs hatin nivîsandin. Lê ew jî herêmî mane û ji çarçuveya parçeyeke Kurdistanê derbas nebûne. Jêderên kurdî yên şêwekarî nebûne, daku em bişên weke jêder giringiyê bidinê. Lewma dibe Jiber nebûna bingehekî netewî kurd neşyane xwe ji vê herêmgeriyê biparêzin. Herçende dibe ku peydabûna hin bingehên netewî, ji bo cara yekê *Hikumata Melekî* di serokatiya *Şêx Mehmodê Hefîd* de li sala 1919an ku li başurê Kurdistanê li Silêmaniyê hate damezrandin û ronahiyek bû ji bo pêşdaçûn û parastina kultur û bingehên civakî yên kurdî. Geşbûnek bû ber bi hesta netewî li cem kesê kurd. Lê mixabin jiyê wê Hikumatê kin bû. Li dawiya şerê *Derbendî baziyan* ji aliyê hêzên dagirkerê înglîz ve bi dawî hat. Başûrê Kurdistanê hata girêdan bi hikumata ereb a Îrakê ve. Di wê demê de gelek nivîskar, şaîr û rewşenbîrên kurd ji Stenbol vegerane Kurdistanê. Berdewam bûn li ser kar û xebatên hunerî û rewşenbîrî ji bo hişyarkirina hizra netewî li cem mirovên kurd. Bitaybet pştî derketina çendîn rojname û kovarên kurdî. Ev jî weke hişyarbûnekê bû, bitaybet ji beşdarbûna rewşenbîrê kurd ji aliyê şîr û edebiyatê ve. Ev jî pêngavekî giring bû di wê demê de. Lê ev yek ji aliyê hunermendê kurd ve peyda nebû û rolê xwe nelîst. Bi tenê çend hewldan ji aliyê dîroknivêsê kurd *Husên Hiznî Mukriyanî* û *Şêx Nurî Şêx salihê şaîr* ve, li ser hunerî hatin nivîsîn. Bitaybetî hunerê nîgarmendî di hin rojname û kuvaran de hatibûn nivîsandin. Hin hunermendên kurd derketin bitaybet li bajarê Hewlêrê weke hunermend *Cabr Pîr Dawd* ku peykertaş bû di salên çilan de. Di hevpeyvînekê de dibêje: *"Li bîra min e ku jiyê min 6 sal bûn. Hunermendekî Ermen xwe xendiqand di geraceka Hewlêrê de bi werîsî. Ev hunermende weke penaberekî hatibû Hewlêr resim çêdkirin û difiroştin û bi vî pereyî dijiya. Danyalê hunermend jî li*

*bin bandora wî bû hunermend."* (38)

Herweha di nivîsekê din de dibêje: "*dîsa li destpêka sedsala bîstan nîgarmendekî din li Hewlêrê karên hunerî kirine bi navê* Isaq Hewlêrî. *Lê heta niha berhemên hunera vî hunermendî neketine ber destê me*



**Tabloyê Slêman Şakir-Hewlêr**

*Dibe berhemên vî jî nehatibin parastin weke berhemên* Osman Beg *ew jî ji nav çûbin. Vî hunermendî di gel wî hunermendê ku xwe kuştî li Hewlêr, têkeliyek hebû. Dibe ku ev jî her Ermen be. Yan jî fele be."* Di nivîsekê de hunermend Slêman Şakir dibêje: *"Di salên sîhan de hunermendek hat Hewlêr ku navê wî* Cîhangîr *bû, kurdekî kuçber bû di odeyeke geraca* Celal Ebdo *de dijiya. Vî hunermendî li wir dîmenên siruşta Kurdistanê, jiyana kurdewarî û reklamên otomobîlan resim dikirin. Di vê demê de resim, hîn cihê xwe negirtibû di nava civakê de. Lê resmên wî ji hêla gel ve dihatin qebûlkirin. Kartêkirên li ser civakê hebû û gelek hunermend ketin bin bandora wî û dest dan resmî. Lê mixabin jiber zextî û bêzariya jiyana wî ew nekarî jiyana xwe berdewam bike. Li dawiyê di odeya xwe de xwe kuşt."* (39) Ev hunermende ji Kurdistana rojhelat hatibû Hewlêrê. Lê jiber jiyana xwe ya taybet xwe kuşt. Dibe ku ev, ew hunermendê Ermen be, ew ê xwe kuştî. Ev jî pêwîstî bi lêkolînê ye daku rastiya dîrokî ya van hunermendan bê eşkere kirin.

Piştî van hunermendan her li Hewlêrê hunermendekî din tê qade

---

(38) Cabir pîrbal- Kovara raman jimare18.1997.

(39) Ferhad pîrbal -Kovara raman jimare 29..le pênawî nûsînî hunerî resen.

hunera nîgarmendiyê. Ew jî, *Danyal Qesab* e. Ev hunermend kurdekî cihû ye. Di salên pênciyan de piştî damezrandina dewleta Israîlî vegeriya Felistînê. Ev û sê brayên ji wî biçuktir bûn. Ew jî her resam bûn bi navê; *Munîr, Nahum* û *Şahum.* Ev hunermendne jî pir bi nav û bang bûn. Heta niha jî çendîn berhemên wan ên hunerî mane. Di salên çilan de beşderî di pêşangeha *Hevalên Hunerî* li Bexde kirine û di gel hunermendên Îraqî yên bi nav û deng weke; *Faîk Hesen, Cwad Selîm, Eta Sebrî* û *Hafiz Derubî* pêşangeh vekirine. Ev hunermende kartêkirineke mezin dikin ser bizava şêwekarî ya kurdî û resamên kurd û fêrkirin û perwerdekirina hunermendan. Babetên tabloyên wî pêkhatine ji, babetên reyalistî, ku dîmenên rojane û jiyana komelayetî, kar û saxletên kurdewarî ku bi şêweyekî pir huneriyane resim dikirin daku bala hemû kesan bikşîne. Ji aliyê ciwanî û fîgûr û rengan ve pir bi zanistî kar kiriye. Ev hunermend, li Hewlêrê rola mamosta û rêberekî meydana şêwekaryê dibîne. Di perwerdekirina cîlekî hunermendan de weke serkêşekî cihê xwe di nava civaka kurd de kiriye. Berhemên wî yên hunerî jiyana kurdewariyê ji hemû aliyan ve hildaye nava xwe. Lewma di nava civakê de xwşewîst bû, ji ber ku çrayê hunerî geş kiriye û çendîn berhemên wî yên hunerî li Hewlêr û li Muzexaneya Nîştîmanî li Bexde heta niha mane û hatine parastin. Ev hunermende şiya dîrokeka zêrîn di nava gelê kurd de bi berhemên xwe yên hunerî binexşînê. Lê mixabin piştî salên pênciyan deng û basên vî hunermendî neman. Lê niha jî jiyana xwe ya hunerî berdewam dike li Felistînê. Hin dibêjin ber bi Ewropa ve çûye û di van salên dawî de vegerya bû başurê Kurdistanê. Lê careke din ji wir vegeryaye.

Herweha li bajarê Slêmaniyê çendîn hunermend diyarbûn û şiyan xebata hunerî berdewam bikin weke; *Hesen Felah (1910-1976)*, *Mihemed şewqî* û *Ezîz Selîm (1917- )* Herçende Mihemed şewqî bêhtir hunera karîkatur resim dikir. Lê Hesen Felah û Ezîz Selîm weke du hunermendên aşiqên vê meydanê û kultura kurdî bûn Bi berdewamî xebata xwe pêk anîn. Hunera wan weke findeke hunera kurdî ber bi geşbûnê ve dibir û rê li pêşiya gelek hunermendên din vekir, Ew eşqa di dilê wan de roj bi roj geştir dibû. Berhemên xwe yên hunerî di xizmeta netewa xwe de diafirandin. Rudan, karûbarên kurdewarî û rewşa gelê kurd dikirin

babetên tabloyên xwe. Piraniya tabloyên wan bi dîwarên çayxane, hemam, mal û bazaran ve ye. Bi rengên zeytî û bi rejoyê çend tabloyên Hesen Felahî ku resim kirine babetên reyalîteya wî serdemî bûn. Weke; *şerê Derbendî Baziyan,* (şerê şêx Mehmodî li hember Îngilîzan) *Mem û Zîn, Kuçberiya Xêlkên Caf* û çendîn dîmenên din yên derbirînê ji rudenên rojane dikin. Di vê demê de hêşta huner di civaka kurdî de cîh negirti bû. Lê van hunermendane viyana hunerî bi rudanên girêdayê rewşa siyasî û civakî ya gelê kurd ve girêdan. Ev jî bû destpêkek ji bo hişyarbûna gelê kurd. Ev destpêk weke karwanê serekî yê hunera kurdî tê hijmartin.



**Tabloya Ezîz Selîm**

Herweha *Ezîz Selîm* bi rihekî vekirî hunera xwe girêda bi civaka kurdî ve. Li ser şêweyekî klasîk kar dikir. Bêhtir viyana gel. Hesen Felah gelek pêşangehên taybet vekirine û karên xwe yên hunerî pêşkêş kirine. Piştî li gelek welatên din geriyan û ezmûnên huneran gelên din dîtîn, bêhtir şyan hunera xwe ber bi pêş de bibin. Bitaybet *Ezîz Selîm* ku çûbû Bexda, Îran, Azerbêcan, Turkiya û Ewropayê ûwd.., têkel bûn bi hunermendên biyanî. Nasîna hunera biyanî bûne egerên pêşdaçuna wan. Ev yek bû egera têkelbûna hunera wan bi gel ra. Mîna yek parçe jêk cuda nebûn. Li ser vê yekê *Sîdnî Finkliştin* dibêje: *"Huner amadekirina jîna hevbeş e û têkelê civak û gel dibe. Huner her tim kar dike li ser jiyana gel û dibe beşek ji*

*perwerdebûna civakê.”.*[40] Vî hunermendî ji çi xwendingeh û cihên hunerî nexwendîye Tenê viyana wî ya hunerî bibû palderê geşbûna çrîska hunera wî. Herçende di karên hunermend *Hesen Felahî* de ber bi hunerekî akademîk, rengdaneke zanistî û bi hêz xweya nabe jî, lê di babet û rengdana reyalîteya gelê kurd de weke seretayek pir giring bû. Lê heke em li tabloyên *Ezîz Selîmî* binêrîn, ji stîla klasîk û rengên siruştê Kurdistanê û rengên kurdewarî û babetên weke dastanên kurdî, çîrokên eşq û evînê û resimkirina ajalan, hesp, pez û jiyana cutkaran bi şêweyekî eşkere resim kiriye. Hin caran jî resmên mirovên navdarên kurd û şêweyê fotografî resim dikirin. Ev hunermendne gelek caran ketîne ber nexwşî, lêdan, tirs û gefan ji aliyê mirovên kevneperês, dîndar û fewdalan. Gelek caran weke mirovên “kafir” û “bê Ol” didane nasandin. Li ser van hemû nexwşiyan ra *Ezîz Selîm* şiya berdewamiyê bi hunera xwe bide û bigehîne îro. Tabloyên wî di gelek muzexaneyan de çîh girtine. Herweha piştî van hunermendan çendîn hunermendên din di meydena hunerî de serî hilden weke, *Îbrahîm Xelîl* li Tûz Xirmatu, *Faruq Ebdulezîz* li Bexda, *Sidîq Ehmed Aşur* li Musil ji dayik bûye. Li sala 1913an li Kerkuk dijiya. Ev hunermendne piraniya babetên wan li ser siruştê Kurdistan û jiyana gelê kurd bûn. Piştî têkelî bi hunermendên ereb re danîn, gelek pêşangehên hevbeş li Kerkuk, Bexda û Musil vekirin.

Her li dawiya şerê çîhanê yê duyem, hunermendekê din li Bexda bi navê *Jemal Ferec Basat* derdikeve. Ew endaziyar bû û hunera şêwekarî bi kar dianî. Lawekî xwîn germ bû lê mixabin di jiyê xortaniyê de jiyana xwe ji dest da, ne karî karwanê hunera xwe ber bi dawî bibe. Ev hunermende li ser hunera nûxazî kar dikir û berhemekî xwrt û baş li paş xwe hişt. Vî hunermendî di gel hunermendên navdarên nûxazê Iraqî *Cewad Selîm* û *Faîk Hesenî* kar kiriye. Hunermend *Azad Şewqî* dibêje: *“Nîgarmendekî file ku ji xelkê Hewlêrê bû. li Bexdayê dijiya û di salên çlan de jiyana xwe ji dest da. Ji bo bîreweriya mirina wî,* Faîk Hesen, Îsmaîl Şêxlî, û Cewad Selîmî *pêşangehek vekiribûn, ku di vê pêşangehê de gelek*

(40) Mocahîd abdulmuhe-Al waqiîye wel fen.Seîdni.wergêr imen.qahîre.1971.rûp.27

*tablo li ser bajarê Hewlêrê û jiyana gelê kurd bûn."*[41]

Herweha di salên dawiya şerê cîhanî yê duyem û destpêka damezrandina *Komara Kurdistan.* (Komara Mehabad) Li bajarê Slêmaniyê hunermendekî çalak û xwedî şiyan derket. Ew jî *Jemal Hamdî Esed* bû, nasrawe bi navê *Jemal Bextiyar* ku digel hunermend *Ezîz Selîmî* di komara Mehabad de karên hunerî kirine bi şêweyekî riyalîstî ku girêday rudanên rojane bûn. Dîmenên Folklorî û resmên jinên navdarên kurd çêkirine. Herçende her yekî ji van hunermendan bi şêweyekî taybet ku girêdayê cîhana wan a taybet bû, karê xwe yê hunerî dikir bi şêwê klasîk. Lê ji ber hemdemiya wan û babetên hevbeş, hin tiştên hevbeş di kirên wan de hebûn. Dîsa her di vê demê da peykertaşekî din derket binavê *Şêx Jemal Şêx Osmanê Duru.* Vî hunermendî rolekî giring di meydana peykersazîda lîst û rê li hin hunermendên din vekir. Ji ber ku ev hunermende ji malbateke bi nav û deng bû. Malbata wî dîndar bû û girêdayê rêya *Neqşebendî* bûn. Lê bi hizreke pêşketî ev rê dimeşand.

Herweha li hewlêrê gelek hunermendên ku li ber destê *Denyal Qesab* xwendibûn, rolekî mezin lîstin di nîgarmendiyê de. Weke; *Cabir Pîrdewid; Cewad û Fuad Resul Najî*. Ev hunermendne weke qonaxa di navbera şerê cîhanî yê yekem û duem da tên hijmartin û di meydana hunera şêwekarî de rolekî pozetîf lîstine.

Herweha di salên dawiya çilan da hunermendekî navdar derket, bi navê *Bedîi Babacan.* Li sala 1923an li bajarê Kerkukê ji dayik bûye. Li destpêkê hin wêneyên weke motîv, ji bo kovar û rojnameyan resim dikirin, bitaybet *Kovara Gelawêj (*1939-1949an). Yekem şagirdê kurd e, ku li *Peymangeha Hunera Ciwan li Bexda* tê wergirtn. Li sala 1951an xwendina xwe bi dawî tîne. Vî hunermendî xizmetek mezin kiriye, di resimkirina wêneyên helbestvanên kilasîkên kurd de. Bi destên xwe yên zêrîn ew helbestvan weke xeyal resim kirine. Yek ji wan resmên rengîn, resmê *Şerefxanê Bedlîsî* ye.

(41) Ferhad pîrbal- Kovara raman jimare29.1998..



**Tabloy Bedîi Babacan-Kerkok"wêneî Şerefxanî Bidlîsî"**

Bi şêweyekî ciwan û xeyaleke kûr û şarezayeke dîrokî dest daye karê xwe yê hunerî. *Dr. Maruf Xezneder* dibêje: *"Nav û dengên vî resamî di salên pênciyan da belav bibû. Di kovarên kurdî de li ser nivîsîn, bitaybet kovara Gelawêj."*

Dîsa piştî resimkirina çend şayîrên kevn ên kurd, herkesî ev hunermende nas kir. Bi taybetî bi wan resmên di pirtûka Dîroka Edebiyata Kurdî ya Eladîn Sucadî de.(42)

Vî hunermendî berdewamî da rêbaza xwe ya hunerî û weke hunermendekî zana û bi şêweyê zanistiya hunera xwe meşand heta dawiya jiyana xwe...hunermend Sedîk Ahmed Aşur yek bû ji damezrênerên bizava şêwekarî li Kerkokê , ev hunermende sala 1915 li Musil jidayk bibû hevalê herî nizîkî hunermend Azad Şewqî bû, deh tabloyên wî li Muzexana Bexda hatîne parastin.(43) Vî hunermendî digel Dr. Sinan Seîd û Mehmud Al Ubeydî yekem komela hunerî li kerkokê damezrand li sala 1953 her di heman salê da pêşangeheke hawbeş li kerkukê vekir. Di sala 1955 Ahmed Aşur bo endamê komela hunermendên Iraqê hunermenê Iraqî yê navder

---

(42) Dr.Maruf Xezneder- Kovara raman jimare 29 1998.Bedîi baba can û hûner..rûp.129.
(43) methef Al fenanîn al rwad, menşorat deiret al fnwn al tşkîlîye Bexded

Şakir Hesen Al Seiîd gelek gringî dida karên vî hunermendî herweha hunermendekî din binavê Mehemed Mehdî di sala 1954 de bo endamê komela hunermendên Kerkukê hunermendekî din ji Çemçemal di sala 1954 de bo endamê komela hunermendên Kerkuk binavê Abdula Amîn , paşan hunermenê navdar Eta Sebrî li sala 1913 li Kerkukê ji dayk bûye paşan li Roma xandina xwe bi dawî aniye yeke ji damezrênerên komela Bexdadî ya hûnerê nûdem. Gelek caran seredana Kurdistanê kirye û tabloyên xwe li ser rewşa civakî û dîmenên kurdistanê çêkirîne.(44)

Azad Şewqî dibêje: hunermendekî din hebû kurd bû binavê Nurî Mostefa Behcet û jina wî jî kurd bû li kerkukê dijiya û wî ruleke giring hebûye di bizava şêwekarîya kerkukê de bitaybeta dinavbera salên 1930-1960. herweha çendîn hunermendên din derketin di meydana hûnerê şêwekariyê kurdî de li Kerkukê weke Ednan Baba Can, Fexrî Celal, Ab dulrezaq Şîxar û Haşim Ismaîl.(45) herweha Izedîn Sindoq yek bû ji hunermendên navdarên Kerkukê. hunermend Şaker Hesen Al Seîd dibêje: hindek ji hunermendên kerkukê endamên komela hevalên hunerî bûn li bexda mîna Izedîn Sindoq ku di sala 1948 de beşdariya pêşangeha kirbû, herweha hunermend Mehmud Al Ubeydî û Sidîq Ahmed Aşur endamên komela hunermendên Kerkuk bûn bûne endamên Komela hunermendên Iraqî.(46)

(44) Şakir Hesen Al Seîd fsul mîn tarîx al hereke al teşkîlîye fî al Iraq rûp 198
(45) Dr. Ferhad Pîrbal tarîx al fen alteşkîlî fî Kerkok malperat herweha Izedîn Sindoq yek bû ji hunermendên navderên Kerkukê tirej.net
(46) Dr.Ferhad Pîr dewid tirej.net

# Bizava hemdem ya şêwekariyêli başurê Kurdistanê

Piştî şerê cîhanî yê duyem, hunermendên Îraqî bi şêweyekî giştî û hunermendên kurd bi şêweyekî taybetî di çarçuveyeke tesk de huneran xwe pêk anîn. Ev pêk anîn; girêdana hunermendî bi naverokê ve, yan giringî nedana ruxsarî di tabloyê de bû. Ev jî dibe egera wê yekê ku piraniya tabloyan şêweyên eşkere û babetên ku zû bêne famkirin hatin bikaranîn. Ev bû egera wê yekê ku şêweyên poster yan serhatiyan bo me vegerin hin aliyên hunerî, ji dest dabûn. Sedemên vê yekê jî mirov dikare li ser çend xalan dest nîşan bike: **Yekem:** Jiber nebûna bingehekî xûrt yê dîroka hunera şêwekarî û nebûna hin xwendingeh û rêbazên taybet ku hunermend bikare ji xwe re bike bingeh û şêweyekî zanstî hunera xwe pêk bîne. **Duyem:** Girêdana hunermendî bi naverokê ve bêhtir bi ruxsarî yan şiklî ji ber bûyerên rojane diqewimîn. Hunermend pal dide wê yekê ku bînerî yan jî gel razî bike bi babetên tabloyên xwe. Ev jî di bo sedema wê yekê ku hunermend nikarî bû ji xwe re stîleke taybet hilbijêre. Vê yekê jî du dilî li cem hunermendî peyda dikir û ji ruyê derve yê tabloyê hatibû dûrketin. S**êyem:** nebûna cemawerê hunera şêwekarî bi şêweyekî giştî û nebûna rexne û lêkolînên hunerî li ser xebatên hunermendan. Herweha nebûna têkeliya hunermendên me di gel hunermendên cîhanî, bitaybetî yên ewropî. Nebûna meteryalên pêwîst ji bo kar û xebatên hunerî. Li vir bi tenê em dikarin hin komeleyan dest nîşan bikin, yên di Îraqê de hatine damezrandin. Ev komeleyan ji aliyê çend hunermendên navdar weke bingehekî ji bo hunermenden bi giştî bibûne xwendingehek lê berdewam nebûn mîna van komeleyên şêwekarî.

Sala 1950 an *Komeleya Rwad.*[47] li ser destê hunermend *Faîq*

---

(47) Adil Kamil- Al hereke al teşkîliye al îraqî..1979.rûp.36

*Hesen* û *Îsmaîl şêxlî* hate damezrandin. Lê piştî demekî Faîq Hesen xwe vekşand, ji ber ku hin kesên din bûne endamên vê komeleyê, şert û mercên wan di komelê da pêk nedhatin. Li sala 1951an *Komela Bexda ya Hunera Nû* ji aliyê hunermendên mezin *Cewad Selîm, Qhtan Ewnî, Lorna Selîm, Şakir Hesen, Nizar Selîm, Muhemed Alhusnî* ve hate damezrandin. Vê komelê rolekî mezin hebû di pêşdabirina hûnerê şêwekarî li Îraqê da bi şêweyekî giştî. Ji ber ku armancekî taybetî di daxûyaniya damezrandinê de destnîşan kiribû. Ew armanc jî ew bû ku şêwe, motîv û kultura Mezopotamiya li ser şêwe û rêbazên hunera nû ya ewropî pêk bînin. Ev jî tiştekî nû bû. Ji ber ku girêdana kultura rojhelat li ser şêweyên nû yên ewropî mîna xwendingehekê di nava hunermendên Îraqî da bi giştî belav bû. Herweha di sala 1953an de *Komeleya Impressionizm* hate damezrandin ji aliyê; *Hafz Drubî, Elai Beşîr, Ziyai Alazawî û Seidî Alkeibî* ve. Van hunermendan jî digotin; Împressionizma ewropî, ji rojhelata navîn hunera xwe wergirt dema li parîsê derketiye holê. çima em bi xwe vê ezmûnê pêk neynin. Li ser vî bingehî komeleka xûrt a berdewam derkete holê û hêdî hêdî vekirina hin akademî û peymangehên hunerî û çûna ji derve ya çendîn hunermendan destpêkir.



**Tabloyê Ali Cola (Suleymanî)**

Ev jî bû sedema ku hêdî hêdî hunermend xwe di nava cîhana hunerî de bibîne. Bitaybet dema em dibînîn di van salên dawî da bitaybet piştî serhildena 1991an ya başûrê Kurdistanê, gelek hunermend hatin welatên Ewropa û li cîhanê belav bûn. Ev belavbûn û têkelbûna di gel kultur û hunera cîhanî, hunermendên kurd ber bi hin hizr, stîl û bîrkirinên nû bir Ji ber ku di cîhaneke azad û vekirî de. şiyan weke xebateke xurt di qada şêwekariya kurdî da pêk bînin û bandorê li Kurdistanê jî bikin bi alîkarî û têkeliyan. şiyan çendîn pêşangehên mezin li gelek welatên biyanî vekin û çendîn katelogên hunermendên kurd bêne çapkirin. Ev pêşdaçûn jî heta niha di berdewamî û pêşdaçunê da ye. Herçende weke me eşkere kir, ji egera nebûna jêderan li ser şêwekariya kurdî bi şêweyekî giştî, lê li gor ew nivîs û jêderên ketine ber destên me, em dikarin bêjîn ku dîroka hunera şêwekariya kurdî li başur vedgere destpêka sedsala bîstan. Di salên bîstan û sîhan de weke me li pêşiyê destnîşankir, ku bitaybet ev curê resmê destpêkê li çayxane û li ser dîwaran dihate dîtin, weke destpêkeke nû. Piraniya babetên tabloyan li ser siruştî û jîna cutkar û gundiyan û karên folklorî, pez, ajal û jiyana gund bû. Weke me di pêşiyêde hin aliyên hunera hunermendên netewi û gelerî Ezîz Selîm yeke ji pêşewayên vê bizava hunerî ku berdewamî li ser kirîin. Li salên heftêyan vî hunermendî li Bexdayê gelek pêşangehên hunerî li ciyên giring vekirin wek galeriyên hunerî. Gelek ji van tabloyan veguhastina fotografan bûn, li ser jiyana kurda û dîmenên siruştî û karên remzî. (Gelek ji hunermendên navdar ên wê demê ev rê bi kar dianîn mîna: Faîq Hesen, Cewad Selîm, û gelekên din. Ev rê bû layenek di hunerî de bi navê; kopiya reyalîteye.[48] Ev babetine bi kar anîbûn li ser hestekî şaîrî nerêkxistiyeke sêhrî û bi pêçewaneya reyalîteya jîna kurdan. Vî hunermendî bawerî bi çi xwendingeh û bîrûbawerên hunerî nebû. Bitenê dizanî resim bike. Hizir nake ka hunera wî ji çi tê û xwe mijol nake bi bizava hunera nû yê ewropî ve. Lê dikulîd di kevirên di çiyan da, gul, giya û vî rengê siruştî yê mîna deriyekî kevnar ji dîmenê Kurdistanê. Ew jî pêk tê ji dar, rubar û jinan. Ew di tabloyê de tiştan bi kar tîne mîna etarekî gerok, ku tiştên xwe yên hemereng û cur.cur pêş çav dike. Wan tiştan bi xwe re radike, ew

---

(48) Feîsel al loeîbî- Kovara al seqafe al cedîde..al hereke al teşkîliye al kurdiyeal muasir jimare 206

ên bûyin û nebûyin. Ezîz Selîmî bi xwe, xwe avakir. Ev jî bû sedem ji avakirna navxweyî di bizava resmê kurdî de. Dibe ku ew (Henrî Rusoî 1844- 1910) nas neke jî. Lê rastî û rastgoyiya Ezîz Selîmî ji ya wî kêmtir nîne. Paşî hin hunermendên din piştî wî derketin dibe hin ji wan berdewam bin û hin ji wan di cîda mabin. Mîna Silêman şakir ku hunermendekî siruştî dihat hijmartin. Paşî Mihemed Arif 1937 û Ismaîl Xeyat 1944 ji hunermendên dahêner bûn. Mihemed Arif Siyamensorî li Peymangeha Huneran Ciwan li Bexda (Înstituta Hunerî) xwendina hunerî bi dawî anî. Paşî ji nû ve berdewamiya xwendina hunerî kir li Yekîtiya Sovyeta berê. Ev hunermende kete bin bandora xwendingeha sovyetî di resmî de. Heta niha jî ew bandor li ser maye. Ev jî bû astengek di rêya pêşdaneçûna hunermendî de.



**Tabloyê Mohamed Arif (Hewlêr)**[(49)]

---

(49) Katelog Mohamed Arif, Bexded 1984

Pêwîst e hunermend xwe ji vê yekê rizgar bike, ji ber ku pêdviyeke ji pêdiviyên derunî. Vî hunermendî hewl dida ku remzên gelerî û wêneyên reyalîteya civaka kurdî bikar bîne. Herwekî giringî dida dîrok û keleporên musilmanan. Ev yek jî wî pal dide cîhana wî ya taybet di hunerî de. Cîhaneke rewşenbîrî û dûr ji cîhana *Ezîz Selîmî* ya siruştî. Cîhaneke rêkxistî û bi pirogram. Dariştina wêne, reng, xet û babetî ya teqenî. Hemû bi pîvaneke hunerî bi kar anî. Çi tiştên nehên ji bîr kirin, bizaveke di tabloyê da ya bê mebest. Mihemed Arif nêzîkî minemnmatên Farisî dibe. Bitaybet resmê *Behzad* a mezin. Ev yek destpêkeke baş e ji zanîna karên wî û nasnama wî ya hunerî. Paşî nasîna giyan û kesayetiya wî ya ku derdikeve ji xaka wî. Vî hunermendî reyalîteya ji der ve û dîrok pêçewane kiriye ji bo gelê xwe. Herweha di rêbaza xwe ya taybet da bi kar anîna rengên folklorî yên kurdî



Rebwar, Ismail Khyat, Daro

Weke şarezayî û resenatiya hunera wî dide zanîn, ku girêdayê remz, dastan û folklorê netewa xwe di cîhana xwe ya taybet de bi şêweyê hunerî bi kar tîne. cîyê xwe di nava meydana hunerî da

çêkiriye. Çî li Kurdistan, Îraq û ji derve jî tê naskirin. çend tabloyên wî yên girêdayê dîroka gelê kurd û rewşa gelê kurd weke tabloyên J*iyana Selahedînê Eyubî, xatir xwastin, şer, serketin, birayetî, aştî li Kurdistanê , aenzde swarên Merîwan û gelekên din )* hene. Ev hunermende şiya di gelek muzexaneyên gelek welatan cih bigire û niha jî berdewam e li ser vê rêbaza taybet û cîhana xwe ya taybet. her weha çendîn pirtûk li ser hunerî, ji zimanên biyanî wergêrandine ser zimanê kurdî. Niha jî li bajarê Hewlêrê (başurê Kurdistan) dijî.

*Ismaîl Xeyatî* (1944) xwe dahêlaye di kuraniya hundirê mirovê kurd de. Ew mirovê çiyayî, bi berxwedan, xweragirî û bi aramî nêzîkê *Îxun Şîle (1890-1918)* hunermendê Nemsayî ye, yê ku karên wî *rêwayeta Kafka* bi bîra me tînin. Ev hunermende giringiyê dide rastiyeke din; ser û çavên mirovî.



**Tabloyê Îsmaîl Kayat(Suleymanî)**



**Peykerê Fuad Alî Ezîz** [50]

Rastiyeke dûr ji cîhana derve. Ew nêzîkî hunermendên Holendî ye. Di bikaranîna melamihên derunî ve nêzîkî *Rambrandî* ye. (1606-1669) Yan jî *Vangog* (1835-1890) Ev hunermende yek ji navdarên hunermendên kurd e. Nexweşiyên gelê wî bi giştî, bi hemû guhartinan ve di tabloyên wî de di eşkere ne. Mîna hunermendê Îrlendî *Baconî,* (1909) ku derbirîn ji gelê xwe dikir ji bo serxwebûnê.

(50) Policromia Kurde.Albom 1992



**Tabloyê Îsmaîl Kayat (Suleymanî)**

Wesa Îsmaîl Xeyatî jî derbirîn ji gelê xwe dike. Herweha em dikarin hunermend *Alî Cula* jî, ji vê komelê bijmêrîn. Lê bizava wî ya hunerî kêm e. Herçende yekemîn hunermendê Abstrak a kurd e. Bitaybet di resimkirna tabloyên mezin de.


Li vir mirov dikare çendîn hunermendan weke xelekekê di navbera Mihemed Arif, Azîz Selîm, Ismaîl Xeyat û nifşên nû de girêdanekê çêbike. Weke; *Eta Kezez û Aso Sidîq*. Karên wan ji reyalîteya şaîrane pêk tên, yan jî ji hestekî jiyana rojane. Ew bûn bingehek ku nifşekî hunermendan li ser rêbaza wan biçe. Heta niha jî gelek ji wan hunermenden li ser wan rewşan dimeşin, kevin dibin û pêşeroj li pêş çavan tineye. Lê her yekî taybetmendiyek heye. Bikaranîna rengan a Eta Kezazî, pêdivî hîç ronkirnekê nîne. Dema ji Kurdistanê derkete Ewropa di gel xwe nêrgiz, sosin, giya, çiya û ava sulavan anî. Daristaneke pirî tişt di mejiyê wî de heye, pêk tê ji hemû rengên siruşta Kurdistanê û zêrevaniya wî jî Belatîng dikin.

Herweha hunermend *Aso Sidîq* girêdayê hunera ewropî ye. Wesa xwe eşkere dike ku kêmtir nîne ji hunermendên rojavayî mîna hunermend (*VESPIGNANI RENZO,* hunermendekî Itali yê bi nav û deng e. Dijî faşiyê bû. Reyalist û şaîrî ye. Giringî dida girêdana bizava laşê mirovî.) Kartêkirna cîhana pîşesazî li ser wî alet û mirov. Ev yeke di pêşangeha wî de eşkere dibûn, sala 1981an

li Florensa.[(51)]

Pştî salên heftêyan bizava hunera şêwekarî li başurê Kurdistanê pêş da çû. Ji ber ku gelek hunermend derketin li ser rêbazên nû yên hunerî. Piraniya van hunermendan resimî li Peymangehên Hunerî li Bexda xwendin. Her li vê demê hatin grêdan bi bizava komelayetî û aboriya civaka kurdî ve û bizava nîştîmanî ya kurdî û pştevaniya şoreşa kurd dikirin. Piraniya wan hizrên sosyalistî û hevrikiya çînayetî hilgirtin. Lê hêrîşên dijminan nehêlan bizava rewşenbîrî û hunerî li duv xwastekên xwe pêş de biben. Hin ji van hunermandan girêdayê bizava netewî bûn, hin jî durketin ji siyasetê. Hin jî girêdayê hizrên sosyalizmî bûn lê bi hev ra gelek xebat kirin, ji bo pêşde birna şêwekariya kurdî ya nû. Li vir du alî û bawerî peyda bûn:

1 Aliyek lêkolîn û giringî dida kultur û rewşenbîriya kurdî, di gel hunera ewropî ya nû, di kesayetiya netewî ya hunerî de.
2 Aliyê din jî giringî dida bizava hunera ewropî yê nû û dûr ji kesatiya netewî ya rewşenbîrî.



**mînakên hûnerê peykerê kurdistanê(Suleymanî)**

(51) feîsel al loeîbî- Kovara al seqafe al cedîde..jimare206



**peykerê ji derî çêkirî**



**peykerê 4 efserên Komara Mehabad li Silêmaniyê**
**hunermend Azad Jemal**

Ji aliyê yekem hunermend û peykertaş *Fuad Elî Ezîz* (1951, li Hewlêrê ji dayk bûye) demekî li Florensa dijya. Ew şiya peywendiyekê di navbera peykerê xwe yê hemdem û kelepurên xwe yên netewî de çêbike. Piraniya babetên wî li ser dayik, xoşewîstî, şehîd û xebatkeran bûn. Di karên wî yên hunerî de

peywendiya şaristaniya mezopotamya û peykerê hemdem hebû. Wek; peykerê Gutî û peykerê Manzo di navbera teqna xaka Kurdistan û teqna *Marini***,** nexşên li ser laşên mirovan, gul di dest de û hêvî di çavan de diyar in. Jinên razayî, çaverê, bêdeng û bixem. Ev peykerên wî Kurdistanê bi bîra me tînin: Mermer, ber, teqnê şala kurdî, şelwar, pştî û bizava birêveçunê ûwd.. Bê dengiya hember cîhanê û bîranîna xaka pîroz. Hunera Fuad Elî teikîda nasnameya kesayetiya kurd e.


Hunermendê din jî her ji bajarê Hewlêrê ye û navê wî *Azad Ehmed Mewlûd* e.Ramaneke din dide me li ser rewşenbîriya kurd. Vî hunermendî dest pê kir ji kesayetiya gelê kurd û babetên girêdayê civaka kurd. Digel hunermendên salên heftêyan weke *Kazim Heyder* karên wî qonaxek e ji qonaxên hunera Iraqî yê hemdem. Giringî dida doza xebatkeran. Zîndaniyên li ser bîr û baweran hatin zîndan kirin û bizava siyasî û bindestiyê bi rengekî giştî di tabloyê *şemer (1958)* yê hunermend *Kazim Heyder* da destpêk bû. Karên Azadî yên dawî, nêzîkê karên *hunermendê Italî Glaudio* bûn. Di hest û bizavên şêweyî da dudiliya Azadî diyar dike. Geryana wî li dûv tabloyê ji bo rastiya rewşa wî ya hundirî ye. Rewşa tê guhartin, di gel rewşa hundirî ya hunermendîye.



**Tabloyê Simko Tawfik** [52]

(52) Policromia Kurde.Albom 1992

Hunermend *Simko Tewfik:* Di gel Azadî derket û babetên wî yên xerîb û reyalîteyeke ji dervey reyalîteyê, remz, îşaret û sira veşartî, mîna çîrokên rojhelatî yên sêhrî. Mirov nizane ji kîjan xalê dest pê bike. Simko di berdewamiya karên xwe de babetên wesa nîşan dide ku mirov dibêje qey sûreyalî ye. Lê ew bixwe ne sûreyalî ye. Tenê roxsar sûreyalî ye. Sirên Simkoyî sirên rojhelatî ne, nêrînên wî, cîhana wî, pêkhatinên wî, dest pê kirin ji keviran û bi dawî anîn bi asûmanî. Simko neku digel hunermendên hunera nû ye.



**Tabloyê Azad Şewqî-Silêmanî**

Keniya wî tê dema dibêjin tabloyek di çend seatan da bi dawî tê. Yan jî bi çend roj û hefteyan. Tabloyên wî bi mehan tên dirustkirin hin caran jî bi salan, taku ronahiyê bibîne û jê razî be. Ew giringiyê dide giyana rojhelatî. Ev hunermende bi şêweyekî nerm û hêdî di tabloyê de kar dike û bi hizirkirin û bêdengî. Ger lez di karên wî de hebe hestên hunermendî ji me ra xweya dibin. Xemxwûrî û giringî pêdana vî hunermendî du tiştên baş in di berjewendiya karên hunerî de û giringî pêdana wî ya bêyî dudilî. Hunermend Azad Şewqî yeke ji wan hunermendên di xeyalên xwe da çwye nava xwezaya kurdistanê û rengên gul û çîçek û daristana bixwere tîne. Tabloyên wî berev siruştî ne liber roja germa kurdistanê kevyên befrê di helîne û ava zelal dide me, bi rengên wî hestên me geş dibin û

xweza dixemile. Lê mixabin ji egera nexweşiyek gran nikarî bû berdewamiyê bi hunera xwe bide û jiyana xwe ji dest da.lê tabloyên wî hemû rojê li dîdara mene û muzeyên kurdistanê pê xemlandîne.



**Tabloyê Baldîn Ahmed** [53]

Hunermend *Baldîn Ehmed:* (1954, ji dayik bûye.) Di tabloyên wî da em têkelbûna bizava hunera kurdî dibînîn, ne di kesayetî de. Ew welatê xwe resim dike bi rengên; xwîn, gul, kesk û sor, zaroktî, bîrhatin, şehîd, zîndanî, bûstan û viyan. Dîmen li cem Behaedînî pir in ji tiştan.

Tiştên li paş xwe hişt, di bûstanan de welat lê amade ye. Van tiştine hemû di tabloyê de diyar diken û welatê wî di gel wî ye mîna çanteyekê ku pir tişt jê derdikevin: Dergeh, giya, ax û wêneyên xelkê wî. Karên wî tên zanîn bi şefafiyeteke berz. Hunermendê italî *Lojyano Bartolinî* bi bîra me tîne. Lê ji wî cude ye, di wê dûzê da ya lê digere. Ew jî mîna wî hizir û xewn û şûnewarên xetî bi kar tîne. Hunermend *Serdar Elî:* (1953) piştî vî hunermendî çendîn ezmûnên hunerî kirin. Xebatên wî nêzîkî hunermendê Îtalî *Manlirî*

---

(53) Katelok Grenzenlos kurdisçe Kunst Heute Volkşall im Winer rathaus 2002.

*Bakuzî* ye. Lê ew giringiyê dide remzên borî weke zexrefa musilmanan, pirtûk û şêweyên berê. Sêguşe, kef û hêl ku bîra me tînin nexşên nasdar ên kurdewarî. Ev hunermende hûr hizir dike di tabloyê de Nizane kengî tabloya wî bi dawî tê. Zanyariya wî ya hunerî li ser hestên ciwaniyê ye. Bikaranîna buşayî, lê çareseriya wê sipî mina hunera girekî.





**mînakên hûnerê Sîramîk**

Hunermend *Yusif Hebîb:* (1955) Ev hunermende di pêşkêşkirina tiştên nû di hunera xwe de, ezmûna xwe ya bi sanahî û bi şêweyekî sade nîşanê me dide. Bêyî ku ew bixwe ji me ra şirove bike. Ji ber ku ev ne karê wî ye. Ew cuda ye ji hunermendên bi tundiyeke eşkere û hesteke kûr ya bi bizav û mîna giyana wî û kesayetiya wî ya dudil û ne binecîh. Resmên wî mîna karekî rastewxoye eşkere dibe. Materyalên cuda bi kar tîne. Hevrik e di gel kesayetî û nekesayetiyê. Nêzîkî hunermendê Îtalî *Manlirî Bakozî* ye. Weke hevalê xwe *Serdarî.* Vê ezmûna hunerî kartêkirnek mezin kir li ser hunermendên kurd yên ku ber bi apstrakê (razberiyê) ve diçin û diçin nava kuratiya ciwaniyê.*Hunermend Kawyan Mihemed:* **(**1951) Nêzîkî ezmûna hunermend *Bahadîn Ehmed* e. Lê bêhtir giringî dide hundirî. Ger ezmûna Bahadînî giringiyê bide berfirehiya asoyê, Kawyan tenê giringî dide wê yekê ku çi di hundirî oda wî de heye. Ew jî çenteyekê radike, lê ya biçûk, ya nazik û bi rêk û pêk. Mîna wî, li vir dan û standineke berdewam heye di navbera hunermend û sêvê de, îstekana çayê û difna mirovî, diktatorî û mirinê, celad û qurbaniyê, qumaşî û perên di firin, pencerê û hewaya odê. Reng li cem wî giraniyeke bêdeng e.



**Tabloyê Wehbî Resul-Suleymanî**

Dema resim dike, bîra mirovî tîne ku dema mirovek dixwaze karekî pêk bîne li pêş, çawan pêdiviyên karî lidor kom dike. Rengan li ser palêtê datîne û li dûv rêzkirinê, firçeyên xwe digel rengan wesa bi kar tîne mîna sertiraşî. Firçeyê digel sabûnê tîne û dibe dêmê riha ditiraşe. Dema rengan datîne ser tabloyê, ew hest dike mîna sertiraş musekê datîne ser ruyê mirovî bi hişiyarî û bi tirs. Cîhana vî hunermendî gelek biçûk û tesk e, lê pir e ji hemû giyaneweran. Dudilî û hest, nazikiya wî du palderên giring in ji bo avakirina tabloyê. Lê pêwîstî baş lê nêrînêye û rastan û çavdêriyê. Hunermendekî din *Bextiyar:* Di karên xwe yên hunerî de ber bi aliyê ne şiklî ve diçe. Lê ji hunera têgeheştinê dûr nakeve weke derbirîna *îtalî*. Remzên wî weke qonaxên ezmûnê ne li ba wî. Ji ber ku li ser aliyekî tenê ne rawestiya ye. Herdem di karkirinê da ye.



**Tabloyê Muhemed Fetah (Suleymanî)**

Li ser hunera Feqîran kar dike, (ARTEPOVERA) bikaranîna madeyên siruştî mîna qumaş û kevir ûwd.. Hestiyariya wî li ser peywendiya di nav bera civak û mirovî de ye. Vî hunermendî şiyanên mezin hene di rengan de. Lê tabloyên wî ji bo me diyar dikin ku di bizava tabloyê de ya ku ew dixwaze rizgar bike ji hestkirinê. Ev yek jî hizirkirina hunermendî ji bo hinekên din diyar dike. Herweha ji nêrînên beramber ditirse .



**Tabloyê Qerenî Jemîl** (54)

(54) Katelok Grenzenlos kurdisçe Kunst Heute Volkşall im Winer rathaus 2002.

Hunermendekî navdar *Kerenî Jemîl***:** (1954) Ev hunermende ketiye bin bandora hunera *îtalî,* bitaybetî hunera Lujyu Fontano (1899-1968) Qerenî Cemîl nihêniyên xwe peyda dike, diparêze û belavdike li dûv demên ew bixwaze bi şêweyekî dudil û bi tirs ava dike û xerab dike. Di hundirê wî de xetîreke hil heye. Ew bi tenê têr nake ji wê afirandina ku ew dixwaze. Ew madeyên li ber destê wî, dest pê dike ji resamekî xwedî îltizama hunerî. Ketiye bin bandora hunermendên îraqî weke; *Mihemed Elî şakir.* (1934) Piştî ku çû Yekêtiya Sofyeta berê paşgezyek li cem peyda bû û hemû tiştên berê li paş xwe hêlane û dixwast ji nû ve çareseriya hundirî bike, bi agirê xwedayî û mecusî. Li ser ezmûna hundirî, cîhana hundirî û pirsa dîtinê di huner de .

*Hunermend Medhed Elî:* (*1956)* Vî hunermendî xwendina xwe ya hunerî li Peymangeha Huneran Ciwan li Bexda bi dewî anî. Lê xwendina xwe ya bilind tewa nekir, ji ber çend egeran. Vî hunermendî di gel hevalên xwe *Hemîd* û *Azad Abdula* di odeyekê de dijiyan li Bexda li Heyderxanê.




Li vir nexweşî, hejarî û birsê cudayiyek xiste navbera Qesra Mensor û odeya wan a kirêkirî. Kesayetiya vî hunermendî girêdayê kesayetiya hunermendê reyalistî yê Alman Max Bekmanî (1884-

1950) ye. Babetên *Mehmûd Sebri* (1927) li ser birs, jan, nexwşî û derdên mirovayetîyê bûn. Ezmûna Medhedî jî kolana li ser derî ye, bi hevalê wî *Hemîd Ebdul Husên* re baştirîn ezmûn e di hunera îraqî yê nûdem de, ku girêdayê babetên civakî bûn. Lê niha li ser ezmûnên hunera ewropî diçe komeleya mîna *COBRA,* ya ku hatiye damezrandin di salên pênciyan de. Wateya wê; *Marê hezarser* e. Vê navê rexnegir *Maribue* lê daniye. Di karên Medhetî de reş û sipî di karên kulayê de tên bikaranîn. Ev yek jî nayê wê manayê ku ev hunermende nikare rengan bi kar bîne. Lê reş û sipî zehmedtirîn reng in û hesas in,

bitaybet dema em bizanin di siruştî de peyda nabin.

Hunermend *Azad* û *Welîd Mistefa* her yek dixwaze di cîhana xwe ya taybet de kar bike li ser diyarkirina senfoniya tabloyê şêwekarî. Her du jî mixamirên bi cerg in. Giringî didin ezmûna hunera îraqî. Her yek jî hunera kulan û kopî li ser berî û herîrî bi kar tîne. Ezmûna wan li Yugusilaviya çêbû, ku hunera kulanê têde bi nav û deng bû ji hemû welatên sosiyalistî bêhtir. Ev huner ji ber ku hunerekî gelerî bû zû belav dibû. Karên wan mîna hunera hunermend *Xwan Miro (1893- 1983), bizava kobra û resam Abnikî ne.*

Di xebatên *Mihemed Şerîf* de nêzîkbûnek efewî heye ji *Yusif Hebîb,* asaniya *Simko Tewfîk* û siruştê *Ezîz Selîm* û cudahiya mezin di nivbera wan û wî da. Hemîd bixem û esebî di haletê hêstrya de û bêdengî di haletê hizirkirnê de. şefaf û nediyarî, nêzîkî û dûrayî, tirsiyayî û bihêz, asanî û zorî.. Ev hemû şêwe di karên wî de diyar dibin bêyî dirust bike. bîra me tîne *hunermendê Japanî Hisyauşin.* Ew jî bîr li firça dike dema datine ser rengan û tabloyê digel yek têkel dike. Hest dike bi hêz û germiyê di dîtinên wî de. Dema karekî hunerî diafrîne mîna ji daykbûneke bi ruh e.



**Tabloyê Jamal Moşîr(Hewlêr)**

Ev hunermende peywendiyekê di navbera xwe û tabloyê de peyda dike. Di navbera made û ruhê wî, karkirina karekî hunerî mîna giyandarekî bi ruh e. Mîna wî hizir dike, dibîne û digel diaxife. Di ser wê yekê ra ku wî li xwendingehên hunerî nexwendiye. Lê karên wî bihêztirin ji wan kesên xwedî bi dîplom.



**Tabloyê Rêbwar Seîd (Suleymanî)**

Hunermend *Dilşad Pîrdawid:* Yek e ji hunermendên nebinecih. Herdem kar dike di wan demên hêşta nehatî de. Di hundirê wî de hest bi yekaneyî windabûn û havîbûnê dike. Karên wî li ser hebûn, dorpêçî û firînê ne. Bawerî bi hunera *sutfê* heye, yan hunera nû ARTEACTION, ber bi nûyatiyê diçe. Ev hunermende dûr ji rudanên nû yên li Ewropa peyda dibin. Wî parastina dahênan û armanca serekî di xerîbî de têkel kiriye di gel: bindestiya netewî û lêkolînên hunerî.

Piştî ku gelek hunermendên kurd kuçber bûn Ewropa û gelek cihên din û peydebûna rêbaz û nûyatî di hunerî de, hunermendên me jî şiyan hin pêşdaçûnan bi xwe ra bînin. Gelek ji wan şiyan resenatiya rojhelatî bi pêşdaçûna hunera nû yê cîhanî peyda biken.

Li ser vê yekê jî hunermendê Irakî *Feisel Al luêbî* dibêje: *« Di dîtinên min de li ser piraniya hunermendên kurd li Iraqê bi şêweyekî giştî diyar bû, ku piraniya wan ber bi hunera ne şiklî ve diçin. Ev yek jî havîbûna hunermend û rewşenbîrê kurd e ji egera ketin û şkestinên bizavên netewayetî yên kurd û bizavên demokratî û ne peydabûna sosyalîzmê. »*



**Tabloyê Remzî Qutbedîn** [55]

(55) Katelok Grenzenlos kurdisçe Kunst Heute Volkşall im Winer rathaus 2002.

## Remzî Qutbedîn

Yeke ji hunermendên xwedî şiyan û navekî diyar e di ferhenga şêwekariya kurdî de. Li destpêka salên heftêyan dest bi xebatên hunera şêwekarî kir. Beşdarî û karmendiyek mezin

kiriye di danîna bingeh û tuxmên derbirînxwaziyê (Xpirssunizm) de, di warê hunera şêwekarî de. Ev hunermend, li sala 1955an li bajarê Xaneqîn li başurê Kurdistanê hatiye dinê. Li salên 1979-1980an xwendina hunerî li Bexda bi dawî aniye. Çendîn pêşangehên taybet û digel guruban li Kurdistan û li Îraq û Ewropa û gelek welatên din vekirine. Niha li Parîsê dijî.



**Tabloyê Azad Nanekelî** (56)

Herweha gelek hunermendên din yên mîna *Niyaz Salih û Daro, Azad Nanakelî, Welîd Şît, Fuad ûwd...* Di meydana şêwekariya kurdî de rolekî mezin hene. Gelek hunermendên din yên navdar bûne xwedî rêbazên hunerî yên taybet û şiyane di nava gel û cîhana hunerî de xwe bidin nasandin.

Ji wan, jinên kurd jî xwedî hunermendiyeke berz in û çendîn

(56) Katelok Grenzenlos kurdisçe Kunst Heute Volkşall im Winer rathaus 2002.

pêşangeh li Kurdistan û welatên din yên cîhanê vekirine. Yek ji wan Xanim *Çîmen îsmaîl* bû ku mamostaya hunerî ye li Peymangeha Huneran Ciwan li bajarê Suleymaniyê. Ev hunermenda kurd girêdayê stîleke taybet e û dema mirov li tabloyên wê dinêre bîra lêdena firçeyên *Van Goghî* tê bîra me ku ew jî, ji hest û hêrisiya di hundurê hunermendê de derdikeve.



**Tabloyê Çîmen Ismaîl (Suleymanî)**

Lê Çîmen bi nazikiya dilê xwe frçey bikartîne û bi dilovaniya nazikiya jinê, ji ber ku naxwaze hestên xwe û yên mirovan birîndar bike lê me dikenîne û carnajî girya me tîne cîhana wê pire ji serbûrên jiyanê. Reng li ba Çîmenê mîna volkaneke agirî hemû aliyan di nava xwe de dihelîne. Rêxistineke hunerî li gorî ciwaniya hunerî tabloyê pêk tîne, dema çavên mirovî bi van tabloyan dikevin yekser bala mirovî dikşîne û hunermendiyeke xweşik nîşanî mirovî dide. Ruyê ji der ve yê tabloyê bi hestên hunerî ku rêxistineke zanistî bi kar aniye weke maforeke rengîn ji rengên kurdewarî û resenayetiyek bi xwe ve digire. Ev jî nameya giring ya hunerî ye ku pêşkeşî mirovahiyê dike. Ew tabloyên ji derd û rudanên reyalîteya hunermendî bi xwe derdikevin. Bi vî şêweyî hunermenda me mohra xwe li dîroka hunera şêwekariya kurdî daye. Dîsa jî berdewam e li ser pêkanîna bedewiya tabloyên rengîn.

*Li herêma Badînan*: Gelek diyardên pêşdabirna hunerî derketin. lê jiber kartêkirinên ola musilmaniyê û paşvemana civaka kurdî ya wê demê, nikarîn berdewamî bi xebata xwe ya hunerî bidin. Weke helbestvanê klasîk ê kurd *Bekr Begê Erizî* (1769z.)

Ev hunermend û şaîre li sala 1769an z. li gundê Eriz ku dikeve ser çiyayê Metînî rojavayê Bamernê ji dayk bûye. Ji binemaleke navdar e. Dîmenên ciwan yên ku çiyayê Metînî xemilandî û dewr û berên gundê wî ji dîmenên gul, nêrgiz, sulav, kanî, dar û berên vî çiyaî ev şaîre pal da wê yekê ku afirandinê ji ciwaniya van dîmenan bike.[57] Ev şaîre zêdey ebqeriyeta şîrî hunermendekî mezin bû. Weke peykertaş dihat naskirin û nîgarmendekî xwedî şiyan bû. Lê mixabin ji egera kartêkirina ola musilmaniyê dest ji karê xwe yê hunerî berda. Wesa tê gotin ku eger bîr û bawerên wî yên olî nebana rêgirên pêşdabirna hunera wî, ku musilmanan resim heram kir bû dirust kirna xwedan rihan dibû yek ji resamên navdarên vê herêmê. Vî hunermendî resmê Xezalekê ji dar çêkirbû û diyariyê *Ismaîl Paşayê mîrê Amêdiyê* kir bû. Dema mirovî çav pêdiketin mîna xezalekî bi ruh dihate berçavên mirovî. Herweha dibêjin carekê bi kurê xwe re diçe çiyayî û dixwaze kerekî ji darî çêbike. Dema diçin darekê dest nîşan dike û ji kurê xwe re dibêje; « li vî cihê darê bivrê xwe lêxe.» Dema kurê wî bivrê xwe li darê dixe yek buhust li jor dikeve, ew ji kurê xwe re dibêje; «kerê me guhekî wî kêm e.» Kurê wî dibêjê; «hêşta te dest pê nekiriye çawan tu dizanî?» Dawiyê dara xwe perçe perçe dikin û li dawiyê kerekî xweşik jê çêdibe, lê guhekî wî kêm e. Paşî li ser pişta kerî tirê datine û ji Ismaîl Paşayê Amêdiyê re diyarî dike. Dema nêzîk dibe Paşa nizane ku kerê darî ye û wî çêkirye. Ew demê jê ra diyarî dike. Pir kêfa paşay tê bi wî xelatê mezin. Lê mixabin civaka kurdî di wê demê de bi çavekî nizim lê dinêrî. Dawiyê neçar dimîne ku dest ji hunera xwe berde û bi tenê şîir binvîsîne. Niha jî di dîroka edebyata kurdî de weke şaîrekî mezin tê nasîn.[58]

---

(57) Enwer Mayî -Al akrad fî badînan.çap 2.1999 rûp.179.
(58) Sadiq buhaedîn Amêdî -Hozanvanên kurd..1980 rûp.374




**Tabloyê Sîrwan Şakir Akreyî**

çendîn hunermendên din derketin û hin diyardên hunerî li xwendingeh û bizavên hunerî pêk anîn. Her ji salên pênciyan û şun de weke; *Seidedîn* ku vî hunermendî di tabloyên xwe de bêhtir şêweyekî taybet bi kar dianî, weke stîleke hunerî. Lê hin diyardên hunerî û rengên siruştî û babetên girêdayê jiyana giyanewer, mirov, teyr û her tiştê hest bilîvînê bike. Dîsa di tabloyên wî de hin babetên taybetî di jiyana hunermendî de eşkere ne. Wesa tê xweyakirin ku hunermend di jîneke yekane de dijî û cîhana xwe ya hundir ku cîhana veşartî ye di tabloyê de diafrîne û xemên xwe bi rengan vedirevandin. Karên wî yên vê dawiyê bêhtir nêzîkî abstrak bûn. Ev hunermende kete bin jiyaneke giran ya civakî. Di dawiyê de jiyana xwe ji dest da.

*Enwer Cizîrî:* Yek bû ji hunermendên ku bêhtir li xwendingehên perwerdê kar dikir. Lê çendîn berhemên wî yên weke peykerê, li ser dîwaran mane li bajarê Duhok û Zaxo.

Dîsan hunermendekî File bi navê *Kemal Melkî* li Duhokê her ji salê şêstan û vir ve weke mamostayekî hunera şêwekarî

rola xwe lîst.





**Tabloyê Silêman Alî(Duhok)** **Tabloyê Guhder Bazaz**

Hêdî hêdî hunera şêwekarî di nava civaka kurdî de cîh girt û ji egera peydabûna şoreş û serhildanên kurd û zulm û êşkence û zoriya li ser gelê kurd, hunermend pal dane wê yekê ku babetên tabloyên xwe li ser van bûyeran dirust biken û viyana xelkê Kurdistanê bêhtir ji bo huner rabikêşin. Ev yek bu sedema peydabûna gelek nivîskarên qelem xurt. Mil bi milê hunermendan şiyan hin çarçuveyan têk bidin û ji nav bibin. Digel vê yekê bitaybet piştî beyana 11 î adara sala 1970 û berdewamiya şureşa kurdî li başur bandureke xwe li ser rijêma îraqê kir û rijêmê rê da çendîn sazî, kovar û rojnameyên kurdî derkevin. Dîsa zimanê kurdî û perwerdeya kurdî li xwendingeha bi şêweyekî fermî bi kar dihat. Digel pêyda çûna şoreşê, piştî şkestina 1975an û peydabûna şoreşa partîzanî ya li sala 1976an, gelek hunermend ji bajaran derketin çûn nav şoreşê. Paşî çûne welatên Ewropa û yên din. Li wir şiyan mifa ji xwendingeh û rêbazên hunera cîhanî werbigrin. Herweha gelek ji van hunermendan şiyan pêşangehên xwe li van welatan vekin û rewşa Kurdistan û zoriya li ser gelê kurd di tabloyên xwe de weke zimanekî hunerî bidin xoyakirin.




**Peykerê Reşîd Ali-Duhok**

Bitaybetî, di bûyerên Enfal û komkojiya Helebçe û koçberkirna kurdan bo başurê Iraqê, hunermend û nivêskarê kurd helwêstekî netewî lihember van bûyeran wergirt. Di berhemên xweda ev bûyerne bikaranîn çi li kurdistan û Iraqê bi şêwê sombolîk û çi jî lidervey welat b zimanê hunerî ev bûyerne nîşanî cîhanê dan.



**Tabloyê Fehmî Balayî-Duhok**

Di ser van qonaxên dijwarên hunermendê kurd tuşbûy, berdewamî bi xebatên xweyên hunerî dan. Jiber ku viyana wan bo huner û afrandinê rê li ber hemû astengiyan girt, herweha sext û sinurên rijêmê nasnekirin. Çendîn hunermendên xwedî şiyan jî bone qorbanên vê rastiyê.




**Tabloyê Adnan Şîno**

Li vir hunermend rastgo bû û girêdayê reyalîteya gelê xwe bû. Herçend dûr be jî. Eşkere ye ku (her hunerek girêdayî hizirkirnê ye di jiyanê de. grêdayî îdîolojiya dema xwe ye û dema wî ji dayik dibe. Ev jî şêweyeke ku huner bi xweve digire. Dibejî bibe beşekî jiyana rasteqîne ya civakê ji bo hest û hişyarbûnê.) bi demezirandina *Peymangeha Huneran Ciwan li* Silêmaniyê**.**

(1979-1980), bi dilekî germ hunermendên kurd pêşwazî lê

kir û ji hemû bajarên Kurdistanê li ser şêweyekî akademîk û zanistî hunermend çûn ji bo xwendina hunerî.Wê demê sala 1980 yan *ji Duhokê çendîn hunermend li Peymangeha Huneran Ciwan li Neynewa dixwandin. Weke: Fehmî Balayî, Ismaîl Ezam û Fazil Yus.*



**Tabloyê Seidedîn-Duhok**



**Peykerê Hemîd Ecîl-Duhok**



**Tabloyê A.Wehîd Kalho(Duhok)**

## Abdulrehman Wehîd Kalho

Sala 1954an li Duhokê li başurê kurdistanê ji dayk bûye. Xwendina xwe ya akademîk sala 1980 li Akademiya Bexda bidawî kiriye. Ew ji bo xwendina hunerî berî hemûyan ji Duhokê çûbû Bexdayê. Paşî weke mamoste li bajarê Duhokê waneyên hunerî li ser astekî zanistî xwêndekar perwerde dikirin. Heta wê demê hin giringî bi waneya resmî nedihate dayîn. Di cîhana wî ya taybetî de taybetmendiyeke tabloyên Kalhu heye. Tablo di boşayeke rêkxistîde reng, estetîk û ruyekê nû pêktîne. Ev jî digel ruyê jiderve yê jiyanê ji afrandin û hestên hunermendî tê. Her hunermendek vê

yekê bi awayekî dibîne, ji ber ku hunermend dixwaze bi berhemên xweyên hunerî hin ruyên hêşta tîrojkên rojê, xemla jiyanê û hestên mirovan nenaskirîn bide jiyandin. Ev jî dibe felsefeya demê û her yek binêrînekê tevlî dibe. Tablo; ruyê herî xemlandiye, li berçavan pir tiştan bixweve digire. Hunermend bi hustayeke pir şareza xwe dinava vî karî de dibîne. Ji ber ku hest bi berpirsiyarî dike. Kalho ; bûye beşek ji tabloyî. Carnan digel xwe dikeve hevrikiyê, di egerêda kesayetiyeke din ya hunerî diafrîne. Hin caran jî ew bixwe hest bi vê yekê nake. Carnan jî mirov di nava tabloyê de kesayetiya wî dibîne û bi eşkereyî tê xwiyakirin. Hin caran jî di nava rengan de xwe vedişêre û naxwaze mirov bi asanî wî bibîne. Mirov dikare di nava tabloyan de xweşî û hestên cwaniyê bibîne. Weke nexşeyên maforan di xemla siruştî de dêmekî xemilî ji tilên nazik yên huriyan û xanimên dil nerm, vî tevnê bi eşqeke xwezayî di vehîne û dibe hêvênê tabloyî. Hunermend di cîhana xwe da hestên nediyar pêşçavdike. Peywendiyên cîhana hunermendî bi xemla jiyanêve girêdide. Resenatiya neteweyetî di motîv, reng û babetan de nîşan dide. Jin li ba hunermend, ruyê geş ê jiyanêye, di tabloyande babetê serekeye. Peywendiyên jinê bi jiyanêve di nava siruştekî bêdeng de mirov dibe daristanên derûdora Parîsê ji bo hunermendên mîna Cezanne. Renoir û manê tine bîra me. Weke zêrevanên davên rojê digel helatina rojê hemû deman di rengîne. Di hin tabloyan de bi şevê rojê dibîne û li hemû kêşwerên cîhanê xwe bi davên rojêve girêdide, di xeyala xwede dur diçe taku digihîje armanca xwe. Tîna welatekî nû ji rengên tabloyên wî tê. Ew dixwaze ji xwînrêtinê ji kuştinê û ji bin pêkirina mirovatiyê dur bikeve, di hestên nazik de, di cwaniyê de welatekî ava bike. Jin hin caran mijolî siruştiye, caran jî çaverênemîna hunermendî dixwazin bigehin armanca xwe. Lê hêşta di qonaxên navîndane. Çend qonaxan dibirin armanc xwe dur dike, hunermend xwe di çavên çaverêyan da dibîne, dixwaze tîrên wan çavan van qonaxan bibirin û armanc nêzîk bibe. Hunermend; bêhtir xwe di nava rengên sar de dibîne, carnan di germahiya dilê xwe de ruberê tabloyî jî germ dike. Lê di hin tabloyan de hevrikiyek heye, reng hevûdû digirin û ji hevûdû


diqetin, ji ber ku fîgurek xwe dinavberê de dibîne û bala mirov dikşîne. Dilovaniya hunermendî li hember mirovatiyê û nexşeyê jiyanê divê cîhanêde durgehekî bixeml di nava deryayê de resim dike, tîrojkên rojê û pêlên avê baxekî rengîne, dengê avê û awazên teyran di xemla siruştî de dêmê keçan digirnijînin. Di hemû tabloyan de ev dêmê girnijî heye weke mêvan û weke huriyên efsaneyî xwe wenda dikin. Mirov van hemûyan di nava serhatiyên dîrokî de dibîne. Li vir evîndara hunermendî wenda dibe û bi lêdanên firşeyê û hestên xwe lêgerînên xwe datêla deryayên kuîr û li darstanên tarî. Nêrîna wî li ser hunerî li dorgehê jiyanê bi durbînê lê dinêre, bi renga dixemlîne, hemû kirasên nexşandî li bejna wê dike. Di nava gulistanan de, di nava daristanan de, di hizran de, carnan jî di xeyalan de pêktîne. Hunermend; jin mîna welat dayîk û evîndar bikaraniye. Gelek caran jî şirove û rastiya jiyanê di kesayetiya jinê de bikar aniye. Jinê dike xanima textê jiyanê, ji ber ku ew dixwaze di welatekî nû de jin cîhaneke nû biafrîne, daku jiyan careke din vegere ser rastiya xweya dîrokî. Bi şêweyekî zanistî qonaxên jiyanê bi dîrokêve girêbide û hertişt nû bibe. Sîstem nû bibe, xweza nû bibe, mirovekî nû ji dayîk bibe û civakeke nû jî peyda bibe. Bi vî awayî hemû bi hevre di cîhana rastiyê de cwanî û dilovaniyê di tabloyê de pêkbînin. Di hevrikiya jîyanê de hunermend xeyala xwe serbest dike, jiyan û ciwaniyê pêşkeşî mirovayetiyê dike.

Piştî vekirna Peymangeha Hunerî li Silêmaniyê, ji salên 1981an û şûn de gelek hunermend ji bo xwendina hunerî çûne Silêmaniyê, Neynewayê û Bexdayê. Ji wan: *Adnan Şîno, Guhder Bezaz, Şehîd Selman Reşîd Alî, Hemîd Şerîf,* li Peymangeha Silêmaniyê bûn. Çendîn hunermendên din, li Akademiya Bexdayê xwendina hunerî bi dawî kirin. Weke; *Jemal Selîm, Rêber Omer, Hude Ehmed Sebrî.*

Hunermendên wek *Hikmet Heso, Mihemed Ibrahîm Berwarî,* ji Zaxo *Selam, Muslim ûwd* **..** jî Peymangeha Huneriyê li Neynewayê xwendin.

Hunermend *Enwer Mistefa Berwarî***:** (Sala 1948an ji dayik bûye) Zanîngeha Zanyarî Beşa Jiyologî li Bexdayê bi dawî kiriye.

Rolekî mezin di warê hunerî de lîstiye û gelek pêşangeh li Bexdayê vekiriye. Gelek rojname û kovarên erebî û kurdî li ser hunera wî nivîsandine. Babetên vî hunermendî li ser siruşta Kurdistan in. Mîna jiyana civaka kurdî, kar û barên rojane bi rengên girêdayê folklor, civak û siruştê Kurdistanê. Ev hunermend heta niha jî kar û xebatên xwe yên hunerî berdewam dike û niha li başurê Kurdistanê dijî. Herwiha çendîn hunermendên din yên ne girêdayiyê ti peymangeh û xwendinên hunerî bûn û li beşên din dixwendin, lê rolekî mezin di warê hunerî de dîtin û berdewamî bi xebata hunerî dan û hin din pêşangehan li Kurdistanê û derveyê Kurdistanê vekirine. Her yek li ser rêbaza xwe ya taybet e. Wek: Hunermend *Star Eli, Slêman Elî, Îmad Elî, ûwd.. Sîrwan Şakir* : Yek ji hunermendên ku girêdayiyê stîleke taybet e û rengên wî ji siruştê Kurdistanê û civaka kurdî ne. Niha jî li Peymangeha Hunerên cwan ya Duhkê mamostayê hunerî ye. Piştî serhildana 1991 an gelek sazî û bingehên rewşenbîrî û hunerî li başur çendîn zanîngeh û peymangehên hunerî vebûn. Ew jî pêşniyarên hunermendan bûn, ku gelek hunermendan amadebûna xwe nîşan dan, ji bo bêyî berjewendiyên taybet amade ye li van dezgehên hunerî kar bike. Piştî vebûna peymangehên hunerî, mamostayên kurd bi xwe şiyan rêberî û karên hunerî li ser astekî zanistî berdewam bikin û pêşde bibin. Ev bû sedema wê yekê ku hejmareke pir ya kur û keçên kurd li van peymangehan bixwnin û her sal bi sedan hunermend ji van xwendingehan diblomayên hunerî werbigirin û her sal çendîn pêşangeh û festîvalên hunerî saz bikin. Armanca me ya serekî ji vê pirtûkê ew e ku li gor şiyan û jêderên ketin ber destên me, em ê hewil bidin ku li çar parçeyên Kurdistanê hunera şêwekarî ya kurd bidin nasîn. Hunermendên kurd û dîroka hunera şêwekariya kurd bidin nasîn. Bila tablo bibe zimanê hemû gelan û hemû devokên kurdî. Bila firçeyên resamên kurd, bi hizr û rengên siruştê Kurdistanê, bikin tabloyekî yekgirtî û Kurdistanî. Rudanên trajedî û komedî bi resenatiya kurdî bêne xemilandin û bibe tabloyê aştî û serkevtinê. Ev jî daxwaz û hêviya gelê kurd e weke arşîvekî Kurdistanî di hizra her kurdekî de bimîne...



**Tabloyê Şehîd Selman Zaxoyî**

## Şehîd Selman

Di xortaniya xwe de bibu xwedî hêzeke hunerî, di afrandin û reng û pêkhata tabloyekî hunerî de. Xwedî hestên nazik bû giringî dida ruxsarê tabloyî li ser bingehekî hunerî û zansta rengan, lêdanên frçey li ba Selmanî hestên mirovî dilivandin. Hind caran di rengên avî de şefafyet dida tabloy runahî û sêber di tabloyda birengan hawseng dikir, tîrojkên rojê şerê tariyê dikir û bala mirovî dikşand. Rengên xwzaya kurdistanê zaroktiya şehîd selman nîşa

dida bîreweriyên gunda û kulanên bajarokê wî zaxoya delal li ser lêva rubarê Xabûr digel pêlên avê dmeşiya, di rengên wî de av û awazên teyran digehane guhên me, ji aliyê naverokê ve dixwest viyana xwe ya netewî bi zimanê reng û cwaniyê nîşanî cîhanê bide. Buyerên didema wî de di qewmîn di çarçuveya hêrişên berdewam li ser welatê wî bibune babetên tabloyên wî , wî dixwast di vê cîhana hunerî de van bîreweriyan bike dîrok di tabloyan da. Lê hevrikiya wî ya jiyanê û eşqa kurdistanê ew palda ku di meydana xebatên nihênî da dinava cergê dojminî da nameya xwe bigehîne. Bîra min tê li sala 1986 ê em bihevre bûyîn.li ser navê hunermendên Duhokê me pêşangehek li Hewlêr, Silêmanî û Duhokê vekir, dema em di runiştîn yan di pêgehê de pirsek jê di pirsî wî bi dilek gerim û ruyekî biken gutin dibersivandin. Piştî vegera me bo Duhokê ew çu Zaxo pirojên meyên hunerî hêşte diberdewam bûn, lê didemek kêm de ji aliyê çekdarên rijêma Beis ve hate zîndanîkirin û di demekî kêmda,hêşta hêviyên wî di singdabûn, frçeya rengîn didest de, palêta reng tevlihev libersingî bû tabloyekî nîvtemam bi cih hêşt û digel karwanê şehîda birêket. Şehîd selman digel çend hevalên wî li gurepana leşkerî li Feyîdiyê nêzîkî bajarê Duhokê gulebaran kir. Ji ber vê yekê me ji hejî dît ku karwanê wî yê hunerî berdewam bibe di hestên hemû hunermend û hevalên wî de, piştî serhildana 1991 ya pîroz, me Geleriyek binavê (Galeriya şehîd Şelman) li bajarê duhokê vekir û pêşangeha yekem ji bo wî hate vekirin. Nihajî rojane hevalên wî û gelê wî li dîdara wîne û bihevre berhemê xwîna wî tê libîranîn.

# Hunera Şêwekarî di Bakûrê Kurdistanê de

Dema mirov li rewşa gelê kurd dinêre û hin rûpelên dîrokê dikole, koçberî, serhildan, qetilkirin û ji holêrakirina gelê kurd bi çendîn şêweyan tê ber çavan. Her bûyerek ji van dibe mijarên roman, helbest, tablo, şano û çîrokan. Lê digel vê yekê jî gelê kurd dest ji kultur û hebûna xwe bernedaye. Bi sedan û bi hezaran qurban di vê rêyê de dane.

Bitaybetî dema em piştî avakirina komara Tirkiyê û serdestiya Kemal Atatûrk û înkarkirina nasname, ziman û kultura gelê kurd rewşa gelê kurd li Kurdistana bakur bigirin pêş çav, wê demê tê dîtin ku Kurd di rewşeke gelek aloz û dijwar de jiyane. Ev yek jî bû sedem ku hunermend û rewşenbîrên Kurd bi şêweyekî taybetî nikarin armancên xwe di karên afirandinê de bînin ziman. Lê dîsa pştî dûrketina ji welat û hatina gelek hunermend û rewşenbîran ji bo welatên Ewropa û Amerîka û Aûsturya ûwd.. li derveyê welat bûne egera berdewamî û pêşdebirina xebatên hunerî. Dîsa piştî avakirina hin saziyên kurdî yên li derveyê welat, bêhtir Kurd şiyan hebûna xwe pêş çav bikin û xebatên xwe bidomînin. Hunera şêwekarî jî beşekî herî giring ê vê xebatê ye. Lewma gelek hunermendên kurd bûne xwedî navên mezin û di nava neteweyên din de tên naskirin. Lê berî em hin ji wan navan bigirin pêş çav, em dixwezin pêşengiya hunera şêwekarî li Kurdistanê ji kê û di kîjan demê de serhildaye û mîna xelekeke bi hev re girêdayî di hemû qonaxên jiyanê de heta îro berdewam bûye? bibersivînin. Dibe ji egerên siyasî û parçebûnê hin caran ji hev veqetiyayî bin û gelek tişt jî li me wenda bibin. Lê dîsa çend mînak li ber destên me mane û em dikarin pêş çav bikin.

Weke di rûpelên pêşî de min eşkere kiriye û bi şêweyekî berfireh em li ser hunermendiya dîroknivîsê kurd *Şerefxanê Bedlîsî* û *Abdelxanî* rawestiyan ku çawa ne tenê li bakûrê Kurdistanê,

belku li seranserî Kurdistanê weke bingeha hunera şêwekariya kurdî em bi nav dikin. Pêwîst e weke xwendingehekî hunerî were hijmartin.

Herweha bikaranîna hin nexş û nîgaran li ser derî û pencereyan û weke şêweyê mînatur li ser bergên pirtûkên kevin û bi şêweyê dastan û efsaneyên kurdî hatine resimkirin (sala 1596an ). Ev jî yekemîn komela mînyatura kurdî bû ku jiyana siyasî û civakî ya gelê kurd dianî ziman. Herweha hêja Dr.Memo Osman dibêje: *«Di jêderekî almanî de min dît, ku gerokekî alman piştî têkçûna şoreşa Bedirxaniyan wiha nivîsiye; `Li koçka Bedirxanî hin tabloyên ciwan mabûn ku resamên kurd dirust kiribûn lê hemû hatin windekirin û têkdan.` »*

Piştî damezrandina komara Turkiyê û peymana Lozan li sala 1923 a kurdistan bi yekcarî hate parçekirin li ser çar welatên dagîrker, vê yekê jî berjewendiyên rojava û van welata diyar diken. Hunermendên Kurd jî weke hemû gelê kurd kete bin zordariya vê rijîmê û nekarîbûn bi serbestî ramanên xwe yên hunerî bînin ziman û derînin holê. Bi giştî gelê Kurd di rewşeke ne baş de dijiya. Ev jî bû sedema wê yekê ku hunermendên Kurd nekarî xwendin û pêşdaçûnên hunerî pêk bîne. Tenê hin hunermend karîbûn hunera xwe pêşde bibin û hin jî şiyan bên derveyê welat û bi şêweyekî azad xebata xwe berdewam bikin. Ji ber ku li Turkiyê jiyaneke taybet heye, bitaybetî jî li ser gelê kurd, ji sedema înkarkirina gelê kurd û rênedayîna hunermend û rewşenbîrê kurd û dirêjbûna şer, kûştin û koçberiya Kurdan bu sedema wê yekê ku hunermendên Kurd girêdayê vê rewşê bimîne. Gelek kesan hunera xwe di nîvê rê de hîşt. Lê em dikarin li gor derfet û çavikên ber dest, ronahî bidin ser tabloyên çend hunermendan û em di karin li vir bi xwendevanî binasin.

## Remzî

Dîroka xewn û xeyalên Remzî sala 1928an destpê dike. Ew li bakurê Kurdistanê, di ber çiyayên ku nîzikê Antakyayê ye, tê dinê. Zaroktiya wî li wir dibore. Ew bi toreyên eşîrî û koçerî yên kurdî mezin dibe. Kes û karên wî her tim li dora wî ne. Koçerên kurd

havînan diçin zozanan, zivistanan dadkevin gund, navçe û bajaran. Jiyan rengîn e, reng jiyan e. Şêniya darûberan, keskahiya biharê, bilindiya serê çiyan, keskesora xunava biharê, şînahiya ezman, zerahiya çirûskên stêrkan, sorahiya tava hingurî, reşahiya kon û reşmalên kurdî zaroktiya Remzî radipêçe. Reng dibe parçeyekî jiyana wî. Rengên yekta yên cil û bergên keçên xama yên sergovendan bi nexşên kurdî re dikevin hest û bîrên wî. Hê di neh saliya xwe de dest davêje pênûsê û xîçan çêdike. Dar û ber, zinar, çiya, av û çem, teyr û tewal, zom û zozan, heyv û stêrk bi xîçên wî hêdî hêdî dikevin ser kaxizan û hunermendiya kurdekî dixemilînin. Ew, sala 1947an yekemîn pêşangeha xwe li *Kirixan* û *Iskenderunê* vedike.



**tabloyê Remzî**

Gelên herêmê gelek bi kêfxweşî pêşwaziya tabloyên wî dikin. Lê ne ew bi xwe, ji ber ku jê re zanîna hunerî, têgehiştin û hostayî, cîhaneke nûjen û fireh, Jiyaneke hunermendî divê. Ew berê xwe dide Stembolê û li wir *Akademiya Hunerî* dixwîne. Ew, sala 1948an pêşangeheke xwe li *şişlî Halkevi* yê vedike. Paşê dibe yek ji damezrêner û endamê guruba *Onlargurubu* ku di hunermendiya Turkiyê de cîhekî taybet digire. Lê ev xebat û xwendin û pêşangeh jî têr nakin, jê re hîn bêhtir pêşketin pêwîste. Sala 1953 an ew berê xwe dide *Parîsê.* Cîh û warê resam û hunermendan, navenda ronakbîrî û hunermendiyê. Li Perîsê dest bi xwendingeha *"Iecole*

*des Beaux-Arts* dike. Di dawiya salên 1950an de, ew celeba resamiya xwe dibîne; *Peysage* (bergeh) û *Nature-morte*. (xweza)

Li Parîsê bi hezaran resam û hunermend hene. Lê kêm ji wan bûne navên nas û bikarin bi hunermendiya xwe bijîn. Remzî ji wan kêm kesan e. Ew navekî nasyare. Piraniya hunermendên li Parîsê û li cîhanê wî bi navê *«le Peintre Kurde Remzi»* yanê; Resamê Kurd Remzî dinasin. Dema sala 1988an komkûjîya Helepçê li başurê Kurdistanê çêbû, Remzî li Parîsê bi rêveberiya xwe pêşangehekî mezin bi resamên kurd, tirk û frensî ve vekirin. Heta niha bi dehan pêşangehên wî li Frensa û welatên din hatine vekirin. Tabloyên wî li gelek galerî û muzeyên navdar ên Frensa, Yekêtiya Dewletên Amerîka, Swîsre û Turkiyê hatine hilawîstin. Herweha bi vekirina Enstîtuya Kurdî li Parîsê, Remzî tabloyekî xwe yê mezin pêşkêş kir û niha jî li wir amade ye. Rengên ku Remzî di tabloyên xwe de bi kar tînin, rengên taybetiyên kurdî û jiyana kurdewarî ne. Lê hin şêweyên hunermendî li ser bingehekî cwanî û zanistiî bi kar tîne. Mirov dikare bêje wî hem bingeh parastiye û hem jî rêbazeke taybet ji xwe re danîye. Wî sala 1971an de pêşangehek binavûdeng li *Musee Laon* vekir.*Therese Essen* di kateloka wî ya vê pêşangehê de wiha nivîsiye: «*Li vir Remzî ji min re got, ku* **`Min hemû hunermendiya xwe ji bingeha zaroktiya xwe werdigirt. Berî her tiştî ez resamekî hisî me.`** *Heke ji nêzîk ve mirov bala xwe bide tabloyên Remzî, mirov dibîne ku rengên tarî desthelat in. Gava me hevûdû dît, min jê pirsî, çima? Wî jî bersiva min da* **`Ji bo resmekî kurd çima na?` »** Di resmên wî de rengên trajediya kurdî xwiyane. Ma terajediya kurdî jî ne parçeyekî bingeha jiyana kurd e? Kesera dûrê welat û xemên kurdan bi rengên trajedî hêdî hêdî direşîne ser palêtê û dibêje: **«Tabloyên min nakenin, ken lê nînin.»** Hêja Mehmed Uzun jî weha dibêje: *«Dema ez diçûme atoliya Remzî, her tim palêta wî rengên nû li ser bûn û tabloyek di dest de bû, li kêleka wî maseyek hebû û li ser maseyê hin mêweyên çilmisî hebûn. Dema min jê pirsî, ev çi mêweyên çilmisî ne? Wî got:* **`Ew dibine bingeha Ilhamê.`** *Matîsse jî pare deyn dikirin, mêwe dikirîn û diçilmisandin, paşî resim dikirin.»* (59) Li vir jî dema mirov rengên tarî û trajîk dibîne mêweyên çilmisî tîne bîra me, tabloyê wî yê binavê"*Femme au col de fourre.*" Tablo, bi rengên tariyê pêçayî ye. Jinek resim kiriye ku nakene, (mîna ew dibêje; «**rengên min ken têde nînin»)** dilê wê tijî keser in. Çavên wê di kûrahiyê de ne û bi

---

(59) Muhemed Ozon -Kovara nûdem jmare 2. 1992.rûp.8 Swêd

kûrahî difikire. Ew li dûr dinêre. Rû û rûçik mîna mêweyên çilmisî yên atoliya Remzî ne. Pîrê jê re pêşeroj nîn e, paşeroj jê re bûye jiyan. Di nav tariyê de pîrejink e. Lê ev tablo, ev reng, herwekî yên din, bala mirovan dikşîne, mirovan dihejîne, pirsiyara «çima?» tê bîra mirovan. Lewma jî ew rengên tarî pêktîne û ev renganan dibine jîndar, bejnên xurt jê dardikevin. *Henri Van Lier* di kateloga pêşangeheke Remzî de nivîsiye û Remzî mîna endamekî *"Lecole de Paris"* (Xwendingeha Parîsê) dinirxîne. Ji bo resamekî xerîb, ku ji welatê xwe hatiye Frensa û li Parîsê bi cîh bûye, ev binavkirin payebilindiyeke mezin e. Ji ber ku hîmdarên Xwendingeha parîsê resamên mezin mîna *Van Gogh* û *Cezanne* ne. Henri dibêje: «*Şopên **Van Gogh** û **Cezanneyî** di tabloyên wî de hene. **La Fornaçe** çiyayekî li navçeyê **la Drome-poät,Sigillatê** ye. Remzî bergeha çiyan dîsa bi rengên xwe yên taybetî, çêdike. Reng tarî ne, ewr û ezman, dar û ber, quntar û gopîkên çiya bi tonên cihê yên tarî pêk anîne. Ev rengên tarî bi carekê dibin maforeke rengîn û jîndar."* Henri Vanlier dibêje: *"Ez di tabloyê **Le fautewil an boaquet** de jî, di gel rengên taybetî yên kurdî, rengên şaristaniya mezopotamiyayê jî dibînim."* Bi vî awayî ew hunermende rengên netewî û navnetewî pêk tîne. Di vê stîlê de û bi van rengên taybet, ew tabloyên bedew diafirîne.



**Tabloyê Riza Topal (Helebje)**(60)

(60) katelok Riza Topal Gisela Barçe- Ein Kurdisçer Maler.haus der kulturen der welt.Gm berlin 1990

## Riza Topal

Sala1934an li gundê *Hurlmanê* li herêma Dêrsimê li bakûrê Kurdistanê ji dAyik bûye. Ji sala 1950an evîna resm ketiye dilê wî û bûye evîndArê vê rêya pîroz. Di vê rê de xwe amade kiriye ji bo berdewamiya vê xebata hêja. PiştÎ çendîn pirtûk li ser hunerî xwendin, zanîna wî ya ser hunera Ewropî çêbû û giyana hunera Emprsionizmos li cem peyda bû. Ji ber ku ew bixwe di nava siruştê Kurdistanê de jiya ye, dîmenên ciwan ên Kurdistanê bandora xwe li ser nêrînên vî hunermendî kiriye. Sala 1953an li bajarê *Meletiyê* çendîn semînar li ser hunerî pêşkêş kiriye. Yekem pêşangeha xwe sala 1956an li *Enqereyê* vekiriye. Sala 1957an weke mamostayek li Çepaxçûrê (Bîngol) ders daye. Salên 1958-1959an Li *Pirtûkxaneya Cîhanî li Enqere* pêşangehek din vekiriye. Herweha Salên 1964-1966 gelek pêşangeh vekiriye. Ji ber rewşa li Turkiyê û bêhtir bi karê xebata xwe ya hunerî bibe serî naçar bû ber bi Ewropayê were û sala 1968an di nava yanzdeh mehan de li *Inistituta Goehte,* li ber destê *Rudî* xwendiye û gelek pêşangeh li vir vekiriye. Salên 1968-81an heşt caran çûye Parîsê. Sala 1971an li *Galeriya Ruf* li bajarê *Munçen* pêşangeh vekiriye. Pêşangehek li sala 1972an li bajarê *Kil* vekiriye. Sala 1973an ber bi Tunis ve çûye. Serdana wî ya dawiyê li Kurdistanê, Sala 1975an bû û heta niha nikare biçe welat.

Herweha gelek pêşangeh li gelek welatên din vekiriye. Topal di destpêka karên xwe yên hunerî de girêdayê rewşa civaka kurdî bû. mina; dîmenên ciwan ên welatê wî weke ciwaniya çiya, deşt, zozan, gul û çîçekan, rengên teyr, sulav, robar û kaniyan. Herweha jiyana cotkarên Kurdistanê û girêdana wan bi kişt û kalî û xaka welat ve. Ev bûne mijarên tabloyên wî. Dema li Almanyayê jî dijiya girêdana wî bi xaka wî re hebû. Wî jiyana welêt li ser bingeha hunerekî nûdem diafrand. Dema ew hunera xwe li ser rêbazên hunera rojava pêktîne, her tim kultura gelê kurd bi vê re girê dide. Piştî pêncî salan ew şiya tabloyên xwe bi vî şêweyê pêk bîne û jiyana kurdewarî bi hemû şêweyan di tabloyên xwe de eşkere dike. Ji bo cara yekê li Enqereyê girnijîna zanista hunerî li ser lêvên wî peyda bû, weke evîndarekî hunerî bû. Lê wî dixwest ji çarçoveyê sistem û civaka Turkiyê derkeve û li derveyê welat bêhtir bikare giringiyê bide vê xebatê. Li Parîsê li ser şêweyê

hunera împrsiunizim û Copîzmosê xwend. Weke viyaneke taybet ev şêweyê hunerî li cem peyda bibûn. Dema li Kurdistanê bû, tabloyên xwe li ser du naverokan şirove dikiri. Weke piraniya hunermendên kurd, ji sedema bindestiya siyasî nikaribû hunera xwe rasteûxo pêkbîne. Ji ber ku sistemê dixwest li gor daxwazên wan karên hunerî pêk bên. Ev jî nerehetiyek bû li cem Topal. Wî dixwast tabloyên wî bibin xwedîk û jiyana gelê kurd tê de eşkere be. Ev jî paldanek bû ji bo şiroveya jiyana gel a ji dîroka hatî windakirin. Ketina bin bandora ola musilmaniyê li ser civaka kurdî û nêrînên wî çarçoveyek teng çêkir. Civak, di vê çarçoveyê de maye û nikaribûye aliyên din yên jiyanê pêk bîne. Heke hin aliyan eşkere kiribin, ev jî ferzkirinên bandora hunera musilmaniyê bûn. Ev yek jî karekî zehmet bû li cem hunermend. [61] Ji ber ku wî dixwest piraniya berhemên xwe li ser rewşa kurdan û civaka kurdî pêk bîne. Mijarên wî yên sereke; cotkar, gundî, nexş û rengên kurdî bûn. Topal xwe ji reyalîteya gelê kurd dûr nexist. Bi çi awayî be girêdana wî bi welat û gelê wî ve heye. Çi ji aliyê naverok û çi ji aliyê bikaranîna rengên kurdî û motîfê kurdî û remzên kurdî ve. Babetên wî weke: komkojiya Helebce, Mezopotamya, azadî, Xec û Siyamend û karên rojane di civaka kurdî de ne. Di tabloyên Riza Topal de xwiya dike ku bi xeyalî diçe Enadol, bajar, gund û çiyayên Kurdistanê û avê ji kanî û rubarên Kurdistanê vedixwe. Bi cotkaran re xwarnê dixwe. Pal dide wan nexşên li ser dîwar û Maforên nava malan. Vî hunermendî armanca xwe ya zarokiyê bi dest xist, piştî gelek astengî ketinan. Hin caran derî lê dihatin girtin û wî bi xwe derên nû vedikirin û li jiyaneke nû dinêrî.

Hunermendê Turk *Bedrî Rehîm,* piştî şerê cîhanî yê duyem bandoreke mezin li ser hunermendên li Turkiy ê kir. Bitaybetî piştî tabloyê wî yê bi navê *şemalka şevê* ku niha li Muzexaneya Stenbole ye. Topal jî yek ji wan hunermendane ku ketiye bin bandora Bedrî Rehîm. Herçêqas gelek caran Topal dikete ber hêrişên dewleta Turk jî, lê weke hunermendekî xwedî helwest, kar û xebata xwe bire serî. Ji ber vê yekê ew şiya cihê xwe di dilê gel û evîndarên hunerî de bike û bibe navek di dîroka hunera kurdî de. Stîla vî hunermendî her ji zarokîya wî tê, di zaroktiyê de hin

(61) Gisela Barçe- Ein Kurdisçer Maler.haus der kulturen der welt.Gm berlin 1990

xwestek li ber dilê wî bûn. Vê jî di dawiyê de bi dest xist. Vejîna kultura kurdî û dîroka Mezopotamiyayê li ser bingehekî zanistî û nû di tabloyên xwe de bikar anî. Ev yek jî weke hevrikiyekê di navbera hizirkirin û pêkanînê de peyda dike. Dirustkirina fîgur karekî bi zehmet bû. Lê ew weke serkêşekî xwe dida nasandin. Wî rengên ciwan ên Kurdistanê bi şêweyekî ciwan bi kar aniye. Her rengek di cihê xwe de bi rêk û pêk e. Di tabloyan de viyana vê rêbazê di rengên wî de weke barovekê bû.

Piştî ku Topal li ber destê *Rudî* xwend, li ser bingehekî zanistî li bajarê *Munçen* bêhtir xwe berda nava cîhana hunerî. Wî dixwest weke hunermendekî xwedî rêbazeke taybet di cîhaneke taybet de nêrînên xwe bîne pêş çav. Ev jî pêwîstî berxwedaneke mezin û berdewamiyê heye. Lê *Rudî* destekekî giring bû ji bo Topal bişê di ezmûna xwe de bibe xwedî taybetmendiyek. Ji ber ku wî dixwast li ber destê hunermendên mezin yên Ewropî bixwîne û jêre bibe weke serkaniyeke zelel û ew bikaribe ji vê serkaniyê avê vexwe û rengên xwe bi şêweyekî nazik bi kar bîne. Vî hunermendî gelek tablo bi şêweyê reş- sipî resim kirine. Bitaybet bizavên mirovan bi hemû şêweyan, bitaybetî runiştî û şêweyê girafîk gelek giringî dida xetê. Di du tabloyan de babetên civaka kurdî weke tabloyên darêtina hunerî bi kar aniye. Herweha mirovên kal û bi rih, dar, teyr û jiyana gund di tabloyên xwe de nexişandiye. Mirovên birîndar ên di şeran de resim kiriye. Di piraniya tabloyên wî yên rengîn de mirov û hizirkirina mirovî beramber siruştî û jiyanê, Kurdistan û civaka kurdî cîh girtine. Ev tablone bi alîkariya teknîk û rêkxistina rengan bi şêweyekî harmonî bi rêk û pêk in. Dîsa siwarên hespan, karwan, govend û cotkar babetên tabloyên wî ne. Ji ber bihayî ya metiryal wî nikaribûye gelek rengan bi kar bîne û piranî rengên vebûyî bi kar aniye. Hin tabloyên wî jî rengên wan têk çûne, xerab bûne. Weke tabloya Xecê û Siyabend.

Piştî durketina Topal ji gel û welatê wî ku ev 25 sal in, hêdî dêdî motîfê kurdî lê winda dibe. Topal hewl da ber bi hunera rojava biçe. Lê ew meloliya welatê xwe di şiyîr û tabloyên xwe de eşkere dike. Wî xwe mina teyrekî didît, lê nikaribû bifire. Hin caran di cîh

de dima û nikaribû bifire. Xwe weke xudîkeka parçekirî didît û di xwest Kurdistanê bi jiyaneke nû bîne ber çavan. Gelek kesayetiyên kurd yên weke hunermend **Yilmaz Guney** di tabloyên xwe de bi kar anîne.

Tabloyê **Helebçe** balkêş e. Ev trajediya bi şêweyê siruşt û mirov û xwezayî bi hev re bi kar aniye ku şaxên dar û barên hişk, şor û melul bûne. Mirov di cih de û zarok di hembêzên dayikan de mirî ne. Ajal û hemû jiyan bi perdeyeke reş dapoşiye. Wî ti caran nedixwest di navbera mirovan de şer çêbe. Ji ber sedema şer bi hezaran kes derbeder dibin û jiyan bi bê dengî tê dapoşîn. Vê reyalîteyê, jiyana gel û siruştê Kurdistanê di tabloyên xwede bi kar aniye û nîşanê cîhanê daye. Wî dixwest tabloyên wî di cîhanê de bibin nûnenerên gelê kurd. Di atoliya wî de bi sedan skêç, tablo û pirtûkên li ser hunerî cîh girtiye.

Gelek rexnegir û hunermendên alman û biyanî li ser vî hunermendî nivîsîne. Weke **Doris sçmidt** sala 1984an li ser nivîsandiye. Topal, di heman demê de helbestvan e jî. Helbestên wî carna dibin tablo û bi hev ra jiyana Kurdistan didin ber çav. Ew pir hez ji felsefe, edebiyat û zanista siruştî dike.



**Tabloyê Kurdey** (62)


(62) katelog Alfred Laçauer, Kurdey, Zivilisation Münçen,Elmanya

## Kurdey

Roja 21.10.1952an li Dêrsimê bakurê Kurdistanê ji dayik bûye. Mîna cotkarekî vê deverê jiyana xwe ya destpêkê borandiye. Ji ber têkiliya wî bi siruşt û karên civakî evîna nîgarmendiyê di hizrên wî de ser hil da. Destpêka xwendina xwe ya seretayî ber bi evîna pîroz ya tabloyan ve çû. Wî dixwest jiyanê ji nû ve wêne bike û hestên xwe yên nazik bi cîhana ji derve re girêbide. Hêdî hêdî xebatên xwe berdewam kir taku li bajarê Stembolê *Akademiya Hunerî* bi dawî kir. Ji sala 1980an û vir de weke hunermendekî şêwekar hate nasîn. Paşî li bajarê Munçen li Almanya *Akademiya Hunerî* bidawî kir

Vî hunermendî gelek pêşangeh li gelek welatan vekirin, taku sala 1990an li Elmanya jiyana xwe ji dest de. Û karwanê xebata wî di cîh de ma. Vî hunermendî gelak tablo li paş xwe hîştin. Sazî û dezgehên elman çendîn katelok ji bo karên wî yên hunerî çap kirin û tabloyên wî li hin cîyan hatin parastin. Piraniya babetên tabloyên vî hunermendî li ser rewşa kurdane. Hin tabloyên wî li ser rewşa îroyîn ya cîhanê û ew kiryarên ku li dijê mirovatiyê tên pêk anîn . Hin jî Weke Helebçe, koçberî û terora ku li ser gelê kurd tê meşandin. Herweha hin tabloyên wî li ser jiyana wî ya taybet e êş û azarên di hundirî wî de rojane digel dijîn. Dîsa hin tabloyên ku derbirîna ser û çavan dike, bi şêweyên sorralî çêbûne. Tabloyên wî hemû beşên jiyanê bi xwe ve girtine. Reng û hestên Kurdayî ji durewelatî û koçberiyê pêkdihatin, herweha peywendiyeke dur ji jîngeha wî û civaia wî digel welatekî serdest û xwedî tiştên pir dur ji civaia wî bihevre lê dinêrî. Evjî di tabloyên wîde weke lê geryana rastiyê bo. Bi awayekî rexneya hûnerî li karên dur ji civak û jiyanê dinêrî, lewma hertim ne rehetî li ba hunermendî xweya dike û hûndurê wî digel xeyalên ew dibîne di şerekî dijwarde bûn. Di bo egera ji daykbûna tabloyekî nû taku rengên wî jî di cudabûn, gelek caranjî bi pênusê reş skêçên biçuk li ser kaxez û kartonê wêne dikirin, tiştên rojane wî didîtin hem di hizrên xwede hemjî di wêneyên biçukde bixwere di anîne malê û tabloyekî mezin pêk di anî. Bi vî awayî şerenîxa wî û jiyanê bo, ew her tim li rastiyê digerî

ku di xizmeta mirovatiyê dabe. Lê mixabin berî ku vê evîna pîroz pêşkeşî mirovatiyê bike mirina reş rê lê girt û di nava tariyê de wenda kir. Berhemên xebata wî, pîroztirîn û bihatirîn diyarî ne jibo gelê wî û tevaya mirovatiyê.[63] Niha jî piraniya tabloyên wî li Enstituta Kurdî ji bo zanist û lêkolînê li Berlin hatîne parastin.



**Tabloyê Leman** [64]

## Leman

Sala 1967an de li bakurê Kurdistanê ji dayik bûye. Ji sala 1986-1988an li ser karê keramîk xwendiye û salên 1988-1992an jî li Eskîşehîrê grafîk xwendiye. Piştî hate Almanyayê gelek pêşangeh vekir. Bi çendîn grup û hunermendên biyanî û kurd re karên hunerî pêk aniye û pêşangehên hevbeş vekirine. Niha *Li* Almanyayê li *Dortmuntê* dijî. Niha jî berdewame li ser xebatên xwe yên hunerî.

(63) Kurdey Zivilisation?Atomzitalter und Kunst.Münçen
(64) Neue Perspektiven 1996 Mezopotamien Verlag,1996 Elmanya

## Misto

Sala 1960an li Kurdistana bakur ji dayik bûye. Ji zaroktiya xwe dest bi karê hunerî kiriye taku gihiştî Swîsre. Li vir bêhtir kete nava xebatên hunerî û çendîn pêşangeh pêk aniye. Hunera wî bêhtir li ser abstrak tê xûyakirin û dabeşkirîneke bi rêk û pêk ya rengan di tabloyên xwe de bi kar tîne.[65] Niha li Swîsreyê li bajarê *Luzernê* dijî.

Herweha gelek hunermendên din mîna ***Abuzer Çlişkan, Remzî Toşklan, Mistefa Enkmen, A.Celal Binzet*** û gelekên din xwedî hunermendiyeke mezin in û çendîn pêşangehên hunerî pêk anîne û dîsa li ser kar û xebatên xwe yên hunerî kar dikin. Bitaybetî piştî van hunermendan, Akademiya Hunerî li Stembolê bi dawî kirin bêhtir li ser rêbaz û zanistiya hunerî karên xwe pêş de birin.



**Tabloyê Ilter Rêzan** (66)

(65) Neue Perspektiven 1996 Mezopotamien Verlag,deutşland.
(66) Neue Perspektiven 1996 Mezopotamien Verlag,deutşland.

## Îlter Rêzan

Sala 1960an li bakurê Kurdistanê ji dayk bûye. Ji ber sedemên siyasî û rewşa gelê kurd li Turkiyeyê hunermend û rewşenbîrên kurd nikaribûn bi şêweyekî azad û serbest jiyana xwe ya hunerî berdewam bikin. Weke hemû beşên din yên Kurdistanê. Weke di destpêkê de me gotibû; ev yek bûye sedema koçberiya gelek hunermend û rewşenbîran. Hunermend Rêzan jî yek ji van hunermendan e ku bi dîrok û rewşa netewa xwe ve girêdayî ye. Di salên 1978-1980an de di F*akûlteya Zimanê Frensî* ya Enqereyê de dixwend.Wek penaber hate Almanyayê. Li vir xebatên xwe yên hunerî berdewam kir. Salên 1990-1994an li bajarê Freiburgê di *Akademiya Hunerî* de xwendina xwe bi dawî kir. [67]

Rêzan di berdewamiya xebata hunerî de bû xwediyê rêbazeke taybet û di navbera realîte û abstrak de piraniya tabloyên xwe nexşand. Felsefeya hunerî li cem vê hunermendê di pîvanên hunerî de bikar hatiye. Ji ber ku têkelî û karkirina wî digel gelek hunermendên kurd û biyanî yên navder hebû. Ew jî di vê qadê de bû xwedî serboreke hunerî. Tabloyên wî hin şêweyên hunera nû bi xwe re girtîne. Hunermend hêdî hêdî ji abstrakê derdiçe û dîroka mezopotamyayê weke berdewamiya jiyanê hildigire û ji keştiya Nuh dest pê dike û ber bi roja îro tê. Ev jî girêdana hunermend ya bi welêt re dide xûyakirin. Dîroka dirêj bi şêweyê abstrak li ser bingeha hunera nû ya rojava pêk tîne. Di vê xalê de hunermend şiyaye gelek qonaxan bibire û berbi armanca hunerî dimeşe. Jiyanê, weke qonax qonax di çend tabloyên bi hev re girêdayî de resim dike. Ev tablo weke çend parçene, lê li di dawiyê de li ser bingeha hunera nû ya cîhanî tabloyekî yekgirtî pêk tîne. Ev jî beşeke ji şarezayiya hunermend û têkiliya wî ya bi karwanê hunera îroyîn re ye. Rêzan niha li Almanyayê û çend welatên Ewropayê yên din li ser bingeha hunera nû ya cîhanî karê xwe yê hunerî berdewam dike. Herweha gelek pêşangeh li piraniya bajarên Elmaniya û Europa vekirîne.

---

(67) neue Perspektiven mezopotamien Verlag 1996

## Hesen Bagdaş

Ev hunermend xwedî rêbazeke taybetî ye û bi meteryalên nû hunera xwe diafirîne. Sala 1948an li bakurê Kurdistanê hatiye dinê. Di zaroktiya xwe de evîndarê huner û mirovatiyê bû. Wî dixwest hêviyên xwe di bedewiya tabloyan de pêkbîne û bibe bersiva demê. Sala 1969an de bûye xwedî şiyanên hunerî û li Turkiyeyê weke mamosteyê *Akademiya Hunerî* ders daye şagirtan. Ji ber ku babetên tabloyên wî piranî bêhna polotîkayê jê dihat û rewşa netewa kurd bû sedema ku dewleta tirk vî hunermendî nerehet bike û ew nikaribe bi azadî hunera xwe pêk bîne. Lewma Bagdaş pal da wê yekê ku karê siyasî jî bike. Piştî girtin û êşkenceyê viyana huner û mirovayetiyê bêhtir di dilê wî de çêbû. Çend pêşangeh li tirkiyeyê vekir û pêşdaçuneke hunerî bi xwe ve girt û bu armanca sîstema tirkiyê. Ew neçar ma ku sala 1973an welat terk bike û li Australiya bibe penaber.

Piştî salên 1987an bûye xwedî ezmûneke hunerî. Li ser herîr û bi rengên zeytê kar kiriye.

Sala 1969an *bawernameya hunera şêwekarî* li *Kayserî*-Tirkiyeyê wergirt. Sala 1992an *bawernama diplomî* li *zanîngeha Tape* wergirt. Salên 1993-1995an li *Melbournê bawernameya Bacalor RMIT*, wergirt û li sala 1994an *Bawernameya li ser hunera kevin ya Çînê* wergirt

Ev hunermende xwediyê gelek pêşangehên taybet e. Bi guruban re jî li welatên cûda çendîn pêşangeh vekirine. Li Australiyayê sala 1998an xelata xwe ya yekem wergirt û tabloyên wî li muzexaneyên Australiyayê cîh girtîne. Nêzîkî 300 tablo di destê vî hunermendî de hene û niha li ser şêweyekî nû *jelatînî* bi rengan kar dike. Vê yekê jî bala hunermendên biyanî kişandiye. Niha karên xwe yên hunerî berdewam dike.

Herweha çendîn hunermendên din yên bakurê kurdistanê li welatên cuda yên europa û cîhanê di jîn, mîna hunermend Haşim Seyda ev deruyê akademiya hunerî ye li Berlîn,gelek pêşangehên taybet û digel giropa vekirîne. Karên huneriyên Seyda ji aliyekî ve

mîna Grafîka reş û spî tên nîşandan, ji aliyê din ve abstrak di hind tabloyan da xweya dibe herweha hunera gelerî jî di nava berhemên wî da tê xweyakirin weke nexşên maforên kurdewarî û jiyana gund û rewkî.herweha li aliyê din rewşa siyasî ya kurdan bi gştî dibin babetên tabloyên wî.niha Haşim Seyda li bajarê berlîn dijî. Herweha hunermend Adnan Mîro weke hunermendekî xwedî stîleke taybet tê nasîn ku piraniya karên wî bi ruberekî freh û bi kêr û şêwên din yên teknîkî bikar tîne. Çendîn pêşangehên hunerî li elmanya û turkiya û europa vekirîne, niha li bajarê berlîn dijî û berdewame li ser kar û xebatên hunerî.

# Hunera Şêwekarî li Başurê Rojavayê Kurdistanê

Weke em dizanîn gelê kurd ji her aliyê ve hatiye parçekirin, huner, kultur bi şêweyekî eşkere hatiye sînorkirin.



**Tabloyê Şîrîn Mola**

Hunermendê kurd bi rêya afirandinê dikare rastiya xwe û jiyanê bide ber çav.[(68)] Ji ber vê yekê jî, her parçeyeke Kurdistanê rastiyeke xwe heye û li hin rewşên taybet de dijî. Lewma li gor van rewşan hunermendên me jî heta radeyekî xwe parastine, da bikaribin di encama xebateke hunerî yê serkeftî de ji mirovayetiyê re xizmeteke giştî bikin. Ev jî weke erkekî dîrokî li ser hunermendên kurd eşkere ye. Dîsa jî hunermendê kurd şiyaye ji vê çarçovê rizgar bibe û hunereke bê sinor biafirîne û dengê xwe li cîhanê belav bike daku mirovayetî bigihîje rastiya vê ciwaniyê. Ji ber vê yekê li gor ew welatê kurd têde dijîn hin bandor bi xwe re girtine .

(68) Malpera tîrej.net





**Tabloyê Omer Hasîb(Heseke)** **Peykerê Leyla Tirk(Efrîn)**

Hin caran dema mirov li hin çavik û pirtûkên hunerî dinêre navên hin hunermendan dikevin pêş çavên mirov. Pir kesên biyanî nêrînên xwe bi şêweyekî pozetîf li ser van kesan anîne ziman. Nav û nîşanên xwe li rûpelên dîroka nû ya hunerî xistine. Gelo ev kesên kurd in? Yan nav biyanî û naverok Kurdistanî ye?! Û girêdayî reyalîteya gelê kurd in. Hin caran ew bixwe jî dibêjin giring ne ew e ez kurd bim yan na: Ya giring ew e ku em bikaribin di cîhana xwe ya taybet de xizmeta huner û mirovatiyê bikîn. Lê dîsa nikarin ji gelê xwe qut bibin. Reng û sîmayên tabloyê xwe dîsa ji hêvênê reyalîteya gelê xwe pêk tînin.(69)

Di vê parçeya Kurdistanê de, hind hunermendên xwedî şiyanên hunerî peyda bûn, stîlê wan ji hevdu di cudane, hind xwe di sruştî de dibînin lê di ruhiyeta wande peywendiyeke riyalîteyî heye û rengê sor zale di tabloyên wande. Hind jî berev Abstrak diçin û cîhaneka renga ava diken, ya bê dawî, dema bîner li van tabloya dinêre hêbetî dimîne û diçe cîhaneka din. Hîç tiştekî têda nabîne bitenê hevrikiya rengan, di her beşekî tabloy de reng remzeke ku

(69) malpera tirej.net

derbirînê ji gel û riyaliteyê dike. Piştî damezrandina Akademiya hunerî li Şamê jmareka hunermendên kurd xwe di meydana hunerî de dît. Ji wan hunermendan Abdulkerîm Mecdel Beg yek bû ji derçûyên Akademiyê ev hunermende berî biçîte Akademiyê hevrikiya reng û frçey dikir, direngên ne amade û frçên nerim de ruhyeta xem û azarên xwe der dixist divan rengên winde de kesayetiya xwe ya hundrîn aşkera dikir. Hunermend Heso Hisko yeke jiwan hunermendên digel serhatiya diaxvît Dirêya tabloy û rengan di bajarekî winda de, di windatiya tiştande reng hevdu digrin, her tiştek ji yê din cwdaye lê bi alîkariya hêlên pan û drêj peywendiyekê peyda dike. Hunermend Hejar Isa reng liba wî her tişte di hind tabloyande rastiya Fuliklorê winda Aşkera dike, rengên gerim li ba wî nepeniyên jiyanê xweya dike, tablo li ba wî rengekî xemgîne, mirovên dilnerim di dilê xwede bi hîviyên xeyalî di parêzin. Çendîn hunermendên navdar li koçberiyê dijîn bûne xwedî navên cîhanî û li her çar parçên Kurdistanê tên naskirin, weke Malva, Beşar Isa, Berhem Haco û Inayet Etar û..htd.(70)

Ez bawer dikim kêm hunermendên kurd hene ku navê MALVA nebihîstibin. Ji ber ku mirov dikare bêje vî hunermendî mohra xwe li dîroka şêwekariya cîhanê ya nû xistiye. Bi dirêjî em dikarin di rûpelên pêş me de li ser kar û xebatên vî hunermendî rawestin. Herweha navên mîna; Inayet Atar, *Behrem Haco, Zûhêr Hesîb, Omer Hesîb, Bişar Isa, Nihad Tirk, Ahmed Raid ,reşid Heso, Abdulselam abdula ,Leyla tirk, Şirin Mola, Rehîmo, Xalid, Abdulkerîm Şêx Mus, Cemal Abdol* û gelekên din bi bîr bînin. Hin ji van têkilî hunera nû ya cîhanî bûn û piraniya wan demekî dirêj e li Ewropayê dijîn. Ev hemû bûne palderên kar û xebatên hunerî. Mirov dikare li ser her yekî hin şiroveyên li ser kar û xebatên wan bike.

(70) Haşim Eliko,malpera amude.com 07.09.2004



**Tabloyê Înayet Atar(Efr**

Dema em li tabloyên Inayet Atar dinêrîn, ku eşqa Xec û Siyamenda tê bîrame jin di tabloyên wîde bi komel tên û diçin ew jî nizanin ji ku tên û diçin ku. Dinava pêlên bayê zozana û bêhna gulan û pêlên derya de dimeşin, meşa bûka ev hemû di tabloyên wî de mîna sombûl bikar tên û dibin pirs, xeyala mirova berev cîhaneka dur dibe. Divê rêbazêde atar xwe serkeftî dibîne girêdana bîranînên rojhelatî bi ruşinbîriya rojava ve hevdigirin û tablo bi rengên xwezayî ji dayk dibin.

# Malva (Omer Hemdî)

Navê wî **Omer Hemdî** ye li başurê rojavayê Kurdistanê (Suriye) Sala 1951an li herêma Girê naîf li nêzîkê bajarê (Heseke) ji dayîk bûye. Sala 1968an rewşa wî ya aborî ne baş bû û nikaribû xebatên xwe yên hunerî pêk bîne. Ji bo vekirina yekemîn pêşangeha hunerî neçar ma ku motora xwe bifiroşe û tabloyên xwe bibe bajarê Şamê, (Paytextê Suriyê). Piştî vekirina vê pêşangehê li bajarê şamê tabloyên wî bandoreke mezin li ser hunermend û rewşenbîran kir. Gelek rewşenbîrên ereb û kurd lêkolîn li ser tabloyên wî kirin û di rojname û kovarên erebî de behsa wî kirin. Wî di vê pêşangehê de serketinekî mezin bi dest xist. Ev hunermend piştî ku tabloyên xwe li meydena giştî ya şamê şewitandin bitaybet kete nava cîhana hunerî.(71)

Di warê nivîsandinê de jî Malvayî gelek lêkolîn û têkstên hunerî û rexneyî di gelek rojname û kovarên erebî û biyanî de nivîsiye. Sala 1978an gihîşte welatê Nemsa (Awûsturya) bajarê Wîn (Viyena) paytexta Nemsa. Li vir jin anî. Ji wê demê ta niha gelek pêşangeh li welatên curbecur yên cîhanê pêk aniye. Weke van welatên jêrîn:

* 1976 Nationalmuseum.Aleppo
* 1987 Palais Palffy. Wien
* 1990 Kunsthaus Göttingen
* 1991 Galerie Frankenstein.Berlin
* 1993 Galerie Art Forum.Wien
* 1994 Wally findlay Galerie. Paris, New york, Çicago, Palm Beaç
* 2000 Green Art Galerie. Dubai
* 1990-2000 çendîn pêşangehên hunerî li DYA (Dewletên Yekbûyî Ya Amerîka) wek:..Galerie Arnot, New York, Art Insight Galerie, Ambassador Galerie, Bevs Fine Art Gallery, Mercedes Benz, Renjeau Galleries,Tillting at Windmills Galleries

(71) kovara Hicelname jimare.4 Malpera tirêj.net

**Pêşangehên hevbeş:**


1980.1992 Yekêtiya hunermendên Nemsa
1985 Hunermendên cîhanî li Wîn
1986 Hunermendên nêvnetewî, Nizza “ ewroArt”, Verona
1987 “ Bologna Fiere” Bologna
1988 Budepest Art Expo
1997 Yekemîn Festîvala Hunera Hemdem a erebî Wîen
1998 Kunsthaus Wien
2001 Nêvnetewî ya erebî li Kairo (Misir) re.

## Pirtûkên ku li ser hatine çapkirin

Malva -Emer Hamdi û 20 salên xebata hunerî 1974-1994 Wien 1994
Malva û Abstract, Galerie Art Forum,Wien 2000
Malva Book 111, Galerie Arnot, New York 2001

Heta niha çendîn rexnegirên ereb, Bulgarî, Rus, Alman, Nemsawî, Amerîkî…ûwd.. li ser berhemên Malvaî nivîsandine. Herweha Sala 1990î de di ferhenga hunermendên cîhanî de hatiye çapkirin. Li bin navê (The Worlds Art Drectory) ku navê 124 hunermendên navdarên cîhanê têdaye, ji wan yek *Malva* ye. Katelokek ku hemû berhemên Malva yên salên 1968-1990an di gel rexneka hunerî ji aliyê *Niqolay Maykuviski* li bin navê (The inner Landscape) hatiye nivîsandin.

Malva endamê çendîn saziyên cîhanê yên hunerî ye wek:
Yekêtiya Hunermendên şamê
Yekêtiya Hunermendên UNCO
Yekêtiya Hunermendên Nemsa
Yekêtiya Hunermendên Ewropa



**Tabloyê Malva î Zistan (Omer Hamdî)**[72]

*Malva* di berxwedana xwe ya hunerî de gelek êş kişandine û tuşî gelek nexweşîyên derunî bûye. Lê weke wî di gotinên xwe de gotiye: *"Dema ez gehiştîme Wîn min tirs di gel xwe anîbû demekî dirêj min hevrikiya wê tirsê kir, ne ji bo wê yekê ku ez ji vê tirsê rizgar bibim, min dixwest ez wê tirsê binasim û biguherînim, bikim hêzek daku bişêm dakukiyê li xwe bikem û di karê hunerî de berhem bidim. Kesayetiya min di atmosfêrekî çav tirs û derdoreke tarî û di hawar û azarên bê deng de çêbû, ku di cîyekî de dabeş kirî bûn. Reng jî burkan bûn. Tabloyên min ev ruxsare bi cîh hîştin û ber bi hila pêşangehê ketine rê. Li utrîşlê xewnên ku li welat dirust bûn, di gel reyalîteya vir cuda bûn. Heta niha jî ji min dûr neketine. Ji ber ku ez wesan bû rudana diçim, ku nizîk bin ji xewnên min.".*[73]

Malva di wê baweriyê de ye, ku dem ji bo hunermendî pir giring e û dixwaze dema vegere welatê xwe hêviyê xwe jî bi xwe re bibe û dibêje: *"Hunermendbûn ne bi tenê ji bo wê yekê ye ku ez bibim navekî navdar û bişêm rengên xwe bi nan Biguherim"*

---

(72) Katelog Malva 20 Jahre Malerei/Paintnig 1974-1994Wien 1994
(73) Kovara yekgirtin jimare 2 .1990 rûp.226

## Malva Çawa Bû Navekî Cîhanî?

Dibêje: *Min di pêvajoya kar û xebatên xwe de gelek caran hevrikiya rengan bi tulvekirinê ve didît. Dem dihat kuştin. Lê di dawiyê de tabloyek bi berhem dihat. Ev ji bo min dibû girnijînek. Jiberku min dizanbû ku dema ez bi cidî li ser kar û xebatên xwe rawestim, wê rojek bê ezê pê kêfxweş bim. Havîna Sala 1980an Dema Pêşangeha Navnetewî li Frankfurtê lidar ket ji min re hêviya herî mezin çêbû. Sê tabloyên min di kunceke pêşangehê de bûn, li jêr desthelatiya xwediyê holeka bazirganiyê bû. Di wê demê de yek ji bazirganên navnetewî ya tabloyên bi nav û deng, Amerîkayîyekî 70 salî bi navê* Herbert Ernot *ku ji New Yorkê hatibû, tabloyên min girtin û li dûv* Malvayî *digeriya. Êvarekî ez li malê li ser erdê nivistibûm. Weke hunermendekî hejar rengên min li ser palêtê bûn, ew rengên erzan ku min tablo pê resim dikirin. Ew mirov kete hundurê oda min û ji min çend caran pirsî: "*Bi rastî tu Malva yî? Û di vê odeyê de dijî?" *Mîna bavê min di odeyê de pêkol dikir. Li lekûpekên min nêrî. Lêkûpekên mîna paşmayê şer ku li hemû odeyê belav bibûn. Paşê hemû tabloyên min bi bihayekî berz kirîn û li Emerîkayê pêşangehek ji bo min organîze kir. Ji wê demê heta niha min dest bi vekirina pêşangehan kir. Paşê min malek li ser çiyayê* Zeyton *li bajarê* Wîn *ava kir. Niha jî dema ez di ber wê mala kevin re diborim, ez şanaziyê pê dikim. Ji ber ku li vê malê, êş û azarên min kêm bibûn û ez navdar bibûm..."* Hunermendên îro rojgerk in bê efsane dijîn Heke efsane jî hebe bê palewane, bê dîrok û karîger e. Pêvajoya afirandina efsaneyeke hemdem e, ku hemû tişt têda ye: Reng digel made, ragihandin digel derunasî, siyaset digel mask, ev hemû li ser ruberekî disekinin. Malva dibêje: *"Tablo ew ruber e ku hunermend xwe têda dinase."*

## Nêrînên Rexnegir û Lêkolînerên Biyanî Li Ser Malvayî:


Dr. Esed Erebî dibêje: "Resenetiya yekgirtina navxweyî di navbera dîmenên weke yek û dîmenên dilveker. Ev hunermend li Ewropa hate nasîn bi navê Malva û li Viyena binecih bû. Nav û dengê wî hêdî hêdî belav bû. Di gelek holên hunerî de tabloyên wî hatin hembêzkirin. Li Viyena Galerieya Art Form, li Frensa Galerieya Balem Bij, li New York Galerieya Findli û li Berlin Galerieya Stein. Gelek bi zehmet e jiyana wî ya zarokatiyê bête jibîrkirin, berî koçberiya wî. Yek ji wan hunermendên ku tabloyên wî ji sedema dudilî û nerehetiyê ji dayik dibin. Yekgirtina behreya wî di karên hunerî de, hilgirê çentika tabloyên xwe ye ku remzê xerîbî û yekaneyê ye. Li destpêka karên wî kartêkirina wî li ser serûçavên cotkar û cudabûnê ye. Hest û viyana cotkaran di bajarê Hesekê de landika ji dayik bûna wî ye. Û gundên teqnê yên li derûdora wî hûr e. Bayê li serûçavên cotkaran resim dike di gel avabûna rojê. Heta nihala di gel rengên wê yên avabûnê li bin rengên agir û xweliyê di hizrên wî yên dûr de... Di gel tabloyan wî tiştên hevdij pêk dianîn; mîna zewaca avê û agir, burkan û solan, agir û baran, reş û sipî, sar û germ... Firçyên wî di buşaiyê de mîna tîran diçin di gel rengên keske sorî yên pêl pêl di hundurê wî de dikelin, mîna pêlên bayî li zeviyên genimî bide. Yan jî mîna davên şemilka tên rêsan û rengîn di van awiran de. Serûçavên keçan di xewnên wî de diyar dibin, ji xerîbî û serketina bê dawî ya girêdayê bi buşayeka dûr ve. Di gel rêbaza siruştî ya Parîsê û zengînîya xwendingeha Viyena. Malva, ma girêdayê bi bîr û hizrên xwe yên taybet ve. Dema dihate veguhastin taybetmendiyên xwe yên abstrac (razber) hevîr kirin di van pêkanînan û di afirandineke bitenê de. Behreyeke diyar di rengan de bi dest xist ku îro jî, bilindtirîn reng tên hijmartin di reyalîteya wî de. Dest ji derbirîna kesayetyê berneda, tenê piştî ezmunên nîvê. Di vê rawestgehê de tabloyên wî bi nav û deng bûn, sala 1982an li jêr navê Beyrut bingehê kesayetiya wî, buçunên hundurî yên derunî di çarçoveyekî çargoşe ya zal bûyî de li ser rêbaza wî .

Grêdana wî ya rengan mîna dîmenên rengîn yên helawîstî di maweyê abstrac û wekhevî di buşayiya çarguşe de ye. Daku sinorên nediyar pêk bîne. Bikaranîna rengan li ser dar û giran mîna belavbûna kirîstalî li ser avê tên xûyakirin. Dilopên sulavan bi rengên kesk û sor û madên ji bin erdî derdikevin. Rêxistin di lêdana

firçeyê de diyar dike, ku li Viyena distirên. Parîs û li gelek bajarên din. Giringî dayîna abstrakê li ser bingehê rêxistina; çarînên Revê 200x200 cm, çarînên Aştiyê 140 x 140 cm, Binefşok di Welat de 160 x160 cm, Hin Reng Li ser Erdekî zer 130 x130 cm. ne. Ev çend tabloyên wî bûn, ku bigiştî li ser berdewamiyên dîtinê ji parçeyên mezin ku abstrakê pêktînin. Dibe di dawiyê de weke dîmenên abstrak yên mezin bi kar anîbin. Giringî dayîna di lêdanên firçeyê de ye. Li ser ruber û hevîrê rengan vediguhêze radeyekî ji saratiya rengê şîn û rengên nêzîkî şînî, ku germtirîn rengên beramber rengên agirî û rengên nêzîkî agirî derbixe. Vehandina wan mîna davên rojê ne, weke kesk û sor derdikevin li navbera du rengên li dûv êk. Giringiyeke taybet a rengê sipî li cem heye. çi ji pileya ronahiyê yen ji ciyê wî, ji nexşê pêkhatinê ruberê sipî jî pêwîstî bi hemû tabloyê heye, wek di tabloyên wî de diyar e. Paşê ji guhertina şev û rojan di dîmenên abstirak de şêweyekî dastanî dide. Tabloya ku derdikeve jî, ji wî rengê li ser zal dibe di dîmenî de. Ew ji van guhartinên şev û rojan di yek demsalê de her çar demsalan dirust dike. Di gelek haletan de rengê şîn di xeniqîne. Şînê şevê di rengên wî yê burkanî de belav in. Rojê ji şevê derdixîne û şevê jî ji rojê. Di şevê de daveke ronahiyê peyda dike li hêla bilindiyê. Mîna tabloyê wî yê Derketî ji Ronahiyê. Lê tabloyên wî yên abstrak amadebûneke di nivîsînên azad de mukumkirina (gengazkirin) girafîkî girtiye, bi pêçanên rengan. Dest pê dike nêzikê rengê rumadî û bîrkirina wî ya şêwekarî di dîmenan de. Digel wê yekê di gelek tabloyên wî de bikaranîna rengê sor hizrekê peyda dike ji bo girêdana wî bi civaka rojhilat ve. Di hizrên wî de rengê sor û nezîkê sor mîna rengên siruşt û baxçeyên jîngehawî ya despêkê ne. Di tabloyên wî de û di lêdana firçêyê û buşahiyê de mirov hîs dike ku hemû laşê wî bi kar hatiye. Jibo tundiya lêdanê di buşahiya sipî de ji dastanên wî yên di hundurê wî de peyda bûn.(74)

Malva bûye mijara lêkolîn û rexneyên hunerî ji aliyê rexnegirên biyanî û bi gelek zimanan hatine nivîsandin mîna; *frensî, almanî, îtalî, îngilîzî û erebî.* Kesên navdar ên mîna; *Enderye Matsuno, Bekdenuf, Maykuviskî, Detrşrag, Saval, Desler, Rolando, Barîzu, Birukîtuvanî, Ûstîvan, Qeyser, Herbert, Ernuld ûwd...)*

(74) Esed Irabî- Malva 20 Jahre malerei 1974-1994.rûp.224



## Bandora bizava serabê di rengên Kesk û Sor de

Malva mîna hunermendên siruştî yên *firensî* û *holendî* her tim dixwast di nava siruştî de kar bike. Li ber tîrojkên rojê û rengên xwezayê kartêkirinên ronahî û veguhastina rengan û lêdana firçeyên xwe bi lez bi kar tîne. Barekî zehmet da ser milên xwe daku bişêt li ser şêweyên dijwar zal bibe. Hatin û çûn û lêdanên bi lez û berzkirina rengên nû helatîn. Bi vî awayî wêneyên babetî pêk tîne mîna rêxistinek ji wêneyên babetî û hestkirinê. Giringî dide rengan, ji sedema bizava serabê ya ji tîrojkên rojê. Di pêçewaniyê de li ser ruber û kartêkirinên hundurî, peydabûnên berdewam yên rengan bi bizaveke bê dawî di hundurê fireh ê ronahiyê de ya ku çav dibînin.

Wêne rengan pêçewane dike bi hestên tên dîtin. Li ser tiştan li

ciyê tiştan bixwe bi wateya tişit rasterast nayên dîtin. Dibe bi hestên çavan bi nêrîneke eşkere diyar bibin. Di buşayeka pêçayî de jê veqetina babetî wêneyekî girtiye. Çareserkirina babetî bi vî şêweyî di lêdanên nazik de hebûneke serbixwe dide renga. Bi lez, bi bizav û bi stranên rengên xwezayî... Di guhartina rîtim û bandora ronahiyê û ji peydabûna tîşk û pêlên bi bandor di wêneyê de digihîje pêşda birineke pêşerojî. Serûçavên di realîteyê de ku hatin dîtin, piştî rêbaza Impressionism di xwendingeha Parîsê de ye. Li vir karên malvayî ji nû ve dest bi jiyanê dikin. di hundurê impressionizman de nêrînên wî tên guherîn. Di vê qonaxê de ber bi rengên ronahiya berzeyi li ser ruyê tiştan ji bo pêkanîna pêlên rengan di cih û demê de ye. Diyarkirina pila rengî bihayeke ji bo diyarkirina hêzê. Gera li rengan serkêşiya gera ronahiyê dike. Paşê jibo hêz û peywendiyê bi kutleyê ve (reng ronahî ye û ronahî hêzek e, bi hev ve girêdeyî ye). Diyarkirina pila ronahiya rengan bi hêz dibe bingehek, ji bo rakirina buşahiyên zêde yên bêyî çavdêr û neyên dîtin. Nûkirina abstrak bi lêdanên impressionizim. Di meydana wî ya abstrakê de, di tabloyên wî yên dawiyê de, ku Malva li çareseriya vegera wî digere, lêgerînên împressionizmê yên berê û rewşenbîriya wî ya nû ji sedema têkeliyên wî di gel rêbazên hemdemên abstrakê li Ewropa ye. Bitaybet li Nemsa li ser bingehekî rengê tevnê xwe yê abstrakê radiçîne. Tabloyên wî yên abstrak vegeryaneke ji bo Impressionizmê, di dewlemendiya rengan û lêdana firşeyan abstrak e. Di ronahiyeke heremî de nêrînên ronahiyê li ser bingeha rengên kesk û sor e. Di bakurê welatê wî de rengên wî li dûv derbirina wî li ser belavkirina rengên rojhelatî ne. Di şêweyekî nû de; li ser hunera abstrak a rojava yê hemdem e. Ew dixwaze rengên xwe yên keske sorî bi şêweyê abstrak û bi rengên Impressionizmê bi kar bîne. Lêdanên bi hêz ligor rengên rojhelatî û di hizirkirneke hundirîn de diafirîne. Ev lêdanên rengan ne girêdayiyê reyalîteyê ne, ne jî rewşenbîriyeke ji derve û bi hêze. Cîhana wî ya babetî hizra felsefî ye. Bi dest xistina girêdana wî ya herêmî şiyanên derbirînî yên ciwanî û hundurîn in. Di ezmonên xwe yên abstrakê de gihişte cîhana xwe ya taybet. Li ser rêbazeke taybet li ser bingehê dewlemendiya rengan û rîtimeke diyarkirî. Ger mirov li lêdanên wî yên firçeyê binêre, ji sedemên hundurîn haletekî bi hêrs dibîne. Yên bi hêz û bê tirs. Veguhastina wî ya demildest di dîmenên rengîn û bizavên bi hêz de ya ku li rîtima şêwekarî digere, wergirtî ye ji rengên ciwaniyê. Berhemên wî bi bandorên rengên rehet bilind dibin, di gel bêhndanên freh û

lêdana bizava rîtima bi rêk û pêk. Di avakirin, helbijartin û hestkirinê de, rîtimeke bi bizav dide me. Ji îşaretên muzîkê, guherîna hestkirinê ya pêkhatî, nexweşî û hestkirinên taybet, reng mîna şiklê serûçavan çavdêriya bizava hizran dike. Weke *Picasso* dibêje:.*"Em rîtimên rengan di pileya abstrakê de li ser afirandinê pêçewaneyê rîtima bîrkirin û dilovaniyê di gel danûstandinên rengan yên pêkhatî ji vegera ser rewşekî ritimê ji lêden û menayê xwezayê de bigehijîn afirandineke abstrak ya derunî û bi hêrs digel tîrojkên ronahiya heremî ya ku hunermend di xerîbiyê de pêre kar dike."* Di rengên Malwayî de ti caran roj ava nabe, roja welatê wî. Ji ber vê ronahiyê bi kar tîne. Nêrîn û hizreke vekirî ya ruhî û rengkirî defirîne ku nêrînên me jî pê re dipêçe. Hundurê me bi xwe ve girê dide. Lêdenên dilê me radike. Li ser ruhiyetê di lêkdeneke asûmanî de Kar dike. Ji bo vejîna jiyana wî ya ruhî ji çavkaniyên bizavê re mîna hêzek û singekî vekirî ye.

Mîna buşayî û navendek e ku her tim bizaveke serbixwe têde dizivire. Ew dixwaze vê yekê di diyarkirina sinoran û cîhana ne madî de pêkbîne. Ji hundur bo xwezayê, di diyarkirina sînorên zanîn û nezanînê û sînorên hestkirinê de, terzên lêdanên wî yên rengên ebesî yên bi pêşevaniya eqlî derketîn. Em sembolên hundurîn dibînîn yên ku tên veguhastin di îşaretên rengan de, yên hestpêker û nehestpêker. Ev hemû di lêkolînên hundurî û guhartina şêweyê madî û sedemên esebî li ser pêkanîna rudanên hunerî, li ser pîvanên di navbera aqil û dilovaniyê de ne. (75)

Malva di karên xwe yên hunerî de peywendiyek bi wargeh û welatê xwe re çêkiriye. Lewma dibêje: *"Girêdana min bi rengên gelerî yên welatê min ku min bi xwe re anîne, ji dil tên. Xem, romansî û sêhra hunerî ne bitenê di rojhelat de herweha girêdaneke hundurîn e li rojava jî.* Malva xemên mirovayetiyê pêşkeş kirine. Destê wî li ser dilê wî ye. Ji ber ku hin astengên civakî, psîkologî û afirandin ji trajediya reyalîteyê derdiçin. Van hemûyan xwe sipartine pêşdeçûna hunerî. Divê demê de Malva digot: *"Heta niha bilindbûn ne xweya ye û laşê min li ser volkaneke agir e."*


Li ser tabloyên Malva, rexnegirê Bulgarî *Tumatşiviski* dibêje: *"Rengê sor li cem Malvayî hêdî hêdî dişewite û rengê şîn ta dawiyê geş dibe"* Dîsa *Deter şrak* li Viyena di pêşangeheke Malva de dibêje: *"Em şaş in dema dibêjîn tenê hunera Ewropa hunereke*

(75) Adîb Meîzon- Malva 20 jahre malerei.1974-1994.rûp.223.

*cîhanî ye. Divê em di cîhana sêyem de mînakên weke Malva bibînin."* (76) *Ulrik Ernuld* Rexnegirê Cîhana Ciwaniyê li ser Malvayî dibêje: *"Malva yek e ji mînakên îro di qada hunera Ewropayî de."*

Reng li cem Malva karmen de. Çawa ku hesp li cem *Yilmaz Guney* rastî ye. Heta niha bi xwînê resim dike û bi wan rengên cara yekem tabloyên wî hatîn şewitandin. Berdewamiya rengên şîn, zer û sor mîna şemilkeke rojhelatî hatiye nexşandin. Ji bîranîn û dûriya welat û ji sê zaroyan ev hemû komek in ji xemên mirovî ku bi afirandina rengan pêk tên.(77)





(76) Malva 20 jahre malerei 1974-1994.rûp.221
(77) Malva 20 jahre malerei 1974-1994.rûp.229

## Laşê mirov di Tabloyên Malvayî de.

Yek ji diyardên karê wî jî bikaranîna laşê mirovan e. Li ser bingeheke ciwaniyê çi ji aliyê xîçên reş û spî be, yan bi şêweyekî akademîk li serûçavên mirovî, yan jî bi şêweyekî taybet resimkirina destên mirov, ku di tabloyên wî de ev baş tê xwiyakirin. Mîna parêzvanekî li ser van bizavan radiweste. Malva her tim bi rengan re dijî. Reng li cem wî nêzîktirîn heval e. Rengên wî bi durbîniya li ser deşt, gir û çiyan mîna rojhelat in. Di avabûnê de li ser giran mîna parçeyeke hevîrkirî bi hêvênê rengê zerê axê yê her tim hel, geş û germ e. Mîna henasedaneke bi êş, ji êşa jinekê ku dema çaverê zaroyek nû ji dayik dibe. Di nava zeviyên derûdora gundan û bajarên biçûk de rengê zer ronî dibe, Bajarên mezin li derûdora xwe kom dikin, ew bajarên ji teqnê dirustbûyî diyarda tozê, ji helatin û avabûna rojê. Di nava cade û kolanên wî de şewqdana rojê li ser zevî û bostanên li derûdorê kaniyên ava zalal, vî dîmenê xwezayê di hundurê xwe de kom dike. li cem wî nêrînek hunerî ji bajarekî mezin û ji avahiyên bilind pêkhatî ciwantire. Rengên wî mîna bêhna gulan û biriqîna birûskê ye... Û ciwaniya wan berên di dest karkerên ku pê qesrên mezin avadikin li bin (Tabok) ên şewitî yên teqnê. Ev dîmenên bajarê *Hesekê* ne. Ev e welatê *Mar, Aşor, Babil û Mîdiyan;* ne ji hespên Cengîzxan, ne ji biriqîna şurê Teymurlenge, ne jî zûrîna gurên bakurê çiyayê Toros û Cûdiyê ne. Van dîmenana; li pişt pezê şivan û hêstirên rêgiran, di deriyên vekirî û zeviyên mînan de ji wexerên bê dawî ne.. Ji toza gundan, ji toza serûçavên karker û cotkaran ber bi kolanên dirêj birê dikevin. Kolanên xemilandî bi pilakatên sînema û cîhaneke din ya gelek dûr û nêzîk .. Van dîmenana mîna siruda serbazekî ji şahidên bûyeran, çavnêrîneke bi armanc û lerzok in.. Lerzîneke erjeng û bi heybet a ku nayê dîtin. Ji bo zarok pêwîst e lîstok liber çav be, da ku baweriya wî pê were.. Van huneranan ji hîkayetên nemir yên Adem û Hewa,Temoz û Eştar, Qabîl û Habîl, yên di navbera dudilî û hişyariyê, hezkirin û neşiyanan de, peywendiya çavan bi ronahiyê re.. Ji quriyên çayê û ji dukela cixareyên tutinê ne.. Dapîr, dayik, bav, pencereyên vekirî û di kulînkan de tîruşkên rojê yên rewneqdar û rohin... Divê reng li cem Malvayî rehet bibe. Ev teybetiyeke xwendingeha resmî ye. Xwendingeha tariyê ya ku hest

dike ji girêya kevirî û ji bo çavan lerzînê peyda dike.. Yan jî, xûhdana serûçavên kesên li deştê digerin û di bîrkirineke civakî de lerzîneke efsaneyî ber bi dojehê. Kelepur û tirsa nemir nêrînên xwe pê reng dike. li ser jiyê wî yê zaroktiyê dudiliyê çê dike. Zaroktiya bi xirafat û bi tirsa agir sondxwarî. Malva rengvanekî berz e: Çi digel rengekî bi tenê û rengên nêzîkî wî rengî. Hevrikî û dijberî di rengan de heye. Hevîrkirina wî ya sipî di gel sorê tarî, reş û sor û rengên nêzîk yan durxistina rengên nêzîkê kesk û ronahiya wî ya zer. Reng mîna sulaveke avê ye, pêlek e agirî ye. Pêkhatina hewayî, parçeyekê dide me li ser şêweyekî pêkhatinê. Sor li cem Malvayî berdewamiya jiyanê ye. Hevîrkirina sorî û rengên nêzîk, vegera kesayetiyeke kevn e. Malva wî careke din nû dike û dike bingehekî hunerî ji bo bikaranîna behreya wî û hizrê bi hevr e. Di pêlên ba û ava *Xabûr* ya beşeke ji gulavê de cutkirina rengan û hevîrkirin ji rengan vedigere xweristiya *Sumer* di şiyanên reng û ronahîyê de. Malva hunera xwe ya kevin nû dike. Ji rengan maforeke efsaneyî çêdike; ya ku hate vehonandin ji aliyê huriyên deryayên tarî yên li ber tîrojkên rojê ve.. Mîna tavbarankê keskesorê erdî di şînatiya asûmanî de li tariyatiya hindavî *Viyena* xist, daku germahiyekê bide bajarî.[78]

Malva li bin gelek bandoran kar dike. Dixwaze ji kevlê der ve ber bi xweşiya hundurîn ya bi êş û serbest bimeşe, daku hundurê mirovan nas bike. Dibêje: *"Dema ez wêneyekî resim dikim, ez naxwazim bizanim ka ez çi drust dikim."* Li ser tabloyê lêdanên bi hêz ku girêdayê hundurê wî ne derdikevin û li ser azar û arîşeyên wêneyê, bi berfirehî, paldan, balkêşî û pîvanê ra bi ser dikevin.. Germayî, nêzîkî, dûrî û rabûn ji bo pêkanîna abstrak û helgirtina reyalîteyê paldanek in, di peydabûnên xerîb ên di hundurê wî de û dibêje: *"Dema ez diçim hundurê atoliya xwe ez bêzar dibim û mîna zaroyekî dayika wî lê wendabûyî, mîna dema emeliyateke giran ya berî mirinê, mîna dema berî li sêdarêdanê û mîna dema berî tirsê me. Ev demine li derdora tabloyê ne, dema tablo dibe berevan ji bo azarên hundurîn..."*

---

(78) Malva 20 jahre malerei 1974-1994.rûp.215.sadula Tewîl



**Tabloyê Beşar Îsa**

## Beşar Îsa.

Sala1950an li gundê herêma Cizîrê girêdayî *Hesekêye* li başurê rojavayê Kurdistanê hatiye dinê. *Bişar* di axaftinên xwe yên li ser hunerî dibêje: *"Ez tabloyê weke berxwedana jiyanê dibînim û bitaybet rewşa jinê. Ew jina ku gelek hêvî di singê wê de mane û negihiştiye xewnên xwe. Ez dixwazim van xewnan di tabloyan de bikim rastiya jiyanê."* Ji ber ku hunermend xwe di vê cîhanê de dibîne û berevaniyê ji vê rastiyê dike, giringî dide serhatî û efsaneyên dîrokî yên di nava civaka kurd de. Dîrok li ba hunermend hemû aliyên jiyanê ne.(79) Ji ber ku di pêşdaçûna civakê de şaristanî pêk tê. Di nav xwe de felsefe, avakirin, rewşenbîrî, xwînrijandin, azadî û kuştinê dibîne. Divê dîrokê de hunermendê me babetên dîrokî, efsaneyî û serhatiyan ji bo me vedigerine

(79) Malpera tirêj.net

rengekî nû û bi zimanê hunerî van serhatiyan nîşanê me dide. Weke bûyerên li herêmên Mezopotamiya û di navbera herdu rubarên Dicle û Ferad de Herweha çiyayê zagros û Toros û wê xaka ku hespên Eskender û Dara û Zeynefon tê ra derbas bûne. Van serhatiyên dîrokî di çarçuveya tabloyan de bi rengên ciwan û li ser stîleke nû pêk tîne. Hunermend Bişar ne bi tenê şêwekar e Di nivîsîn û rexneya hunerî de jî rolekî wî ya berz heye. Çavên hûnermend zêrevanên rengên rojê bûn di avabûnêde ,bi derbirînên hûndirîn buşahiya wî di dît pir dikir û keske sor rên asmanî girêdidan bi derbirînên jiyanê ve û tabloyek nû jidayk dibûn. Ruberê welatê rojê, Mezopotamiya ji çiyayên Zagrus taku Turos digel dengê blora şivan û pez û rewşa weletekî di dîrokêde windabûî, ew bi hestên xwe û rengên xwe lê digere, welatek nû cîhanek nû diafrîne, bîreweriyên xwe yên zaroktiyê li hember mamostayê xandingehê di salên destpêkêde li bîr tîne.

Hunermend Bişar piştî ku Ji suriyeyê derket, koçberî Frensa bû û jiyana xwe li Parîsê didomîne. Di ezmûna huner de gelek pêşangeh li welatên herêmî û cîhanê vekiriye. Xebatên wî yên li ser huner berdewame.niha jî li Parîs dijî.



**Tabloya Bahram Haco**(80)

(80) Neue Perspektiven 1996 Mezopotamien Verlag,1996 Elmanya

## Bahram Haco

Sala 1952an li başurê rojavayê Kurdistanê ji dayik bûye. (1970-1972) xwendina xwe ya hunerî li *Akademiya Hunerî* li Bexda bi dawî kiriye. (1978-1984) Li Akademiya Hunerî ya Munster (Almanya) xwandiye. Bahram Haco yek ji hunermendên navdar ên kurde. Di qada hunera şêwekariyê de li Ewropayê tê naskirin Ji ber ku vî hunermendî giranî daye ser serbor û ezmûnên jiyana hunerî, hespê wî her tim di gel karwanê wexerên dûr dimeşe. Mîna mêrxasekî vê meydanê tê naskirin û her tim sware. Li hemû kuncan dinêre. Derûdora xwe bi asanî di tabloyan de dibîne. Di ruberên fireh de hespê xwe dibezîne û bi hêza firçeyê hunerî vî ruberî pir dike. Hemû babetên jiyanê pêk tîne Buşayî li cem hunermend serbestî ye û bi hêza rengan li ser bingehekî zanstî vê buşahyê pir dike. Li pêş çavan her parçeyek dibe tabloyekî serbixwe. Fîgûr bi şêweyên nediyar Di tabloyan de pêk tên. Hin caran bi şêweyê *portrê* kar dike. Lê serûçav xwiya nabin. Ji ber ku dixwaze di cîhana serûçavan de gelek tiştan veşêre. Ji temaşevanan re dibêje, li nepeniyan bigerin deku hûn bi rastî jiyanê fêhm bikin. Ev jî behre û hêza hunerî dide tabloyê Rêbazên hunerî yên nû li cem Hacoyî bûne beşek ji jiyana wî. Ji ber vê yekê jî di xwendin û tecrubeya wî ya zanstî de li ser rêbazên hunerî, hunermend bûye xwedî rêbazeke serbixwe. Lewma dema tabloyên hunermend tên ber çavan, cîhana hunermend tê naskirin. Ew cîhana taybet, reng û lêdana tabloye bi lêdana frçeyê di boşahiya di ruberekî pahn de. Tabloyên hunermend bi piranî li ser şêweyê mezin tên resim kirin. Ev jî di tabloyê de dibe serbestî. Hunermend Haco li piraniya welatên cîhanê xwedî gelek pêşangehan e. Gelek lêkolîner û rexnegirên kurd û biyanî li ser tabloyên wî nivîsîne. Bahram Haco niha li Almanya li bajarê Münster dijî û karê xwe yê hunerî berdewam dike.[81]

Herweha hunermend Mehmod Hesso jî yeke ji wan hunermendê berv Abstrak karên xwe pêk tîne û xwedî çendîn pêşangehên hunerî ye.

(81) Katelok Neue perpaktiven.1996 mezopotamien Verlag



**Tabloya hunermen Mahmoud Hasso (Heseke)**

# Hunera Şêwekarî Li Rojhilatê Kurdistanê

Li gor çavkaniyên ketine ber destê me, huner bi şêweyekî giştî li rojhelatê Kurdistanê taybetmendiyeke xwe heye .





**Peykerê Hadî Ziyadîn (Senna)** **Tabloyê Jamşîd Porawzan**[82]

Li ser vê yekê jî mirov dikare hin mînakên hunera vê parçeyê bi aweyekî dîrokî şirove bike.

(82) Malpera Awiar.com

**Tabloyên Hadî Ziaadînî (Senna)**[(83)]

Herçendê piraniya van çavikan bi zimanê farisî hatine nivîsandin. Ev jî vedigere ser sînordana azadiya zimanê kurdî li hemû Kurdistanê. Di hêla şaristaniyê de ev herêm xwedî dîrokeke pir dewlemend e. Me ev jî di beşên pêşîn de bi dirêjî anîne ziman ku di hunera nexş û nîgaran de rolekî sereke hebûye. Bitaybetî di nexşên maforan, kel û pelên nav malê, aletên şer, zîn û komziriyên hespan de. Ev hemû vedigere wê yekê ku kurdan çawan di jiyana xwe ya rojane de ji siruştê sud wergirtiye û çawa ev jiyane xemilandiye û hêdî hêdî pêşde biriye. Ji aliyekî dinve em dibînîn ku hin peywendiyên dîrokî di navbera kurd, faris û wan neteweyan de hebûye. Bitaybet yên ku kurd digel wan dijîn. Ev yek di hunera hunermendên rojhelatî de eşkere ye. Aliyên din yên ku bandora xwe li ser hîştine ev in: Wêjeya klasîk ya kurdî, farisî û babet û stîlên hevbeş di navbera wan de. Dîroka hunera şêwekariyê mirov nikare bi awayekî balkêş bigire pêş çav. Lê li aliyê zexrefe û xweşnivîsiyê de rolekî mezin dilîze. [(84)]

---

(83) Malpera Awiar.com
(84) Malpera Awiar.com



**Tabloyê Ahmad Kalilî (Senna)**[85]

Mînakê vê yekê jî hunermendê kurd ê navder **Mîrza Mihemedê Kelhurî** ye. Ev hunermend û nivîskar sala 1825an ji dayik bûye. Di zaroktiya xwe de li ber destê çendîn zana û mamostayên navdarên xwedî şiyanên hunera zexrefê û xweşnivîsînê xwendiye. Jiyana xwe li Qezwîn borandiye. Li ser vî hunermendî gelek navdarên kurd nivîsine. (mîna Mîr Îmadidîn) Vî hunermendî bi dirêjiya hîjdeh seetan rahênanên hunerî dikir û di encamê de gelek tabloyên rengîn li paş xwe hiştin. Sala 1890î de jiyana xwe ji dest daye. Lê mixabin berhemên vî hunermendî ta niha giringî pê nehatiye dayîn û lêkolîn li ser nehatine kirin.

(85) Malpera Awiar.com

## Hesen Qazîzade

Ev hunermend xwedî berhemên hunerekî reyalîteyî ye. Gelek tabloyên hunerî pêkanîye û rêbazekî taybet hilbijartiye. Di tabloyên xwe de rewşa kurdan û bindestiyê wêne dike. Piştî ku ev hunermend koçberê Frensayê bû, bûye xwediyê cîhaneke taybet. Ji ber ku Frensa û bitaybetî Parîs bingehê huner û rewşenbîriya hemdem e, *Qazîzade* di fêrkirin û xwendina xwe ya hunerî de bû xwedî stîl û bi hunermendên frensî û bîyanî re ket nav peywendiyan. Şiyanên akademîk di çarçoveya hunereke nû de bi naverokên rewşa Kurdistanê pêk anîn. Hunermend pal dide du tiştan: *Yekem;* duriya welat û koçberî. *Duyem;* evîna welat û rewşa gelê kurd û bindestî. Lewma di praniya tabloyên wî de bi şêweyê bi hev re mirov hespan dibîne. Ev jî nîşan dide ku hunermend têhniyê azadî û serbestiyê ye. Vî hunermendî di tabloyên xwe de rengên rojhelatî bi yên rojavayî ve girêdaye. Weke peywendiyeke ruhî hunereke reyalîteyî pêk aniye. Ev hunermend xwedî gelek pêşangehên hunerî ye. Gelek lêkolîner û rexnegirên kurd û biyanî tabloyên wî şrove kirine. Hin jî xebatên xwe berdewam dike.

## Axayê Mehmud

Ev hunermend weke serkêşekî şêwekarî tê naskirin. Gelek hunermendên rojhilatê Kurdistanê li ber destê wî fêrî hunerî bûne. Bitaybetî di hunera peykertiraşî de rolekî wî ya mezin hebûye. Li derûdora salên 1930an de vî hunermendî weke mamostayek rola xwe dîtiye û piraniya babetên wî girêdayî rewşa gelê kurd bûn. Piştî salên 1960an û heta van demên dawî pêşdaçûnek di qada hunera şêwekarî de çêkir. Lê mixabin ji ber helwestê wî yên netewî û babetên li ser rewşa siyasî û civakî ya Kurdistanê, ji aliyê rejima Îranê ve hate zînden kirin



**Peykerê helbestvanê kurd Ahmedê Xanî**
**(hunermend Abdula Braderî)**

## Abdula Braderî

Ev hunermend di salên 1950an de bi evîna hunerî ve mijûl bû. Yek e ji şagirtên hunermend *Mehmûdî.* Ji 22 saliya xwe û vir de jiyana xwe piranî ji bo hunera peykertaşî û seramîk terxankiriye. Vî hunermendî hunera xwe ji dar, axa sor û berên Kurdistanê pêk aniye. Tiştê herî balkêş li ba Braderî ewe ku wî bi xwe rengên seramîkê çêdikir û di hunera xwe de bikar dianî. Di meydana huner de Xwedî ezmunekî fireh e. Di gelek pêşangeh û saziyan de berhemên wî yên hunerî hene. Di sala 1995 an de bi bîreweriya konferansa xanî ya ji aliyê Instituta kurdi ya Berlînê ve hatî lidarxistin, Braderî peykerekî nazik û cwan yê Ahmedê Xanî pêşkeşî Instituta Berlînê kir û nihajî amadeye. Piştî ku ji welat derket û hat Ewropa, dîsa kar û xebatên xwe yên hunerî berdewam dike û weke navekî hunerî tê naskirin. Niha li bajarê Kalisruheyê (Almanya) dijî û jiyê wî 65 sale.

# Çend Mînak Ji Hunermendên Derveyê Kurdistanê

## Gulîxan:

Ev li welatê *Rusya* hunermendekî navdar e. Li *Moskovayê* berdewamiya jiyana xwe ya hunerî biriye serî. Ev hunermend sala 1948an li bajarê *Tiblîsê* hatiye dinê. Li Moskovayê dîploma hunerî wergirtiye, Dîroka kurdan li ser Gulixan bandoreke xwe hêştiye û bûye hêvênên tabloyên wî. Piraniya serkirdeyên serhildanên kurd bi şêweyê *portre* di tabloyên wî de cih girtine. Mîna *şêx Mehmod* di nava siruştê Kurdistanê de û gelek kesayetî û navdarên kurd. Her ji zarokiyê reyalîteya Rusya, şêweyê motîv, reng û fentazî di stîla wî de xwiya dibe. Ew dibêje: *"Despêka min li ser bingeha realîzmê bû. Bê realîzm huner nabe. Di modernîzm û popartz de mirov dikare hin guhartinan bike. Lê her tim nikare xwe ji realîzmê dûr bixe. Ji ber ku ez vî şêweyê hunerî weke bingeh dibînim, di pêşdeçunên hunerî de. Ez xwe di nava wê de dibînim."*(86)

Dîsa dibêje: *"Ez dixwazim girêdayê dîrok û civaka kurdan bim. Ez vê yekê di tabloyên xwe de, bi jiyanê ve girê didim. Jin û civaka kurdî pir rol dîtiye û hêjayî wê yekê ye ku di*

*hunera de em bînin ziman û bi rengên hunerî vê dîrokê nîşanîcîhanê bid***.** Di tabloyên Gulîxan de tê xweyakirin ku bandura hunera sosyalîzma dema yekêtiya sofyeta berê liser wî heye , lewma ew nikariye xwe ji riyalîteyê û naveroka tabloyî dur bixe.herweha çarçuvekirina sîstemê di sinorên vî welatê pan û mezin da ew dinava serma û befrêda hiştiye lewma em dibînîn rengên tabloyên wî ji rengên sar tên, ger hind rengên gerim bikaranîbin jî rengê sore ewjî têwateya bandora aîdolojiya sosyalîzmê.

---

(86) kovarî hawar- jimare 13. sala 2003 rûp.26.



**karîkaturên hunermendê Behzad Taha (Sinna)** (87)

(87) Malpera Awiar.com

# Karîkator hunerekî birîndarkirina bê xone

Ev huner li ser şêweyê pêkenok tê afrandin li ser kesayetiyeka diyarkirî, hind guhartina di kesayetiyekê de pêk tîne û şêweyekî mezin û berzkirina hind endamên laşî.



"ڤوروبا تتأرجح فوق قنبلة على وشك الانفجار" كاريكاتور للرسام ڤونوريه دومييه نشر عام ١٨٦٧ بجريدة "الشاريفاري"



رسم كاريكاتوري فكاهي يمثل الحياة في أمريكا، فالأب يرفع "البيت" كي يستطيع ابنه البحث عن "الكرة".

**1-wêneyekî hunermendê Frensî Domme li sala 1867 di rojnama Şarîfarî de belavkirbo (Ewropa li ser bombeyê dilerze û li ser teqînêye).**

**2-wêneke jiyana Emerîka nîşa dide top çuye jêr xanî bab xanî radke û kurê wî lê digere**

Livir bidehan mînakên hunermendan ji neteweyên cude di qonaxên cude de ev hunere wêne kirîye. Weke çekê rexnê pêkaniye, hunerekî çavlêkere, mibalixe bi Qelemê reş, firçe û hêla tê kirin ev hunere bişêweyekî pêkenok birîneke destnîşan dike û vedke û derman dike bêy ku dilopeke xonê jê bikeve. Dîroka vî

hunerî vedere dema Firewna li misrê û Girîkan li ser şêwê giyandar û nîv mirov û nîv jî giyandar wêne dikirin, di dema efsaneyan de, ev hunere wê demê rula huner dibîne dema hunermend rastiyên jiyanê dibîne û hunera wî rula xwe di nava civakêdedike û bibe xwedî bandor.

Ev hunere ji bo cara yekem di dîroka nûde li Îtalya li ser destê hunermend **Yenipal Karatşi** (1560-1609z)yekem kes bu wêneyê pêkenuk resim kirî ji hind kesên di derdura wîde, ji navê wî peyva (Karikatur)derket(88)

Paşan hunermendekî din yê Îtalî binavê **Girom Buş** ku dojeh bi şêweyekî pêkenok resimkir bu û **Bitro Cizi** (1755-1674)hunera karîkaturî bi hunerekî gelerî di hijmart hind dibêjin **Lionardo Devinşi** serkêşê hunera karîkaturi ye. Lê bikaranîna vî hunerî weke çekekî siyasî, li ser destê resami Îngilîz **Gorg Tawnsind** yê ku binavê **Merkiz** hatî naskirin hatibo kirin vî resamî navbangiyek mezin di welatê xwede dîtibu. Damezrênerê xandingeha hunera karîkatur yê Îngilîz **Wilyem Hugart** bu. Wêneyên rexneyî bûn li ser rewştên civakê kêmasiyên fesad û ehmeqiyan..piştî wî çendîn hunermendên din yên karîkaturî derkeftin li welatê wî mîna: **Tomas Rolanson** û **Jims Gilrai**, ev hunere ji aliyê hunermendan ve weke çekekî rexneyî li hember partên siyasî bikar anî.



صور فكاهية من رسم قدماء المصريين، وجدت على ورق البردي، وهي تمثل أسداً وغزالاً يلعبان الشطرنج،
وثعلباً يعزف على الناي وهو يرعى الماعز، بينما القطة تقود الأوز

**3-wêneyekî karîkaturê giyandera ku şêr û rûvî şetrencê dileyzin û heywanên dinjî mozîkê lêdxen** .(89)

(88) Monir Eteybe.elfen elteşkîlî malpera Islamonline.net2001
(89) deiret elmearif el şeib-misir

Li Frensa ev hunere ji hunermend **Laril Filibon** (1806-1862) destpêkir yê ku disala 1830 kovarek binavê karîkatur derdixist, piştî du salan rojnamek binavê Şerifari derxist herdu kovar û rojname dijî hikometê bûn. Di vê demêde gelek hunermendên navdar mîna **Unorya Dommi** (1808-1879) navdar bûn li sala 1832 hate zîndanîkirin ji ber ku hunera wî rexneya paşa Filip bu, lê hêrişên wî û rexneyên wî berdewam kir piştî ji zîndenê azad bûy ev hunermende weke hunermendê herî navdarê karîkaturî tê naskirin taku roja îro, hunera karikatur giringiyê dide kesên navdar , da zotir ji aliyê gelve bêne naskirin.

Li Holende di sedela hevdande ev hunere derket, herweha li Emerîka li despêka sedsala bîstan û li Yekêtiya Sovyetaberê li ser destê hunermend **Lorsi Îfinov** di şoreşa Oktoberê de û rulekî mezin hebu di şerê cîhaniyê duyem de.

Ev hunere di rojname û kovarande rola xwe dibînin û kesanên navdar weke sombol li hember deselata siyasî û civakê bikartînin, li Emerîka vî hunerî gelek cemawer heye, bitaybet di rojname, kovar, reklame, pirtûkên wenekirî û filim kartun..lê ev xandingeha Emrîkî serveye bitenê armanca wan kenandine ne rexneya siyasî. Bitenê giringiya rexneya siyasî li aliyê hunermendên Frensî û Îngilîz ve li hember siyaset û civakê pêk dihat, ta niha di encamên pêşwazîkirina vî hunerî de gelek rojname û kovarên serbixwe û navdar hene weke (Şankarz)li Hindistanê û Karîkatur li Misrê û pîne li Kurdistana Bakur. Herweha hûnermendê Îspanî **Goya** (1746-1828) dema wêneyên bi vî awayî dirust dikirin dijî serok, serdestîya deselat, gutinên efsaneyî, tiştên ku belav dinava civakêde û nehên bawerkirin. Piştî Ispanya ji aliyê Frensa ve hatî dagîrkirin sala 1808 ev şêwekî bihêz bo ji bo Goyaî li hember wan bikar dianî, piştî hatî Parîs çendîn hunermendên din li duv rêya wî çun, mîna **Domey**e wênên Donkişuf û dadgehan çêdkirin, di wênên xwede serûçav di guhartin û mîna pêkenoka wêne dikirin, paşan hunermend **Tulis Lotrik** li Frensa ev şêwê hûnerî pêk anî. Rexneya papasa dikir û wênên wan çêdikirin, ev alê hûnerî gelek belav bo taku diberdewamiya xwede gehaye kesên siyasetmedar û kesatiyên olî û civakî. Hêdê hêdî di nava gelda bandora xwe kir taku roja îro em dibînîn di piranya aliyên jiyanê de bandora xwe kiriye.(90)

(90) Francisco de Goya.Leben und Werk

Herweha hunermendê karîkatorî yê navdar **Ares** li sala 1961 li Havana hatiye dinê, navû dengekî mezin li cîhanê heye û taniha pênc pertûkên li ser hunera karîkatorî çapkirîne û 100 xelatên cîhanî wergirtîne jiwan 45 di pêşbirkêyên nêvnetewî de wergirtîne ku niha bitaybet li Koba, Berazîl û Gwatîmala pir berhemên wî têne hezkirin û belavkirin.[91]

Li wilatên Erebî jî li Misrê yekmcar ev hunere peyda bu, li despêkê di kovara rexneyî û pêkenok binavê kovara (Ebo Nizare)ji aliyê **Yakob Snui** bi belavkirina wêneyên karîkaturî yên resamên Îtalî yek jiwan kovarên ji hemûyan pêtir rola xwe dîtî kovara (Keşkol)bûya ku ji resmên hunermendê Îspanî **Cwan Santiz** têde belav dikirin, li sala 1925 hunermendekî Ermen binavê **Saroxan** hate misrê û li wir ma û hunermendek ji Turkiya bi navê **Ali Rifqî** van hunermendan bandureke mezin li ser hunera karîkaturê misrî kir û xandingeha karîkaturê misrî hate damezrandin. Lê hunermendê misrî yê navdar **Mohemed Abdulmonim Rexa** yek bu ji hunermendên xwedî bandur li ser meydana vî hunera karîkaturî li Misrê, ji wêneyên kesên navdarên Misrê destpêkir mîna (Ibin El beled, Refie Xanim û Misrî Efindî) herweha babetên wî ji xewnên gel û rexneya siyasî û civakî bûn, lê weke Domme ew jî hate zîndenî kirin li ser wênekirina paşayê misrê çar sala di zîndanê de ma. Di xandingeha (Rixa)de komelek ya hunermendan derket mîna. Abdulsemi Abdulah, Zuhdi, Selah Şahin, Gorg Behcuri, mostefa Hesen herweha Naji El Ilî..li Îraqê jî kesên mîna Mensor Bekrî Alî Mendelawî nihajî Serdar Kêsteyî...hw

## Curên hunera Karîkaturî

Wênê karîkaturî nameyeke ji hunermendî bo bînerî di nêrîneke hawbeşda û bihêz di riyaliteyekê de ku herdu têde dijîn, evjî li ser çend şêwaza dabeş dibe:

1_ Karîkaturê civakî: derdikeve ji egera kiryarên hevdij di riyaliteya civakîde, ev şêweye rola xwe dibîne û bandora xwe dike ya sinordar li ser civakê.

(91) Renasart malpera internetê

2_ karîkaturê siyasî: ev şêweye pêtir belav û xwedî bandore, giringiya wê rexneyeka rasteuxoye li hember deselata siyasî dibe herêmî be û dibe jî cîhanîbe. Ger herêmî be divê bi henek li ser bingehê nivêsînê û resmî, lê ger cîhanîbe pêwîste naverok û derbirînek têde bê xweyakirin bi resmî da bê wergera axaftinê bê famkirin.

3_ karîkaturê werzişî: ev şêweyekî rojnamevaniye, beşeke ji karîkaturê civakî, di demeke diyarde berpisyariya wê derdikeve weke hunerekî palder û piropagende, ji hebûna nwêneratiya pêşeroja resmî paşan rabûn bi karên mirovayetî di egera wê hizrêde ya hunermend pêşkeş dike.(92)

Bi vê yekê em dibînîn hunera karîkaturî xizmetek mezin dike ji bo mafê mirovî, bi van xetên asan û bi mane û naverok, herweha ji bo pêşdaçûn û nûkirina civakê û ladana hind tiştan li ser civakê û avakirineka nû di riyaliteya mirovî û civakêde ku berev pêşerojeke geş diçe û xwedî bandore, herweha xoşiyeka rohî dide mirov ji ber ku kêmasiyan di wênekîde nîşa dide û banga me dike ji bo guhartinên bingehîn û xwe amadekirin ji bo avakirinê di hemû aliyan de. Hunera karîkaturî her ji destpêkê li ser hind rêkên diyarkirî derbirînê dike, yan dirêya resim de yanjî nivês digel wêneyî herweha di berdewamiya dîroka vî hunerî de, gelek xandingehên kilasîk bixweve digre di berdewamiya têgeheştina karîkaturîde:

1- xandingeha Ewropî ya rojhelat: bitenê giringiyê dide resmî, bi alîkariya vî wêneyî, hizrê dede mirovî, di giringî pêdana xeyalî û mezin bikaranîna laşê mirovî ku rula nivêsê yan henekê têdexweya nake.
2- Xandingeha Ewropî ya rojava:wênekî hêlkarî yê sadeye, divê rula pêkenokekê têde hebe yan hevpeyvînek a bikenî dinavbera du aliyande, di peywendiyên dinavbera hevpeyvîn û resmî de, cudahiya fikrê û tê geheştinê diyar dibe.
3- Xandingeha Emrîkî: ev ji têkelbûna herdu xandingehên berê pêktê, giringî dide wê yekê ku hevpeyvîn û resim di babetî de bê xweyakirin.

(92) Henan Osman.karîkatur.Islamonline.net





**Karîkatorê Behzad Taha (Sine)**













**Çend mînakên hûnerê Karîkatorî**

## Alî Mandelawî

Li sala 1958 li bajarê Mendelî li başurê kurdistanê hatiye dinê, instituta hunerî li Bexda bidawî aniye sala 1979 herweha Akademiya hunerî li Bexda sala 1986 bidawî aniye. Mandelawî aşiqê cîhana zaroyan bû, lewma di gelek kovar û rojnamên zaroyande karkiriye weke kovara (Miceletî) û rojnama (Mizmar) li salên destpêka 1970 li Bexda. Ev hunermende yek ji hunermendên herî serkeftî ye di cîhana Zaroyan de.



**karîkatorekî Ali Mandelawî**

Herweha di meydana şêwekarîde rolekî giring heye û di tesmîma pirtûkan de, gelek serhatiyên gelerî weke çîrokên zaroyan bi wêne resim kirîne, gelek pêşangeh li îraqê û drvey îraqê û gelek welatên erebî û ewropî vekirîne. Li ser vê yekê jî gelek karîkator wênekirîne weke jiyana civakî, siyasî û hemû alî. Wêneyên wî piranî birengên avî li ser kartonê wênekirîne, niha li Bexda dijît piştî jinavçuna rêjêma Sedamî carek din vegera kurdistanê û îraqê, berdewame li ser kar û xebatên hûnerî.

# Sombolizma Reng

Li gur aliyê zanistî nêrîn û saîkolojiya reng dabeş bûye ser du komelan:

1-rengên gerim: Ku lipêşin nîşana bizav û hestkirinên azad bixweve digre, ji van rengan pêk tên(sor, narincî, zer, ji bo firehtir sipî)

2-rengên sar: Sir û lawaziyê digehîne, ji van renga pêk tên(şîn, nîlî, mor, ji bo firehtir reş).dinavbera rengên sar û gerim de rengê sewz (kesk) heye weke peywendidare dinavbera herdu girupan de guhartinê pêktîne. Rêk û pêkiya zincîreka pileya Cromatikî serekeye, xwe weke pêkhateke diyarkirî rengên tên naskirin nîşa dide, di cuda û lêkhatîne. Şêweyê vê zincîrê şeş yan heft rengin-hind caranjî şîn digel nîlî, şînê asmanî digel şînê deryayî jiyek cuda nakin, digel zincîreya deng û nutên muzîkê ku heftin li cem Girîka rê dide wê baweriyê ku di esilde pêçûneka cewherî heye dinavbera van çînan de, digel dabeşbûna asmanî bo heft çîna (hind caran jî ji bo nehan), ku ji aliyê Estiro biiologan ve ya kevin û selmandiye. Wisa tê diyarkirin ku sombolîzma reng ji yek jivan bingehan hatiye:

* afrandinên pêwîst ji bo her rengekî weke karekî hatiye encam dan, ku bi şêweyekî hest pê bê kirin.
* peywendiya dinavbera reng û sombolê de hatiye durpêç kirî ku rewişt pêve hatîne girêdan.
* peywendiyeka sade dinavbera reng û xwezayê de, şêweyekî ber biçave ku hertim di hizrên mirovî daye. Li ser vê yekê di lêkolîneke saykolojîde *Jolan Jacobi* li ser vê Jung dibêje: Rêkeftina renga digel kartêkirina saykolojî li gur kulturên cuda cuda di civakande tê guhartin, herweha dinavbera take kesên cuda jî de, lê bi şêweyekî giştî…rengên şîn-rengê buşahî û asmanê ruhne-rengê bîrkirinê ye. Rengê zer-rengê rojêye ku dighe duratiyê, ji tariyê derdikeve mîna peyamnêrekî ronahiyê, lidawiyê di nava tariyêde winda dibe-rengê pêşbîniyê ye, bandura wê yekê heye, ku di hemû deman de regez û

hemû dem û rudana runak bike.[93]
Sor-rengê xwînê, zîndî û agire, rengê hestên germe. Sewz (kesk) Rengê giya û erdêye rasteûxo hest pê dike hestiyariyê digehîne. Ew peywendiyên ji serokaniyên cewherî hatîn û biberdewamî giringiyeke xwe cih heye evin:

- Sor (xwîn, birîn, rudan, pîrozî)
- Narincî porteqalî (Agir, Gir)
- Zer (tîşkên rojê, ronahî, belavbûn, giştîbûneka zîrekane)
- Sewz (kesk) (şiînahiya Giya û dar û direxta, Rengê mirinê dema gelek tarî be berev reşî). Ji ber vê yekê jî sewz pireke dinavbera reş (weke meidanî) û Sor (xwîn, Giyanewer) herweha dinavbera Giyanewer, ruxan û mirinê de.
- şînê tarî (asman û şev û derya helçuyî)
- Qaweyî, oker (xak)
- zêr ( roxsarê pîroziya rojê digehîne)
- zîv (sîmayê pîrozê Heîvê)

Dinava ol û rewştên miletan de cudahiya bîrkirinê di rengan de xweya dibe. Hind şêwên sombûlîk bi xweve digrin, herweha li gur heft renga hind pêkhatên jiyana civakî û olî bune egera destnîşan kirina jmarekê di rengande. Li ser vê Eloy Star dibêje: *her yek ji heft renga haupêçuneke ji bo her yek ji heft şiyanên ruhî, heft fezîle (binêrîneke pozetîv). heft kêmasî (binêrîneke nêgatîv), heft şêwên endazeyî ,rojên heftiyê. Ev hemû girêdayî sombulîzma rengin. Weke eşkereye li ba gelek miletên destpêkê girêdaneke hûndurîne bi hemû şêweyan hest pê diken, mînak; Hindî rojavayê Emerîka baceka salane diden qeşeyên xwe ji heft rengên genimî pêk tên her rengek taybete bi xwedawendekî ve.*[94]

Agir bi rengê sor narincî nîşadaye, hewa bi zerî, ji keskî bo murî: Av, xak bi reşî û okerî nîşa deye. Zemen bi rengekî tîşkdar yan birîqedar ku her tim di guhartinêdaye. Derbareyî pêlên şînî, ew şînê têkelî reşî dibe taku şînê ruhin, gelek xeyal jê kiriye. (şîn ji ber peywendiyeke cewherî heye digel asman û derya û boşahiyê sombolîzma astê berz û nizime). Wateya berzayî û kûîratiyê, li

(93) Jun Eduardo Cirlot,wergêra Qerenî Jemîl.Kovara Şêwekarî rû.41jimare3.Hewlêr 2003
(94) Jun Eduardo Cirlot,wergêra Qerenî Jemîl.Kovara Şêwekarî rû.43jimare3.Hewlêr 2003

oqyanosê jour û yê jêr digre, ev rengên sombolîk hêzeke mezin di yarîkirnêde bi sêberê, (tarî, xirabî) û tîşk (ronahî, nemirî, başî) bi vî şêweyî, şînê tarî diçe ser reşî, şînê asmanî, weke zerê berev spî, şîn tarîye û tê dîtin. şînê dinavbera spî û reşî de (roj û şev) yeksaniyekê nîşa dide. Tê guhartin ligor gohartina tonî, alîgiriya rengî bi şêwê cemserê diyarkirî ku rengên sereke di şêweyekî diyarkirî de, ew dikarin bikevine nava çarçuveyê (pozetîv de) (tîşk) yan nêgatîv (sêber) herweha di tiura estetîka hemdem de reng dide ku li cihê sîstema cromatik li ser sê rengên sereke diyar dike ewjî (sor, zer, şîn)in. Li ser opozisiona dinavbera zer (spî) û şîn (reş) dike, wesa tê danîn ku rengê sor encama gohartina ne rasteuxoye, dinav bera van du renga de (berdewamî, zer, narincî, sor, mor, şîn).lê kesk encama gohartina têkel rasteûxo (Kandinsky, Herbin).(95)

Sombolîzma kromatîk bivî şêwey tê şirovekirin:

- şîn diçe ser (Jono, Jupiter) weke xwedawendên asmanî, hest û sozên olî, peristin û bêgunehî.
- sewz (kesk) rengê vînos û xwezaye, şînbûn û berhem, xonşirînî, rahatin, yekgirtin.
- Mor, bîrewerî, peristin (şîn) zêde soz (sor)
- zer, diçîte ser (A polo) xwedawenda rojê, dilovanî, hestiyarî û zîrekî.
- Narincî, (fexir û temaî)
- Sor, vedere bo Merîxê, soz, hestên hundurîn, destpêka jiyanbûnê.
- Bur (risasî) (bê layenî, xoperistî, bêkarî, bê ciyawazî, rengê xoliyê ye.
- orcwanî, (rengê Empiryalî a Romaniye Cardinalia nizîke ji rengê mor, deselatdarî, rohanyeta pîroz digehîne.)
- pemeyî, (rengê goştî û hestên sixsoêlî.

Ev şirove dibe hêşta dirêj bibe ligur piraniya reng û pileya tunên renga lihemberî wateya wan, lê ji aliyê sombolîzmêve metirsî û dudiliyê peyda dike, berev sîstemekî req û bi manebe. Ev jî giringe ji bo balkêşiya dinavbera tunên renga de .(çirî û pirî, ronahî û rengek) di pileya sombolîzma hevgirtî de, dinavbera herdu cemserên ronahî û tariyê de, herweha paqijî û ronahiya rengekî her

---

(95) Jun Eduardo Cirlot,wergêra Qerenî Jemîl.Kovara Şêwekarî rû.45.jimare3.Hewlêr 2003

tim wateya sombolîzmê digehîne, di heman şêwey de her curek ji rengên sereke diyardeka bizava serekî û cewherî dide. Ew rengên ne serekejî, di pileya duyem û sêyemde li hember aloziya yek digrin. Zaro bişêweyekî hezên xwe rengên têkel û tarî red diken, ji ber ku ji bo wî hîç wateyekê nagehînin, lê huner di qonaxên herî pêşkeftî de rasteûxo bi tonên zer, pemeyî, oker û kesk ve girêdeybo. Livir mirov dikare pêtir aliyên sombolîzma kromatîk eşkere bike, ku di qonaxên jiyanê de raû buçunên kesanên şareza yên vê meydanê şirovekirîne ligor pile û wateyên li hind dever, netew qonaxên dîrokî de bikar anîne û ta niha jî weke sombolîzma vê yekê bi rêya renga tê bikaranîn.

Ligor nêrînên **Beaumont**, sombolîzma çînên renga mana û meremên cude digehîne.Zer ji ber ku rengê rojê ye-pîroze, taybete bi paşa, ji aliyê Misriyan ve, şîn rengê rastiyê bu, kesk di hunera kiristiyanan serdeste ji bo bihayê yekgirtinê dinavbera herdu komelên renga de. Xwedawenda Dayka Hindiyan bi rengê sor pêşkeş kiriye, (li cihê rengê spî ku rengê mêye), ji bo nêzîkbûn bo destpêka dirustbûnê, sor rengê hatin û çûn û bizav û xonêye. Ji bo vê mebestê jî di qonaxên destpêka dîroka mirovahiyê de tiştên xo sor dikirin ji bo vejiyandinê, Çînî jî mîna Telsim alayekî sorê dirêj bikar di înin, bi heman wateyê ku jeneralekî Romanî dema xelatê şerefê pêşkeş dikir swarî erebanekê dikir du hespên spî radkêşa, bi cil û bergên cengê rengê zêrî ku sombola rojê bo ruxsar bi sorî reng dikir, bidîtinên (Şnieder), rengê sor baştir hîmayê agir û paqijî a hundurîn digehîne.[96]

(Oswald Wirth), rengê narincî ji bo karekterê bê hêvî û dupatkirina zor, taybet û giring, xoperêsî û bê rehmî û…gir û dirindeyî dide, rojhelatnas (Eriç Zimmer), dibêje: beriya Buda bibe Buda pora xo tiraşî cilên padşatiya xo guhartin rengekî zerî narincî li berkir, ew kesên di vê çarçuvêde razî bûn komelgehê liber xo dikirin mîna cilên kirmînalî bûn dema berev cihê sêdaredanê dibirin. Ev yeke jî li ser sê aliyan tê xweyakirin, rengê reş mîwe, spî, kiprît (sor) pêgehiştina Berd zêr reş ji bo hêvênê bûnê, bugenî, veşartin, nepenî û tubeyê. Spî-ji ji bo geşbûn, berzbûn, lêbûrînê, sor- ji bo êş û azaran, pîrozî û xoşewîstî, zêr ji bo şanazîkirinê. ev zincîre (reş, spî, sor, zer) rêya windabûna ruhî nîşadi de,

(96) heman çafkanî.rû.44

pêçewaneyî vê jî ji jor bo jêr. Zer (zêr bi şêweyê nêgatîvane, ne weke xala pêgeheştinê, lê weke xala destpêkirinê, ya helçûnê) şîn (asman) kesk (xweza, jiyan, rasteûxo siruşt) reş (retina Eflatuna nû), di hind rewiştan de kesk û reş bi şînahiya dar û direxta dibînin. Ji ber wê jî zincîreya serkeftî: kesk, spî, sor baştirîn sombola misriyên kevin pêktîne. Ji aliyê qeşeyên kevin **Seliteksin** jî biheman şêweyî herweha **Rene Guenon** me agadarî wê yekê dike di rêkeftinekê de (Beatriz) bi cilekî derdikeve ligor (Dente) rengê kesk û spî û sor, ev jî wateya hêvî û omêda ye, rastgo û dilsozî ku hersê wateya digehîne. Derbareyî rengên têkel, wateyeke aloz û giştî heye giringiya sombola lê derdikeve çunkî dubare pêkhatîne, bi vî curî qaweyê tarî digel xakê û şînbûnê, giya û dar. Qeşeyên mezhebê meirîfî li ser vê ramanê dibêjin rengê pîvazî rengê guştiye û sombola dubare û helçûnê ye, yan rengê narincî li pertoûka (El kîmiya) ya (Abraham Juif) dibêje: rengê bê hudeyî di şiroveka bedawiyê de ji bo çend vîgoran Mejazî dibêje: mêr û jin li ser rubarekî şînê asmanî, wateya wê dide ku jin û mêr nagehin hêvî û awatan di vê cîhanêde wateya bê hêviye, baugranê şînê asmanî, hêvî û umêdên asmanî di de, ji ber wêjî rengê kesk rengê keş û av û hewaye, rengê şînayî û giya û dar û direct û jiyanê ye, herweha rengê laşê bê giyan ye. Ji ber wê jî misriyên kevin xwedayê şinayî û giya û drext û mirinê bi keskî reng dikir, bi heman şêweyî, dinava xwezayê de, keskî cihekî sereke û naverast dagîrkiriye. Ligor nêrînên (Guenon) zincîreya şeş rengî bi vî şêweye (sor, narincî, zer, kesk, şîn, mor) rengê heftê jî spiye ku naverastê digre û her şeş reng dikevin dinavbera herdu sêguşên stêra şeş palôde(Sello De Salomon).

# Huner-Xweza û Dîrok

Wêneyên mirovên kevin li ser dîwarên şkeftan berî zayînê pazde hezar salan bandura siruştî pêve diyar, xweza serukaniya hunerê bû. Wek di destpêkê de çawan ji siruştî tişt vediguhsztin. Lê di gel pêşdaçûna hizir û rewşenbîriyê bi destkariya ku tiştan hin caran veguhast şêweyekî abstrak. Gelek şêweyên siruştî hene, ku mirov dikare veguhêze berhemeke hunerî..Bi wateya serûkaniya huner, xweza weke mînak peruçkên befrê li bin mîkroskob şêweyên wisa derdxîne ku ji dirustkirina nexşeyên zêrî bikar tên. Yan jî dezuyên di nava pelên daran de ku nexşeya bajaran pê tê çêkirin, Herwekî balafir bi ramana perên teyran çêbûye ûwd.. şêweyê herêmî serûkaniya îlhama mirovên kevn ji çêkirina guzik û amanên navmalê ye.



**Tabloyê hûnermendê cîhanî Monet**

Hunera Bîzentî ji wêneyên giya, mirov, giyanber û balindan bestiye. Hunera Helen, herêmên Afganistan û başurê Turkistan û hunera Girekî yên kevin bihayekî zor bi mirov û werzeşvanan daye. Hunera Sasanî giringî daye wan nexşeyan ku ji belgeyên mêwa tirî

wergirtîne û balinde bikar anîne, giyan li beramber dara jiyanê. Hunera Îslamê jî heta radeyek ketiye bin bandora toximên xwezayê.(97)

Mirov dikare huner binasîne bi wê yekê ku huner bingeha serekî û karekî bingehîn e di mirovatiyê de pêwîste ji bo kes û civakê. Huner û mirov ji hevûdû nayên cudakirin. Ne huner bê mirov û ne jî mirov bê huner rastiyek e. Derûdor û rastiyeke ya afirandinê ji hundurê hunermend diyar dike. Cîhaneke eşkere û ronî ye. Ji henasedana ruhî, mîna henasedana siruştî kes û şaristaniyet bê huner pêşda naçin. Huner girêdayî jiyanê ye. Jiyana bê huner jiyaneke bê wateye. Huner pêwîstî berztirîn hest û bîrkirinê ye ku kurahiya tecrubeyane. Huner berztirîn pêwîstiya mirov e. Azar, xweşî, xem, şiyan û neşiyan, gihîştin, ji nav birinan bi armancên mirov dijîn.

Berdewamî û afirandineke bi hêz hemû taybetmendiyên mirov in. Hêza wî di karê wî de dîroka hunerî rastiyeke beramber zanyarî û hebûna vê rastiyê mirov fêr dibe ka çawa dikare bawerî bi hebûna xwe hebe û girêdana wî bi hemû qonaxên jiyanê re. Herwekî şahidê rast e û xwe ye ji bo karên hunerî. Mîna karên nemir û her tim jîndar. Hîç tişt mîna karê hunerî li ser nazikî û hesta kûr a mirovî hîkariyê nake. Dîsa dîroka hunerî vê yekê çespandiye, (îspat kiriye) ku xewna mirov pal dide rastiya realîteyê. Lê ne pênasa wê û ne jî şiroveya wê bi asanî nayê zanîn. Tenê ew bes e ku di hunerî de daneke berdewame. Ew jî ciwanî ye, bi nêrînên her zanayekî û hunermendekî vê ciwaniyê wateyekî taybet wergirtiye. Lê serencamê vê yekê ciwaniya hunerî ye. Di her cîhekî de û di her demekî de rengekî nû bi xwe ve digre, ku mirov hêbetî dimîne. Kûrî û bilindiya vê yekê armanca pêkhatina hunerî ye. Li ser vê gelek lêkolîn û hûrnêrîn hatine kirin; *ji bo zanîna hunerî bi zanîna mirovî û zanîna mirovî bi hunerî.* Ev jî wergirtiye ji jiyan û cîhanê; ji bo berzkirina karê hunerî.

---

(97) Suleman ŞakirKovara raman jimare 32.1999 rûp.189

# Çavkaniyên Hunerî

Livir mirov di pirse gelo huner pêçewaneyî dîrokê ye?

Lê bersiva vê: Bitaybet ji curyên guhartinê û li dûv guhartinên çaxan huner pêwîstiyek e bi mirovî ve girêdayî ye. Bi vî rengî diyardike ku dîroka hunerî serbixwe ye û dîrokeke taybet e. Yek ji peywendiyên di navbera huner û mirovî de ye. Dîroka hunerî û xwendina hunerî û guhartinên bi ser de tên ji xwendinên mirovî nayên cudakirin. Nabe tenê bêjîn dîroka hunerî paşgirê dîroka giştî ye. Weke gelek kes wesa dinêrin.

Di sedsala nozdehan de *Hibulit Tîn* (1828-1893z) di pirtûka xwe ya bi navê *Lêdena Deriyê Dîroka Wêjeya Îngilîzî de* dibêje: *"Sê çavkanî yên cuda hene ji rudanên destpêkê* ***Regez, Navend û Dem.*** *Tîn wusan dibîne ku divê karê hunerî li bin bandora van be. Mînakê vê yekê jî resmê Holendî ye. Di sedsala huvdan de ku girêdayî wê demê bû ya civaka Holendî têde dijiya. Bi girêdana jiyana realîte bi jiyana kesayetî ve. Ciderdu, Rembrand, Herkul ûwd.. yan jî mînakê hunermendekî mezin mîna Vermeer di tabloyên wî de jiyana wê serdemê ya civaka wî û cil û bergên wê demê di tabloyên xwe de bi kar aniye, şêweyê afirandina wî ji hemû hunermendên wê serdemê cudatir bû. Ne tenê ji bo realîteya wî bêhtir ji bo şaîriya wî jî."*

Dîsa *Karl Marx* (1818-1883) dibêje.[98]: *"Di durbîna siyasî, nêzîktirîn dem û wêrekiyê de, karê hunerî berhemê kartêkirinên ji derve ye. Lê di diyardeke hisî de. Ji ber ku her tişt ji hebûnên aborî û civakî pêk tê. Wisa jî huner xwe diçemîne biryarên giştî şêweyên berhemî yên di jiyana madî de hukim dike, ji bo pêşdaçûna civakî, siyasî û fikrî di civakê de."*[99]

Bi vî şêweyî nêrînên *Tîn û Marxî* pêwîstiyê hunerî û mirovî diyar dikin, ku ruyekî yekgirtî û bi hev re girêdyî di reyaliteyê de pêk tînin.

---

(99) Ernst Fisher-El-Iştîrakiye wel-fen- rûp-21 tercima Esed Helîm çapa yekem 1973 Beyrut.

# Bandora Huner Di Dîrokê de

Em dibînin ku giringiya dîrokê li ser hunerî çend bûye. Em dipirsîn gelo pêçewaneya vê yekê raste yan na? Mirov di her demekî de û di her cihekî de afirandina karê hunerî pêk tîne? Ev kar tê encamdan li gor rewşa wê demê û nêrînên hunermend ji bo cîhana wî/wê û hebûna wî/ê. Lê divê em vê yekê jî bizanin çawa ev kar ji bo hemû kesan dibe rudaneke berdewam. Ev jî rastiya mirov e. Ji wê rastiyê mirov afirandinê dike. Nêrîneke taybet ya serbixwe ye. Diçe nava hemû civatan û bandora xwe li ser dike. Ev bûye rastiyek û guherînek ji realîteyê. Bi vî rengî hest, hizr û ramanên hunermendî dikeve praktîkê û bi karê hunera xwe bandorê li ser me dike.

Gelek caran hunermend dîmenekî diyarkirî ji bo xwedawanan dirust kiriye. Dema pêçewaneya olê wê demê çêdibû weke demildestiyekê bû ji bo afirandina karekî hunerî bi şêweyê olî. Di wê demê de ji xwedawendan rengekî nû hate afirandin û di bû nûjeniyek. Bi vî rengî gelek pirs û şirove dihatin kirin û danûstandin li ser çêdibûn. Ev bû ku hunermend şiyan rengekî nû di nava civakê de peyda bikin. Divê demê de nakokî di navbera dêr û katolîkan de peyda bû, ku piraniya hunermendan hunera di xizmeta dêrê de bi kar dianîn, taku babet jî dest nîşan dikirin. Bi vî rengî resim bû karekî derveyî şîyanên wan û zivirîna desthilata dêrê ya ku hesta van kesan bilivîne. Bi vî rengî dêr gelek ji şiyanên resmî ditirsiyan û digotin; guhartinê li ser hizrên gel çêdike û yê giringiya olî nemîne. Ew resmên tê dirust kirin hizreke din çêdike û ev di sedsaliya dozdehan de diyar bû, ku ne bi tenê li cem katolîkan, li cem bîzentî û musilmanan jî guhertinê derxiste holê. Dîrok diyar dike ku huner ne tenê di berdewamiyê de ye. Hîkariya xwe li ramanê dike û mirov hiltîne bin bandora xwe. Jiber wê jî serhildana Europa (Renaîsans) ji encama vê bandurê û çendîn xebatên din peyda bû.

# Hîkariya Huner Li Ser Mirov

Dema Karekî hunerî yê serkeftî tê berçavên me, diçe di hundirê mirov de cîh digre. Hizir û bîrên mirov bi xwe re dide kar kirin. Bi hizir, hest û bo çuyîneke diyarkirî mirov hewl dide ku bikeve nava vê jiyanê û têde hizir bike. Ev hizir û raman xwe der dike. Ger em li desthilatderên serokên dewletan binêrin em ê bibînin ku bi rengekî teorîk li dûv hunera klasîk diçin. Wek; **Şarliman, Luîsê çardan û Napolyon**, ji realîteyê dûr û bi nêrînên xwe yên cûda ew jî ji vegera bingehên hunera kevin kêfxweş bûn. Lê ew neşên vê yekê veşartî bikin. Giringîdayîna vê yekê ji bo rêxistina hunerî palderek e. Wisa huner şiya di qesirên împratoran de li hemberî hevrikiyekê rawest e. Ji klasîkiya Napolyon xwe bigîhîne netirsiyê, berevan û afirandinê ku bandora xwe li ser dil û giyanê herkesî bike. Huner û hunermend bi vî şêweyê gelek caran bandora xwe li ser hest û livîna mirov çêkirin. Rast e, Astengên mezin di riya afirandinên nû yên hunerî de peydabûn. Lê hunermend bi nêrîn, hest û şiyanên xwe dikare hunera xwe mîna karekî siruştî di civakê de pêk bîne. Huner gelek caran li gor rewşên gelek civak û komeleyan zû bi zû cih nagire. Lê heger hunerekî serkeftî be hunermend dikare xweşiya vî weke bandorekê li ser hest û nêrînên herkesî bike û xweşiyê jê werbigre. Ji ciwanî û afirandina vî hunerî, dibe ku nêrînên hunermend cuda bin. Ji bo her tiştî di jiyanê de, her kes vê ciwaniyê bi şêweyekî din dibîne. Ji ber ku ciwanî rêjeyî ye. Ev yek li ba herkesî bi dirêjiya jiyanê gihîştiye qonaxên nû û nêrînên cûda li ser peyda bûne. Mîna nêrînên **Budler** ku wiha dibêje: *"Ciwanî bi dirêjiya caxan li ser du helwêstan dabeş bûye;* ***bawerî bi ciwaniya mutleq*** *û* ***neliv- û şirovekirin.***

***Regezên me,*** *ku dîmenên siruştî ne, yên neyên guhartin. Madê pêşda neçe hunermend ji bo şirovekirina yekem û zalbûn li ser ya duyem, li ser rêbaza xwe nûjeniyan çê dike. Her yek bi nêrînekî li siruştî, çiya, bilindahî, ciwanî û romansî dinêre. Serbilindahî û xweragirî hin jî pêçewaneyî vê yekê ye. Bi vî awayî gerdun li hemû*

*deman yan bi rengên cuda li gor siruştî û cihî yan hemerengên mirovan di çavan û hizran de pêçewane dibe. Bi vî awayî guharîn û pêşdacûn li demekî bo demekî peyda dibe ku bikaranîna mirovên alî û pêşdecûna teknolojî ku tim girêdayiyê vê yekê ye, lê regezên serekî mîna (dest, çav û hizir) di guharîna berdewamde ne. Di çarçoveya jiyanê de, di gel pêşdaçûna demên kar, dest pêş de diçe, dîtin tê guhertin, li gor dîmenan nû dibin û tên destnîşankirin. Di berdewamiyê de hizir bêhtir nû dibe, ku rêya mirovayetiyê ye.)* (100)

Li vir hemû tişt girêdayiyê demekî diyarkirî ye. Her yek li gor îmkanên xwe û rêya xwe çi ji aliyê felsefî ve û çi ji aliyê nivîskar û hunermenden ve bi rengekî derbirîna vê yekê dike. Lê ji rewşa demê ew têde, her yek bi zimanekî taybet li gor bernameya xwe wê derbirînê dike. Hemû di keştiyeke li ser deryayê de çavdêriya rengekî taybet dikin. Di cîhanê de, bivî rengî tên dest nîşan kirin, bi rengên amûraniyê din jî bi renga resim dikin. Mirov di navbera van karan de hîç nêzîkbûnekê nabîne. Hemû bi hev re bêyî cûdayî vedigerin ser wî babetî ku dibînin her yek vê çendê şirove dike û hemû bi hev re di yek keştiyê de ne û di yek pile de, ji bo rêyek diçin. Ev keştî vî cilî radike. Huner li ser felsefeyê tiştekî diyarkirî ye, wêje û karê xwe, her wekî razî li ser haletê komelayetî û aborî.

(100) Ernuld Hawzer-tercime-Dr.Fuad Zekerya-miracie- -El-fen wel-moctemi ebre el-tarix.cild-1- duyem.1981 Beyrut

# Huner û Netew

Dema em behsa huner û netew, yan jî bandora huner ya li ser hesta netewî bikin, berî her tiştî pêwîst e em herdûyan cuda bidin nasîn. Netew çi ye? û Huner çi ye?. Her yekê ji vana, li gor lêkolîn û şiroveyên navdarên cîhanî cur bi cur hatine danasîn. Lê dibe ev danasîn jî hemû ne mîna hevûdin bin. Lê dîsa jî hin armanc û xalên hevbeş di navbera wan de hene. Li ser vê yekê em hin pênase û şihiroveyan bigirin ber çav ka her yek ji van tê çi wateyê.

## Netew:

Gelek pispor û lêkolîneran, pênasên cûda cûda li ser netew û pêkhata netewî kirine, em dikarin bi kurtî weha bêjîn: Netew ji diyardên giring yên hizrên mirov di yekgirtina civakê de û hevrikiyeke berdewame di navbera çînan de peywendiyeke civakî ye. Ji bizavên dîrokî, ji bo rêkxistina civakê peywendiya bihêztirîne. Îdolojî di rêkxistina civêkê de roleke sereke dibîne. Sîstema peywendiyên civakê yên madî li ser bingehê îdololojiyê peyda dibin. Di sedsalên nû de diyarda netewî derket û ji hêzên siyasî û dilovaniyê bi hêztir bû. Ev jî ji bo avakirina dewleta netewî bi hêztirîn piştgirî kir. Ji sedemên dagirkirinê ji bo parastina mafên netewî û ji bo rizgarî, azadî û serxwebûna netewî, netew paldan hêzên bergiriyê û berevaniyê.

Mînakên vê yekê jî di cîhanê de pir in. Mîna, yekgirtina îngilîzan li dij dagîrkirinê ji aliyê Danîmarka ve. Şerê sed salî yê di navbera Frensa û Îngilîztanê û dagîrkirina Rusya ji hêla moxol, teter û bolindiyan ve. *Rusell* dibêje: *“Peywendiyên zimanî û resenayetiya dîrokî ya hevbeş, di hemû deman de ji bo pêkhatina netewî alîkar in.”* Berî êrişên Napolyon bêne ser Almanyayê almanan hin navên din li xwe dikirin weke; *Hanoverî, Brusî, Farî û Saksonî.* Ji ber ku di wê demê de peywendiyeke netewî di navbera van herêman de nebû, ne di hizrên wan de ne jî di piraktîkê de deku

keleporekî netewî bi hev re girê bide. *Makyavelê* Îtalî hesta netewî ji hesta dêrê cudakir û xwest, gelê îtalî hesteke netewî ji bo avakirina dewleta netewî pêk bîne. Dema pirtuka binavê Mîr di sala1513an de nivêsî. Dîtin û nivîsên wî raman û hizra netewî û wlatparêzî ya Îtalî pêş çav kir û pêş de bir. Di wê demê de Italya li ser çend mîrgehan dabeş bibu. Vê belavbûnê jî peywendiyên netewî bê hêz dikirin. Di heman demê de dewletên netewî yên bi hêz weke Frensa û Espanya li bakurê rojava bi hêz û dagirker bûn.[101]

## Huner:

Huner di bingeha xwe de şêweyeke ji îdolojiyê û pêçewane dibe ber bi hevrikiya hizran di rêkxistnên peywendiyên civakî yên di navbera mirovan de. *Tşirniviskî* dibêje: *"Giringiya huner ne vegera peydakirina jiyanê ye, şiroveya wê ye. Ev jî bi alîkariya îdolojiyê ji diyardên jiyana civakê mîna; hikimdana realîte, gunehbarkirin û bê gunehiyê derdiçe. Ev yek di hemû pêvajoyên dîrokê de bi civakê re rolekî sereke lîstiye."* Wêneyên hunerî, wêneyên diyardên cîhana ji derve û hundur e, bi alîkariya gotin, derbirîna serûçan, bizavên laşî, wênekirina tabloyan û rêkxistina dengan.. Ev wêneyên rojane di gel jiyana mirovî peyda dibin. Ew wêneyên hizr û belavkirna zanebûna mirovin û di afirandinên hunerî de hunerek peyda dibe. Huner hemû aliyên jiyanê di nava xwe de hembêz dike. Di guhartinên civakî de bi aliyên erênî û neyînî rolekî sereke dilîze. Ji ber ku cîhana huner; cîhana hest, ciwanî û dilovaniyê ye. Wêneyên hunera netewî berî niha jî hebûye di demeke dirêj de li ser hemû bizavên netewî yên pêgîhîştî di huner de. Hunera netewî bi pêçewaneyî jiyana netewî di gel peydabûna netewî derketiye.

Regezên netewî li Ewropa pêşdaçûn. Piştî derketina sermayedariyê, nêzîkî sedsaliya şanzdehan di sedsalên naverast de netew peydabûn. Paşê dewletên netewî yên serbixwe yên mîna; Îngilîztan, Frensa, Espaniya û Komara Holanda derketin. Di nava

(101) Sven-Eric Liedman-wergêr ji swêdî Asos Kemal –rêguzerî bîrî siyasî.rûp.82.weşanên APEC swêd 1997

her neteweyekî de zimanekî hevbeş û axeke hevbeş hebû. Li şûna her neteweyekî hêza serdest a derebegîtî dabeşkirî bû. Ev yek bû sedema peydabûna aborî ya netewî. Piştî *şoreşa 1640-1648an* çîna bazirgan û pîşesazan hewil dan ku desthelatdariyê bixin destê xwe. Di peydabûna netewan de huner, pêçewanê jiyana netewî bû. Huner, ji aliyê wergirtina hemû civakê ve ji hemûyan berfirehtir bû. Ji ber ku huner di nav jiyanê de zanînên nû peydakirin. Kesayetî û hevrikiyên nû pê gihîştîn. çînên nû di pêşekiya dîrokê de, nêrînên giştî yên realîte yên zanistî, bazirganî, pîşesazî û hevrikiya çînayetî, ji şer û ji rêkxistinên derebegîtî rizgarbûn. Çarçoveya ruxsar û zimanê taybet yê hunerî ji bo hemû dewletan diyar dibû.

Wisa tê zanîn ku rewşenbîriya netewî li Espaniya peyda bû bi *Antonio Lebreja* (1444-1522) re ku rêzimana nehwê nivîsî yê destpêkir û bi şaîr û nivîskarê dirama yê mezin *Lopedevega* (1562-1635) û rîwaiyê mezin *Cervantes* (1547.1616) û resamê mezin *Vilaskiz* (1599-1660) re geş bû.

Li Îngilîztanê dirama û şiîr di sedsaliya şanzdehan de pêşda çû. Ev huner bi zimanê gel bi civakê re diaxive. Dixwest hesteke netewî bide gelê xwe. Ev hişarkirineke civakî bû ku kesên civakê bizanbin di rêya kesayetî, civak û dîrokê de çêbikin. Nîştîmanperwerî, viyana nîştîmanî, û giringî dayîna dîrokê li cem *Şçspaarî* eşkere ye. Di lêdana hizra derebegîtiyê de cûdabûneke tund e. Gel girêdayî hişyarbûna netewî ye. Li ser hizrên nû xwe pêş de dibe û di navbera karên hunerî yên pêçewaneyên van rudan bûn. Vê yekê kar kire ser hişyarbûn, dastan, dîrok, siyaset, perwerde, yasa, hunera gelerî, hunera ciwaniyê û kartêkirina wan li ser rewşa jiyanê. Çîn serkêşiya peydabûna netewê dike. Çîna burjuwazî, çîna bazirgan û xwediyên pîşesazî yên ku xwe diguherin ji bo sermayedariyê. Piraniya hunera netewî di sedsala şanzdehan û huvdehan de, ji aliyê *Şçspaar* û hevalên wî yên nivîskarên diramayê û ji aliyê *Servants, Lopedevega, Vilaskiz* û ji aliyê serkêşên hunermendên Holendî yên navdar ve peyda bûye. Di vî hunerî de hemû çînên civakê di siruştê xwe yê mirovayetiyê de rastgo ne.

Em huner di du kelepurên sereke de dibînîn.

**Yekem:** Kelepurê reyalîteya dema serhildanê di gel meteryalên hunerî yên pêşkeftî ji bo şiyanên fermî, peywendî û rûdanên civakî yên bi girêdanên hundurî û şerên bîr û ramanan.

**Duyem:** Kelepur û efsaneyên gelerî, şiîr, huner û hunermendên nediyar yên ku ji sedsalên naverast derketin û di jiyana realîteyê de li gor mirovên gelêrî, ku afirandin dikirin li ser wênê ol û xeyalê.

Van regezan jibo hunera ji şiyanên derunî û pêkhatiyên realîteyê û hest û rûdanên diramî, giştî yên civakê hatin guhartin. Di sedsala hevdan de rêbazên nû bi navê hunera zexrefê yan Barok tên zanîn.(102)

Peydabûna bizavên netewî di sedsala huvdehan de li Ewropayê ye, di nav kesên ku di nava xak, ziman û jiyana aborî û rewşenbîrî ya hevbeş de dijiyan. Mîna; *Italî, Şîlî, Sirbî û Macer* û Îrlandî ku di bin dest bûn û dixwestin serbixwe bibin. Lê ev bizav li gor rewşên dîrokî, herwekî cudatiya ji aliyê rewşenbîriyê ve jî ji ya din cuda bû. Wan hewl dida bi rêya huner bi giştî tiştekî bi dest bixin. Bizava yekîtiya di navbera cotkar û burjuvaziyan ji rewşenbîriya netewî dest pê kir. Ev bizav ji aliyê akademistan ve hate rexnekirin. Digotin ev bizaveke herêmî ye ne ya cîhaniye.

Lê tiştê ji hemûyan giringtir di hunera dewletên serbixwe yên pêşketî de ku heta niha ji hunerî bo radeke nû gihişte wêneyê jiyana netewî. Ev huner beramberî hêzên serdest û xweperestiya di nava civakê de, jiyana dorhêl û hizirkirina dorhêlê eşkere kir. Ev huner afirandinê ji hevalbendiya gelan pêk tîne û ber bi azadî û pêşdaçunê ve diçe. Herwekî jiyana realîte ya gelên karker û pîşesaziya li ser bilindiyê. Ev huner ji dîtinên bûyîn û mirovayetiyê afirandinê çêdike. Herweha ji ciwaniyê peydakirineke nû ye. Ev huner li Îngilîztanê; di wêneyên siruştî yên hunermend *Constable* de û di karên rîwayiyên *Takri, Dikniz* û *George Ilyut,* li Rusiya; li cem nivîskar *Puşkîn, Gogol, Tolstoy, Gorkî* û di musîka *Gilnika û Mosorcskî* de derket.(103)

Bi hunera netewî ya li despêkê re, pêçewanî realîte û sembolên netewî diyar bûn. Weke şêweyê zexrefî çekên wê demê; dastan, serhatiyên gelerî, mêrxasî, stran û reqisê. Van babetan di nava hunereke netewî de xwe didît. Her neteweyek jî bi resenatiya xwe di hunerî de pêşçav dibû. şoreşên netewan jî di hestên netewî de

---

(102) Al markisiye wel mesele al weteniye.1942 rûp.12 Newyurk

(103) Sidni Venkşin- Al waqiye fî al fen.rûp.tercime Mucahîd Abdulmuimîn 125. 1971 misir

bandora xwe li ser hunera netewî kirin. Herdu jî girêdayiyê hevûdûne mînakê vê yekê jî şoreşa gelê Meksîka de bi serkêşiya *Zabata.* Ji bo rizgarkirina welêt bi peydakirina hunera Meksîka ya netewî bandora xwe li ser hunera bergiriyê kir. Ev jî paldereke netewî ye weke tabloyên hunermendê Meksîkayî zapatîst *Orozcoyî*. Buyerên netewî ku hunermendî pal dide berevanî û hesta netewî ku tu bixwazî û nexwazî tu beşekî ji neteweya xwe yî. Mînakeke vê yekê jî hunermendê rus *Ilja Repin* e ku beşek bû ji şoreşa gelê Rus a şoreşa 1905an û şoreşa 1917an. Li Rusya roleke sereke di gel gelê xwe bi hêza hunerî di beşdarbûna şoreşê de dît. Dîsa hunermendê Espanî *Goya* di tabloyê *Gulebarankirin* de bergiriyê ji şoreşgêrên Espanî dike. Di vî tabloyê de leşkerên Napolyonî guleyan berdide singê qehremanên Espanî. *Goya* dibêje: "Girêdana min bi hesta netewî û berevanî ji kurên netewa min, pal dide bi rêya tabloyê, ku ez beşek bim ji şoreşa gelê xwe û ez girêdayiyê jiyana netewa xwe me. Ev jî ji hest û wijdana hunermend tê.

Di avakirina komara Holanda de hunermendên navder li dijê dagirkirinê rolekî giring dilîzin. Li herêmên nizim şores, sala 1525an li dijî desthelatderiya Espaniya peyda dibe. Ji aliyê hunermendên weke *Peter Brugl* di tabloyê xwe yê bi navê *Dîn* de li ser xwînrijiyê xebitiye. Di tabloyê de serbrîna çend bê guneh û cotkarên gundekî Fleman resim kiriye. Dîsa hunermendê navdar ê Holandî *Rembrand û Rubinz* weke hunermendên netewi tên hijmartin. (104)

Herweha di dema Ronessansê de hunermend *Algirico* (1541-1614) li herêma *Kret* ji dayik bûye, lê jiyana xwe ya hunerî li *Roma* birye ser. Di wê demê de ev herêm li bin gefên *tirkan* de bû. Roma jî ji aliyê Espanya ve hatibû dagirkirin. Di tabloyên xwe de serûçavên leşkerên dagirker bi şêweyên dirindane resim kiriye. Ev jî derbirîn bû ji hovîtiya wan. Dîsa *Robinz* di tabloyekî xwe de zaroyên ku ji aliyê çekdaran ve hatine kûştin resim kiriye. *Borhart* li ser vê yekê dibêje: *"**Robinz** hemû hêza xwe ya hunerî di vî tabloy de bi kar aniye. Hewara zaroyekî berê ku bê kuştin xwiya dike."* Ev tablo li hember vê hovîtiyê berevaniyeke eşkereye. Ev jî mîna

(104) Sidni Venkşin- Al waqiye fî al fen.rûp.tercime Mucahîd Abdulmuimîn 126. 1971 misir

şahidekî dîrokî tê dîtin. *Tranz Halz* di gel çekdarên Holandî bi hevre li dijê dagîrkirinê şer dikir. Hemû tabloyên wî di vê demê de ji gel û netewa wî re berevanî bûn.

Piştî êrişên Almanya- Italya yên li ser Espanyayê û bombarankirina hemû aliyan, gelek hunermenden li Espanya di karên hunerî de bergiriya netewa xwe kirin. Mîna hunermendên nevdarên cîhanî Picasso, Goya, Silvador Deli ûwd...Di dema şerê cîhanê yê duyemîn de *Picasso* li hember hemû kiryarên ku ji aliyê hikumata *Fişî* ve pêk dihatin li dijê mirovayetiyê rawestiya. Gelek Tablo li dijê reftarên wan dirust kirin. Mina tabloyê *Serek Remzî yê mirovek mirî* û tabloyê *cimcimê çêlê*. Li dawiya şer *Picasso* bû endamê hizba komunîst û di axaftineke xwe de dibêje:*"Ji ber wê yekê ku ev partiya me ya kominist bêhtir hemû partiyên cîhanê nas dike û ava dike ez bûme endamê partiya komunist. Mirov serbestî û azadiyê di vê partiyêde dibîne. Ji ber ku komunîst ji hemûyan bêhtir xwedî helwêst bûn. Lê dîsa ez çav lirême ku careke din vegerim welatê xwe da bikarim xizmetê ji bo netewa xwe bikim."* Ev jî wê didenişan ku mirov di astekî berz û navdarde be jî li cîhanê, nikare xwe ji neteweya xwe dûr bixe. Ev berpisyariyeke dîrokî ye li ser her endamekî di her civakekê de. Ev jî dibe bersiv ji bo wan kesên xwe bi navneteweyî dizanin û netewa xwe ji bîr dikin û dibêjin me çarçoveya netewî derbas kiriye. Piraniya tabloyên *Picassoy* ji netewa wî re sembol û berevaniye. Dema li Espanya dijiya li jêr desthelata leşkerî û diktatorî û paşvemana pîşesazî, wî dixwest ji vê zîndana mezin rizgar bibe. Lê digot: *"Rizgarî û azadiya kesan nabe bêyî rizgarî û azadiya civakî û netewî. Ji be rku em beşekîn ji netewa xwe . Divê xebata me di qada hunerî de li dijê burjuwazî û derebegayetî û dagîrkirina leşkerî berhingarî be ."*

Li vir mirov dikare dagirkirina netewekê ji aliyê hêzeke din ve wê bîne ziman ku ne tenê welat tê dagirkirin. Herwiha kultur, huner, ziman û civak ji hemû aliyan ve tê dagîrkirin. Bitaybetî heger ev dagirker nezan be, dibe sedema wê yekê ku huner û wêje bi giştî di sistiyê de bijî. Mînakên vê yekê jî di dîroka gelan de liber çave. Mîna dagirkirina herêmên eraban ji aliyê dewleta Osmanî ve. Osmaniyan hemû tişt ji holê rakirin. Heger zimanê *qoranê* bi erebî nebûya wê ziman jî ji holê rakirana. Herweha dagirkirin ji aliyê welatên rojava ve jî bandora xwe li ser wan herêman hişt. Bergirî di şoreşa hunerî de li ser bingeheke netewî ji aliyê hunermendî pêk tê.

Ji ber ku vê yekê jî pêgirî jê re divê û berpisyariyeke dîrokî ye. Huner di civakê de dikare bibe hunerekî giştî û rola xwe di hesta netewî de bileyze. Ev jî wê digîhîne ku hunermend girêdayiyê civak û netewa xwe ye. Heger hunermend ji derveyî vê yekê be, nikare hunerekî netewî biafirîne. Ew ji realîteyê naçin tecrîdê, belku ji tecrîdê vedigerin rialîteyê. Ev jî beşeke ji rudanên dîrokî.

## Neteweyitî Di Huner de

Dema mirov netew û huner dabeş dike, ew bi xwe lêgerîneke di resenayetî de û rastiya êş û azaran e. Lêgerîn di ezmuna dîrokê de, gihiştin ji bo pêşerojeke geş û hevbeş e. Di ser wê yekê re ku hin aliyên nû hebûn, di nêrînên kesayetî de ku dîsa jî, ji çarçoveyê xwe ya netewî derneketîne. Ji ber ku bi şêweyekî asan nikare xwe ji vê rewşê a ku ji rih û rîşên netewî dûr bixe.(105) Herweha derbarê aliyên sosyalîzmê jî. Her çende li ser bingeha yekîtiya xebata karkeran ava bibe jî, dîsa nikariye xwe ji hest û rewşên netewî dur bixe. Li vir em dibînîn pîvanên nû di hunera nû de li ser bingehekî ava dibin, ew jî bingehê resenayetiya netewî ye. Ev yek jî bêhtir ji aliyê wan neteweyên ku xwedî kelepurê kevin ve diyar dibe. Ji netewe yên xwedî şaristaniyeke nû jî, bi şêweyekî li hunera kevin ya veşartî digerin. (106)

Ji berztirîn diyardên hunerî, di sedsala bîstan de, diyarda hevrikiya neteweyan bû. Dema mirov li Parîsê dinêre, ji hemrengên hunerî yên neteweyên cuda cuda li vir bûn. Lê hizra Firensî xwe li ser van hemûyan eşkere dike. *Xwendingeha Parîsê* ya ku piştî şerê cîhanê yê yekem diyar bû, mîna pirekê bû ku Amerîka girêdaneke huner a nû bi hemû cîhanê rev çêkir. Ev jî sedemek bû ji bo diyarda aliyên herêmî yên netewî ku dijayetiya wan dikir. Destpêka vê hevrikiyê li Almanya, Swîsre û welatên Iskandînavî, Belcîka û Holande bû. Almanya di sedsala nozdehan de li bin bandora hunera akademî yê berhingar bi şêweyê eşkere ji reng û lêkdanên folklora rusî di gel rewşa wan ya ku di şerên berdewam de di gel ruxsar û alîgirî yê

(105) Sidni Venkşin- Al waqiye fî al fen .rûp.153.
(106) Dr.Efif Behnisi- Al fen fî ewropa..cild 2 London 1993.rûp.342

dikir. Berî ku **Kandinsky** (107) bibe abstrakî di navbera salên 1906-1909an de wêneyên zarveker çêdikir. Di navbera 1910-1914an de ji berhevkirina rengên rojhelatî giringî dida hunera abstrak. Almanya di destpêka sed sala bîstan bi navê *expressionismê* aliyekî hunerî lê peyda bû. Ew bi xwe zarvekirineke ji huneran çaxên naverast bo çaxê serhildana paşî bo derbirînê. Di vê demê de Frensî li Parîsê girêdayî aliyê hunera *Fauvismê* (108) bûn. Paşê *Cubismê,* (109) ku di têgeheştina serbestiya tabloyê ji hemû naveroka pêçewaneyî Almanya, yên ku hunera xwe ji kûratiyê bi şêweyê diramî bi kar dianîn. Sala 1892an pêşangeha hunermendê Norwecî *Munç*.(110) li Berlinê bi navê *Secession* navek ragehand (cudebûn.).

## Mercên Hunera Netewî Çi ne?

Di dîroka huner û estetîkê de mirov dikare rastiyeke neguher bibîne. Ew rastî jî di civak û avakirina huner de heye û rola xwe ya hemdem û taybet pêk aniye. Her civak li gorî jiyana xwe û li gor bîrûbaweriyên xwe dibe xwedî çand û estetîkeke xwezayî. Ev estetîka xwezayî jiyana wê civakê ya hunerî di estetîkê de dide xweyakirin, ku bala mirov dikişîne. Di nava gel de gelek diyardên ku ji estetîkê re bibin bingeh hatine afirandin. Weke; ciwanî-neciwanî, bilindî- gernasî ûwd... Bi van jiyana hunerî ya civakan tê avakirin. Ji ber wê yekê ku civakek yan neteweyek di dîrokê de hin diyardên çandî û hunerî afrandine. Wê demê mirov dikare bêje di vê civak û netewê de jiyaneke hestî û dilînî avabûye. Ew gel di nava jiyana xwe de gelek berhemên ku ji huner, çand û estetîkê re

---

(107) Al fen fî ewropa.Dr.Afif Behnisi.cild 2 london 1993.rûp.342

(108) -**fauvisime**:diyardeka huneriye disala 1905-1908 derkeft li ser destê çendîn hunermendên serbixwe yên bingehê hûnerê Kevin jinav birî,û dijî çevlêkirinê dikarekî sade û asande dixebitîn azadiya bikaranîna rengan,bê têkelkirin digel yek û lihev nehatina renga di tabloyande.vauxelles yeke ji serkêşên vê rêbazê û Rouault,Dongen.V,Flaminiek û Durain.

(109) **Cobisme:**ev curê hûnerî li ser bingehekî endeziyarî pêk têhunermendên Cobisme,şêweyên endezeyî li ser şeşpalo,bazneyî û xir bikar dianîn,serkêşên wê Picasso û Epraqua bûn.

(110) Dr.Efiv Behnisi-al fen fî ewropa.rûp.296 Munç(1864-1944)li luten Nerwij jideyk bûye,lijêr bandûra Vangugh,Sura,Gaugan û Tulus Lutrik bûye.

bibin bingeh, afirandîne.(çi hunermend nikarin li derveyî civaka xwe û netewa xwe, hunerekî neteweyî biafrînin. Lewma mirov dikare bêje huner di taybetiya xwe de neteweyî ye.) Mirov li ser vê yekê dikare vê rastiyê bibîne: Dema tu bala xwe didî jiyana kurdan ya netewî û civakî, ev rasti xwiya dibe. Heta niha jiyana kurdan ya dîrokî, di mezopotamiyayê de gelek dewlemend meşiya ye û kurd heta niha dibin bandora avahiyekî gelek tund de mane û ji aliyekî din ve kurdan dewlemendiyeke mezin xistiye nava van afirandinên mezopotamiyayê. Ji ber vê yekê gelek mîtolojî, efsane, dastan û kevneşopiyên kurdan hene. Ev berhemên folklorî û mîtolojîk, ji bo hunermendên kurd weke xezîne ye. Herwekî di van berheman de rêya afirandina gel heye. Di van berheman de gel; (zimanê kesayetiya mirov û huner yek bi yek bi awayekî taybetî û xwezayî derxistiye holê).[111]Ku hunermendê kurd vê rastiyê nebîne û tevî vê rastiyê, rastiya xwe ya hemdem jî ji bîr dike. Ew nikare berhemekî netewî biafrîne. Berhemekî netewî jî di nav xwe de gelek tiştan dihewîne.

Mîna:
1- Rewşên çînî û siyasî .
2- Rastiya netewî û jiyana wê ya xwezayî û hemdem.
3- Taybetiya afirandina hunermend û bîrûbaweriyên hunermendî
4- Xurtbûn û şiyanên hunermendî û têkoşeriya hunermendî
5- Nêrîna hunermend a di derbarê rastî û rastgoyî de û zanebûna wî ya li ser çand û hunera netewên cude cude ûwd...

## Rola Hunermend Di Çarçoveya Netewetiyê de.

Dema em bixwazîn li ser huner û estetîkê lêkolîneke zanistî bikin, divê em pêşî bibin xwedî felsefe û îdeolojiyeke xurt. Ji ber ku bêyî felsefe û îdeolojî rexne û lêkolîneke zanistî peyda nabe. Berî vê yekê em bizanin, rol û rastiya hunermend di nava civakê de bibînîn, pêwîst e ku em li ser huner rawestin. Huner ji aliyê hunermend ve tê afirandin. Ev afirandina bi awayekî tund di nav

(111) Zoher Kakanî -kovara Rewşen jimare 8 .

xwe de jiyanê hembêz dike. Ji ber ku tiştên di berhema hunerî de hene, jiyana hunermend ya taybet e. Heger em bi awayekî bersiva hin pirsên li ser huner bidin, emê bikaribin rola hunermend û taybetiya huner a di jiyanê de heye bidin pêş çav. Pêwiste ku ev kar baş derkeve holê û bandora xwe li ser jiyan û civakê bike. Ji ber ku huner ji jiyanê tê û hunermend jî jiyanê bi zimanê hunerî dide pêş çav. Ev ne mîna derxistina felsefe û hin zanyariyên pozetîf e. Hunermend jiyanê di berhemê de ji nû ve diafirîne. Ji ber ku ew di huner de xeyal diafirandî ne. Hunermend di berhema hunerî de xwestek û hêvîyên xwe, felsefe; bîrûbaweriyên çîna xwe bi kar tîne. Livir hunermend xwedî xeyaleke fireh e û xwe berdide kuratiya hemû aliyên jiyanê. Dikare li ser hemû çînên civakê afirandinê bike, dema berhemeke hunerî li ser jiyana hejaran bîne ziman. Dikare jiyana dewlemendan jî bîne ziman, lê gava ku derbarê van jiyanan de bi zimanê hunerî berhemek derxe holê, divê pêşî rastiya xwe û rastiya civak û ya mirovahiyê rind bibîne. Hunermend nikare bi awayekî objektîf li jiyanê binêre. Em dizanîn ku rola huner û taybetiya hunermend, girêdayiyê hin tiştane. Weke; kesayetiya mirov û jiyana wî û helwesta wî ya li hember rastî û rastgoyîyê. Divê hunermend li hember rastî û rastgoyîyê bi awayekî baş û ne baş li jiyanê binêre. Jiyanê li gor vê çarçoveyê bike berhema hunerî. Divê hunermend berhema hunerî bike neynika jiyanê, lê ev neynik bila ne kopiya jiyanê be, bila ji nû ve afirandina jiyanê be. Ji afirandina jiyanê mebest ev e; hunermend ku bi çavekî estetîk û feylezofî li jiyanê binêre, wê demê hunermend dikare serdestiyê li hest û xeyalên xwe bike, wan bixe bin baskên hest û viyana xwe û jiyanê bi dorfirehî bigihîne encam. Huner û hunermend zagonên taybetiya civakê ne. Mirov ku di civakê de bijî, di nava wê civakê de dibe xwedî gelek bîr û baweriyan. Huner di nava vê jiyanê de pêş çav dibe û zimanekî di xwe de vedşêre. Heger em giringiya huner di civakê de bibînin, wê demê emê barê hunermend jî eşkere bikin. Li vir mirov dikare hin rasti û pêwîstiyên jiyanê bi huner ve girê bide û dema mirov dipirse gelo huner di civakê de pêdvî ye yan na?. Dema mirov li dîrokê dinêre rastiya vê pirsê dikeve ber çavên me ji çaxê paliolîtîk, neolîtîk û Mezodulîtî ûwd... dinêre, rastiyek derdikeve ew jî ev e: Huner çekeke di destê mirov de li hemberî astengiyên jiyanê. Mirov bi huner jiyanê guhertiye û xwe jî guhertiye. Wêneyên

şkeftan û cihên pîroz, arkalog divî warî de me rast derdixin. Lê ev çekekî wisaye ku jiyan guhartine. Mînak; dîtina agir, şoreşa çandinê û têkoşîna mekanîk ya bi astengên xwezayî re.. ûwd Ev têkoşînana gişt, serdestiya mirov û azadiya wî didin eşkere kirin û van çalakiyana di destê mirov de wek çekekî xwe guhartinê hatine bi karanîn. Lê çalakiyên ku zanînekî hunerî û estetîkî têde hebe, ji wan çalakiyên mekanîk gelek cudatir in. Mirov bi tîrekê dikare xwe li hember dirindekî biparêze û azad bibe. Lê ev azadbûne tenê têr nake. Ji ber ku di xwezaya mirovan de hin rastiyên kesayetî û piskolojîk jî hene. Heta mirov jiyana di hundurê xwe de derbasê ser rastiya objektîf neke, nikare azad bibe. Huner şêweyek azadiyê ye. Lê şêweyek gelek xurte. Di dîroka mirovahiya civakê de huner ev bar daye destê xwe û bi guharînên ta niha hatiye.

Dema em rola hunermendî beş bikin pêwîst e berî her tiştî em çend mînakên hin hunermendên mezin bidin ka çi rol di dema xwe de pêk anine. Her çiqas mirov nikare hemû mînakan bide pêşçav jî, lê dibe weke dîrok û hin rastiyên jiyanê bi rola hunermendê/î ve girê dide. Di her çaxekî de, di nav çand û jiyana wê civakê de, gelek zagon û rewşên çînî hembêz dike. Dîsa di civakê de jiyan girêdayiyê gelek tiştan e, wek; aborî, raman, siyaset, çand, huner ûwd... Lê di civakê de çîna serdest dikare civakê ji gelek aliyan ve bike bin bandora xwe û wê civakê dîl bigire, gotinên xwe pê bide kirin. Wisa tê diyarkirin ku huner jî di civakê de dikeve bin bandora têkiliyên weha. Ev di her çaxî de xwe eşkere dike. Ev jî girêdayiyê helwêsta hunermendê/î ye. Hunermend ku nebe xwedî bîr û baweriyek dewlemend, naveroka berhemê wê/wî tu caran rastiyê dernaxe holê. Divê mirov hunermend di nav rewşên netewî de bibîne. Divê jiyana hemû mirovahiyê di kesayetiya hunermend de derbikeve. Yên mîna *Rudîn, Bilzak, Dostuviskî, Pîcasso,Goya ûwd...* ku li berhemên hunerî bê firekirin, wê bi awayekî xurt were xwiyakirin ku jiyan cara yekemîn di nav dîtina hunermend de derbasî berhema hunerî dibe. Ev rewş bibe sedema nirxwandina jiyanê ya estetîk.(112) Ji ber vê yekê barê hunermend di nava jiyanê de girêdayiyê rastiya jiyanê ya ku li ser hunermend bandorê dike. Heger hunermend rastiyê nebîne û vê rastiyê di hundurên xwe de bi awayekî estetîk nehune, ew nikare barê xwe bikşîne û ti car nikare

---

(112) kovara rewşen jimare 9 rûp.60.1997.Istanbul

rola xwe bilîze.

Dema mirov li rewşa jiyanê dinêre di dîrokê de ti berhemekî nûjen tuneye ku tama neteweyiyê bi xwe re negirtibe. Mînakên vê yekê jî pir in. Dema mirov li berhemekî *Puşkin* binêre, yan jî romaneke *Dostoyevskî* bixwîne, jiyan û çanda Rus wê bi awayekî xurt derkeve pêşiya me. *Sçskpaare* di hemû berhemên xwe de pêşî Îngilîz e, paşê mirovekî hemdem û navneteweyî ye. Mirov dikare vê yekê di berhemên gelek hunermendên mîna *Goya û Picasso* û hunermendên Iraqî yên mîna *Feîsel Loêbî. Faîq Hasen, Mahud Ahmed* û hunermendên kurd yên mîna *Ezîz Selîm, Mihemed Arif, Evdirehman Kelho, Rêbwar Seîd û Beşar îsa Malva ûwd* de bibîne.

Lê di hin berhemên *post- modern* û *nue figuratîf* de ev rastî nebin jî, wekî wêneyên *Mondiryan, Malvetş û Kliye..ûwd.*.ku bêhna netewitiyê hindik e, mirov dikare van bi awayekî din û li ser raweste. Lê em dikarin di rastiya huner de nifşên netewî bi rengên xurt bibînin. Divê hunermend rastiya netewî bi dorfirehî ji bo huner bike bingeheke ne guher û li ser wî bingehî bilind bibe. Di vê derheqê de hunermendek di berhema xwe de, ew pirsgirêkên ku pê re girêdayî bûye, her dem jiyana gelê xwe û welatê xwe derdixe pêş. Li ser rewşên civakî radiweste. Heta ku ev pirsgirêkên, ku hunermend ji bo gelê xwe peyda kirine ji bo gelekî din jî rast derdikevin û ji bo wan jî dibin rastiyên mirovî û dimînin. Lê her rewşên mirovî di jiyana gelan de bi hin awayan cihekî taybetî digire. Di jiyana her welatekî de û cihekî û rengekî digre. *Gagan* dibêje: *"*Bilinskî *di têkiliya neteweya hunerî û rasteqîneyî de nêzîkahiyên ku hene hergav jê behs kiriye. Di jiyana gelekî de, li gorî taybetiya xwe vê tîne ziman.* Bilinskî dibêje; *jîndarkirina jiyanê ger bi rastî be, wê gavê ew bûyera ku di huner de ye netewî ye. Dîsa* Bilinskî *dibêje; ***`Netewetiya me, bûyerên di jiyana Rusyayê de hene, li gorî wan afirandinekî dixwaze.`**.. "[113]

Gogan li ser *Gogol* dinivîsîne û ji devê Gogol van agahiyan dide me: *"Di Fablen* Krilov *de ajel wek* Rosan *difikirînin û dilivînin. Tore, hest û taybetiyên wan dişibîn rewştên Rosiyayê yên gundan."*

Ev rastiên estetîkî pêşî ji nava rastiya neteweyekî derdikeven, bi çand û wêjeya wî gelî mezin dibe û ji civak û derûdura jiyanê estetîkeke xwezayî û netewî hildide. Dûvra hunermend li ser

---

(113) kovara rewşen jimare 9.1997.istenbul

bingeha netewî bîr û baweriyên wî yên hemdem û herêmî herçende xuristir dike, ew jî dibe xwedî felsefe û îdolojiyek. û ji nav civaka xwe der dikeve û dibe cîhanî. Paşê li ser rewşên mirovatiyê radiweste. Dema em li huner,edebyat û Idiolojiyên kurdan dinêrîn bi drêjiya dîrokê keftine heman şaşiê, evjî bûne egerên wendakirina gelek qonaxên zêrîn di dîrokê de. Hertim xwe bi hind tiştên xeyalî yên dervey çarçuveya netewî û rastiya jiyanê ve mijolkirîne ev jî bûye egera negeheştina wan ji bo armancê, ji aliyekî din ve nikarîne mifayî ji bûyer û pêşdaçunên nêvnetewî bibînin. Hunermend ji bo bigihîje rastiyê di berhemên xwe yên hunerî de bi nêrînekî kûr difikire. Ji ber ku karê hunermend yê duyemîn ev e: Divê Mirovahiyê bibîne û di berhemên xwe de bîne ziman. Karê sêyemîn yê hunermend helwesta çînî ye. Livir mirov dikare bêje hunermend dibe xwedî sê rastiyan. *Helwesta netewî*, *raman û baweriya hemdem* û *helwêsta çînî*. Ev hersê mînak di jiyana hunermend de bi hev re kar dikin û li ser afirandina hunermend bandora xwe çê dikin. Hunermend ku rastiya jiyanê nebîne û haya wî ji hemû çîn, rewş û bizavên hemdemî nebe, nikare di hunera de mijarekî bi zimanê hunerî bîne pêşiya civakê. Hunermend divê bizane her civakek çandekê derdixe holê. Ew civak li gor vê çandê, mirovan perwerde dike. Dibe ku ev rewş carnan wek vê zagonê dernekeve, lê bigiştî wiha ye. Mînak; di wêneyê de ronahiya *empressionizmê* hunereke burjuva ye û li gorî bîr û baweriya vê çînê hatiye afirandin. *Gauguin û Vangogh* li derveyê çîna xwe tiştek nafrandine, lê ev rewş hunera wan bê qîmet nake. Dema mirov bala xwe dide van wêneyan, rastiyek xwe dide der. Ev rastî jî rastiya jiyana wê çînê ye. Jiyana çîna burjuwa wisa di wêneyan de xwe dide der. Wêneyên romantîk ûwd. Bi kurtasî hunermend di berhema xwe de ji sê tiştan nikare dûr bikeve.

1- Rewşên netewî
2- Helwesta çînî û îdeolojiya ku jiyanê dinirxîne
3- Nujenî û hemdemî ya ku li gorî nirxandinên estetîkî yên hunermend pêk tîne.[114]

Li vir mirov dikare bêje berî ku têkiliya hunermend bi hunera re hebe, divê xwe li hemberî jiyanê û rastiya jiyanê amade bike û xwedî zanyarî û pisporiya hunera be. Li gor pîvan û hestên hunerî bifikire daku bikaribe pisporiya huner di jiyanê de pêk bîne û bibe xwedî hunereke serkeftî hunermendeke/î ku jiyanê nas neke, nikare

(114) kovara rewşen jimare 9 .1997.îstenbul

jiyanê bi awayekî estetîk bixe berhema xwe. Hunermend çiqas ji civak û gel dûr nebe jî, dîsa taybetiyekî wî heye û ev jî dibe sedemek ku rastiyê ji civakê bêhtir bibîne. Hunermend jiyanê dibîne û dikeve pêş şêwe û giringiyên jiyanê. Wekî nêçîrvanê ku nêçîra xwe dibîne, hizir dike. Wê demê bîr û baweriyên hunermend pisporiya wî û hestên wî yên hunerî derdikeve pêş û li ser wan rastiyan hunera xwe pêk tîne. Ev weke rewşekî estetîkî tê pêk anîn. Dema ku hunermend dest bi berhema hunerî dike, di nava wî de şerekî mezin dest pê dike û hemû hêzên xwe yên di nav de derdixe holê û rastiyê dinirxîne. Di vê hêlê de huner ji nû ve afirandina jiyanê ye. Lê ev afirandin li gor hin zagonên hunerî pêk tên. Hunermend li gor helwesta xwe ya estetîk li go rewşên netewa xwe digihîne rastiyê. Dema ku rastiyê li gor van mercan pêk anîn divê hunermend helwesta xwe ya çînî û Îdeologîk derxe holê. Dema em li tabloyekî, peykerekî dinêrin, yan jî li muzîk û şanoyekê guhdarî dikîn, divê di wan berheman de jiyan li gor çarçoveyeke estetîk xwe bide der. Ev rastî jî di huner de bi şêweyekî ne eşkere di kurahiya hest û bîrên hunermend de di cîhaneke taybet de tên pêk anîn. Ev rastî jî rastiya jiyan û hunera ye.

Dema em hin rastiyan li ser hunermend û helwêsta wî di qada hunera de bidin pêş çav pêwîst e hin nêrîn û berdewama jiyanê û rola hunermend bi huner û jiyanê re bidin pêş çav. Gelo her berhemekî hunerî dibe xwedî afirandinekî hunerî û kesatiya hunermend, di nav civak û jiyanê de temsîl dike? Yan jî ew berhem û helwest ji hunermend tê xwestin? Di çi astê de ye û li ser hişiyarbûn û pêşdabirinê bandora wê çi ye? Heya niha gelek rexnegir û lêkolînerên mezin li ser hunermend gelek tişt gotine û her kes li gorî nêrînên xwe hunermend xistiye nava hin çarçoveyan. Birastî di hêla hunerî de dirustkirina çarçoveyan tiştekî çewt e, lê ne dirustkirina çarçoveyan jî çarçoveyeke û di vî warî de divê mirov hinekî objektîv birêkeve. Herwekî em dizanîn ku hunermend mirovekî taybet e û karê wî ne mîna hin karên dinê ye. Di jiyanê de huner weke wan çekên jiyan guhartinê ye. Di demên kevn de û di demên paleotitik de hunermend di nava rastiyeke giring de bûn. Ji ber ku hunermend çêker û ji nû ve avakerên jiyanê bûn. Wan bi hunerî jiyana xwe dide destê xwe û xwe rizgar dikirin. Huner weke pêwîstiyeke jiyanê bû. Em dixwazin hunermend di nava jiyanê de bibe xwedî rolekî mezin û huner bibe mînakekî guhartinê û azadiyê. Her weke di dirêjiya dîrokê de ev rol pêk anî.

# Huner û Cwanî (Estetîk)

Nîvîskarek bi rêya peyvan berhemê xwe diafirîne. Hunermendek berhemên xwe yên hunerî bi rêya resimkirinê diafirîne. Li vir ji bo me eşkere dibe ku ji vanan her yek bi zimanekî taybet berhemên xwe diafirînin. Di qonaxên pêşdaçûna mirovayetiyê bi rengê hizir kirinê û bi rengê dîtinê. Di hundirê mirov de di navbera hizir û huner de rastiyek heye. Ev jî bêhtir di hunera *empressionisimê* de diyar dibe. Ji bo me cîhaneke şefaf ya pêl bi pêl hatî avakirin li ser tîrojkan û bêhtir diyar, ji rengên xwe em dikarîn vê diyar bikin, li ser wê cîhanê ya vê yekê ji bo me diyar dike. Her yek bi nêrîneke cuda û rêbazeke cuda vê yekê pêk tîne. Lê armanca hemûyan yek e. Huner tiştekî bê dawî ye ku dibe dîroka mirovatiyê li pêş çavên rêvingan dîmen tên guhartin bi berdewamî û nayên zivrandin. Ev yek her tim di xaleke binecih de ye û berdewamiya guherînê ye û li gor qonaxên jiyanê çavdêriya karwanê vê yekê dike. Li vir em dikarin bêjîn xaleke binecih heye, ew jî armanca hunerî ye, ew hizra rojane li pêş çav e û li dûv diçe. Ma ev yek tê rawestan û di cîh de dimîne? Ev pirs ne rast e. Rastiya vê yekê her dem di rêya xwe de berdewame. Beşdarbûna hemûyan di vê armancê de nabe rêgir, pêre her yek bi nêrîneke cuda lê binêre. Gelek caran li cem hunermend ev yek diyar dibe û dibe sedema dudiliyê. Ev jî wê diyar nake, ku bibe sedema afirandina ciwaniyê. Ew rê ya rudan têde tên nîşandan. Ev ciwanî ji afirandina hunermend diyar dibe. Li vir mirov dikare bêje huner bizaveke afrandin û ciwaniyeke bi rumet e. Ciwanî bi nêrînên hundirî û felsefî tên zanîn. Dîmenên tîrêjên rojê li ser bilindiya çiya û daristanan cwaniyek e, lê ciwaniyeke bi bandore. Ew ciwaniya ku hunermend bikare di hunera xwe de pêk bîne û biafirîne. Li vir dîyaloga di navbera berhemê hunerî û temaşevanî de karê hunerî peyda dibe. Nepeniya vê yekê jî, huner bi xwe ye. Dîroka hunerî huneran cuda cuda diyar kirine. Yên ku diyar bûne bi hezaran sal in di hemû deman de vê yekê ji girêdanên hizrê yên ku li ser ferz dikirin, ji bo cwaniya hemû hizran rizgar dike. Dema balinde difire wênegirê fotografî

dikare bi kamerayê vê firê rawestîne, resmê wî bikşîne û binêre. Berdewamî tê de tine û tenê dîmenek lê diyar dibe. Lê berdewamî û bizav, her yek ciwaniyekê dide. Lêkolînên hunerî wê yekê diyardikin ku kûrayî û zanyarî li ser naveroka karê hunerî bi xwe ciwanî ye. Bi vî şêweyî têkeliyên di navbera huner, mirov û xwezayê de giring in. Rola huner di ciwaniyê de xweşiyek dide mirov, di jiyanê de ku jiyanê pê dixemlîne. Pêwîst e em kûrtir li vê yekê binêrîn da kilîla rastiya vê yekê û xala destpêkê ji bo me eşkere bibe. Ji demekî ku mirov peyda dike ne ji bo sûde xwe ji bo leyistin û afirandinên bi her rengê huner dest pê dike û ev yek bi karekî hunerî tê nasîn. Bi van haletan hewldanek peyda dibe ji bo têkdana wan sînorên xwezayê ku li ser me hatî ferzkirin huner dest pê dike. Di civakên kevin de peyker yan jî resim bi rengekî dastanên olî, yan rudanên dîrokî ta çêkirin ku dîmenên xwe pê binecihkirine. Herweha di demekî nêzîk de bêhtir hestkirin bi ciwanî û afirandinê dikir. Em dikarin rengdaneke din diyar bikin, ew jî cîhaneke nediyar ya afirandinê ye. Ya ku pê hizir û hest dike û xwe pê ve dibîne. Ku hunermend dikare di cîhana ji derve de pêkbîne. Bi berhemê hunerî van hestên hundur dide pêş çavê herkesî. Bi vî şêweyî gelek caran ji bo xweza bê veguhastin huner dibe pêwîstiyeke afirandinê. Lê bi rêyên taybet.

Heger em li tabloyên hunermendên mîna *Renwar, Durin û Sutin* binêrin, nêrînên wan ji bo xwezayê ji cîhana ji derve de ku wêneyekî jê werbigire, yek ji dîmenên ji derve wergirtî her yek bitenê afirandina hundurîn e. Lê bi nêrîneke taybet ya hunermendî, mîna şanogerekî ku li ser depê şanoyê û bizava zarvekerî li gor dexwazên derhênerî bikaribe peyvan bi kar bîne. Huner rastiya derunî ye ji bo nêrînên ji derve, yan a derdikeve ji mirovî û cîhanê. Herdu bi hev re vê yekê pêk tînin û wateya ciwaniyê didin. Ev yek ji mucîzeyên mirov û girêdana wî bi xwezayê re, mîna ruh di laş de be.[115] Ger em awirekî bidin hunera empressionisim, em ê bibînin ku li pêş çav reng giringiyeke mezin e, di pêkanîna karek hunerî û hesta ciwaniyê de peyda dike û bandora xwe li ser hizir û hestên hundurîn yên mirovî dike. Ev huner, hunera dîmen û rengê ye. Dema em behsa empressionisma dikîn komeke reng dikevin ber çavên me, sêber û ronahî têne hestkirin. Bi lez bi kar anîna filçeyan

(115) rinye Hewig -al fen teiwîlihî we sebîlihî cild 1 .

û cihê lêdana wan bi çend rengên ciwan tên xemilîn, paqijî û ciwaniya bi kar anîna rengan bi şêweyekî ciwan û hişiyar bi kar anîne. Sêber bi komeke rengên sar ku rehetî li dev me peyda dibe. Ronahî bi komeke reng tê bi kar anîn. Wek rengê porteqalî, zer, oker û tonên wan. Wisa reng hesta bînerî ber bi tabloyê dibe. Ji ber sedema bi kar anîna wan cureyên rengan mirov di van rengan de germî û sariyê hîs dike. Dema em li tabloyên hunermend *Sezan*, *Clod Mune* û *Alfred Sisili* binêrîn dê bo me diyar be, ku mirov hest bi wan deman bike, av û hewayên wê demê ku tablo dirust kirî. Ji ber ku van hunermendan piraniya tabloyên xwe li der ve dirust kirine. Ji ber vê yekê mirov av û hewayê li derve hîs dike. Di vî şêweyê hunera de rizgarkirina filçeyê bo ji nepeniya lêdana wî, bi rengên zeytî û hemû aliyên filçeyê. Bitaybet bi filçeyên pan ji bo pirkirina buşahiyan di tabloyê de reng bi paqijî bikar anîne. Bitaybet rengên sor, narincî, zer, oker û kesk ku bêyî tirs li cihên ronahî lê bi kar dianîn. Hunermend *Gaugan* rengê sor ji bo sêberê jî bi kar dianî. Sêber û ronahî li dev hunermendên empressionism giringiyeka mezin hebû. Bitaybet li dev hunermend *Sisli, Mane, Renwar û mune.* Ev rengên ku dihatin bikaranîn hin caran bi rengên taybet Yan tenê bi rengekî û rengên nêzîkê rengên mîna *Gaugan, Vangogh û Folarm.* Yan jî bikaranîna komeke rengên guncayî mîna yên hunermend *Renwar, Sizan û Krus.* Reng li cem empressionismê bê tirs dihatin bikaranîn. Ji ber ku ezmuneke mezin li ser vê yekê hebû. Gelek caran rengên sor ji bo darên kesk bi kar dianîn. Yan hin giringî diden rengê nav û îmzeyên xwe li bin tabloyê bi tîpên rengîn dinivîsîn. Gelek girîngî diden hêlan jî.[116]

Li vir mirov dikare nêrînên ciwaniya huner li ser du şêweyan bide xuyan;

1- Bi nêrînên hunermendî şêweyê ciwaniya huner .
2- Li ser yasayên zanistî şêweyê zanistî

Mînak:

Dema ku mirov li derketina rojê dinêre, nîvê wê li nav deryayê û nîvê din li derê ye. Mîna rengekî porteqalî bi rengê sor ve tê xweya kirin. Ev dîmenê ciwan yê xwezayê bala mirov dikşîne. Bitaybet evîndarên hunera, yên ji hemû nêrînên din dur.

Lê nêrîna zanistî ya xwezayê vî dîmenî li ser şêweyekî zanistî

(116) Gara Resul- kovara yekgirtin jimare 3.rûp178 sal1987

şirove dike. Têkiliyên di navbera av û ezman de bi sedemên peydabûna rengê porteqalî bi şêweyekî zanistî şirove dike. Lê karê hunerî bala me ji dur ve dikişîne.

Li bin bandora huner ji bo vî dîmena li ser bingehê ciwaniya hunerî, Ji bo hest û xweşiyên me bi tenê babetekî şirove dike.

Li vir mirov dikare bêje ciwaniya hunerî wijdana mirovî ye û xweşî û hestkirin bi ciwaniyê ji armanceke mifayî dure. Ji ber ku gelek tişt hene mirov jê sud werdigire, lê dibe ku hestên ciwaniyê tê de tunebin... Felsefeya nû ya mîna yên *Croce, Ruskin, Tolostoi, Nitzçe, Santayana ûwd...*

Li ser vê yekê **Croce Benedetto** dibêje: *" Wêneyên mêjuyî hest û wujdan ne. Ji ber ku lêgeryan pêwîstî bi ezmûna kar kiryar, û bidestxistinê heye.*[117] *"*

**Descartes** li ser estetîkê dibêje: *"Rêjeya ciwaniyê di xwezayê de rêjeyî ye."* Di pirtûka xwe ya bi navê ***Pêşgotinek li ser Musîkê*** de dibêje: *"Hestkirin bi ciwaniyê ve bînerî vedigere. Ev jî di pîvana hest, viyan û têkiliyê de û di qada huner de peyda dibe."*[118] Li ser musîkê têkiliyekî di navbera meju û hestkirinê de girê dide. Ji ber ku musîk giringî dide hestên guhdanê, guhdana parçeyeke musîkê, li ser bingehekî zanistî û bi rêkûpêk ciwaniyê derdixe holê. Ev jî di huner de vedigere şiyan û afirandinên hunermendî. Ev yeke jî şert nîne ku li cem herkesî wek hev be. Dibe ku li cem hin kesan tiştekî normal be û li cem hin kesan ne ciwan be. Li vir Descartes ciwaniyê dike şêweyekî rêjeyî û refiz (mendele) dike ku mutleq e. Ev jî dimîne li ser rêjeya ciwaniyê ya li cem herkesî. **Eflaton,** ciwaniya hunera dike ciwaniyeke veşartî. Vê jî bi afirandinên hunerî mirov dikare fêm bike. Ji ber ku ne şêweyekî eşkere ye ku mirov bi hêsanî bi wê ciwaniya veşartî hest bike. Hestkirin bi hebûna navxweyî ya Derunî. [119]

**Pascal** dibêje; *"Zimanê zelal, xweşik, reyalîteyî û ciwan wêjeyeke serkeftî pêk tîne. Giringiya tîpan nîne heke bi şêweyekî rêxistî ya peyvekê pêk neyên."* Giringî dide realîte û ciwaniyên di wêjeyê de. Ger ev şêwe jî bi nermî û ciwanî û rêxistî di azadiya

---

(117) .Dr.Rawiye Abdulmunim Abas- al his al jemali wel fen.Beyrut.rûp.234
(118) Decarts.Dr Rawiye Abdulmunim Abas.rûp.90
(119) Al his al jemalî Dr.Rawiye Abdulmunim Abas.rûp.91

hizrê de bê bikaranîn.[(120)]

**Sçiller** digot: *"Huner rêyeke ji bo peydakirina mirovekî gihiştî, paşî azad û bidestxistina azadî û rastiya jiyanê. Peywendiya di navbera ruh û xwezayê de yan di navbera wêne û madeyî de. Ji ber ku ciwanî jiyan e û wênê rastego ye. Wêne şiroveya wateya jiyanê dike. Huner li ser madeyî sultanê mezin e. Ji ber ku dikare li ser zal (sift) bibe û li bin bandora xwe ya afirandinê bihêle. Pêwîst e bîner jî bi azadî xweşiyê ji vê yekê werbigire. Navxweyî cîhan e û cîhan navxweyî ye. Derun di serbestiya cîhana xwe de vê ciwaniya azad hildibijêre."*[121]

**Fridriç Hegel** dibêje: *"Hunera rasteqîn ew huner e ku mirov li ser hewl dide realîteyê zal bibe û derbirînê ji ciwaniya bilindiya xwezayê û realîteyê bike. Huner ne zarvekirine, lê hewl daneke ji bo eşkerekirina naveroka veşartî ya rasteqîne. Serkevtina karê hunerî li ser pîvana eşkerekirina ruhê û derbirîn ji rastiyê ye."* Huner li cem Hegel: *"Rêbazeke ji rêbazên paqijkirina deruniye. Huner ew ruh e ku; hizrê di nav xwe de bi şêweyekî azad dike di resenayetî û afirandinê de. Lê hertim hizir li pêş e, ji ber ku huner hizirkirneke mejûyî ye. Ji bo bi dest anîna ciwaniya hunerî Lêgeryane..*[122]

Li vir mirov dikare li ser ciwaniya huner bêje: Ciwanî beşeke ji beşên felsefî ji lêkolînên hizirkirinên mirovî di ciwan û hestkirinê de. Paşî biryad dide li ser karekî hunerî. Li ser vê yekê pênasa ciwaniyê dibe sê qonax:

1- Qonaxa Texmînê '
2- Qonaxa Hestkirinê
3- Qonaxa Biryardanê.

Li vir mirov dikare ji dîrokê heta niha çendîn pênaseyên cuda cuda li ser vê yekê bigire pêşçav û her yek di dema xwe de xizmeta huner û pêşdaçuna civakê kiriye. Wêje û felsefe jî li ser vî bingehê pêk hatiye. Dema em li dîroka felsefe û ciwaniya *Grek* binêrîn, mînakên weke *Eflatonî* tên pêş çavên me û gelek berhem û nêrînên felsefî li ser ciwaniyê pêk anîne. **Eflaton** dibêje: *"Ji ber xweza ya ciwan û sêhrî ya Grekîstanê, pêwîst bû ku grekî pal bidin zewqa*

---

(120) Dr.Rawiye Abdulmunim Abas -Bascal. rûp.105
(121) Dr.Rawiye Abdulmunim Abas -Şili..rûp.137
(122) Dr.Rawiye Abdulmunim Abas -Al his al jemalî wel fen. .rûp.140

*ciwaniyê û şîir, efsane û diramayan binîvîsin."* Eflaton yek ji wan kesan bû ku yekem car jêderê ciwaniyê di felsefeya Grekî da aniye ziman. Ciwanî li cem wî girêdayi yê wê hunera ku îlham ji aliyê xwedayên hunerî dihat, ku nûnertiya îşaretên remz û efsaneyan dikir xwedawendên mîtolojî, komîdiya, dîrok, nexwşî, reqis, şîir, stran, felek ûwd... *"Ciwanî girêdayî xweza yê ye, xweza çavkê cwaniyê ye. Jiberku jêderê rastî û xêrê ye."*(123)

Xweza serkaniyeke ji bo huner dikare hin beşên biçûk di xwezayê de ji xwe re bike çavkanî. Lê karê hunerî û afirandin ji aliyê hunermend tê kirin. Xweza mîna ferhengeke peyva ye. Mirov dikare rastiya peyvan ji vê ferhengê bigre. Lê parçeyek helbestek yan jî nivîsek ji aliyê mirov ve tê afirandin. Ciwanî ji hundurê hunermend derdikeve di gel ezmunên wî di reyalîteyê de girêdayî hundurê wî û xeyal û şiyanên hunerî ye. Li ser vê yekê **Tolstoy** dibêje: *"Mirov dikare bîrûbaweriyên xwe bi rêya gotinê bigihîne hin kesan. Lê dilovanî û hestên xwe jî bi rêya huner."* (124)

Ciwanî diyardek û rastiyeke girêdayî hundurê mirov e. di tiştekî de taybet û babetiye ku bi ciwanîyê digirnije. Lê ew rastiya rêjeyî tê guhartin û ne mutleq e yan giştiye û nalive. Hunermend dikare li ser bingehê afirandineke xurt ya hunerî tiştên ne ciwan di hunera xwe de ciwan bike.

Ev yeke jî di nava xweda dibe bedewî li gur bandurkirina karê hunerî li ser hestên mirovî. Mirov dikare li dawiyê bibêje ku ev peywendiya destpêka jiyana mirovan taku îrojî peywendiyeke bi hêz digel mirov heye û berdewam dimîne.

---

(123) heman jêder Aflaton.al his al jemali.rûp.35
(124) Dr.Rawiya Abdulmunim Abas-Tolostoi al his al jemali wetarix al

# Jêderên Kurdî û biyanî


1- Hyam El Seyd el seqafe wel fen.malperê Islamonline.net
2- Rustem Axale -Kovarî şêwekarî jimare 3 hewlêr rûp.6 .
3- Suleyman Nemir- Kovarî Hezarmêrd jimare 18. 2001 rûp.105
4- heman jêder rûp.10
5- heman jêder rûp.105.
6- Abdulreqîb Yusif.rûp- Hezaret al dewle al dustekiye fî Kurdistan al wista..5.cild 2.1975.Baxde
7- hem,an jêder rûp.6.1975.Baxde
8- Abdulreqib Yusif-heman jêder.rûp.414.1975.Baxde
9- heman jêder.rûp.415.
10- heman jêder.rûp.414
11- heman jêder .rûp.422.
12- heman jêder rûp.425.
13- heman jêder.rûp 431
14- suleyman şaker- Kovara raman jimare 29.rûp.101.
15- Amed Tigrîsî û Aso Germiyani.Korte mêjoy kurd û Kurdistan,Rû 34 swêd
16- soret el maide-ayeta 90
17- heyam el seyd-islamonline.net2005
18- Belqis Mohsin- Tarix elfen elislami- 1986 Bexde rûp.42.
19- Dr.Efif Behnsi- Elfen welmuctemi ebreeltarix- Dimeşq rûp.151.
20- Ebdulreqîb Yusif- Tabloyên Şerefxanê Bitlîsî., Çapa duyem Hewlêr rûp.13
21- Ebdulreqîb Yusif -Tabloyên Şerfxanê Bitlîsî..
22- Enwer Mayî -Elekrad fi Badînan çapa duyem Duhok 1999 rûp.126

23- Kovara Yekgirtin Hejmar 1-3.1987
24- A.Reqib Yusif-Tabloyên Şerefxan çapa duyem Hewlêr
25- Konferansa Şerefxanê bitlîsî Berlîn 1997.abdulreqîb yusif
26- Şerefxanê Bitlîsî ,Şerefname,Tarixa kurdistanê ya kevnwergêra kormancî Zîya Avci, Apec çapa yekema kormancî 1998 swêd
28-Abdulreqib Yusiv,konferansa Şerefxanî ,Berlin1996
29-¯Şerefxanê Bitlîsî ,Şerefname,Tarixa kurdistanê ya kevnwergêra kormancî Zîya Avci, Apec çapa yekema kormancî 1998 swêd
30- heman jêder
31-heman jêder
32-Abdulreqib Yusv,Seminara konferansê Şerefxanî ,Berlin 1996
33-Şakir Hasenal seîd- Fisul mîn tarîx al hereke al teşkîliye al îraqîye..Bexde1983
34-Ferhad pîr bal- Kovara raman jimare 29 rûp.142. nûsîneweî mêjoî resmî kurdistan.
35- Burhan Hejar.kovara kurdistî Îmro.rû.59.jimare13.2001
36-[1] Cabir pîrbal- Kovara raman jimare18.1997.
37-Ferhad pîrbal -Kovara raman jimare 29..le pênawî nûsînî hunerî resen.
38-Mocahîd abdulmuhe-Al waqiîye wel fen.Seîdni.wergêr imen.qahîre.1971.rûp.27
39-Ferhad pîrbal- Kovara raman jimare29.1998..
40-Dr.Maruf Xezneder- Kovara raman jimare 29 1998.Bedîi baba can û hûner..rûp.129.
41-methef Al fenanîn al rwad, menşorat deiret al fnwn al tşkîlîye Bexded
42-Şakir Hesen Al Seîd fsul mîn tarîx al hereke al teşkîlîye fî al Iraq rûp 198
43-Dr. Ferhad Pîrbal tarîx al fen alteşkîlî fî Kerkok malperat herweha Izedîn Sindoq yek bû ji hunermendên navderên Kerkukê tirej.net
44-Dr.Ferhad Pîr dewid tirej.net

45-Adil Kamil- Al hereke al teşkîliye al îraqî..1979.rûp.36
46-Feîsel al loeîbî- Kovara al seqafe al cedîde..al hereke al teşkîliye al kurdiyeal muasir jimare 206
47-Policromia Kurde.Albom 1992
48-feîsel al loeîbî- Kovara al seqafe al cedîde..jimare206
49-Policromia Kurde.Albom 1992
50-Katelok Grenzenlos kurdisçe Kunst Heute Volkşall im Winer rathaus 2002.
51-Katelog Mohamed Arif, Bexded 1984
52-Katelok Grenzenlos kurdisçe Kunst Heute Volkşall im Winer rathaus 2002.
53- heman jêder
54-heman jêder
55-Enwer Mayî -Al akrad fî badînan.çap 2.1999 rûp.179.
56-Sadiq buhaedîn Amêdî -Hozanvanên kurd..1980 rûp.374
57-Muhemed Ozon -Kovara nûdem jmare 2. 1992.rûp.8 Swêd
58-katelok Riza Topal Gisela Barçe- Ein Kurdisçer Maler.haus der kulturen der welt.Gm berlin 1990
59- Gisela Barçe- Ein Kurdisçer Maler.haus der kulturen der welt.Gm berlin 1990
60-katelog Alfred Laçauer, Kurdey, Zivilisation Münçen,Elmanya
61-Neue Perspektiven 1996 Mezopotamien Verlag,1996 Elmanya
62- heman jêder
63- heman jêder
64- heman jêder
65- heman jêder
66- heman jêder
67-Malpera tîrej.net
68- heman jêder
69-kovara Hicelname jimare.4  Malpera tirêj.net

70-Katelog Malva 20 Jahre Malerei/Paintnig 1974-1994Wien 1994.
71- Kovara yekgirtin jimare 2 .1990 rûp.226
72-Esed Irabî- Malva 20 Jahre malerei 1974-1994.rûp.224
73-Adîb Meîzon- Malva 20 jahre malerei.1974-1994.rûp.223.
74-Malva 20 jahre malerei 1974-1994.rûp.221
75-Malva 20 jahre malerei 1974-1994.rûp.229
76-Malva 20 jahre malerei 1974-1994.rûp.215.sadula Tewîl
77-Malpera tirêj.net
78-Neue Perspektiven 1996 Mezopotamien Verlag,1996 Elmanya
79-heman jêder
80- Malpera Awiar.com
81-heman jêder
82- heman jêder
83-heman jêder
84- heman jêder
85-Monir Eteybe.elfen elteşkîlî malpera Islamonline.net2001
86-deiret elmearif el şeib-misir
87-Francisco de Goya.Leben und Werk
88- Renasart malpera internetê
89-Henan Osman.karîkatur.Islamonline.net
90-Jun Eduardo Cirlot,wergêra Qerenî Jemîl.Kovara Şêwekarî rû.41jimare3.Hewlêr 2003
91-Jun Eduardo Cirlot,wergêra Qerenî Jemîl.Kovara Şêwekarî
92-Jun Eduardo Cirlot,wergêra Qerenî Jemîl.Kovara Şêwekarî rû.45.jimare3.Hewlêr 2003
93-heman çafkanî.rû.44
94-Suleman ŞakirKovara raman jimare 32.1999 rûp.189
95-ernst Fişer -Al îştîrakiye wel fen..Beyrut
96-ernold Hawzer- Al fen wel muctemi abre al tarîx. cild 1 1981
97-Al markisiye wel mesele al weteniye.1942 rûp.12 Newyurk

98-Sidni Venkşin- Al waqiye fî al fen.syidni finkştin1971

99-heman jêder.rûp.153.

100-Dr.Efif Behnisi- Al fen fî ewropa..cild 2 London 1993.rûp.342

101-Al fen fî ewropa.Dr.Afif Behnisi.cild 2 london 1993.rûp.342

102-**fauvisime**:diyardeka huneriye disala 1905-1908 derkeft li ser destê çendîn hunermendên serbixwe yên bingehê hûnerê Kevin jinav birî,û dijî çevlêkirinê dikarekî sade û asande dixebitîn azadiya bikaranîna rengan,bê têkelkirin digel yek û lihev nehatina renga di tabloyande.vauxelles yeke ji serkêşên vê rêbazê û Rouault,Dongen.V,Flaminiek û Durain.

103-**Cobisme:**ev curê hûnerî li ser bingehekî endeziyarî pêk têhunermendên Cobisme,şêweyên endezeyî li ser şeşpalo,bazneyî û xir bikar dianîn,serkêşên wê Picasso û Epraqua bûn.

104-Dr.Efiv Behnisi-al fen fî ewropa.rûp.296 Munç(1864-1944)li luten Nerwij jideyk bûye,lijêr bandûra Vangugh,Sura,Gaugan û Tulus Lutrik bûye.

105-Zoher Kakanî -kovara Rewşen jimare 8 .

106-kovara rewşen jimare 9 rûp.60.1997.Istanbul

108-kovara rewşen jimare 9.1997.istenbul

109-rinye Hewig -al fen teiwîlihî we sebîlihî cild 1 .

110-Gara Resul- kovara yekgirtin jimare 3.rûp178 sal1987

111-.Dr.Rawiye Abdulmunim Abas- al his al jemali wel fen.Beyrut.rûp.234

112-Decarts.Dr Rawiye Abdulmunim Abas.rûp.90

113-Al his al jemalî Dr.Rawiye Abdulmunim Abas.rûp.91

114-Dr.Rawiye Abdulmunim Abas -Bascal. rûp.105

115 heman jêder..rûp.137

116 heman jêder.rûp.140

117- heman jêder,Aflaton.al his al temali .rûp.35

118- heman jêder Tolostoi al his al jemali wetarix al